



**K.T.**

**ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ  
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBÎYATA KURDÎ**

**LÊKOLÎNEK LI SER DÎWANA ŞÊX ‘EBDURREHMANÊ  
AQTEPÎ (RÛHÎ)**

**Zeynep YILDIZ**

**181301204**

**TEZA LÎSANS A BÎLÎND**

**ŞÊWÏRMENDÊ TEZÊ**

**Doç. Dr. M. Zahir ERTEKÎN**

**BÎNGOL – 2020**

**T.C.  
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI**

**ŞEYH ABDURRAHMAN AKTEPÎ'NİN RÛHÎ ADLI  
DİVANI ÜZERİNE BİR İNCELEME**

**Zeynep YILDIZ  
181301204**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**TEZ DANIŞMANI  
Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN**

**BİNGÖL - 2020**

## NAVEROK

<b>PÊŞGOTÎN</b> .....	<b>XVI</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>XVII</b>
<b>KURTE</b> .....	<b>XVIII</b>
<b>ABSTRACT</b> .....	<b>XIX</b>
<b>KURTEBÊJE</b> .....	<b>XX</b>
<b>TABLO Û GRAFÎKÊN TEZÊ</b> .....	<b>XXI</b>
<b>DESTPÊK</b> .....	<b>1</b>
1 Mijara Tezê .....	1
2 Armanca Tezê .....	2
3 Girîngiya Tezê.....	3
4 Çarçove û Rêbaz .....	3
5 Jêderên Sereke yên Tezê .....	4
6 Astengî û Zehmetiyên Tezê .....	5
<b>JÎYAN Û BERHEMÊN ŞÊX EBDURREHMANÊ AQTÊPÎ</b> .....	<b>7</b>
<b>JÎYANA ŞÊX EBDURREHMANÊ AQTÊPÎ</b> .....	<b>7</b>
Jidayîkbûna Wî.....	7
Xwendina û Îcazeya Wî .....	7
Terîqeta Wî.....	8
Wefata Wî .....	9
Zewac û Zarok.....	9
<b>BERHEMÊN ŞÊX EBDURREHMANÊ AQTÊPÎ</b> .....	<b>10</b>
<b>Berhemên Wî yên Kurdîya Kurmancî</b> .....	<b>10</b>
Rewdunne'îm .....	10
Tarîx .....	10
Dîwan .....	10
<b>Berhemên Wî yên Erebî</b> .....	<b>10</b>
Kîtabu'l Îbrîz.....	10
Kitabu Keşfu-z Zalam Fî Eqâid-î Ferq'el Îslam .....	11
Mînhacu'l-Usûl .....	11
Kitêbeke li ser Astronomîyê.....	11
Kîtabu's-Serf we'n-Nehw .....	11
<b>Berhemên Wî yên Tirkî</b> .....	<b>11</b>
Muxemmes.....	11

## BEŞA YEKEM

### KESAYETA EDEBÎ YA ŞÊX ‘EBDURREHMANÊ AQTÊPÎ

<b>1.1 ZIMANÊ WÎ.....</b>	<b>12</b>
1.1.1 Unsurên Farisî .....	17
1.1.1.1 Pêşdaçekên Farisî .....	17
1.1.1.2 Qerafên Pirjimarîyê .....	18
1.1.1.3 Rengdêrên Nîşandanê .....	19
1.1.1.4 Cînavkên Kesane û Cînavkên Kesane ên Hevbend .....	19
1.1.2 Unsurên Erebî.....	20
1.1.2.1 Têgehên Erebî .....	21
1.1.2.2 Terkîb û Hevokên Erebî .....	21
1.1.2.3 Îqtîbasên ji Ayet û Hedîsan .....	22
1.1.3 Unsurên Tirkî .....	23
1.1.4 Bandora Devoka Hekarî û Botanê.....	24
1.1.5 Gotinên Pêşiyar, Biwêj û Nifir .....	24
<b>1.2 MEXLESÊN WÎ.....</b>	<b>25</b>
<b>1.3 HELBESTVANÊN KU BANDOR LI AQTÊPÎ KIRINE .....</b>	<b>25</b>
1.3.1 Melayê Cizîrî.....	25
1.3.2 Ehmedê Xanî.....	26
1.3.3 Feqiyê Teyran.....	27
<b>1.4 BIKARANÎNA HUNERÊN EDEBÎ.....</b>	<b>28</b>
1.4.1 Teşbîh (Şibihandin; Lêkçiwandin) .....	29
1.4.1.1 Teşbîha Mufessel .....	29
1.4.1.2 Teşbîha Belîx / Teşbîha Mu’ekked .....	30
1.4.1.3 Teşbîha Mucmel / Teşbîha Mûcez .....	30
1.4.1.4 Teşbîha Muekkeb .....	31
1.4.2 Îsti’are .....	34
1.4.2.1 Îsti’areya Vekirî / Îsti’areya Musarraha .....	34
1.4.3 Mecaza Mursel .....	35
1.4.4 Cînas.....	36
1.4.4.1 Cînasa Tam.....	36
1.4.4.1.1 Cînasa Basît.....	36
1.4.4.2 Cînasa Netemam (Nîvco).....	36
1.4.5 Tezad.....	37

1.4.6 Muqabele.....	37
1.4.7 Nîda' .....	39
1.4.8 Tenasub .....	39
1.4.9 Tersî' .....	40
1.4.10 İştîqaq.....	41
1.4.11 Mubalexe.....	41
1.4.12 İstifham .....	42
1.4.13 Alîterasyon .....	42
1.4.14 Asonans .....	42
1.4.15 Teşxîs .....	42
1.4.16 Qelb .....	43
1.4.17 Mulemme' .....	43
1.4.18 İrsal-i Mesel (İrad-i Mesel).....	44
1.4.19 Teraduf (Sînonîm).....	44
1.4.20 Tezmîn.....	44
1.4.21 Redd'ul- Acuz Ale's-Sadr.....	45
1.4.22 'Îade.....	46
1.4.23 'Eks / Tard-û 'Eks / 'Eks û Tebdîl .....	47
1.4.24 Tewrîye (Îham).....	47
1.4.25 İstixdam / Sarfû'l- Hizâne.....	48
1.4.26 Husnu –l Te'lîl (Şîroveya Xweşik) .....	48
1.4.27 Tecrîd .....	49
1.4.28 İltîfat.....	49
1.4.29 İrsad / Teshîm.....	50
1.4.30 Tecahula 'Arif.....	50
1.4.31 Tefrîq.....	51
1.4.32 Tenkîku's-Sifet (Wesfandina Domdar).....	51
1.4.33 Teşabîhu'l Etraf.....	52
1.4.34 Muwazene .....	53
1.4.35 Tesmît.....	53
1.4.36 Leff û Neşr .....	54
1.4.36.1 Leff û Neşra Muretteb / Leff û Neşra bi Rêkûpêk .....	54
1.4.36.2 Leff û Neşra Muşewweş / Leff û Neşra Bêtertîb .....	55
1.4.37 Sihra Helal.....	55

1.4.38 Rucû' .....	56
1.4.39 Telmîh .....	56
1.4.40 Pirs û Bersîv .....	57
1.4.41 Tarîx .....	57

## BEŞA DUYEM

### VEKOLÎNA DÎWANÊ JI ALIYÊ TEŞEYÊ VE

<b>2.1 TERTÎB Ê DANASÎNA GIŞTÎ YA DÎWANÊ .....</b>	<b>59</b>
<b>2.2 TEŞEYÊN NEZMÊ .....</b>	<b>61</b>
2.2.1 Xezel .....	61
2.2.1.1 Xezela Musammat.....	62
2.2.1.2 Xezela Mukerrer.....	63
2.2.1.3 Xezela Mutawwel (Dirêj).....	64
2.2.1.4 Xezela Yekaheng .....	64
2.2.1.5 Xezela Yekawaz.....	64
2.2.1.6 Xezela Mureddef.....	65
2.2.2 Mustezad .....	65
2.2.3 Qesîde.....	66
2.2.4 Murebbe' .....	66
2.2.4.1 Murebbe'a Muzdewic .....	67
2.2.4.2 Murebbe'a Mutekerrir.....	67
2.2.5 Muxemmes /Pencîn.....	68
2.2.5.1 Muxemmesa Muzdewic .....	68
2.2.5.2 Muxemmesa Mutekerrir.....	69
<b>2.3 CÛREYÊN NEZMÊ .....</b>	<b>70</b>
2.3.1 Ne't.....	70
2.3.2 Medhîye .....	70
2.3.3 Recmîyye (Le'netname).....	71
<b>2.4. SERWA (QAFÎYE).....</b>	<b>72</b>
2.4.1 Asta Deng.....	72
2.4.1.1 Rewî .....	72
2.4.1.2 Pêşrewî .....	72
2.4.1.3 Paşrewî .....	72
2.4.2 Asta Peyvê.....	73
2.4.2.1 Peyvên Serwa .....	73

2.4.2.2 Pêşserwa (Hacîb).....	73
2.4.2.3 Paşserwa (Redîf) .....	73
<b>2.4.3 Cureyên Serwayê / Qafiyeyê .....</b>	<b>74</b>
2.4.3.1 Serwaya Mucerred .....	74
2.4.3.2 Serwaya Murekkeb.....	74
2.4.3.2.1 Serwaya Murdef .....	74
2.4.3.2.2 Serwaya Muqayyed.....	75
2.4.3.2.3 Serwaya Muesses .....	75
2.4.3.3 Zû- Qafiyeteyn .....	76
2.4.3.4 Zû'l- Qavafî.....	76
<b>2.5 WEZN (‘ERÛZ) .....</b>	<b>77</b>
2.5.1 Behra Hezecê .....	77
2.5.2 Behra Recezê.....	78
2.5.3 Behra Remelê .....	78

**BEŞA SÊYEM**  
**TEHLÎLA DÎWANÊ**

<b>3.1 DÎN .....</b>	<b>80</b>
3.1.1 Navê Xwedê .....	80
3.1.2 Melek .....	81
3.1.3 Kitêbên Pîroz.....	81
3.1.3.1 Qur’an .....	81
3.1.4 Pêxember.....	81
3.1.4.1 Hz. Muhemmed.....	81
3.1.4.1.1 Zarokên Hz. Pêxember (s.x.l) .....	82
3.1.4.1.2 Alê Mustefa / Alê Resûl.....	83
3.1.4.2 Hz. Îbrahîm .....	83
3.1.4.3 Hz. Mûsa .....	83
3.1.4.4 Hz. Yûnis .....	84
3.1.4.5 Hz. Îsa .....	84
3.1.4.6 Hz. Suleyman .....	85
3.1.4.7 Hz. Eyyub.....	85
3.1.4.8 Luqman .....	86
3.1.5 Çar Xelîfe.....	86
3.1.5.1 Hz. ‘Elî (s.l).....	86

3.1.6 Sehabe .....	87
3.1.6.1 Hz. Huseyn .....	87
3.1.6.2 Hz. Hesen .....	87
3.1.6.3 Ehlê Bedir .....	88
3.1.6.4 Qeder .....	88
3.1.7 Hin Têgehên din ên Dînî .....	89
3.1.7.1 Axret .....	89
3.1.7.2 Heşr û Neşr (Qîyamet) .....	89
3.1.7.3 Cennet (Behişt) .....	90
3.1.7.4 Baxê Ne'îm .....	90
3.1.7.5 Firdews .....	90
3.1.7.6 Ava kewser .....	90
3.1.7.7 Horî .....	90
3.1.7.8 Cehennem (Dojeh) .....	91
3.1.7.9 Esfelê Safil .....	91
3.1.7.10 Dîn, Îman, Kufir, Misilman û Kafir .....	91
3.1.7.11 Îsayî (Mesîhî û Dêr) .....	92
3.1.7.12 Pût (But; Senem) .....	92
3.1.7.13 Pûtperest .....	93
3.1.7.14 Limêj (Secde) .....	93
3.1.7.15 Du'a .....	94
3.1.7.16 We'z .....	94
3.1.7.17 'Ummet .....	94
3.1.7.18 Bende ('Ebd; 'Evd) .....	94
3.1.7.19 Şehîd .....	95
3.1.7.20 Heram û Helal .....	95
3.1.7.21 Qurban .....	96
3.1.7.22 Perî .....	96
3.1.7.23 Cin .....	97
3.1.7.24 Şeytan .....	97
3.1.7.25 Rûh .....	97
<b>3.2 TESEWIF .....</b>	<b>98</b>
3.2.1 Saqî .....	98
3.2.2 Meyxane (Xerabat) .....	98



3.2.3 Dergah .....	99
3.2.4 Tewbe (Îstîxfar).....	99
3.2.5 Sulûk .....	99
3.2.6 Tecellî (Tecella) .....	100
3.2.7 Sir (Esrar; Raz).....	100
3.2.8 Cam (Cam-i Cem; Qede; Saxer; Peyal) .....	101
3.2.9 Şerab (Bade; Mey; Xemr) .....	101
3.2.10 Abê Heywan (Ava Jîyanê) .....	102
3.2.11 Kebab .....	102
3.2.12 Mexrib û Meşriq.....	103
3.2.13 Hîcran (fîraq; fîrquet).....	103
3.2.14 Murîd.....	103
3.2.15 Muxbeça.....	104
3.2.16 Pîr .....	104
3.2.16.1 Pîrê Terîq (Terîqetê).....	104
3.2.16.2 Pîrê Muxan .....	105
3.2.17 Derwêş.....	105
3.2.18 Zahid û Sofî.....	105
3.2.19 Nefs .....	107
3.2.20 Xews.....	107
3.2.21 Şêx û Mela .....	107
3.2.21 ‘Alim .....	108
3.2.22 Welî (Ewlîya).....	108
<b>3.3 KESAYET.....</b>	<b>108</b>
3.3.1 Kesayetên Dînî- Mitesewif .....	108
3.3.1.1 Şêxê Geylanî û Teyfûrî / Ebû Yezîd Bîstamî.....	108
3.3.1.2 Behauddîn .....	109
3.3.1.3 Weys’îl Qeran .....	109
3.3.2 Kesayetên Xerab .....	110
3.3.2.1 Yezîd .....	110
3.3.2.2 ‘Emr, Şemr û Îbnî Ziyad .....	110
3.3.2.3 Nemrûd.....	110
3.3.2.4 Helagû Xan.....	111
3.3.3 Kesayetên Dîrokî û Mîtolojîk (Efsaneyî).....	111

3.3.3.1 Keyxusrew û Cemşîd (Cemşah).....	111
3.3.3.2 Eskender.....	112
3.3.3.3 Qubad.....	112
3.3.3.4 Xaqanî û Fexfûrî.....	113
3.3.3.5 Esfendar û Rustem.....	113
3.3.3.6 Mehmûd û Eyaz.....	113
3.3.4 ‘Aşiq û Me’şûq.....	114
3.3.4.1 Leyla û Mecnûn.....	114
3.3.4.2 Ferhad û Şîrîn.....	116
3.3.4.3 Yûsuf û Zuleyxa.....	117
3.3.4.4 Wamiq û Ezra.....	118
<b>3.4 HEYWAN.....</b>	<b>118</b>
<b>3.4.1 Sîyehmar.....</b>	<b>118</b>
3.4.2 Teyr (Murx).....	119
3.4.3 ‘Eqreb.....	119
3.4.4 ‘Enqa.....	119
3.4.5 Bilbil (Endelîb; Hezâr).....	120
3.4.6 Baz (Şahîn; Şahîbaz).....	120
3.4.7 Qijik (Xurab; Zax).....	120
3.4.8 Ahû (Xezal).....	121
3.4.9 Kebk (Kew).....	121
3.4.10 Tûtfî.....	122
3.4.11 Puleng (Piling).....	122
3.4.12 Rovî (Rûbah).....	122
3.4.13 Perwane.....	123
3.4.14 Kelb (Kûçik).....	123
3.4.15 Ejder (Ejdeha; Ejderha).....	123
3.4.16 Şêr (Şîr; Esed).....	124
3.4.17 Edhem (Mehîn).....	125
3.4.17.1 Duldul.....	125
3.4.18 Mahî (Masî).....	125
3.4.19 Musîqar.....	126
3.4.20 Qaz û Sî.....	126
3.4.21 Nemleê Ez’ef (Mûr).....	126

<b>3.5 NAVÊ WELAT Û BAJARAN .....</b>	<b>127</b>
3.5.1 Semerqend û Buxara .....	127
3.5.2 Şam û ‘Iraq .....	127
3.5.3 Firingîstan .....	128
3.5.4 Mesken Seba .....	128
3.5.5 Yemen .....	128
3.5.6 Kərbela’ .....	129
3.5.7 Necef .....	129
3.5.8 Çîgul .....	129
3.5.9 Çîn .....	130
<b>3.6 ÇÎYA .....</b>	<b>130</b>
3.6.1 Çîyayê Tûrê .....	130
3.6.2 Kûhê Qaf (Çîyayê Qaf) .....	130
<b>3.7 SÛR – GELÎ - BÎR .....</b>	<b>131</b>
3.7.1 Xeyber .....	131
3.7.1.1 Babê Xeyberê (Babul- Xeyber) .....	131
3.7.2 Wadî Eymen .....	131
3.7.3 Çahê Zemzem .....	132
<b>3.8 ÇEM .....</b>	<b>132</b>
3.8.1 Dicle .....	132
<b>3.9 NAVÊ QEWMAN .....</b>	<b>132</b>
3.9.1 Turk (Tacik û Qecer) .....	132
3.9.2 ‘Ereb .....	133
3.9.3 ‘Ecem .....	133
3.9.4 Rom û Hebeş .....	133
3.9.5 Tatar .....	134
3.9.6 Fireng .....	134
3.9.7 Tersa .....	134
3.9.8 Deylemanî .....	135
<b>3.10 NEBAT .....</b>	<b>135</b>
3.10.1 MÊWE .....	136
3.10.1.1 Engûr (Tirî) .....	136
3.10.1.2 Sêv .....	136
3.10.2 ZERZEWAT .....	137

3.10.2.1 Peyaz (Pîvaz).....	137
3.10.3 KULÎLK.....	137
3.10.3.1 Gul (Werd û Nesrîn).....	137
3.10.3.2 Pirpizêk .....	138
3.10.3.3 Benefş (Binefş).....	139
3.10.3.4 Nergiz (Nêrgiz) .....	139
3.10.3.5 Lale.....	140
3.10.3.6 Sunbul .....	140
3.10.3.7 Reyhan .....	141
3.10.4 DAR .....	141
3.10.4.1 Serwî .....	141
3.10.4.2 Şîmşad.....	141
3.10.4.3 ‘Er’er .....	141
3.10.4.4 Erxewan.....	142
3.10.5 Gulzar (Gulşen; Gulbun; Çîmen; Bûsîtan).....	142
3.10.6 Xar û Muxeylan.....	142
<b>3.11 AMÛRÊN MÛZÎKÊ .....</b>	<b>143</b>
3.11.1 Ney .....	143
3.11.2 Qanûn .....	143
3.11.3 ‘Ûd .....	143
3.11.4 Ribab .....	144
3.11.5 Çeng .....	144
3.11.6 Saz .....	144
3.11.7 Nexme .....	144
3.11.8 Mutrib.....	144
<b>3.12 BÊHNA XWEŞ.....</b>	<b>145</b>
3.12.1 ‘Etr (Şemîm).....	145
3.12.2 ‘Enber.....	145
3.12.3 Misk (Muşkîn; Muşgîn) .....	146
3.12.4 ‘Ebîr .....	146
3.12.5 Nafe.....	146
3.12.6 Bêhna Gulan.....	147
<b>3.13 KEVIRÊN BIQÎMET (GEWHER Û ALAVÊN XEMLÊ) .....</b>	<b>147</b>
3.13.1 ‘Ac.....	147

3.13.2	Yaqût .....	147
3.13.3	Elmas.....	148
3.13.4	Dur .....	148
3.13.5.	Le'l û Sedef (Mercan .....	148
3.13.6	'Eqîq.....	149
3.13.7	Zêr (Zer).....	149
3.13.8	Zîv (Sîm).....	149
3.13.9	Zîwer û Gerdenlix .....	150
3.13.10	Netrîk .....	150
3.13.11	Guhar (Gûşîwar).....	150
3.13.12	Gustîlk.....	151
3.13.13	Tac.....	151
3.13.14	Kulah.....	151
3.13.15	Zencîr (Zincîr).....	152
3.13.16	Kemer.....	152
3.13.17	Tûtîya (Kuhl; Kil) .....	153
3.13.18	Perde û Berqe .....	153
3.13.19	Nîqab.....	154
<b>3.14</b>	<b>ALAVÊN DI DÎWANÊ DE .....</b>	<b>154</b>
3.14.1	Xedeng (Tîr; Nîşab) .....	154
3.14.2	Şîmşîr .....	154
3.14.3	Top û Tifeng.....	155
3.14.4	Gaz (Kerpeten û Çakûç).....	155
3.14.5	Xencer û Teber.....	155
3.14.6	Mencil.....	155
3.14.7	Derzî û Ta.....	156
3.14.8	Ceres.....	156
<b>3.15</b>	<b>ÇAR UNSUR .....</b>	<b>156</b>
3.15.1	Av (Ab) .....	156
3.15.1.1	Enhar û Kanî .....	157
3.15.1.2	Behr û Têgehên der barê wê de.....	157
3.15.1.2.1	Behr .....	157
3.15.1.2.2	Derya .....	157
3.15.1.2.2.1	Deryaya Dil .....	157

3.15.1.2.2.2 Deryaya Keder .....	158
3.15.1.2.2.3 Deryaya Îhsanê (Kerem) .....	158
3.15.1.2.2.4 Deryaya Rehmê .....	158
3.15.1.2.3 Qulzum .....	159
3.15.1.2.4 Umman .....	159
3.15.1.2.5 Xerîq .....	159
3.15.1.2.6 Lucce .....	160
3.15.1.2.7 Mewc .....	160
3.15.1.2.8 Keştîban .....	161
3.15.1.2.9 Girdab .....	161
3.15.1.2.10 Lenger .....	162
3.15.1.3 Baran .....	162
3.15.1.4 ‘Ewr .....	163
3.15.2 Ba .....	163
3.15.2.1 Bayê Nesîm .....	163
3.15.2.2 Bayê Seba (Badê Seba) .....	163
3.15.3 Agir (Nar; Pêt; Ateş; Nîran) .....	164
3.15.4 Ax (Turab; Xak) .....	164
<b>3.16 UNSURÊN GERDÛNÎ .....</b>	<b>165</b>
3.16.1 Felek .....	165
3.16.2 Qemer (Bedr) .....	166
3.16.3 Afîtab (Şems; Xurşîd) .....	166
3.16.4 Kewkeb .....	166
3.16.5 Kursî Sîdre Erşê Mecîd .....	166
<b>3.17 BURC .....</b>	<b>167</b>
3.17.1 Burca Sewrê û Mahî .....	167
3.17.2 Burca Humul (Hemil) .....	168
<b>3.18 DEM .....</b>	<b>168</b>
3.18.1. ‘Îd .....	168
3.18.2 Newroz .....	170
3.18.3 Leyl .....	170
3.18.4 Meh .....	171
3.18.4.1 Meha Muherrêmê .....	171
3.18.4.2 Meha Nîsanê .....	171

3.18.5 Fesil (Demsal).....	171
3.18.5.1 Fesla Buharê.....	171
3.18.5.2 Fesla Xezan.....	171
3.18.5.3 Havîn û Zivistan (Seyf û Şîta') .....	172
<b>3.19 RENG .....</b>	<b>172</b>
3.19.1 Reş (Sîyeh).....	172
3.19.2 Sor (Al; Erxwenanî).....	173
3.19.3 Spî (Beyza).....	173
3.19.4 Zer (Zerd).....	174
3.19.5 Belek .....	175
3.19.6 Hin Rengên Din .....	175
<b>3.20 HERF (TÎP) .....</b>	<b>175</b>
3.20.1 Elîf.....	175
3.20.2 Dal û Lam.....	176
3.20.3 Nûn û Sad û Mîm .....	177
<b>3.21 ÎNSAN .....</b>	<b>177</b>
3.21.1 'Aşîq.....	177
3.21.2 Me'şûq .....	178
3.21.2.1 Unsurên Xweşikbûnê yên Yarê (Me'şûq)ê.....	181
3.21.2.1.1 Por (Kakul; Zulf; Perçem; Turre; Gîsû; Mû) .....	181
3.21.2.1.3 Enî .....	184
3.21.2.1.4 Çav (Çeşm; Beser; 'Eyn; Uyûn; Dîde) .....	184
3.21.2.1.5 Dev (Dîhen) û Lêv (Le'l; Leb).....	185
3.21.2.1.6 Birû (Ebrû ) û Bijang (Mujgan) .....	186
3.21.2.1.7 Çene (Zenexdan; Çahê zenexdan).....	187
3.21.2.1.8 Diran.....	187
3.21.2.1.9 Gerden; Xebxeb û Sing (Sîne û Ber) .....	187
3.21.2.1.10 Dest û Tilî (Zend û Esbe').....	188
3.21.2.1.11 Bejn û Bal (Qed û Qamet ).....	188
3.21.2.1.12 Şehnik (Xal) .....	189
<b>ENCAM.....</b>	<b>192</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>195</b>
<b>JÎNNAME .....</b>	<b>195</b>

## BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Yüksek Lisans tezi olarak hazırladığım *Lêkolînek li ser Dîwana Şêx 'Ebdurrehmanê Aqtepe (Rûhi)* adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

10 /09/ 2020

Zeynep YILDIZ



**BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ**  
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

*Zeynep YILDIZ* tarafından hazırlanan *Lêkolînek li ser Dîwana Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepî (Rûhî)* başlıklı bu çalışma, 10.09.2020 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [oybirliğı ile/ oy çokluğu ile] başarılı/başarısız bulunarak jürimiz tarafından [Kürt Dili ve Edebiyatı] Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans tezi olarak kabul edilmiştir.

**Tez Jürisi Üyeleri (Unvanı, Adı ve Soyadı)**

**Başkan:** Dr. Öğr. Üyesi Osman ASLANOĞLU

İmza: .....

**Danışman:** Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN

İmza .....

**Üye** : Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD

İmza: .....

**ONAY**

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun ...../...../ 2020 tarih ve ..... sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Doç. Dr. Abdulnasir SÛT

Enstitü Müdürü

## PÊŞGOTÎN

### *Bi Navê Xwedayê Rehman û Rehîm*

Edebîyata Kurdî ya klasîk weke rûbarekê ye ku heta vêga jî diherike, xwe gihandiye roja me. Gelek helbestvanan ev rûbar bi berhemên xwe geş kiriye û binyata tarîxa me ya kultûrî û edebî pêk anîne. Ji hêlekê ve jî, îroroj hin helbestvanên vê rûbarê nenaskirî ne û berhemên wan an winda yan jî lêkolîn li ser wan nehatine kirin; loma, divê ev helbestvan bi nifşên nû bîn naskirin û xebat û lêkolîn li ser berhêmen wan bîn kirin.

Bikaranîna terkîb û mezmûnên zimanên din ji bo helbestvanên Kurd ne karekî hêsan e. Helbestvanan carna ji bo wezn û serwayê, carna jî ji bo ku hest û ramanên xwe bi awayekî aşkere dîyar nekin, bi peyvan leyîstiyê û xwestine ku berhemên wan ji aliyê estetîkê ve bala xwîneran bikişînin. Ji ber ku ev ne karekî hêsan e, dema ku em li berhemên wan dinihêrin em rastî zanabûn û qabiliyeta helbestvanan tîn.

Wek edebîyatên din, edebîyata Kurdî ya klasîk jî xwedî prensîb û qaîdeyên xweser e. Ji bo ku helbestên helbestvanan bîn fehmkirin, divê mirov hakimê kelepûra klasîk û qaîdeyên estetîkê yê helbestvanan be. Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepi jî nimûneyek e ku di bin bandora helbestvanên wek Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Feqîyê Teyran de maye û helbestên xwe li gorî qaîde û prensîbên edebîyata klasîk honandine û bi zimanên cuda berhemên giranbûha nivîsîne.

Me jî xwest ku em di vê xebatê de li ser Dîwana wî rawestin û li gorî van rê û rêbazan binirxînin, taybetiyên wê tesbît bikin û girîngîya helbestvan û berhema wî bi nifşên nû bidin zanîn. Her weha me xwest ku cihê wî di edebîyata klasîk de bê tesbîtkirin.

Di serî de, ji ber ku di peydakirina mijara min de şewirmendê min Doç. Dr. M. Zahir Ertekin, ev dîwan pêşnîyazî min kir û min ji vê gencîneyê bê par nehişt, jê re spasîyên xwe pêşkêş dikim. Di pêvajoya amadekirina xebata me de, ji ber ked û alîkarîya mamoste Doç. Alk. Dr. Hêmin Omer Ehmed, Nurettin Ertekin, û M. İkbâl Deniz ku dibûn alîkar, spasdar im. Ji Hoşeng Nûh re spas dikim ku tezê ji serî heta dawiyê xwend û bi pêşnîyazên xwe derfet da min ku ez vê xebatê bikemilînim.

Her weha spasî mamoste Umîd Demîrhan, Zeynelabidin Demir û Ömer Faruk Feyat re dikim. Xebat û hewldan ji me, alîkarî ji Rebbê me ye.

**Zeynep Yıldız**  
**Hezîran 2020, Batman**

## ÖZET

Şeyh Abdurrahman Aktepî 1853 yılında Diyarbakır'ın Çınar ilçesine bağlı olan Aktepe köyünde dünyaya gelmiştir. 1910 yılında vefat etmiş ve aynı köyde metfundur. Şeyh Abdurrahman Aktepî, klasik tarzda yazmış olduğu eserleriyle Klasik Kürt Edebiyatı'nda dikkatleri üzerine çekmeyi başarmış ve bu edebiyatta kendine yer edinmiştir.

Âlim, aydın ve aynı zamanda Mutasavvuf olan şairimiz, Nakşibendiyye Tarikati'nin Halidiye koluna mensuptur ve şiirlerinde çoğunlukla Rûhî mahlasını kullanmıştır.

Bu çalışmamızda Kürtçe'nin Kurmancî lehçesiyle yazılmış ve temeli Tasavvuf ve İlahi Aşktan oluşan divanı üzerine yoğunlaşacağız.

Detaylı ve iyi bir çalışma olması adına araştırmamızı üç ana bölüme ayırdık. Bunlar: Şeyh Abdurrahman Aktepî'nin Edebi Kişiliği, Divanın Şekil Bakımından İncelenmesi, Divan Tahlili. Ayrıca giriş bölümünde Şeyh Abdurrahman Aktepî'nin Hayatı ve Eserlerine yer vereceğiz.

**Anahtar Sözcükler:** Klasik Kürt Edebiyatı, Şeyh Abdurrahman Aktepî, Divan, Rûhî, Tahlil

## KURTE

Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepî di sala 1853an li gundê “Aqtepe”yê girêdayî navçeya Çinar a Diyarbekirê hatiye dinyayê. Di sala 1910an de wefat kiriye û li heman gundî metfun e. Aqtepî, yek ji wan helbestvanên klasîk e ku bi dîwana uslûba xwe yê klasîk û berhemên xwe yên cûrbecûr, bal kişandiye ser xwe.

Şêx, helbestvanekî zana û alim e di heman demê de mutesewif e û girêdayî terîqeta Neqşîbendiya Xalidî ye. Di berhemên xwe de bi piranî mexlesa Rûhî bi kar anîye.

Em ê di vê xebatê de li ser dîwana wî ya Kurdiya Kurmancî ku bingeha wê ji Tesewif û eşqa îlahî pêk tê, rawestin.

Ji bo xebateke kûr û baş bê kirin, em ê xebatê dabeşî sê beşan bikin. “Kesayeta Wî ya Edebî, Vekolîna Dîwanê Ji Aliyê Teşeyê ve û Tehlîla Dîwanê. Her wiha dê destpêkê de behsa Jiyan û Berhemên Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepî bê kirin.

**Bêjeyên Sereke:** Edebîyata Kurdî ya Klasîk, Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepî, Dîwan, Rûhî, Tehlîl

## ABSTRACT

Şeyh Abdurrahman Aktepî was born in 1853 in Aktepe village of Çınar district of Diyarbakır. He passed away in 1910 and is in the same village. Şeyh Abdurrahman Aktepî has succeeded in attracting attention in the Classical Kurdish Literature with his works written in classical style and has gained a place in this literature.

Our poet, who is a scholar, an intellectual and also a Mutasavvuf, is a member of the Naqshbandiyya Tarikati and mostly used the pseudonym Rûhî in his poems.

In this study, we will focus on the divan of Kurdish written in the Kurmanji dialect and whose basis is Sufism and Divine Love.

In order to be a detailed and good study, we divided our research into three main parts. These are: The Literary Personality of Sheikh Abdurrahman Aktepî, Examination of the Divan in Terms of Form, Divan Analysis. In addition, we will include the Life and Works of Şeyh Abdurrahman Aktepî in the introduction.

**Keywords:** Classical Kurdish Literature, Şeyh Abdurrahman Aktepî, Court, Rûhî, Analysis

## KURTEBÊJE

amd.	: amadekar
b.	: bin
bnr.	: binêrin
c.	: cild
DÎA	: Diyanet İslam Ansiklopedisi
eds.	: Editörler
h.b.	:heman berhem
hwd.	: her wekî din
ÎA	: İslam Ansiklopedisi
m.	: mirin
M.E.H	: Mehmed Emîn Hêvîdar
n.d.	: notên derse
r.	: rûpel
R.J.	: Rênas Jiyan
S.	: Stenbolê
s. l.	: Silav li Wî Be
s.x.l.	: Silavên Xwedê li ser Wî Be
weş.	: weşanxane
z.	: zayînî

## TABLO Û GRAFÎKÊN TEZÊ

Tablo 1 Têgehên ‘Erebî.....	21
Tablo 2 Terkîb û Hevokên ‘Erebî .....	22
Tablo 3 Îqtîbasên ji Ayetan .....	23
Tablo 4 Hunera Teşbîhê .....	33
Tablo 5 Rêz, Hejmar, Teşeyên Nezmê û Herfa Qafiyeyê ya Helbestan .....	60
Tablo 6 Rêza Xezel û Hejmara Malikan .....	62
Tablo 7 Qaliba ‘Erûzê di Helbestên Dîwanê de.....	79
Tablo 8 Unsurên Xweşîkbûnê yên yarê û taybetiyên wan.....	191



## GRAFİK

Şekil 1 Grafika rêjeya Teşeyên Nezmê ..... 61





## DESTPÊK

Edebîyata Kurdî ya Klasîk, jêdereke girîng û dewlemend e ji bo gelê Kurd. Dema qala Edebîyata Klasîk tê kirin, bêguman ewil nezim ango helbest tê hişê meriv. Lewra di Edebîyata Klasîk de nezim ji pexşanê pêşdetir bûne, kesên ku bi edebîyatê re mijûl dibûn zêdetir nezmê tercih kirine û girîngî dane nezmê.

Dema mijar dibe Edebîyata Klasîk û nezim jî; serê ewil “helbestên ku helbestvanan ji bo qabiliyet, huner, fikr û nêrînên xwe nîşan bidin, li gor hin rêbazan di defterekê de kom dikirin” tê hişê meriv. Ev helbestên ku di defteran de hatine tertîb kirin wek “Dîwan” bi nav bûye û bi vî navî di nav gel de belav bûye. Dîwan ji bo helbestvanan bûne wek nasnameyek. Piraniya helbestvanên xwedî dîwan jî bi dîwanên xwe navdar bûne.

Di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de heta niha li ser dîwanan du metodên sereke hatin tesbît kirin. Yek şerh e. Şerha berhemên klasîk e ku peyvên di berhemekê de hatine ravekirin, maneyên wan ên mecazî û rastî hatine nivîsîn. Hin kesan jî di vê metodê de erûza helbestan tesbît kirine û malikên helbestan şîrove kirine.

Xebata duyem jî tehlîla dîwanan e. Tehlîl jî; şaxekî edebîyatê ye ku taybetîyên berhemana dertîne holê û têgehiştina berhemana hêsantir dike. Ji bo xwîner berhemana baş fehm bikin û asta berhemana bîn pîvandîna hewcedarî bi vê zanistê bûye.

Edebîyata Kurdî ya Klasîk jî bi berhemên xwe nemaze bi dîwanên ku hatine nivîsîn hêjayî vekolîn û xebatên zanistî ye. Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepi jî yek ji wan helbestvanên ku xwedî dîwan e. Aqtepi berevajiyê helbestvanên din bi “Rewdunneim” a xwe ya li ser jiyan û Mî’raca Hz. Pêxember (s.x.l.) navdar bûye. Lê herçiqas bi dîwana xwe nehatibe zanîn jî dîwana wî hêjayî vekolînê bû. Ji ber vê yekê me berê xwe da dîwana wî.

### 1 Mijara Tezê

Mijara vê xebatê jî “Lêkolînek li ser Dîwana Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepi” ye ku pêdivî bi vekolîna wê hatiye tesbît kirin. Lewra Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepi di dîwana xwe de zanabûn û qabiliyeta xwe raxistiye ber çavan. Bi qasî Kurdî; zimanên Erebi û Farisî jî sûdwergeriya. Terkîb û peyvên van zimanan bikaraniye. Malikên xwe bi mecaz û teşbîhan honandiye.

Wek tê zanîn ku têgihîştina van huneran ne hêsan e nemaze bi zimanên din-  
Erebî û Farisî- ev huner hatibin bikaranîn têgihîştina wan hin diwartir dibin. Ji ber  
vê yekê jî têgihîştina berhema wî ji bo kesên ji rêzê dijwar bû û pêdivîyek bi tehlîla  
vê berhemê hebû.

## 2 Armanca Tezê

Wek çawa ku me anîbû ziman ku di edebîyata klasîk de hejmara berhemên  
wenda an nelêkolînkirî ne kêma e, roj bi roj ev edebîyat zengîniya xwe dide der û roj  
derbas nabe ku berhemeke klasîk ji wendabûnê xelas nebe û nivîskarekî ji vê  
edebîyatê zêde nabe.

Lê xebatên ku heta niha hatine kirin jî, li gorî hejmara berhemên ku hatine  
nivîsîn û peyda kirin, gelekî lawaz dimînin. Ji bo ku ev rewş ji holê rabe, divê ev  
berhemên ku tên peydakirin di nav refên tozgirî de nemînin, helbestvan û berhemên  
wan ên giranbuha bi nifşên nû bînin zanîn û li gorî rê û rêbazên edebîyata klasîk  
xebatên akademîk bînin kirin. Sedema hilbijartina vê mijarê jî ew e ku di vê  
çarçoveyê de pêdivî bi xebateke wisa hebû.

Sê armancên sereke yê xebata me hene:

Yek; ji ber ku asta dîwanê ya hunerî û edebî hîn jî nehatibû tesbîtkirin, me  
xwest asta wê ya di edebîyata Kurdî de bê pîvandin.

Dudu; ji ber ku heta niha ji xeynî çend latînzekirinan<sup>1</sup> û hin gotarên  
akademîk<sup>2</sup>; di bin sernavekî de xebateke hûr û kûr û li gorî rê û rêbazên zanista

---

<sup>1</sup> Dîwana Şêx Ebdurrehmanê Aqtepe (Dîwana Rûhî), 6 caran hatiye çapkirin. Herdu çapên ewil bi  
tîpên 'Erebî hatine çapkirin. Cara ewil di sala 1980an de 103 rûpelî ji aliyê Mela Zeynelabîdîn  
Amedî ve di sala 1986an de ji Mele Ehmed Hilmîyê Qoxî ve bi tîpên 'Erebî hatiye nivîsîn û çapkirin.  
Çar caran jî hatiye latinizekirin. Di sala 1988an de ji aliyê Zeynelabîdîn Zinar û Emîn Narozi ve li  
Swêdê ji weşanên Roja Nû, di sala 2002an de li Stenbolê ji aliyê Osman Akdağ û Kerem Soyly ve ev  
dîwan cardin hatiye latinize kirin û ji aliyê enstituya Stenbolê ve hatiye çapkirin. Herwiha di sala  
2013an de Rênas Jîyan ji nû ve latinize kiriye û li Diyarbekirê ji weşanên Belkî'yê çapkeriye. Herî  
dawî jî di sala 2019an de Mehmed Emîn Hêvîdar latinize kiriye. Jê re ferhengokeke berfireh amade  
kiriye û destxeta dîwanê lê zêde kiriye. Ev jî ji aliyê weşanên Darayê ve hatiye çapkirin.

<sup>2</sup> Ji bilî destnivîs û latinizekirinan hin gotarên akademîk jî bi zimanê Tirkî û Kurdî-Kurmançî li ser  
dîwana Aqtepe hatine nivîsîn. Ew jî ev in:

M. Zahir Ertekin: " Hz. Pêxember di Dîwana Aqtepe de", İbrahim Özcoşar, (eds.): *Diyarbakır, Alimler, Ârifler, Edipler*, Ensar, İstanbul 2018, r. 349-370.

M. Zahir Ertekin, Recmiyye/ Le'netnameyê Wek Cûreyek Nezmê û Le'netnameya Şêx 'Ebdurrehmanê  
Aqtepe, *e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*, Nisan-2019, Cilt: 11, Sayı: 1(23).

Osman Aslanoğlu, Abdurrahman Aktepe'nin Divanında Geçen Şahsiyetler, *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Cilt: 12 Sayı: 64 Haziran 2019.

Osman Aslanoğlu, Abdurrahman Aktepe'nin Divanında Hayvan Mazmunları, Hoca *Ahmet Yesevi, Uluslararası Bilimsel Araştırmalar Kongresi*, 26- 27 Ağustos 2019, Gölbaşı- Adıyaman.

Osman Aslanoğlu, Gîya di Dîwana Şêx Ebdurrehmanê Aqtepe da, *The Journal of Mesopotamian Studies*, Cilt 5 - Sayı 1 - 29 Şub 2020.

edebîyata klasîk li ser “Dîwana Aqtepe (Rûhî)” nehatibû kirin, me jî xwest ku ev dîwan bê tehlîlkirin û taybetîyên wê bên nîşankirin.

Sisê; me xwest ku bi vê xebatê; di edebiyata kurdî ya klasîk de valahîya ji hêla zanistî û teorîk kême be jî bê dagirtin. Ji bo xebatên ku pêşerojê li ser dîwanan re bibe wek mînak û rê li ber xebatên bi vî rengî bên vekirin.

### **3 Girîngiya Tezê**

Ji ber gelek sedeman gelê Kurd bi derengî dest bi xebatên zanistî kirin. Ji ber vê derengmayîne gelek berhem di refan de mane, nehatine vekolandin û nirxandin. Yek ji wan berhemên ku ji ber van sedeman nehatiye vekolandin jî Dîwana Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepe ye. Girîngiya vê xebatê jî ew e ku heta niha ev dîwan nebûbû mijara tezekî û bi vekolîneke zanistî û teorîk nehatibû vekolîn. Herwiha xebatên wisa bi berfirehî li ser dîwanekê kême hatibû kirin û valahîyek ji hêla teorîk ve hebû.

### **4 Çarçove û Rêbaz**

Zanista edebîyata klasîk ji bo metnên edebî, hem ji alîyê naverokê ve hem jî ji alîyê şiklî ve bê fehm kirin xwedî hin rê û rêbazan e. Ji bo di vî warî de xebatên akademîk bên kirin, divê ev rê û rêbaz bên şopandin û xebatên ku tên kirin li gorî van qaîdeyan bên amadekirin. Xebata me jî wê di çarçoveya Dîwana Şêx ‘Ebdurrehman Aqtepe de be. Me ji bo vê xebatê “Metoda Tehlîl û Wesfî” ji xwe re hîlbijartin û em ê piştî xwe bidin vê metodê û li gor wê tevbigerin. Ji bo ku xebateke baş derkeve holê, me ev xebat dabeşî sê beşan kir. Yanî ev xebat, ji destpêkek û sê beşan pêk tê.

Di destpêkê de, bi berfirehî mijar, armanc, girîngî, çarçove, rêbaz û jêderên sereke yê teze hatin ravekirin. Herwiha behsa astengî û zehmetiyên teze hate kirin.

Wek ku tê zanîn, berhemên klasîk ji bo serdema ku hatine nivîsîn wek neynîkekê ne û şopên nivîskarên xwe di nav xwe de dihewînin. Ji bo ku berhemek bê fehmkirin, divê haya lêkolîner û xwîneran ji helbestvan û berhemên wî yê din hebe. Ji bo vê yekê me di destpêkê de cih da Jîyan û berhemên Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepe û me berhemên wî li gor zimanan senifandin.

Di beşa yekem de, kesayeta helbestvan hatiye şîrovekirin. Mexles û helbestvanên ku bandor li Aqtepe kirine, hatine tesbîtkirin. Di heman demê de em bi hurgûlî li ser zimanê şa’ir û dîwanê sekînine û peyvên Farisî, Erebi û Tirkî li gorî

taybetîyên xwe hatine senifandin. Her wiha unsurên ziman ên wek hunerên edebî, biwêj, gotinên pêşîyan hatine ravekirin.

Di beşa duyem de dîwan ji alîyê teşeyê ve hatiye vekolandin. Ewil bi giştî behsa tertîb û danasîna dîwanê hatiye kirin, bi dû re teşe û cûreyên nezmê hatin ravekirin. Herî dawî em li ser serwa û wezna dîwanê rawestîyane; serwa li gorî cûreyan hatine senifandin û kîjan qalibên ‘Erûzê hatibin bikaranîn bi hurgulî bi mînakên hatine ravekirin.

Di beşa dawî de jî tehlîla dîwanê hatiye kirin. Ewil têgehên dîn û tesewifê bi mînakên dîwanê hatine ravekirin, bi dû re kesayet, heywan, navê welat û bajaran, navê qewman, nebat, amûrên muzîkê, kevirên biqîmet û alavên xemlê, çar unsur, unsûrên kozmik, dem, reng, herfên di dîwanê de hatine tesbîtkirin û bi mînakên hatine nîşandan. Herî dawî jî bi giştî behsa taybetîyên ‘aşîq û me’şûq hatine kirin.

## **5 Jêderên Sereke yên Tezê**

Di vê xebatê de keresteya dîwanê; Dîwana Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepî ya ku ji alîyê Mehmed Emîn Hêvîdar ve di sala 2019an de ji nû ve hatiye serrastkirin û latînîzekirin e. Em ê jî vê kitêbê esas bigirin û mînakên jê werbigirin. Ji ber ku di latînîzekirina kitêbê de, amadekar Mehmed Emîn Hêvîdar (dibe ku nivîsê şaş xwendibe an jî di dema xebat derbasî nivîsê kirine xelet nivîsî be) hin peyvan xelet nivîsî bû, ji bo xebatek baş derkeve holê ew tiştên ku xelet bûn hatin sererastkirin. Ji ber ku destxeta Kerbelayî<sup>3</sup> li ber destên me hebû û me hewcedarî bi vê yeke dît.

Ji ber ku ev xebat ji gelek sernav û binnavan pêk hatiye, me di amadekirina wê de ji gelek çavkanîyan sûd wergirt.

Di destpêkê de, me cih daye jiyan û berhemên Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepî. Di derheqê jiyan û berhemên wî de me gelek çavkanî bi dest xist. Ji nav van çavkanîyan me ji xwe re çend pirtûk hilbijartin û ji vana sûdwergirtin. Ew pirtûk jî ev in:

- M. Şefîk Korkusuz Tezkire-i Meşayih-i Amid Diyarbekir Velileri I-II
- Feqî Huseyn Sağniç, Dîroka Wêjeya Kurdî

---

<sup>3</sup> Kerbelayî: Mihemed Kerbelayî, di sala 1885an de li gundê Aqtepeyê yê Çinarê ya li ser Diyarbekirê, ji dayîk bûye. Di meha pêşî ya sala 1939an de li gundê Çuliyê (Tavşantepe) ku li teniştê nehiyeya Palûkeyê ya nêzî Diyarbekirê ye, koça dawî kiriye. Navê wî yê temam Mihemed Kerbelayî Bedruddîn e. Kurê, Şêx Ebdurrehman Aqtepî, neviyê Şêx Hesenê Nûranî ye. Beriya wefata xwe dîwana bavê xwe bi destê xwe nivîsî ye. Li gor destxeta li ber destê me Kerbelayî ev dîwan, di sala 1350ê Rûmî, 1352ê Hicrî nivisandiyê. Ev tarix jî teqabulê 1933ê zayîni dîke.

- Murat Özaydın, Şeyh Abdurahman Aktepe Hayatı Eserleri ve Tasavvufî Görüşleri
- Zeynelabidîn Zinar, Rewdneîm – Şêx Ebdurehmanê Aqtepî
- Şêx ‘Ebdurrehman’ê Aqtepî, *Dîwan*, (amd: Mehmed Emîn Hêvîdar)

Di beşa yekem de behsa kesayeta edebî ya Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepî hate kirin. Binnavên vê beşê jî zimanê şa’ir, helbestvanên ku têsîr li Aqtepî kirine û hunerên edebî ne. Di beşa duyem de jî dîwan ji aliyê teşeyê ve hate vekolandin. Ji bo herdu beşan jî çend çavkanîyên sereke ev in:

- Muhsin Macit- Uğur Soldan, Edebiyat Bilgi ve Teorileri El Kitabı
- Haluk İpekten, Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz,
- İsa Kocakaplan, Açıklamalı Edebi Sanatlar,
- M. A. Yekta Saraç Klasik Edebiyat Bilgisi-Belagat û Klasik Edebiyat Bilgisi -Biçim, Ölçü, Kafiye
- Numan Külekçi, Açıklamalar ve Örneklerle Edebi Sanatlar
- Osman Aslanoğlu, Kendi Kendine Kolay Farsça

Beşa dawî ji gelek sernav û binnavan pêk hatiye. Ji ber vê yekê; me ji gelek gotar, tezên akademîk û kitêban sûd wergirtin lê ji ber ku di vê beşê de zêdetir têgeh hatin ravekirin wek çavkanîyên sereke me ji sê ferhengan îstîfade kir.

- İskender Pala, Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü
- Ahmet Talat Onay, Açıklamalı Divan Şiiri Sözlüğü – Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar ve İzahı
- Ethem Cebecioğlu, Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü

Herwiha me, hem ji bo hin têgehên him jî ji bo rûxsara tezê hin çavkaniyan esas girti ev jî ev in:

- Cemal Kurnaz, Hayalî Bey Divanının Tahlili
- Nejat Sefercioğlu, Nev’î Divanı’nın Tahlili,
- Nilüfer Karadavut, Za’îfe Divanı
- Hayrullah Acar, Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr

## **6 Astengî û Zehmetiyên Tezê**

Zehmetiya sereke ya tezê ev bû ku, di berhemên klasîk de peyvên bîyanî û mezmûn gelek tên bikaranîn. Di edebiyata Kurdiya Kurmancî de ferhengeke bitertîb

li ser peyv, terkîb û mezmûnên edebîyata klasîk nîne. Ji ber vê yekê me ji ferhengên Tirkî -yên mezmûn û peyvên edebiyata klasîk- îstîfade kirin.

Her wiha di edebîyata Kurdî-Kurmancî de kitêbên teorîk li ser berhemên klasîk kêr bûn. Ev jî bû sedem ku em berê xwe bidin tehlîlên li ser dîwanên Tirkî hatine kirin û ji wan çavkaniyan sûd werbigirin.

Zehmetiyeke din jî ev bû ku, ev dîwan ji aliyê çend kesan ve di demên cuda de hatibû latinîzekirin û di navbera van xebatan de hin cudayî hebûn. Me hewcedarî bi destxeta orijinal dît û me bi rêya berawirdkirinê xebata xwe domand. Herwiha dema xeletî hatin tesbît kirin me sererastkirin.

Sê nusxeyên çapkirî yên li ber destên me ev bûn:

Çapa Enstituya Stenbolê ku tevî ferhengoka lê hatî zêdekirin ji 104 rûpelan pêk hatî û ji aliyê Osman Akdağ û Kerem soylu ve hatiye latinizekirin, Çapa Rênas Jiyana latinizekirî ji 112 rûpelan pêk hatî û çapa dawî ya 169 rûpel û Mehmed Emîn Hêvîdar ew latinizekirî. Em ê li jêr cih bidin hin xeletî û cudahiyên di navbera van nusxeyan de:

Helbestên di rêzên, 2, 15, 18, 20 û 24an Murebbe' ne lê di çapa Enstituya Stenbolê û Rênas Jiyana de bi malikan hatine nivîsîn.

Helbesta sêyem ya ku bi "Pur Hezîn im" destpê dike ji aliyê çapa Enstituya Stenbolê ve wek berdewama helbesta duyem hatiye nivîsîn.

Helbestên di rêzên 4, 6, 12, 13 û 23yan Muxemmes in lê di çapa Enstituya Stenbolê û Rênas Jiyana de bi malikan hatine nivîsîn.

Helbesta di rêza 9an de Murebbe' ye lê di her sê çapan de jî bi malikan hatiye nivîsîn.

Helbesta di rêza 19an de Mustezad e, lê di çapa Enstituya Stenbolê û Rênas Jiyana de wek teşeya Mustezadê nehatiye nivîsîn.

Helbesta di rêza 26an de Xezel e lê di çapa Mehmed Emîn Hêvîdar de wek teşeya Murebbe' yê hatiye nivîsîn.

<b>Çapa S.</b>	<b>Çapa R. J</b>	<b>Çapa M. E. H</b>	<b>A rast</b>
ji Xwedê ra	ji Xwedê ra	j'ba Xudê ra	ji baxwê ra
dil kî	dil kî	dilê kî	dil ki
ten kî	ten kî	ten kî	ten ki
qelbî naçar im	qelbî naçar im	qelbê naçarê	qelbê naçar
im			

kerded	kerded	kerded	gerded
şehbela	şehbela	şehbela	şed bela
elif enf ê	elîf enfê	elfê elfê	elîf enfê
şît	şît	şêt	şêt
peçekan	peçekan	beççegan	beççegan

Ew peyv û ravekên li jor tenê ji bo mînakdayînê hatin nivîsîn, ji xeynî van em li rastî gelek xeletiyên bi vî şiklî hatin

## **JÎYAN Ê BERHEMÊN ŞÊX EBDURREHMANÊ AQTÊPÎ**

### **JÎYANA ŞÊX EBDURREHMANÊ AQTÊPÎ**

#### **Jidayîkbûna Wî**

Şêx Ebdurrehmanê Aqtepeyê êvara îna 30ê meha Rebî'ulewwelê di sala 1270<sup>4</sup> yî hicrî li Aqtepeyê hatiye dinê.<sup>5</sup> Kurê herî mezin ê Şêx Hesênê Nûranî ye. Eslê wan ji Hekarîyê ye û dûre koçî Dîyarbekirê kiriye. Bavê wî Şêx Hesênê Nûranî li Dîyarbekirê di medreseyên derdorê de xwendiyê, piştî ku gihiştîye mertebeya Şêxîtiyê, li gundê Aqtepeyê niştecih bûye.<sup>6</sup>

#### **Gundê Aqtepeyê**

Aqtepe, gundekî girêdayî Çinara Dîyarbekirê ye, lê berê gundê Bismilê bû. Dema ku Çinar bû navçe, tentêla gundê Aqtepeyê di gel gundên wan derdoran tê guhertin, anku bi navçeya nû ve tên girêdan. Ji gundê Aqtepeyê, nemaze ji mala Aqtepeyan, gelek kesên zana, ewlîya, seyda û hozanên mezin ên welatparêz derketine.<sup>7</sup>

#### **Xwendina û Îcazeya Wî**

Şêx Ebdurrehmanê Aqtepeyê jî, ewil li cem bavê xwe dest bi xwendinê kiriye<sup>8</sup> Di şeş salîya xwe de dest bi Quranê kiriye û di demeke kin de Quran qedandiye û ew jî her wekî feqîyên din, di medreseya Aqtepeyê de dest bi zanîna olî kiriye.<sup>9</sup> Piştî

<sup>4</sup> Ew jî teqabûlê sala 1853ê zayînî dîke.

<sup>5</sup> Zeynelabidin Zinar, *Şêx Ebdurrehmanê Aqtepeyê Rewdneim*, Stockholm 1991, r. 7.

<sup>6</sup> Murat Özaydın, *Şeyh Abdurahman Aktepe Hayatı Eserleri ve Tasavvufî Görüşleri*, Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Temel İslam Bilimleri (Tasavvuf) Anabilim Dalı, Yayınlanmış Doktora Tezi, Ankara 2008, r. 45.

<sup>7</sup> Feqî Huseyn Sagniç, *Diroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Entituya Kurdî ya Stenbolê, Sermawez 2014, r. 466.

<sup>8</sup> Özaydın, h.b.r. 45.

<sup>9</sup> Sagniç, h.b.r. 453.

bavê xwe, xwendina xwe li cem Mela Mihemed Selîmê Aqtepî, Mela Mihemed Emîn û Mela Mihemed berdewam kiriye û îcazeya xwe jî ji Mela Mihemed werdigire.<sup>10</sup> Lê ji bo xwendina xwe tamam bike ewil li Iraq û Surîyeyê û dûre li gelek medreseyan din jî xwendiyê û piştî xwendinê, vegeyîyaye gundê xwe. Dema ku bavê wî wefat dike, wî li medreseya seydatî kiriye û dersên medreseya dane. Piştî demeke kurt, dev ji dersdayînê berdaye û ev kar teslîmî birayê xwe Şêx Muhammed Can kiriye. Piranîya dema xwe li kitêbxaneyê bavê xwe derbas kiriye. Kitêb nivîsîne û lêkolîn kirine ji boyî ku berhemên berketî binivîse.<sup>11</sup>

### **Terîqeta Wî**

Di edebiyata kurdî ya klasîk de têsîra terîqetên tesewuffî pir zêde ye. Yek ji terîqetên ku herî zêde bandor li ser helbestvanan kiriye, Terîqeta Neqşîbendîyê ye.

Terîqeta Neqşîbendî ji aliyê Bahâuddîn Neqşîbend Buhârî (m. 791/1389) ve hatiye ava kirin. Bahâuddîn Neqşîbend Buhârî, wek Şahê Neqşîbend tê nas kirin. Şahê Neqşîbend, ji zarokatiya xwe bi dewrûbera tesewufê mezin bûye. Murîdê bavê xwe – Hâce Mihemed Baba Semmâsî- bû. Bavê wî -Semmasî- xwendina wî hewaleyî xelîfeyê xwe Emîr Kulâl kiriye. Ji ber vê yekê şeyhê îrşad û sohbeta wî Emîr Kulâl, murşîdê wî yê uweysî jî Abdulhâlîk Gucduwânî (m. 595-1199) ye. Yanzdeh bîngêhên Neqşîbendîyê hene û ji aliyê Abdulhâlîk Gucduwânî ve hatiye tanzim kirin. Ew jî ev in: Vukûf-î Zamânî, Vukûf-î adedî, Vukûf-î qelbî, Hûş der-dem, Nezer ber, qedem, Sefer der- weten, Xelwet der- encumen, Yâd kerd, Bâz- geşt, Nigâh- dâşt, Yâd- dâşt.<sup>12</sup>

Dema em li dîwana Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepî dinihêrin em dibînin ku girêdayî terîqeta Neqşîbendî ye. Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepî berevajiyê Melayê Cizîrî, wek Ehmedê Xanî û helbestvanên din di helbestên xwe de terîqeta xwe aşkere kiriye û du helbest li ser terîqeta Neqşîbendîyê û avakarê wê - Bahâuddîn Neqşîbend Buhârî- nivîsîne. **Wek mînak:**

**Xelwetê der-encumen**, an şahê zîba mîkoned,  
Hem şehînşahê cîhan, hem çeşmê ber pa mîkoned,  
Hebbeza! Esrarê Qur’anî huweyda mîkoned

<sup>10</sup> M. Şefik Korkusuz, *Tezkire-i Meşayih-i Amid Diyarbakır Velileri I -II*, Kent Yayınları, İstanbul, Ekim 2004, r. 48.

<sup>11</sup> Özeydîn, h.b.r. 45.

<sup>12</sup> H. Kâmil Yılmaz, *Ana Hatlarıyla Tasavvuf ve Tarikatler*, Ensar, 18. Baskı, İstanbul Ekim 2014, r. 257- 260.



### **Der-lîbasê ehlê dunya, karê ‘uqba mîkoned**

Xerqeê fiqrest ê punhan, der- qebayê **Neqşîbend** (r. 61)

“**Xelwetê der-encumen**” wek me li jor jî nivîsîye yek ji bingehên Terîqeta Neqşîbendîyê ye û tê maneya di nav qelebalixê de tenê, di nav xelqê de bi Heq re, bi Xwedê re. Dest di kar de yanî dest di karê dunyayê de lê dil bi Xwedê re mijûl e di vê esasê de. Ji bo ku ev esas pêk bê divê însan bi dil û can zikrê bike di nav qelebalixê de jî her tim zikr di hişê însan de be. Suret û beden her çiqas li gor vê dunyayê be jî ew kes karê axretê dike. Di benda jor de jî em têdigihjin ku behsa esasa 7an ya Neqşîbendîyê dike.

### **Wefata Wî**

Der heqê tarîxa wefata Aqtepî de du tarîxên cihê hene. Li gorî Feqî Huseyn Sagniç, ew di 55 salîya xwe de -1905ê z.- li Dîyarbekirê wefat kiriye.<sup>13</sup> Lê di pêşgotina kitêba wî ya bi navê Rewdduneîmê de, ew 16ê meha Adara 1326an, yanî 29ê Adara 1910an de wefat kiriye. Gora wî jî li cem ya bavê wî -Şêx Hesenê Nûranî- li gundê Aqtepeyê ye.<sup>14</sup>

### **Zewac û Zarok**

Ji ber wefata jinên wî, Aqtepî 5 caran zewicîye.<sup>15</sup> Navê 4 jinên wî hatiye tesbîtkirin: “Ayşen, Rabîa, Esmâ, Kerîme.”<sup>16</sup> 8 zarokên wî jî ji wan hene; 3 kur û 5 keç. Navê wan: Mihemed Şewket, Mihemed Kerbela, Mihemed Eskerî, Perdeneşîn, Ruqeyye, Şaxê Nebat, Seadet û Pîrozxan.<sup>17</sup>

---

<sup>13</sup> Sagniç, h.b.r. 458.

<sup>14</sup> Zinar, h.b.r. 7.

<sup>15</sup> Korkusuz, h.b.r. 49.

<sup>16</sup> Özeydin, h.b.r. 48.

<sup>17</sup> Korkusuz, h.b.r. 49.

## **BERHEMÊN ŞÊX EBDURREHMANÊ AQTÊPÎ**

### **Berhemên Wî yên Kurdîya Kurmancî**

#### **Rewdunne'îm**

Ev berhem, kiteba wî ya herî navdar e. Di Edebîyata Kurdî da mesnewîyeka stûr e û bi qafîye ye. Bi wezna arûzê û bi tef'îleyên “Fe’ûlun, Fe’ûlun, Fe’ûlun, Fe’ûl” (mutedarîbu’l-meqsûre)<sup>18</sup> û bi ristika mesnewî (duyîn) û li ser hêjmara yanzdeh kîteyan bi zimanê Kurdî, zaravayê Kurmancî û nêzîkî wêjeya gel nivîsandiye.<sup>19</sup> Di pirtûkê de 35 beş hene, babeta her beşekî ji ya din cihê ye.<sup>20</sup> Mijara wê Mi’rac û jiyana Hz. Pêxember (s.x.l) ye. Di dawîya kitêbê de hatiye nivîsîn ku ev kitêb di sala 1302ê mişextî de xelas bûye.<sup>21</sup>

#### **Tarîx**

Kitêbeke wî li ser tarîxê ye û bi zimanê Kurdî ye. Malûmatên di derheqê vê kitêbê di Rojnameya “Kürt Te’avûn ve Terakî”yê de tê dîtin. Kitêb destxet e û hinek beşên wê jê kêm in. Heta niha xebat li ser nehatiye kirin.<sup>22</sup>

#### **Dîwan**

Em ê li xwarê bi berfirehî behsa vê berhemê bikin.

### **Berhemên Wî yên Erebî**

#### **Kîtabu’l Îbrîz**

Ev berhem bi Erebî ye û ji 81 rûpelan pêk tê û di sala 1307ê mişextî de hatiye nivîsîn. Naveroka wê jî li dor Quranê ye ku “Kelamullah” anku gotinên Xwedê ne.<sup>23</sup> Kitêb destnivîs e û vêga li cem Şêx Şafi’î ye.<sup>24</sup>

---

<sup>18</sup>Şêx ‘Ebdurrehman’ê Aqtepi, *Dîwan*, (amd: Mehmed Emîn Hêvîdar), Weşanên Dara, Kanûna Pêşîn, 2019, İstanbul, r. 28.

<sup>19</sup> Sagniç, h.b.r. 454.

<sup>20</sup> Zinar, h.b.r. 8.

<sup>21</sup> Korkusuz, h.b.r. 48.

<sup>22</sup> Aqtepi, h.b.r. 30-31.

<sup>23</sup> Korkusuz, h.b.r. 48.

<sup>24</sup> Aqtepi, h.b.r. 31.

### **Kitabu Keşfu-z Zelam Fî Eqâid-î Ferq'el İslam**

Ev pirtûk, xwerû bi Erebi ye; li ser fikirên bawerîya yên di dînê İslamê de hatiye nivîsandin.<sup>25</sup> Destnivîs e û ji 25 rûpelan pêk tê.<sup>26</sup> Di sala 1307ê mişextî de hatiye nivîsandin.<sup>27</sup>

### **Mînhacu'l-Usûl**

Li ser 'ilmê Fiqihê hatiye nivîsandin û bi zimanê Erebi ye. Ji 50 rûpelan pêk tê û di sala 1308ê mişextî de hatiye nivîsîn.<sup>28</sup>

### **Kitêbeke li ser Astronomîyê**

Ev kitêb li ser mijara Astronomîyê ye, ji ber ku rûpelên ewil qetîyane, tarîxa nivîsandina vê kitêbê ne dîyar e.<sup>29</sup> Ev kitêb wê yekê dide dîyarkirin ku Aqtepi bi astronomîyê mijûl bûye û li Dîyarbekir û derdorên wê tevgera heyv, roj, sitêrk û gerstêrkan şopandiye.<sup>30</sup>

### **Kitabu's-Serf we'n-Nehw**

Der barê gramera zimanê Erebi de ye, destxet e û bi qasî 50 rûpelî ye. Di berhemê de, di mijarên cûrbecûr yên Sêrf û Nehwê de, agahîyên gramere hatine ravekirin.<sup>31</sup>

### **Berhemên Wî yên Tirkî**

#### **Muxemmes**

Ev berhem bi zimanê Tirkî ye. Aqtepi sê riste li ser xezela şairê Tirk, Nabî zêde kiriye û bi terza Muxemmesê de nivîsandiye.<sup>32</sup>

Ji xencî van berhemên wî, çend berhemên din jî hene lê nehatiye zanîn ka bi kîjan zimanî hatine nivîsîn. Navên wan: Teqwîm, Rîsale, Kitabu'l- Mentiq, Rîsaleya Rabiteyê Rîsaletu'l- Edeb wel-Adab.<sup>33</sup>

---

<sup>25</sup> Zinar, h.b.r. 10.

<sup>26</sup> Özeydin, h.b.r. 74.

<sup>27</sup> Korkusuz, h.b.r. 48.

<sup>28</sup> Korkusuz, h.b.r. 48.

<sup>29</sup> Korkusuz, h.b.r. 48-49.

<sup>30</sup> Özeydin, h.b.r. 74.

<sup>31</sup> Özeydin, h.b.r. 75.

<sup>32</sup> Korkusuz, h.b.r. 49.

<sup>33</sup> Aqtepi, h.b.r. 32-34-35.

## BEŞA YEKEM

### KESAYETA EDEBÎ YA ŞÊX ‘EBDURREHMANÊ AQTEPÎ

Şêx Ebdurrehmanê Rûhî helbestvanekî girîng û dahêner ê serdema piştî mîrekiyan e. Çi di tema û mijaran de, çi di şewazên edebî û hunera helbestê de be ferq nake ew di edebiyata kurdî ya klasîk de xwediyê gelek dahênanên edebî ye û gelek peyrew li pey xwe hiştine. Bi rehetî dikare bê gotin ku di serdema piştî mîrekiyan de li Bakur helbestvanekî dî yê bi qasî wî orjînal û xwedî bandor tune ye. Şêx Ebdurrehmanê Rûhî bi van taybetiyên xwe ne ji bo serdema piştî mîrekiyan tenê, ji bo tevahiya tarîxa edebiyata kurdî wek helbestvanekî girîng derdikeve pêş.<sup>34</sup> “Hizra Terîqeta Neqşîbendiyê, Tesewuf, Hezkirina Hz. Pêxember (s.x.l.) û malbata Wî.(muhebbeta Ehlê Beytê), ‘işqa îlahî, Teşeya Xezelê û hunera Tesmîte,<sup>35</sup> Qabiliyeta wî ya Hunerên Edebî û Xurtbûna Vegotina wî” hin taybetiyên wî yên berçav in ku ku divê bê behs kirin. Di vê beşê de em ê li ser Ziman /Vegotina wî û Hunerên Edebî rawestin.

#### 1.1 ZIMANÊ WÎ

Di edebiyata klasîk de unsurên aheng û ritmê “ wezn, serwa û paşserwa (redif )” in. Digel van unsurên “deng” û hunerên ku girêdayî dangan jî atmosfereke xweş li helbestan zêde dike.<sup>36</sup> Helbestvanên klasîk ji bo helbestên wan bi bandor û xwedî lezzet be ji van unsurên sûdwerdigrin. Lê usluba her helbestavanî ji hev cuda ne, hinek ji wan girîngiyê didin “Ritm”ê (Serwa –redif- û wezn) hinek jî didin tekrara deng û peyvan yên wek asonans, aliterasyon û tekrîrê. Hilbijartin û bikaranîna peyvan xurtbûna zimên û vegotina helbestvan aşkere dike. Helbestvan çiqas peyvan baş hilbijêre û di helbestên xwe de rêz bike, helbestên wî ewqas bi bandor û bi aheng e. Dema em li dîwana Rûhî dinihêrin, em dibînin ku Rûhî girîngî daye ritm û ahengê jî. Ev jî bûye sedem ku Aqtepî ji helbestvanên din veqete û bibe xwedî uslub û vegotîneke xurt û taybet. Em ê li jêr cih bidin van taybetiyên ciyaker ên Aqtepî:

<sup>34</sup> Abdurrahman Adak, “Rûhî: Helbestvanekî Dahêner ê Serdema Pîştî Mîrekiyan û Bandora Wî”, *Sûryani, Arap ve Kürt Klasikleri Uluslararası Klasikler Çalıştayı Bildirileri*, Mardin 2017, r. 491.

<sup>35</sup> Di beşên din de wê behsa van taybetiyên bînin kirin.

<sup>36</sup> Zehra GÖRE, Adnî Dîvanî’nda Ahenk Unsurları, *Turkish Studies International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Volume 2/4 Fall 2007*, r. 405.

## **Bikaranîna Peyvan**

### **Tekrîr- Tekrar (Dubarekirin)**

Wek têgeheke belaxetê eger di nav metnekî edebî (misra, beyt yan bendek), yan jî gotarekê de de peyv, yan komepeyvek çendîn caran li pey hev bê dubarekirin ew hunera tekrîrê ye. Armanca hunera Tekrarê xurtkirina maneyê û bi bandorkirina helbestê ye.<sup>37</sup>

Aqtepî di hin helbestên xwe de ji dubarekirina heman peyvê sûdwegirtiye. **Wek mînak:**

Îd e îro, bêqerar im ez, ji feqda dêmdurê

**Bêhebîb im, bêhebîb im, bêhebîb im, bêhebîb**

Her kesek ba-yarê xwo d' meşiyên di sehrayan li rê

**Pur kebîb im, pur kebîb im, pur kebîb im, pur kebîb! (r. 41)**

Di dîwanê de, ev helbest di rêza 2an de ye. Di benda yekem de peyvên “hebîb û kebîb” hatine dubarekirin. Di bendên heman helbestê de jî ev peyv hatine dubarekirin:

**Bêtebîb im, bêtebîb im, bêtebîb im, bêtebîb.**

**Bênesîb im, bênesîb im, bênesîb im, bênesîb.**

**Ez xerîb im, ez xerîb im, ez xerîb im, ez xerîb.**

**Dil keîb im, dil keîb im, dil keîb im, dil keîb.**

**Na qerîb im, na qerîb im, na qerîb im, na qerîb.**

**Der, nişîb im, der nişîb im, der nişîb im, der nişîb.**

**‘Endelîb im, ‘endelîb im, ‘endelîb im, ‘endelîb.**

**Bêşekîb im, bêşekîb im, bêşekîb im, bêşekîb.**

**Dil ferîb im, dil ferîb im, dil ferîb im, dil ferîb.**

**Der rikîb im, der rikîb im, der rikîb im, der rikîb.**

**Mustetîb im, mustetîb im, mustetîb im, mustetîb.**

Aqtepî, di hin helbestên xwe de jî heman misrayê dubarekiriye û Murebbe’ û Muxammesên ku ji misrayên neqaretê pêk hatî<sup>38</sup>, nivîsîne. **Wek mînak:**

Haletê nez’ê, me feryad e Resûlê Kîbrîya

Pêşuwayê îns û cin, Sultanê cem’a enbîya

Ez nebim serdefterê cem’a xebîs û eşqîya

<sup>37</sup>Adak, h.b.r. 505: Pala, h.b.r. 447.

<sup>38</sup>Bnr. Beşa Teşeyên Nezmê.

**Ya Resûlellah dexîl im! Ya Hebîbellah dexîl!**

Dûr im û pur delal im, bêfirû û bêusûl  
Hedye min nîn e çi bejim deste vala me, melûl  
Cuz selat û cuz selaman, bo Şehê Sahibqebûl

**Ya Resûlellah dexîl im! Ya Hebîbellah dexîl! ( r. 102)**

Ji xêncî misraya li jor, hin misrayên din hene ku Aqtepî ji dubarekirina wan îstîfade kirine, ew jî ev in:

**La feta îlla ‘Elî, la seyfe îlla Zulfeqar**

**Ah û sed efxan, ji hîcra dîlbera ala Fireng**

**Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban**

**El eman, şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me**

Aqtepî, di helbesteke xwe de 60 caran peyva “**gul**”ê dubare dike û dixwaze ku bi xêra hunera Tekrarê bandoreke mezin li helbestê bike û bala xwendevanan bikişîne li ser wê peyvê:

Çeşmê min, 'eynî **gul**-ab e, ji dîtina yarê ‘ezîz

Xende **gul**; bûse **gul** û awur **gul** û dîdar e **gul** (r.95)

**Paşserwa (Redîf):**

Di hin helbestên Aqtepî de dubarekirina peyv û hevokên dawîya misrayê redîfê pêk anîne û ritm û ahengeke cuda li helbestê kirine. **Wek mînak:**

Ey dil sebir ke ber-fîraq; **e’s-sebrû mîftah’ul- ferec**

Çendî bikêşî ihtîraq; **e’s-sebrû mîftah’ul- ferec**

Ger bêkes û bêçare î; dûr-hebîb, aware î

Wer-derê kuhsare î; **e’s-sebrû mîftah’ul- ferec**(r. 55)

Ji bilî vê hevokê bi dubarekirina peyv û lêkerên wek: “dared, Neqşîbend, dîkin, di min, gul” jî redîfan pêk aniye.

## Cotepeyv

Di zimanan de hin bêje hene ku ji bo ku vegotinê bihêztir bikin û wateya îfadeyê xurt bikin bi bêjeyên wekî xwe, nêzî xwe yan jî dijberî xwe re tê bikaranîn<sup>39</sup> Di rêzîmana Kurdî-Kurmançî de ji van peyvyan re cotepeyv tê gotin. Taybetiyeke din ya Aqtepeî jî bikaranîna cotepeyvyan e. Dema em bala xwe didin helbestên Aqtepeî, bikaranîn û sûdwegirtina cotepeyvyan gelekî berbiçav e.

“Nale û zarî, feryad û hewar, feryad û efxan, xulxul û şahî, keyf û şahî, mecrûh û kul, şem’ û çira, yar û hogir, ah û zarî, dûr û mehcûr, zarezar, geşt û guzar, keyf û surûr, berf û selc, tîr û nîşab, ax û turab, dar û nebat, ‘etr û şemîm, berq û enwar, qed û qam, ah û efxan, îstîxfar û tewbe, cewr û cefa, sebr û sikûnkar û xusir, noşînoş keyf û hal, xar û xes, fikr û xiyal, roz û şeb, zîr û zeber, ser te ser, feryad û girîn, soz û zemzeme, şîb û fîraz, sa’et be sa’et, cerg û kebed, xewf û xeter, heşr û neşer, we’z û nesîhet, tîr û xedeng, top û tifeng, bu’d û îhtîraq, nar û dûd, fikr û efkar, sef bi sef, cerh û zexm, zenban û webal, cerg û kezeb, xem bi xem, derd û xem, şox û şeng, cerg û dil, subh û mesa, xulxul û awaz, xûn û sedîd, sem’ û beser, nar û pêt, tîr û rim, pey pey, ewwel û axir, kufîr û delalet, mest û sergerdan, sef sef, qîl û qal, zenb û delal, kesb û kar, dest û pa, xewf û xeşyet, ah û ah, erz û sema, sal û meh, can û dil, cam û zucac, cerh û zam, pêçe pêç, zulm û cefa, damê dam, ‘ewr û xemam, peya pey, dem be dem, derd û xem, ferh û tereb, melhem û derman, zend û pa, ‘îşwe û an, pêl bi pêl, muhbet û ‘îşq, bîhn û bû, feryad û xurûş, ah û enîn, şerab û mey, sergeşte û dîn, xem û nalî, edanî û e’alî, ‘eql û kiyaset, fikr û feraset, cerh û dax, keyf û rahat, zulm û te’edda, heval û haziran, mecrûh û bîmar, newbet û pawan, pey be pey, seraser, şeng û şepal, ateş û me’şel, bang û qîrîn, enhar û kanî, berq e berq, ‘umr û dewran, mahzûn û giryan, best û şerh, zehr û helahîl, tîr û teber, şah û geda, cewr û xedir, ferh û şahî, husn û şîwe, xerabatî û mest, meqquer û mesken, berq û birûsk, dur û cewher, germî û zerdî, murad û meqsed, tar û mar, îns û cin, ah û waweyla, cewr û zîba, pêt û hirqet, werd û gul, durûx û kîzb”

Wek ku di mînakên de jî tê dîtin, dîwana Aqtepeî ji aliyê bikaranîna cotepeyvyan ve têr û tijî ye. Aqtepeî, di dîwanê de cih daye hemû cureyên cotepeyvyan. Xala herî girîng a van cotepeyvyan ew e ku, Aqtepeî herî zêde cotepeyvên hemwate bikaranîne. Peyvên “Cotepeyvên Hemwate” pêk tînin jî yan Kurdî-Kurdî, yan ‘Erebî-

<sup>39</sup> M. Zahir Ertekin- Zafer Açar, Di Kurmançî De Cotepeyv û Cureyên Wan, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Yıl: 1, Cilt: 1, sayı: 1, Ocak 2015, r. 82.

Kurdî (Kurdî-‘Erebî), û ‘Erebî- ‘Erebî, yan jî Kurdî- Farisî (Farisî-Kurdî) û Farisî-Farisî ne. Em dikarin bibêjin ku dîwana wî taybetiyên ferhengê jî di nav xwe de dihewîne. Lewra bi bikaranîna cotepeyvan, hostatî û zanabûna xwe ya bêjeyan nîşanê me dide û me jî ji gelek peyvan agahdar dike. Herwiha ev zenginîya cotepeyvan nîşaneyê xurtbûn û bi tesîrbûna vegotina Aqtepî ne.

Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepî jî wekî helbestvanên berî xwe, di gel zimanê Kurdî, bi zimanê Erebî, Farisî û Tirkî jî baş dizanî û bi van zimanan gelek berhem nivîsandine.

Em dikarin bibêjin ku Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepî zimanekî giran bi kar anîye. Çunkî seranserê dîwanê bi peyv û terkîbên Erebî û Farisî hatiye xemilandin. Ji ber vê yekê, ji aliyê mirovên ji rêzê ve nayê fêhmkirin. Kesên ku dîwana Aqtepî bixwînin, kêma be jî divê haya wan ji peyvên Erebî û Farisî hebe.

Carna, di yek malikê de peyvên Kurdî, Erebî û Farisî bi hev re bi kar anîne.

**Wek mînak:**

Bo dilê sedmet-zede, carek veke babê ‘eta!

Abê yaqûtî bide weqtê seher, ser sîmê cam! (r.113)

Peyvên Kurdî: **bo dilê, carek, veke, bide**

Peyvên ‘Erebî: **babê ‘eta, yaqût, weqtê seher**

Peyvên Farisî: **sedmetzede, Ab,sîm, cam**

Aqtepî helbesta şeş, heft û nehan bi zimanê Farisî nivîsandiye. Çend mînak ji wan helbestan:

Xerqê gîrdabê ‘îsyân em, feqîr em bêxîred

Pakê xwahem, jengê dil ra lîkê ber çeşmeş remed

Rûsîyeh pesmande em, ey pîrê pîran el-meded!

Muşkîlatê rahê ma, hergîz neyayed der-‘eded

El-meded ey xhacê müşkul-guşayê Neqşîbend!(r.61)

Bûwed an çeşmê ber kende kî nebwed cayê yarê pak

Hezaran rewşînaê dîdeê ra ku nezer dared (r.63)

Şîrê Yezdanê Kerîmî, Heyderê Kerrarê sef

Canişîni Fexrê ‘Alem, Şahê Ewreng ê Necef



Ber zeban ranem, hemîn misraê peyda û bexef

La feta îlla ‘Elî, la seyfe îlla Zu’l-feqar (r. 71)

Di klasîkên Kurdî de, “**di**” wek veqetandekê/ qertafa ravekê; hem ji bo ravekên navdêrî hem jî ji bo ravekên rengdêrî -çi yekjimar çi jî pirjimar be jî-, gelekî tê bikaranîn.<sup>40</sup> Di dîwana Aqtepe de jî gelek mînakên bi vî şikilî hene. Em ê hem ji bo raveka rengdêrî hem jî ji bo ya navdêrî mînanan ji dîwanê bidin:

Her ji te’sîrê xedengê xemzeê **çeşmê di reş**

Der-dilê bêçare peyda ne, hezaran cerh û zam (r. 110)

Ah û nalên hesreta min, qeyd û bendê firqeta min

Dax û derdê xurbeta min, ket’ye **cergînê di min** (r.138)

### 1.1.1 Unsurên Farisî

Ji dîwana wî aşkere dibe ku Şêx Ebdurrehman gelek hakimê zimanê Farisî bûye; ji qertaf, daçek û cînavkên Farisî bigire, heta bi peyv, terkîb û biwêjên Farisî jî di dîwanê de cih digirin. Em ê li jêr yek bi yek mînakên wan bidin:

#### 1.1.1.1 Pêşdaçekên Farisî

Pêşdaçekên Farisî ev in: “ez, ber, der, be, ba, bî, û hwd.”<sup>41</sup> Ev daçek nemaze pêşdaçekên “ez û der” di dîwanê de gelekî hatine bikaranîn. Weke mînak:

Narê hîcra te, li ser min zêde xurbet ah û ah

Çendî zehmetkêş im, **ez firqet** li min bûye kemal (r. 103)

Ev “**ez**” jî, “**ji**”ya Kurmancî ye; “**ez firqet**” yanî “ji firqetê”.

Dîlberê bala-qiyamet, ger nebînim **der**-buhuşt

Yek qedem ger deynim ez, ey dil mehal e, sed mehal! (r. 104)

<sup>40</sup>Hayreddin Kızıl, “Di”ya Kirpandinê / Tekîdê di Kurmancî de, *Bingöl Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Yıl: 5, Cilt:5, Sayı: 10, 2019/2, r. 57.

<sup>41</sup> Bo agahiyên zêdetir bnr. Nusrettin Boilelli, *Farsça Dil Bilgisi ( Nahiv ve Sarf)*, M. Ü. İlahiyat Fakültesi Yayınları, 4. Baskı, İstanbul, Eylül 2016 r. 224-233.

“**der**”, ‘**di... de/ da**’ an jî ‘**li**’ ya Kurmancî ye. “**der buhuşt**” tê maneya “**di buhuştê de**” an jî “**li buhuştê.**”

Ger, bugzerê zahid, **be** xelet ber derê yarê’m,  
Ez, ateş û yar im (r. 124)

“**be**” jî “**bi**”ya Kurmancî ye; “**be xelet**” tê wateya “**bi xeletî**” yanî “**bi şaşî**”.

**Ba xîred** kes reste nabit, qet ji pencê esmeran  
Gerçî ev kafir xezal in; setwetê şêran dikin.(r. 136)

“**ba**”, “**bi, bi... re/ ra, di gel**”a Kurmancî ye; “**Ba xîred**” yanî “**Bi aqilê**”.

Ey dil sebir ke **ber-fîraq**; e’s-sebrû mîftah’ul- ferec  
Çendî bikêşî ihtîraq; e’s-sebrû mîftah’ul- ferec(r. 55)

“**ber**”, “**li ser**”a Kurmancî ye; “**ber fîraq**” tê wateya “**li ser fîraqê, li ser jihevduûrbûnê.**”

Çunkî teşne xişkê leb, der- Kerbela xurbetzedê  
Helqê nazik bûne bî’l-cumle bi **bîkamê** burîd (r. 67)

“**bî**” wateya neyînîyê dide; “**bê**”ya Kurmancî ye; “**Bîkam**” yanî “**bêfayde.**”

Ji xêncî van daçekên pirsîyariyê yên wek: “kuca, aya” jî hatine bikaranîn.

### 1.1.1.2 Qerafên Pirjimarîyê

Di Farisî de, du qertafên bingehîn yên pirjimarîyê hene: yek “**-ha**” ye ay din jî “**-an**” e. Ev qertaf tîr dawîya peyvan û wan pirjimar dikin. Bi qelemperî “**-ha**” ji bo heyînên bêcan, “**an**” jî ji bo heyînên bican tê bikaranîn.<sup>42</sup> **Weke mînak:**

Îhya bike vî bédilî; carek bi dêmê sorgulî  
Wek **cîlwehayê bulbulî**; betin ji min sed fetl û ger (r. 73)  
Cîlwehayê bulbulî: Cilweyên bulbulî

<sup>42</sup> Osman Aslanoğlu, *Kendi Kendine Kolay Farsça*, Kent Işıkları, 6. Baskı, İstanbul 2015, r. 29.

Kesk û sor û zer, narencî û mawî û reş  
Sef bi sef seyran kon-an, tèn **dîlberanê mahîweş**(r. 79)  
Dîlberanê mahîweş: dîlberên wek hîva xweşik.

### 1.1.1.3 Rengdêrên Nîşandanê

Rengdêrên ku peyvan li gorî nêzikayî û dûrbûnê nîşan dikin, jê re rengdêrên nîşandanê tê gotin.<sup>43</sup> Di Farisî de, du rengdêrên nîşandanê hene: “**În**”: Ev, vê/ vî û “**An**”: Ew, wi, wê.

#### Weke Mînak:

Xoşa **an dil** ki ez-‘iştqê cemalê to xeber dared  
Zehî **an ten** ki ba-derdê xîyalê to eser dared<sup>44</sup> (r.63)

Şerbetek abê surahî, bexşî ke ber **în** feqîr<sup>45</sup>  
Da ji îhsanê te, carek cebrî bit qelbê kesîr  
Bendeê Pîrê Muxan im, ey şehînşeh destêgîr  
Sakîne dêr im ji bo ‘Îsaîyan mame esîr  
El- eman! Sed el-eman! Ey min jî hîcret nalenal! (r. 91)

### 1.1.1.4 Cînavkên Kesane û Cînavkên Kesane ên Hevbend

Di Farisî de, şeş Cînavkên Kesane hene; sê heb ji wan yekjimar, sê heb jî pirjimar in. Yên yekjimar “**men, to, û**” ne, yên pirjimar jî “**ma, şoma, îşan**” e.<sup>46</sup>

Cînavkên hevbend, bi tena serê xwe nayên bikaranîn û dema bi tena serê xwe bin tu wateya wan nîne. Bi peyvên berîya xwe ve tèn nivîsandin.<sup>47</sup> Di Farisî de, bi tevahî şeş cînavkên kesîn ên hevbend hene: “**-em, -et, -eş**” yekjimar in, “**-man, -tan, -şan**” pirjimar in. **Weke mînak:**

E’s-sela, sed e’s-sela; ber xas û ‘aman der-‘elen  
Kelbê în dergahê şah em, ta demê lehd û kefen  
Tûtîya kon Rûhîya în xakê pa der-her zemen  
Hafîz, amed dîde em-ra rewşînaê zankî **men**  
Saxîtem kuhl’ul-cewahîr, xakêpayê Neqşîbend (r.62)

<sup>43</sup> Aslanoğlu, h. b. r. 46.

<sup>44</sup> Xwezî **bi wî dilê** ku ji evîna cemala te agahdar e  
Xwezî **bi wê wucûda** ku bi derdê xeyala te bandordar e

<sup>45</sup> Şerbetek ava ji surahî, diyariyê **vî feqîrî** bike.

<sup>46</sup> Bo zêdetir agahî bnr. Aslanoğlu h. b. r. 66-67.

<sup>47</sup> Aslanoğlu, h. b. r. 68.

Xoşa an dil ki ez-‘işqê cemalê **to** xeber dared  
Zehî an ten ki ba-derdê xîyalê **to** eser dared (r.63)

Dil, bêçare; behrê xalî şod pa besteê zulfet  
Şoma ra mujde, ey yaran kî **o** xeyr’ul-meqer dared (r.64)

Xerqeê gîrdabê ‘**îsyaniem, feqîrem** bêxired  
Pakê **xwahem**, jengê dil-ra lîkê ber **çeşmeş** remed  
Rûşîyeh **pesmandeem**, ey pîrê pîran el-meded!  
Muşkîlatê rahê **ma**, hergîz neyayed der-‘eded  
El-meded ey xwacê muşkul-guşayê Neqşîbend! (r. 61)

Leşkerê sultanê xem **wustan** li ser dil, sef bi sef  
**Yafitem** ez yumnê ‘işqê şahê xuban sed şeref  
Eşkê xûnê’ m şubhê Dîcle, çû heta mulkê Necef  
‘Umrê bêyar, bûye zayî’, canê şêrîn, bû telef  
Ah û sed efxan, ji hîcra dîlbera ala Fireng (r.85)

### 1.1.2 Unsurên Erebi

Di edebîyata Kurdî ya klasîk de, bandora Erebi zêde ye. Helbestvanên klasîk bi rêya bêje, terkîb, gotinên pêşîyan ên Erebi û iqtîbasên ji ayet û hedîsan, berhemên xwe nivisandine. Edebîyat û zimanê Erebi, bê guman tesîr li Şêx Ebdurrehman jî kiriye. Şêx ‘Ebdurrehman jî di dîwana xwe de ji van unsurên sîd wergirtiye. Dema ku em li dîwana wî dinihêrin, em rastî têgeh, terkîb, hevok, gotinên pêşîyan û iqtîbasan tên. Em ê hinek ji wan li jêr binivîsin:

**We’ d-duhawe’ l- leylî** werd e, ser zebanê min, **muqîm**  
Çun ji **ewwel wechê** te **sanî** dizanim zulf û xal (r. 106)  
Dil me, **mehpûs** e, di gîsûyê nîgarê nazenîn  
Hebbeza! Bendê **cunûnê mubtela nî’ mel meqam** (r. 109)

### 1.1.2.1 Têgehên Erebî

‘Alî	Îrtîqa	Şebab
Beşaret	Kelb	Tecella
Cedîd	Lehd	‘Uqba
Dirayet	Mecrûh	Wehîd
Ehsen	Neqîd	Xeyûr
Fecir	Qedem	Xeşyet
Hedîd	Rîfaq	Yumn
Iktîtam	Sanî	Zuhr

**Tablo 1 Têgehên ‘Erebî**

### 1.1.2.2 Terkîb û Hevokên Erebî

<b>Ehsenellahû Tebarek</b>	Xwedê bimbarek bike. (r. 48)
<b>Mîn-be’dî ‘usrîn dû yusîr</b>	Piştî tengahîyê, firehî heye. (r. 56)
<b>Xeyr’ul xelq</b>	Qenctirîn (r. 71)
<b>La feta îlla ‘Elî, la seyfe îlla Zu’l-feqar</b>	Ji bilî Elî, tu xortê egîd nîne, û tu şûr ji bilî Zulfeqar nîne. (r.71)
<b>Fî semûmîn we hemîm</b>	Di nav bayê germ û tiştên gelek germ û kelandî da. (r.75)
<b>Amentû heqqen bi’-qeder</b>	Bi rastî (heqîqeten), min îman bi qederê anîye; ez pê bawer im. (r. 78)
<b>Beyt’ul Hezen</b>	Mala huznê. (r. 89)
<b>Ser xeylê cem’ê esfiya</b>	Li ser pirranîya gelek kesên paqij û ‘ezîz. (r. 96)
<b>Ebe’l-Qasim</b>	Bavê Qasim (r. 96)
<b>Ebe’l- Zehra</b>	Bavê Zehrayê. (r. 96)
<b>Ul’ul-‘ezmî’r-rusul</b>	Di nav pêxemberan da, yên mezin. (r. 96)
<b>Wadî’ê ehde’subul</b>	Sazkarê rêya xelasîyê. (r. 96)
<b>Ebe’t-Teyyîb</b>	Bavê rindîyê (r. 96)
<b>Ebe’t-Tahir</b>	Bavê paqijîyê (r. 96)
<b>Sifr’ul-yed</b>	Kesê/ kesa ku di destê wî/ wê de tiştek nemaye, xwedîyê ziyan û zîrarê. (r. 97)
<b>Kesba fî’lê bed</b>	Kar û qezenca fî’elê xerab û nebaş. (r. 98)
<b>Cedd’îl-Hesen</b>	Bapîrê Hesen. (r. 98)
<b>Şukru’lîllah</b>	Şukir ji Xwedê ra. (r. 99)
<b>Şefî’el-muznîbîn</b>	Di roja qiyametê de, şefa’etkarê gunehkar û suçdaran. (r. 99)
<b>E’l-meded</b>	Hewar. (r. 100)
<b>Fexr’ul-‘Alemîn</b>	Fexra Aleman. (r. 101)
<b>Şahînşehî Îhsan-‘emîm</b>	Şahê ku îhsan û başîya wî ji hemû kesan ra ye. (r. 101)
<b>Şahê Sahîbqebûl</b>	Ew şah û mezin e ku ji aliyê xwedîyê (ji teref Xwedê Tehala ve) xwe ve hatiye qebûl kirin. (r. 102)
<b>Şefî’ê Ummetê</b>	Şefaetkarê Ummetê. (r. 102)
<b>Nemleê ez’ef</b>	Mûrê herî biçûk ( r. 103)

<b>Cumle a'za</b>	Hemû aza, hemû wesle (r. 104)
<b>Mîn ledun</b>	Ji ba Xweda, ji ba sirrê Xweda (r. 104)
<b>Fîtneê xas û ewam</b>	ew kesê /kesa ku hem merivên ji rêzê, hem jî merivên payebilind (meqambilin) dike fitneya xwe, fitneye tîne serê wan, dilê wan dike xwe. (r. 108)
<b>Nî'mel-meqam</b>	Meqamê pir xweş. (r. 109)
<b>Yexfir lena yewm'el-qîyam</b>	Di roja heşrê de gunehên me 'efû bike. (r. 109)
<b>Ênber- şemîm</b>	Kesê/ kesa ku bêhna enberê jê tê. (r. 114)
<b>Waqifê Ma fi'd-demîr</b>	Di dil da çî derbas bibe, yê ku van tiştan dizane. (r. 143)
<b>Fewe'lahî</b>	Ez sond dixwim. (r. 147)
<b>Le qed edremtî mîn cemrî'l-xudûdî fi'l-heşa nara</b>	Bêguman, te bi soriya suretên xwe, di dil û hinavên min da agir dadaye. (r. 149)
<b>Fe lemma en reeytû'l-qedde mîsl'el-banî yenqadû:(r.150)</b>	Dema min dît ku bejna wê mîna daran ditewe
<b>We lehz'ul-'eynî ke'd-dirxamî lî'l-'uşşaqî yestadû: (r. 150)</b>	Awirên wê mîna şêran nêçîra 'aşîqan dike
<b>Tesellemtû îlel qetfî lî enne's-sebbe ye'tadû: (r. 150)</b>	Ez jî li mirinê razî bûm. Lewra 'aşîq hînî van tiştan bûne.
<b>Mecmû'ê 'uşşaq</b>	Koma 'aşîqan. (r. 154)

**Tablo 2 Terkîb û Hevokên 'Erebî**

### 1.1.2.3 Îqtîbasên ji Ayet û Hedîsan

Di helbest an jî pexşanê de, sûdwegirtina ayet û hedîsan e ji boyî ku mane bihêz û xurttir bibe, lê ayet û hedîs her tim bi tamamî nayên bikaranîn,<sup>48</sup> carna hin peyvên wan tenê tîne bikaranîn. Îqtîbasên ku ji hedîsan tîne çêkirin, jê re Tenwir tê gotin. Carna ji bo wezn û serwayê cihê peyvên ayet û hedîsan tîne guhertin. Ev ji bo vê hunerê ne pirsgirêk e.<sup>49</sup> Aqtepi, hem ji ayetan hem jî ji hedîsan sûd wergirtiye lê bêhtir ayet bi kar anîne. **Wek mînak:**

<b>Ayet</b>	<b>Maneyên Ayetan</b>
<b>Len tenalu'l bîrre, heta tunfiqû<sup>50</sup></b>	Heta ku hûn ji wan tiştên xwe yên ku hez dikin, hûn jê xerc (başî û xêrê) nekin, hûn nagihên wê xêr û qenciya eslî. (r. 165)
<b>Qal û bela<sup>51</sup></b>	Belê, tu Rebbê me yî. (r. 142)
<b>Ma remeyte, îz remeyte<sup>52</sup></b>	Gava ku te diavêt jî, te nedivêt, lê Xwedê diavêt. (r. 97)

<sup>48</sup> Kocakaplan, h.b.r. 59.

<sup>49</sup> Saraç, h.b.r. 274.

<sup>50</sup> Qurana Pîroz, 'Elî Îmran, 3/92

<sup>51</sup> Qurana Pîroz, 'Eraf, 7/172

<sup>52</sup> Qurana Pîroz, Enfal, 8/17

<b>Yuhy'îl- 'îzam</b> <sup>53</sup>	Kî ruh dike hestîyan, kî hestiyân tîne ba hev? (r. 108)
<b>Hel mîn mezîd</b> <sup>54</sup>	Hîn tune ye? Wekî din dê çênebe? (r. 89)
<b>Mazexel beser</b> <sup>55</sup>	Çavê te – Hz. Pêxember (s.x.l.)- dema ku van dît ne bi wê ve çû; ne jî heddê xwe derket, zêdegavîyê jî nekir. (r. 101)
<b>Ya leytenî kuntû turab</b> <sup>56</sup>	Xwezî, ez bibûyama ax û herî. (r. 88)
<b>We'd-duha we'l-leylî</b> <sup>57</sup>	Bi şefeq û dema ku roj diçe ava sûnd û qesem bi wê şeve be ku. (r. 106)
<b>Qul hûwellahû Ehed</b> <sup>58</sup>	Bibêje ku Xweda yek e. (r. 100)

**Tablo 3 Îqtîbasên ji Ayetan**

### Hedîs

Agahiyên bingeh ên kultura îslamê ne ku tê maneya şîrovekirin û ravekirina gotinên Hz. Pêxember (s.x.l.) e.<sup>59</sup> Aqtepî di dîwanê de tenê ji hedîsek sûdwegirtiye ew jî hedîsa “Lewlak” e.

**Lewlak “Lewlake lewlake lema xeletu'l-eflake**<sup>60</sup>: Heke ne ji te bûya, heke ne ji te bûya min dê erd û asîman çênekira. (r. 96)

### 1.1.3 Unsurên Tirkî

Wek ku me li jor jî behsê kiribû, Şêx Ebdurrehman bi zimanê Tirkî jî zanîbûye û berhemeke wî bi zimanê Tirkî bûye. Lê di dîwana xwe de gelek kêr ji zimanê Tirkî îstifade kiriye. Di dîwana wî de em tenê rastî çar peyvên Tirkî hatin. Em ê her çar peyvên jî wek mînak bidin:

Wek di nîsan rengê reng, **çiçek** vebin der murxîzar

Muxtelît bûn têk di çîmen, leşkerê Rom û Hebeş (r. 79)

Aqtepî, li şûna peyva **kulîlkê** du caran cih daye “**çiçek**”ê; “**çiçek**”, peyveke Tirkî ye.

Ger bugzere ez-zillê tuber turbetê Ruhî

Ya munîs e Rûhî.

Dê bînê **selamlîx**, ji eser ‘ezmê di balî

<sup>53</sup> Qurana Pîroz, Yasîn, 36/

<sup>54</sup> Qurana Pîroz, Qaf, 50/30

<sup>55</sup> Qurana Pîroz, Necm, 53/17

<sup>56</sup> Qurana Pîroz, Nebe, 78/40

<sup>57</sup> Qurana Pîroz, Duha, 93/1

<sup>58</sup> Qurana Pîroz, Îxlas, 112

<sup>59</sup> Mine Mengi, *Eski Türk Edebiyatı Tarihi*, Akçağ Yayınları, 20. Baskı, Ankara 2014, r. 21.

<sup>60</sup> ‘Îsma’îl b. Mûhemmed el-‘Eclûnî, *Keşful-Xefâ* ( weş. Ahmed el-Kalaş), 2/164, Beyrut 1985.

Ez, zîrê zemîn im! (r. 126)

Her çi qas ku “**selam**” peyveke Erebî be jî, qertafa “**-lik**” a ku Kurmanc wê wek “**-lix**” bi kar tînin, Tirkî ye û ji wê peyvê peyveke nû hatiye dariştin. “**selamlix**”, tê wateya merasîma çûyîna padîşahan a ji bo nimêja Înê.

Guhar û zêr û zîwer, netrîk û **gerdenlix** û gewher

Xedeng û tîr û afat in li te çûn mu'minê rahî (r.154)

“**gerden**” peyveke Farisî ye lê wek ku me got, **-lik** qertafeke Tirkî ye, loma peyva “**gerdenlix**” Tirkî ye.

Di îro, serwer û serdefterê mecmû'ê ‘uşşaq î

Murîd û qutbê ‘işq î, merkez î; yan **yildizê** cah î(r.155)

“**yildiz**” peyveke Tirkî ye.

#### 1.1.4 Bandora Devoka Hekarî û Botanê

Di dîwanê de, lêkerên wek “**dibit, bêtin, bit, nabitin, nakevîtin, dibarit, tête, bigrit, nakit, naête, kit, didit, nakitin, bigrit, naêtin, nabit, natirsit, hwd.**” ji van lêkeran, ên ku di devokên Hekarî û Botanê de hevpar in, gelek hatine bikaranîn. Em dikarin bibêjin ku Aqtepe di bin bandora van devokan de maye.

#### 1.1.5 Gotinên Pêşyan, Biwêj û Nifir

Diheş girtin: (r. 40)

Dil kir kebab (r. 45)

Herdu ‘alem nayê ber çeşmê me, qîmet yek peyaz: (r. 53)

Le’netullahî ‘ela ruh’îl- Yezîdî fî’l-mezîd (r. 69)

Rûyet siyeh bad: (r. 73)

Reş me kir defter (r.98)

Naête destê min (r. 119)

Diheş xordem (r. 147)

Derb’ul hebîbî, ke’z-zebîb (r. 165)



## 1.2 MEXLESÊN WÎ

Şêx ‘Ebdurrehmanê Axtepî, di piraniya helbestên xwe de mexlesa “Rûhî”, carinan “Şemsî an jî “Şemseddîn” bi kar anîye.<sup>61</sup> Dema ku em li dîwana wî dinihêrin, em dibînin ku Şêx her du mexles jî bi kar anîne. Şêx, ji ber ku di du helbestên xwe du caran mexles bikaraniye bi tevahî 29 caran mexlesa “Rûhî” û carekê jî “Şemsiddîn” bi kar anîye.

### **Weke mînak:**

Wellah nema cayê sebir, meksûr e dil nabî cebir

Lîkîn ji bo **Rûhî** debir; e’s-sebrû mîftah’ul-ferec (r. 58)

Em dikarin bibêjin ku Şêx Ebdurrehman herî zêde ji nasnavê Rûhî hez kiriye, lewra di dîwanê de herî zêde ev nasnav bi kar anîye û 29 jî caran cih dayê.

Xudaya! **Rûhîyê** miskîn, luqebdarê bi **Şemsiddîn**

Ji wesla dîlbera narîn, nekî mehrûm, di ‘uqbaê (r. 162)

Di vê mînakê de jî xuya dibe ku Şêx Ebdurrehman di malikê de du mexles bi hev re bi kar anîne. Di dîwanê de tenê di vê malikê de nasnavê “**Şemsiddîn**” bi kar anîye.

## 1.3 HELBESTVANÊN KU BANDOR LI AQTÊPÎ KIRINE

### 1.3.1 Melayê Cizîrî

Dema em li dîwanê dinihêrin, em dibînin ku herî zêde têsîra Melayê Cizîrî li ser Aqtepi bûye. Aqtepi him ji aliyê şiklî ve, him jî ji aliyê naverokê ve gelek di bin bandora Cizîrî de maye. Aqtepi carna nîvmalikên misrayên Cizîrî rasterast bikaraniye. **Wek Mînak:**

### **Mela**

**Gelo dîsa bibînim ez**, çirayê wesletê hil bit

Bisojim şubhê perwanê, di ber wê nûr û şewqê da<sup>62</sup>

### **Aqtepi**

Me yarê nazenîn wunda ye, keftim narê hirmanê

Li min berq û birûsk e xem dibarin şubhê baranê

<sup>61</sup> Korkusuz, h.b.r. 47.

<sup>62</sup> Melayê Cizîrî, *Dîwan (Kürtçe Metin - Türkçe Çevirisi)*, Türkçe Çevirisi: Osman Tunç, Arap Alfabesinden Latinize Eden: Selman Dilovan, Weşanên Nûbihar, 6. Baskı, İstanbul, 2018, , r. 54.

**Gelo dîsa bibînîm ez** ku dîlber bête meyxanê?

Perîşan zulf û leb, der xende ber kef camê ferfûrî (r. 151)

### **Mela**

Îd e û her kes ji didara te lê pîroz e 'îd

Ez tinê mehrûmê dîdar im bi sed menzil be'îd<sup>63</sup>

### **Aqtepî**

Îd e û her kes li keyf û şahî ye ev rojê 'îd

Ez, tenê mame di kuncê namuradî, bêumîd

Cumle "aşîq, surxî-rû; lê ez di vî halê şedîd

Şubhê sîb im, şubhê sîb im, şubhê sîb im, şubhê sîb! (r. 43-44)

Di vê helbestê de bandora Cizîrî bi awayekî aşkere xûya dike. Temaya 'îdê li ba herdu helbestvanan jî eynî ye. Aqtepî jî wek Mela, di roja 'îdê de ji yara xwe mehrûm e.

### **1.3.2 Ehmedê Xanî**

Têsîra Ehmedê Xanî; li ser gelek şa'irên ku li dû wî hatine çêbûye. Yek ji wan helbestvanan jî Aqtepî ye. Li gor agahiyên me bi dest xistî û li gor berhemên Aqtepî, em têdigihîştin ku Aqtepî gelek hez ji Xanî kiriye û di bin bandora wî de maye. **Çend mînak ji dîwanê:**

#### **Xanî**

Me dil da dîlberek sade, letîf û şox û begzade

**Ji qeydan kirme azade, nîhanî birme dîwanê**

Nîhanî **xelwetek** da min, ji **le'lan** şîretêk da min

Bi weslê **suhbetek** da min, kirim bende di fermanê<sup>64</sup>

#### **Aqtepî**

Kirim yexsîr û napeyda; cunûn û waleh û şeyda

**Verestîm ez ji nêv qeyda;** wekî Mecnûn bi çolê ra

<sup>63</sup> Cizîrî, h.b.r. 282.

<sup>64</sup> Kadri Yıldırım (çeviri ve analiz), *Ehmedê Xanî Külliyyatı IV, Dîwan*, Avesta, Stenbol, 2014, .r. 225.

Bi çeşmê reş îşaret kir, li min mujde'w bişaret kir  
Welê teyyê 'îbaret kir, **nîşan dame ji xelwê ra**

Birim **xelwê**, di nêv **suhbet**; me noşî badeê cennet  
Ji **le'lê yarê** pur hîmmet, 'edem bûm e bi cur'ê ra (r. 39)

### **Xanî**

Ger bizanim ez di **heşrê** dê nebînîm **dîlberê**  
**Cennetê** dê çi bikim ez pê wer bikem xakisterê<sup>65</sup>

### **Aqtepi**

**Weqtê qîyama sa'etê; bêwerdê** baxê wusletê  
Wellahî naçim **cennetê**; nadim li **Fîrdewsê** nezer(r. 77)

**Dîlberê bala qîyamet**, ger **nebînîm** ez der **buhuşt**  
Yek qedem ger deynim ez, ey dil mehal e, sed mehal! (r. 104)

### **1.3.3 Feqiyê Teyran**

Dema em li helbestên li jêr dinihêrin em dibînin ku Feqiyê Teyran jî têsir li Aqtepi kiriye, herdu jî dilkebi in, li ber dergahê rehmetê ne, û xwe avêtine bextê Hz. Pêxember (s.x.l) jê alikarî dixwazin.

### **Feqî**

**Hatim ber dergahê rehmet, ya Resûlellah meded**  
**Ya bi şewqet, ya bi rehmet, ya Hebîbellah meded**

Bêdewa me, **bêtebîb im, her bi işqê dilkebi im**  
'aşiq im, dûr im, xerîb im, **ya Resûlellah meded**

Melhem û derman li barî, **hêstirê min xûn dibarî,**  
**Şubhê taviyên biharî, ya Resûlellah meded.**<sup>66</sup>

<sup>65</sup> Yıldırım, h.b.r. 227.

<sup>66</sup> Feqiyê Teyran, *Jiyan, Berhem û Helbestên wî*, (Amadekar: Xalid Sadinî), çapa 5an. Nûbihar, Stenbol, 2011, r. 483-484.

### **Aqtepî**

‘Îd e îro, bê qerar im ez ji feqda dêmdurê

Bêhebîb im, bêhebîb im, bêhebîb im, bê hebîb!

Her kesek ba yarê xwo d’meşyan di sehrayan li rê

**Pur kebîb im, pur kebîb im, pur kebîb im, pur kebîb!**

‘Îd e; keyf û şahî ye nêv xas û ‘amê xulxul e

Yek yekan ‘aşiq li ser sorgul, mîsalê bulbul e,

Nîn e der qelbê me bestek, çunkî mecrûh û kul e

**Bêtebîb im, bêtebîb im, bêtebîb im, bêtebîb! (r. 41)**

Derdîmend im, **bêtebîb im!** Ah û efxan, bêhîsab

Her ji narê zenb û ‘îsyan, cerg û **dil min, bû kebab**

Hemçu ney, lerzende me; ez xewfê ehwal ê ‘ezab

**Ya Resûlellah dexîl im! Ya Hebîbellah dexîl! (r. 100)**

“Rûhî”yê derwêş **vewestayê li babê Rehmêtê**

Lê ji ber mewca gunahan, ket’ye xewf û xeşyetê

Dûr nekî vî bênewayî **ey Şefî’ê Ummetê**

**Ya Resûlellah dexîl im! Ya Hebîbellah dexîl! (r.102)**

**Ji hicrê daxîdar im ez, wekî tavê buhar im ez**

Mudam ateş dibarim ez, heraret girte dunyaê (r. 157)

### **1.4 BIKARANÎNA HUNERÊN EDEBÎ**

Hunerên edebî; di vekolandina helbest û şerhên metnên kevn de cihekî girîng digire. Ji boyî ku beytek an helbestek bê fehmkirin, hunerên edebî gelek dibin alîkar û rênîşander. Hunerên edebî mijara ‘ilma belaxetê ne. Her çi qas ku hin senifandinên cuda jî hebin, bi gelemperî hatiye pejirandin ku sê beşên bingehîn -Beyan, Meanî û Bedî- ên belaxetê hene.<sup>67</sup>

<sup>67</sup> Muhsin Macit- Uğur Soldan, , *Edebiyat Bilgi ve Teorileri (El Kitabı)*, Grafiker Yayınları, 9. Baskı, Ankara, Ekim 2017, r. 81-82

Di berhemekê de çiqas hunerên edebî zêde bin, vegotin ewqas bi têtj û lezzet e. Bêtj têtjhiştina van huneran xwîner nikarin hevokan, malikan, metnan fehm bikin û xwe bigihînin lezzeta wan Ji ber vê yeke jî divê xwîner van huneran baş bizanin.. Bikaranîna Hunerên Edebî û usluba helbestvan girêdayî hevdu ne. Helbestvan di berhema xwe de, çiqas peyvvan baş hilibijêre, huneran baş bikarbîne, vegotina wî wisa bi bandor dibe û asta wî jî bilind dibe. Hunerên edebî, di dîwana Aqtepi de jî xwedî cihekî taybet e. Aqtepi di dîwana xwe de herî zêde balê kişandiye li ser hunerên wek “Teşbîh, Tekrîr<sup>68</sup> û İsti’are” yê loma jî heta ji destên me hat, me girîngî daye van hersê huneran û bi berfirehî mînakên wan hatin dayîn. Herwiha hunerên din jî hatin ravekirin û ji bo wan huneran jî du-sê mînak hate dayîn.

#### 1.4.1 Teşbîh (Şibihandin; Lêkçiwandin)

Şibihandin; du tiştên ku di navbera wan de têtjilî hebe, ji van tiştan, a bêhêz, bi ya bihêzê bê şibihandin, ji vê hunerê re teşbîh têtjotin.<sup>69</sup>

Di hunera şibihandinê de herî kêr du, herî zede jî çar hêman hene.

1. **Leçû (Muşebbeh):** Ji wan unsurên têtj şibihandin, aa bêhez/ qels e.
2. **Lewçû (Muşebbeh bihî):** Beravaî Muşebbehê ye; ji wan unsuran ya bihêz û xurt e.
3. **Rûyê lêkçûn/ lêkçiwandin:** Wechû şibih; sifeta hevbeş a her du alîyan e.
4. **Amraz (edat):** Qertaf an jî peyvên di navbera **leçû** û **lewçûyê** de pêwendîyekê ava dikin, wek amraz têtj binavkirin.<sup>70</sup> Şêx Abdurrehmanê Aqtepi di dîwana xwe de cih daye van amrazan: “**wekî, misal, wek, şubhê, mislê, eynî, teşbîh, şubhet, çu, çun...**”

##### 1.4.1.1 Teşbîha Mufessel

Ew teşbîha ku hemû hêmanan (leçû, lewçû, amraz û rûyê lêkçûn) di nav xwe de dihebîne, jê re Teşbîha Mufessel têtjotin. Ev cure teşbîh ji aliyê belaxetê ve zêde xurt nayên hesibandin.<sup>71</sup> Aqtepi, di dîwanê de gelek cih daye vî cureyî. Em ê mînakekê ji dîwanê li jêr binivîsin:

Rojê ‘îdê, tarî ye; wek leylê bêşem û çira

<sup>68</sup> Di binbeşa “Zimanê wî” de behsa taybetiyên Tekrîrên di dîwanê de hate kirin.

<sup>69</sup> İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Kapı Yayınları, 23. Baskı, İstanbul, Ekim 2013, r. 452.

<sup>70</sup> İsa Kocakaplan, *Açıklamalı Edebi Sanatlar*, Türk Edebiyatı Vakfı Yayınları, 7. Baskı, İstanbul, 2011, r. 163-164

<sup>71</sup> Numan Külekçi, *Açıklamalar ve Örneklerle Edebi Sanatlar*, Akçağ, Ankara 1995, r. 34.

Ser xerîb û bêkesê dûr bit ji yar û hogira  
Şadîya ‘îdê l imin huzn e, gelî yar û bira!  
Dil keîb im, dil keîb im, dil keîb im, dil keîb!(r.42)

**Lêçû:** “Roja ‘îdê”.

**Lewçû:** “leyl”.

**Amraz:** “wek”.

**Rûyê lêkçûn:** “tarîbûn”.

#### 1.4.1.2 Teşbîha Belîx / Teşbîha Mu’ekked

Di vê teşbîhê de, her du unsurên alîkar ên teşbîhê (amraz û rûyê lêkçûn) nînin.<sup>72</sup> Tenê her du unsurên girîng (leçû û lewçû) hene. Ev cure ji cureyên din xurttir e. Lewra çiqas unsur ji teşbîhê kêr be ewqas bihêztir e.<sup>73</sup> Bikaranîna vê cureyê ne karekî hêsan e û herkes nikare, vê cureya teşbîhê bikarbîne. **Wek mînak:**

**Qed serwe, qerden, sade ‘ac;** eswed-uyûn a ser bi tac

Nakit li derde min ‘îlac; e’s-sebrû mîftah’ul-ferec (r. 57)

Di vê malike de du mînakên Teşbîha Belîx hene;

Ya yekem: “Qed serwe” yanî bejna te wek dara serweyê dirêj e.

Ya duyem: “gerden sade; ‘ac” yanî gerdena (sitû) te wek diranên filan sipî ne.

Lê di van mînakan de, helbestvan ne cih daye amrazan “**wek**” ne jî rûyê lêkçûnan “dirêj, sipî” Aqtepi di malikekê de du Teşbîha Belîx bikaraniye, ev jî bi me dide zanîn ku Aqtepi helbestvanekî gelek serkeftî ye û hakimê ‘ilma Belaxetê ye.

#### 1.4.1.3 Teşbîha Mucmel / Teşbîha Mûcez

Ew teşbîha ku ji xeynî unsura “rûyê lêkçûnê(wechû şibih)”<sup>74</sup> her sê unsurên din hene, jê re “Teşbîha Mucmel” tê gotin.

Ekdarê min, çendîn hene; sa’et be sa’et, zêde ne

Têk hesretê çêsmê te ne, dil bû wekî narê seqer (r. 74)

**Lêçû:** dil

**Lewçû:** narê seqer

<sup>72</sup> M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi -Belağat-* Gökkuşbe Yayınları 11. Baskı İstanbul 2013 r: 131

<sup>73</sup> Külekçi, h.b.r. 36.

<sup>74</sup> Külekçi, h.b.r. 35.

**Amraz:** wekî

Di vê mînakê de rûyê lêkçûn nehatiye bikaranîn. “**Dil bû wekî narê seqer**” yanî dil bû wek agirê cehenemê, dişewite. Di hevokê de, helbestvan cih nedaye lêkera şewitandinê.

#### 1.4.1.4 Teşbîha Muekkeb

Ew teşbîha ku amraz di nav de tunebe, jê re “Teşbîha Muekkeb” tê gotin.<sup>75</sup>

**Weke mînak:**

Ber textê mehebbet, **bi xwe Mehmûdê Eyaz im**,

Gerden di firaz im.

Der mîhnetê hîcranê, şehînşehê nîhalî,

**Ferhadê Şîrîn im.** (r. 125)

Di vê bendê de, du heb mînakên teşbîha muekkeb hene. Helbestvan hem xwe wek Mehmûdê Eyaz dibîne, hem jî wek Ferhad, lê di her du hevokan de jî amraz nehatiye bikaranîn.

Cureya Teşbîhê	Lêçû	Lewçû	Amraz	Rûyê lêkçûn	Rûpel
Mufessel	Ez	Mecnûn	wekî	Verestim	39
Mufessel	‘Aşiq	Bulbul	mîsalê	li ser sorgul	41
Mufessel	Rojê ‘îdê	Leyle bêşem’ û çira	wek	tarîbûn	42
Mufessel	‘Îd	Fesle buhar	wekî	temaşebûn	43
Mucmel	Ez	Sîb	şubhê	-	44
Mufessel	Berf	Serad	wek	tê xwarê	45
Mufessel	Rîtil	qubab	mislê	rabûye	46
Mufessel	Cîhan	xurab	wek	reşbûn	46
Mufessel	Min	musîqar	Renge rengê	nexme	52
Mufessel	ez	şahîbaz	mislê	tevlîbûn	53
Mufessel	Feryadê min	Bulbulê fesla xezan	wek	çûyîn	55
Mufessel	ez	bulbul	Wek	nalîn kirin	56
Belîx	qed	serwe	-	-	57
Belîx	gerden	‘ac	-	-	57
Mucmel	Fîrret	ateş	mîsal	-	57
Mucmel	Le’net	Baranê şedîd	şubhê	-	65
Mucmel	Le’neta kafir şebîhan	Rojê ‘îd	‘eynî	-	65
Mucmel	Ateş	Narê fî’l weqîd	teşbîhê	-	65
Mufessel	Ji min	Cilwehayê	wek	fetl û ger	73

<sup>75</sup>Muhsin Macit- Uğur Soldan, bnr. 87.

		bulbulî			
Mufessel	Ji min	ceres	wek	efxan	74
Mucmel	dil	Narê seqer	wekî	-	74
Mufessel	ez	Narê -cehîm	şubhetê	zehmet	75
Mufessel	min	qemer	wek	rewşen kirin	75
Mufessel	-im (ez)	şah	şubhê	serfiraz	75
Mufessel	tu	Bedrê nêv sema	wek	berq	75
Belîx	gerden	xezal	-	-	75
Belîx	bala	Serwî	-	-	79
Belîx	dem	xonçe	-	-	79
Mufessel	Lale-rû	Perwînê sema	mislê	cem'in	80
Belîx	rû	lale	-	-	80
Mufessel	dîlber	Gulê cûr	-	-	80
Mufessel	rûhîya	bulbul	wek	efxanîkeş	81
Mufessel	Eşkê xerîz	meter	wek	dîbarînim	83
Mucmel	dil	mencel	çû	-	83
Mucmel	yar	qemer	wek	-	83
Mufessel	Eşkê xûnê'm	Dicle	şubhê	çû(zehf)	85
Mufessel	tîr	baran	mislê	dîbarin	86
Belîx	Dilberê'm	tersa	-	-	86
Belîx	qameta	şimşadî	-	-	86
Belîx	çeşm	horî	-	-	87
Belîx	Qedd û qamet	'er'erê	-	-	87
Belîx	Leb, gerden, Xebxeb, ruxsar Dêm, çehre, ten Qedd, met...	gul	-	-	93
Mufessel	-im (ez)	bulbul	mislê	bêhîşbûn	94
Mufessel	-im (ez)	Bulbulê buhar	wek	'aşiq	94
Mucmel	Çeşmê min	gulab	'eynî	-	95
Mufessel	me (ez)	ney	hemçû	lerzende	100
Belîx	Dêm	durr	-	-	104
Belîx	Çav	xezal	-	-	105
Belîx	ebrûyê	hîlal	-	-	105
Belîx	Şerab	ateş	-	-	109
Mufessel	-im (ez)	cisme hewa	şubhetê	mehw-im	111
Mucmel	Qelbê min	Kuhê qaf	şubhê	-	115
Mucmel	zulf	'elem	şubhê	-	116
Mufessel	me( ez)	Yunûs	wekî	der zikê hutê 'ezîm	116
Mufessel	-im (ez)	îksîr	'eynî	mestkirin	118
Mufessel	beytek te	xemra şuşeya	teşbîhê	lezzeta me'nî dide	121
Mucmel	xemze	xedengan	şubhê	-	121
Muekkeb	-im (ez)	Mehmûdê Eyaz	-	gerdenfiraz	125
Muekkeb	-im(ez)	Ferhadê Şîrîn	-	hicran/dûrketin	125



Mucmel	qedd	serwî baxan	wek	-	128
Mucmel	xalê reş	zaxan	teşbihê	-	128
Belîx	enf	elîf	-	-	128
Mucmel	xalê reş	zengî beççegan	teşbihê	-	134
Mucmel	-in (ew)	Qeys, Wamiq, Ferhad	çu	-	134
Mufessel	Dîdeê şehla	Helagû Xan	wek	Wêran kirin	135
Mucmel	Çeşmê sîyah	Esfender û Rustem	çu	-	135
Mufessel	Zulfê muselsel 'enberî	awîze	çun	Cunban kirin/leqandin	137
Mufessel	-e (ew)	re'dê	şubhê	berqe berq	138
Belîx	qelb	seng	-	-	140
Belîx	leb	nebat	-	-	140
Mucmel	Qelbê xemgînê di min	Murxê nîmê- bismil	şubhê	-	141
Mucmel	Dîlberê	Gula cûrî	Hemçûn	-	147
Mufessel	-im (ez)	Yusûf	hemçu	besteê çah	149
Belîx	yara	mah	-	-	149
Mufessel	xem	baranê	şubhê	dibarin	151
Mucmel	ez	Tavê buharê	wekî	-	157
Belîx	Sîma	perî	-	-	163
Mucmel	'aşiqê şeyda	Hîlal û ta û derzî	wek	-	166
Mufessel	-im (ez)	perwane	şubhê	soht-im	167
Belîx	dîhen	xunçe	-	-	167
Belîx	sifet	horî	-	-	167
Belîx	dindanê	sedef	-	-	167

**Tablo 4 Hunera Teşbihê**

Di hunera teşbihê de çiqas unsur ji teşbihê kêr be ewqas bihêztir û bi bandor dibe. Yanî rêza Teşbihê li gor bihêzbûna xwe wiha ye: “Teşbiha Belîx, Teşbiha Muekkeb, Teşbiha Mucmel û Teşbiha Mufesel”. Me jî mînakên Teşbihê yê ku di dîwana Aqtepî de hatine bikaranîn di tabloyekê de raxist ber çavan. Helbet mînakên di dîwanê de ji yê me di Tabloyê de daye nişandan zêdetir bûn, lê me hewl da ku mînakên baş hilbijêrin û binvîsîn.

Dema em li tabloyê dinihêrin em dibînin ku, hêjmara teşbihên “Belîx, Mucmel û Muekkeb” ne kêr in, ev jî bi me dide zanîn ku dîwana Aqtepî ji aliyê hunera teşbihê ve tijî ye û teşbihên wî bihêz in.

## 1.4.2 Îsti'are

Gotineke ku bi mebesta teşbîhê di şûna gotineke din de hatibe bikaranîn, ji vê hunerê re Istiare tê gotin. Istiare hem hunera Mecazê ye, hem jî ya Teşbîhê ye. Ji unsurên teşbîhê yên sereke - Muşebbeh û Muşebbeh bihî- yek tê tercih kirin, yanî ji herdu unsurên yek tenê tê bikaranîn.<sup>76</sup> Du cureyên sereke yê hunera Istiareyê hene: Îsti'areya Vekirî / Îsti'areya Musarraha û Îsti'areya Veşartî /Girtî / Îsti'areya Mekniyye. Em di dîwanê de tenê li rastî Îsti'areya Vekirî hatin.

### 1.4.2.1 Îsti'areya Vekirî / Îsti'areya Musarraha

Di vê cureyê de ji unsurên teşbîhê yên sereke, Lewçû / Muşebbeh bihî tê bikaranîn. Yanî di vê cureyê de Lêçû / Muşebbeh nayê bikaranîn.<sup>77</sup>

Perde û berqe hilanî, da me destûr û tewaf  
Noşî kir 'aşiq ji **le'lan**, badeê nûrîn şefaf  
Xatem û textê Suleyman, zeptî kir min bêxîlaf  
Şahê textê 'işq im, ez navê me dunya bêguzaf  
Yek bes e, min yek dizanim dîlbera 'alîsîmat(r. 49)

Nexme min têtin ji dil, reng rengê mislê mûsîqar  
Her sehergahan, ji min têtin ah û efxan sed hezar  
Şêt û şeyda me, eman aware ez yar û dîyar  
Ger binoşim ez ji **le'lan**, badeê şêrin û guwar  
Heqq e ew xweştir ji cennet ez qusûr û 'alîyat(r. 52)

Heraret da dil û navan, ji **le'l** û perçem û çavan  
Dumû'ê min wekî avan, hebîba nazenîn naê! (r.157)

Lê'l di van mînanan de, di şûna lêv û devê yarê de hatiye bikaranîn. Dev û lêvên yarê bi Le'lê hatine şibhandin. Lê lêv ango dev yanî Leçû nehatine bikaranîn, tenê Lewçû hene di van mînanan de.

Mebada kes be 'alem zende bê'îşqê **perî-rûyan**  
Xulamê hîmmetê an em, ki o daxê cîger dared (r.63)

<sup>76</sup> Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b.r. 87-88.

<sup>77</sup> Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b.r. 88.

Di vê mînakê de jî helbestvan dli şûna “**yarên wek perî rû**” tenê gotiye “**perî rûyan**” ji ber ku cih nedaye lêçûyê- yarê/yarên- di vê mînakê de jî Îstî’areya Vekirî heye.

Qubbeê neh taqê mîna ye, li min tarîk û teng  
Pey bi pey ez çeşmê dîlber tèn cîger **tîr û xedeng**  
Her zeman, ber qel’eê dil mutessil top û tifeng  
Sedmeta ‘îşqa nîgarê, da me nêv penca puleng  
Ah û sed efxan, ji hîcra dîlbera ala Fireng(r. 81)

Şibhandinek di navbera bijangên yarê û tîr û xedeng de heye. Helbestvan li şûna **bijangên wek tîr û xedeng**” gotiye **tîr û xedeng**. Dîsa cih nedaye lêçûyê. Ev jî mînak e ji bo Îstî’areya Vekirî.

We’ d duhawe’ l leylî **werd** e, ser zebanê min, muqîm  
Çun ji ewwel wechê te sanî dizanim zulf û xal (r. 106)

Di edebiyata klasîk de yar her tim bi gulê tê şibhandin. Di vê mînakê de jî di şûna “**yara wek gulan**” de “**werd/gul**” hatiye bikaranîn. Lêçû dîsa nehatiye bikaranîn loma jî Îstî’areya Vekirî ye ev mînak.

### 1.4.3 Mecaza Mursel

Ev huner bi sê şertan çêdibe: (a) divê peyv li derveyî maneya xwe ya rastin bê bikaranîn (b) divê pêwendiyek -ji xeynî şibhandinê- di navbera maneya rastîn û mecazî de hebe (c) divê astengek hebe ji bo fehmkirina maneya rastîn.<sup>78</sup> **Wek mînak:**

Xerîqê qulzumê ‘îşq im, reîsê ekremê ‘îşq im  
Bide **Camê Cem ê** ‘îşq im, qewî me, ez di de’wayê (r. 160)

Cam ji bo qedeha şerabê tê gotin. ji ber ku cara ewil ji aliyê Cem ve hatiye bikaranîn carna wek “Camê Cem” tê bikaranîn. Lê di vê mînakê de mebesta helbestvan qedeh nîne, şeraba di nav qedehê de ye. Dibêje bide Camê Cem ê ‘îşq yanî şeraba ‘îşqê. Maneya mecazî heye, pêwendiyek di navbera Şerab û qedehê de heye lê şibhandin tune yanî em nikarin şerabê bi qedehê bişihibînin û dema em malikê dîxwînin em fehm dikin ku Camê Cem di maneya xwe ya rastîn de nehatiye

<sup>78</sup> Saraç, h.b.r. 110.

bikaranîn yanî asteng jî heye lewma em dikarin bibêjin ku di vê malikê de Mecaza Mursel heye.

#### 1.4.4 Cînas

Ew hunera ku di helbestekê de peyvên -herî kê m du peyv- maneyên wan cuda lê ji aliyê nivîs, şikil û bilêvkirinê ve wek hev bin, jê re **cînas** tê gotin.<sup>79</sup> Em dikarin bibêjin ku Aqtepî gelekî ji vê hunerê hez kiriye; lewra, di dîwana xwe de gelek cih daye vê hunerê û seranserê dîwanê bi vê hunerê daye xemilandin. Ev jî qabilîyeta Aqtepî derdixîne holê; ji ber ku pêkanîna vê hunerê ne hêsan e.

##### 1.4.4.1 Cînasa Tam

Peyvên ku cînasê pêk tînin, ji hemû aliyên ve wek hev bin, Cînasa Tam derdikeve holê. Ev çar alî (taybetî) ev in:

1. Wekhevîya tîpên ku peyvê pêk tîne.
2. Wekhevîya rêza tîpan.
3. Wekhevîya hêjmara tîpan.
4. Wekhevîya xwendin û herekeyên tîpan.

Cînasa Tam di nav xwe de dibe du beş, ew jî: Cînasa Basît û Cînasa murekkeb e.<sup>80</sup> Em di dîwanê de tenê li rastî mînakên Cînasa Basît hatin.

##### 1.4.4.1.1 Cînasa Basît

Ew cûre cînas tenê ji peyveke pêk tê.<sup>81</sup> **Wek mînak:**

Zarîn dikim weqtê **seba**; bo şahide Mesken-**Seba**

Sed ehl û pansed merheba; ey derdê yarê mu'teber(r. 76)

Di vê mînakê de Cînas tenê ji peyveke pêk hatiye. Ew peyv jî "**Seba**"ye. Du wateyên "**Seba**"yê hene. Yek ji bo sibehê tê gotin, yek jî navê welatekî ye.

##### 1.4.4.2 Cînasa Netemam (Nîvco)

Beravajî Cînasa Tam e; di vê Cînasê de, ji her çar unsurên yek jê kê m be, Cînasa Nîvco derdikeve holê. **Wek mînak:**

Wellah nema cayê **sebir**, meksûr e dil nabî **cebîr**

<sup>79</sup>Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b.r. 100

<sup>80</sup>Kocakaplan, h.b.r. 24.

<sup>81</sup>Kocakaplan, h.b.r. 25.

Lîkîn ji bo “Rûhî” **debir**, e’s-sebrû mîftah’ul ferec (r. 58)  
Di navbera peyvên “**sebir, cebir û debir**” de Cînas heye.

#### 1.4.5 Tezad

Di beytek an risteyekê de, bikaranîna peyvên ji aliyê maneyê ve li dijî hev, hunera tezadê pêk tînin, hem dikarin maneya mecazî bin hem jî ya rastî.<sup>82</sup> Hin peyvên ku Aqtepi bi hunera tezadê pêk anîne, ev in: “**Spî û reş, şam û seher, roz û şeb, subh û mesa, ewwel û axir, germ û serd, best û şerh...**” wek **mînak**:

Fikrê min, ew qameta şîmşadî ye der-**roz û şeb**  
**Roz û şeb**; yeksan e, yek reng e ji bom in der-teleb  
Gûşê ber qewlê reqîban, kir hebîbê’m bêsebeb  
Min ji ber derdê firaqê, pare bû cerg û kezeb  
El-eman! Sed el-eman! Ey keckulahê rû bixal! (r. 87)

#### 1.4.6 Muqabele

Di îbareyekê de du an zêdetir peyv bên zikir kirin û piştî peyvên ji aliyê maneyê ve, muqabilî an jî li dijî van peyvên bên zikir kirin, ji vê hunerê re Muqabele tê gotin.<sup>83</sup> **Wek mînak**:

Ji nefxa sûrê **hîcranê**, dikim **feryad** û **efxanê**,  
Ketim deryaya nîranê, şukur dîsa ji baxwê ra (r. 39)

“Feryad û efxan” muqabilê peyva hîcranê ne.

Cumleê ‘alem, di **keyf û şahîyan** de, ser bilend  
Lê li ser min, berf û ba ye; **ah û kovan**, bêhîsab (r. 45)

Di vê mînakê de helbestvan di nîvmalika yekem de behsa keyf û şahîyê dike, di ya duyem de du peyvên li dijî wan yanî peyvên “ah û kovan” bikaranîye.

Bêumîd im, qelbê naçar im, di narê **fırqetê**  
**Roz û şeb** ez destê dîlber lew dikêşim hirqetê  
Nazika şêrîn, kirim mehrûm ji baxê **wesletê**

<sup>82</sup>Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b. r. 95.

<sup>83</sup>Saraç, h.b.r. 164.

Eşkê **germ** û ahê **serd im**<sup>84</sup>, nade min qet muhletê

Ah û sed efxan, ji hîcra dîlbera ala Fireng (r. 84)

Peyvên “Fîrquet û weslet”, “roz û şeb” û “germ û serd” ji aliyê maneyê ve li dijî hev in.

**Ah** û **nalên hesreta** min, **qeyd** û **bendê fîrqeta** min,

**Dax** û **derdê xurbeta** min, ket’ye cergînê di min (r. 138)

Di vê malikê de sê mînakên Muqabeleyê hene:

Peyvên “ah û nal” li dijî peyva hesretê ne.

Peyvên “qeyd û bend” muqabilî peyva fîrquetê ne.

Peyvên “Dax û derd” jî muqabilî peyva xurbetê ne.

---

<sup>84</sup> Ev ravek ji aliyê M. Emîn Hêvîdar ve wek “ahê ser dêm” hatibû nivîsîn, li gor tesbîtên me, ev ravek wiha ye: “ahê serd im” ji ber wê yekê me sererast kir.

### 1.4.7 Nîda'

Nîda' anku bangkirin, di edebîyatê de ku ji bo hestên wek dilgeşî, heyirîn, dilşewatî û hêrsbûnê were îfadekirin, bangkirin an jî berzkirina deng e.<sup>85</sup> Ev huner hem di nezmê de hem jî di pexşanê de gelekî tê bikaranîn; ji ber ku girêdayî maneya peyvê ye û di nav hunerên maneyê de tê hesabandin.<sup>86</sup> Aqtepi, di dîwana xwe de carna bangî Xwedê, carna jî bangî xwe dike. Wekî din, ji boyî ku vegotinê xurt bike, ev huner hatiye bikaranîn. Di dîwanê de, bi xêra van baneşanan hunera Nîda'yê çêbûye: “**ey, ah, ya, hey...**” Wek **mînak**:

Le'netê **Ya Reb!** Bidî ruhê Yezîd û tabi'an

Şubhetê le'na, Te daye canê Şeytanê merîd(r.68)

Di vê mînakê de, Aqtepi bi baneşana “**ya**”yê bangî Xwedê dike û dibêje: Ya Reb tu le'netê bidî ser ruhê Yezîd û ew kesên piştgiriya Yezîd kirine.

**Rûhîya!** Dêrdê zeban bibêje hemî şam û seher

Le'netullahî 'ela ruh'îl-Yezîdî fî'l-mezîd(r. 69)

Di vê mînakê de jî helbestvan rasterast bangî xwe dike. Wek ku me li jor jî gotibû “Rûhî” nasnava Aqtepi ye, “**Rûhîya**” jî “Ey Rûhî” ye. Dibêje: Ey Rûhî bi şev û rojan bibêje derdê ziman, lehmeta Xwedê li ser ruhê Yezîd zêde be.

### 1.4.8 Tenasub

Wateya peyvê “lêhatin, munasibî” ye. Bikaranîna peyvên -herî kêr du peyv- ku ji aliyê maneyê ve pêwendîyek di navbera wan de hebe –ji bilî yê dijwate-jê re Tenasub tê gotin. Di vê hunerê de, peyv bi awayekî tesedîfî nayên rêzkirin. Her çî qas ku ji aliyê maneyê ve pêwendîyek hebe jî û peyv bi awayekî tesedîfî hatibin rêzkirin, em nikarin bibêjin ku ev huner bi awayekî serkeftî hatiye bikaranîn.<sup>87</sup> Wek **mînak**:

Rûhîya! Bes bêje van şî'rê şewat ê pur-hezîn

Bo te digrîn **dar û ber, deşt û çiya, ax û turab** (r. 47)

Helbestvan xwestiye ku di navbera peyvên “**dar û ber, deşt û çiya, ax û turab**” de hunera Tenasubê pêk bîne; lewra, di navbera van peyvên de pêwendîyek heye.

<sup>85</sup> Pala, h.b. r. 358.

<sup>86</sup> Kocakaplan, h.b.r. 113.

<sup>87</sup> Kocakaplan h.b.r. 152.

Çare min nîn e, ji ‘îşqê; ey hebîba çaresaz!

Şu’leya hîcra te, bû narê cehîma cangudaz

Min bi weslî ke demek, şahê cîhan ê serfiraz!

**Bêney û qanûn û ‘ûd û bêribab û çeng û saz**

Dê ji efxanan vekim, bo te hezaran nexemat (r. 51)

Tenasub carna di navbera peyvên heman malbatê de jî çêdibe. Wek ku tê zanîn ku amûrên wek “ney, qanûn ‘ûd, ribab, çeng, saz” ji heman malbatê ne û pêwendîyek di navbera wan de heye, lewma em dikarin bibêjin ku di vê bendê de hunera Tenasubê heye.

#### 1.4.9 Tersî’

Di helbestekê de, peyvên ku malikên pêk tîne, ji aliyê hejmar, wezn û serwayê ve lihevhatî bin, jê re Tersî’ tê gotin.<sup>88</sup> Ev huner di helbestê de ahengekê derdixîne holê û bala xwendevanan dikişîne ser helbestê. Aqtepi jî di hin cihan de ev huner bi kar anîye.

**Şehîdê / çeşmê / cellad im, / hewadar im / bi bejnê ra**

**Di ‘ilmê / ‘îşqê, / neqqad im, / rîwayet kim / ji amê ra (r. 37)**

“Şe + hî + dê” û “di + ‘il + mê” = sê kite ne,

“çeş + mê” û “îş + qê” = du kite ne,

“cel + la + dim” û “neq + qa + dim” = sê kite ne,

“he + wa + da + rim” û “rî + wa + yet + kim” = çar kite ne,

“bi + bej + nê + ra” û “ji + a + mê + ra” = 4 kite ne.

Dîwan bi vê malikê destpê dike û bi hunera Tersî’ yê hatiye nivîsîn. Ev malik hem ji aliyê hejmarê ve, him ji aliyê serwayê ve, him jî ji aliyê weznê ve li hev hatiye û ji bo vê hunerê mîna ke gelek xurt e.

**Xoşa an / dil ki ez-‘îşqê cemalê to xeber dared**

**Zehî an / ten ki ba derdê xîyalê to eser dared (r. 63)**

Ev mînak jî bi hunera Tersî’ yê hatiye nivîsîn nîvmalikên wê li hev hatîne û ahengekê derxistiye holê. Ev huner û aheng qabiliyeta Aqtepi radixîne li ber çavan.

<sup>88</sup> Kocakaplan, h.b.r. 135.



Leb-gul û / gerden-gul û / xebxeb-gul û ruxs/ar e gul

Dêm-gul û / çehre-gul û/ ten-gul, ser a ser y/ar e gul(r. 93)

Di vê malikê de, peyva “gul”ê û qertafa “-ar e”, ji aliyê hejmar, serwa û weznê ve, lihevhatî ne û hunera Tersî’ê pêk anîye.

#### 1.4.10 Iştîqaq

Maneya wê ya ferhengî “jêzêdebûn” e. Dariştina peyv an jî peyvên, ji heman kokê ne ku bi şerteke ku di navbera wan de ji aliyê mane û terkîbê ve ferq hebe. Ji peyvên bi vî şiklî re peyvên “Muştâq” jî tê gotin. Wek: Zîkr, Zâkir, Mezkûr, Zulm, Zâlim, Mazlûm, Cebr, Îcbar, Mûcbîr, Cebbar, Şekl, Teşkil, Teşekkûl, Mûteşekkil, Kerem, Kerîm, Kirâm, Kerâmet. Di nesir an jî nezmê de ji bo xweşikbûna vegotinê bikaranîna peyvên Muştâq hunera Iştîqaqê dertîne holê.<sup>89</sup> **Wek mînak:**

Were, rûne li textê dil nezer de “**aşiqê** şeyda!

Ji ‘**işqê**, wek hîlal û ta û derzî, jê xeber naê (r. 166)

Di vê malikê de koka ‘**işq û “aşiq”** yek e.

Serfê beser, wechê hebîb; yekser di nêv ‘alem xerîb

Ey **wa’izê** gotin ‘ecîb; **we’za** xwe bigre muxteser (r. 77)

“**wa’iz û we’z**” ji heman kokê ne.

#### 1.4.11 Mubalexe

Mezinkirin an jî piçûkkirina buyereke ku girêdayî kelecane ye; yanî dema bûyerek an jî heyînek tesîrê li hişê mirovan dike, kelecaneke neasayî derdixîne holê, mirov jî bi tesîra vê kelecane bûyera mezîna an jî piçûktir dike.<sup>90</sup> Aqtepî di hin cihan de cih daye vê hunerê.

Leşkerê sultanê xem û wustan li ser dil, sef bi sef

Yafitem ez yumnê ‘işqê şahê xuban sed şeref

**Eşqê xûnê’ m şubhê Dicle, çû heta mulkê Necef**

<sup>89</sup> Külekçi, h.b.r. 251.

<sup>90</sup> Kocakaplan, h.b.r. 107.

‘Umrê bêyar, bûye zayî, canê şêrin, bû telef

Ah û sed efxan, ji hîcra dîlbera ala Fireng(r. 85)

Di mînaka jorîn de dibêje: Dilopa xwîna min wek çemê Dicleyê ye, diherike heta bajarê Necefê. Di vê nîvmalikê de, wek ku tê dîtin, hunera Mubalexeyê heye.

#### 1.4.12 Îstifham

Helbestvan, mijarên ku bersîva wan dizane, bi awayê pîrskirinê vebêje, ji vê hunerê re Îstifham tê gotin. Armanca helbestvan ne bersîvdayîna xwîneran e; loma, ji bo ku vegotinê bihêztir bike yan jî ji bo ku ev mijar bala xwendevanan bikişîne, ji vê hunerê sûd werdigire.<sup>91</sup> **Wek mînak:**

Naleê wa’eteşa, çû gûşê sukkanê felek

Halê mel’ûnan, çi bîtin ey gelo rojê we’îd? (r. 68)

#### 1.4.13 Alîterasyon

Di misrayên helbestekê de, dubarekirina tîpên bêdeng e.<sup>92</sup> **Wek mînak:**

Derd û birîn min, bê ‘eded; têk pare bûn, cerg û kebed

Heydad û bêdad û meded! M’ij ‘işqê pur xewf û xeter(r. 76)

#### 1.4.14 Asonans

Berevajî hunera Alîterasyonê ye; di vê hunerê de jî tîpên bideng tên dubarekirin. Bi gelemperî, her du huner bi hev re tên bikaranîn. **Wek mînak:**

Hem zenexdan gul; heme gul, sîne gul, ber gul tamam

Gûşîwarê zer, li ser gul û nîkhetê dildar e gul (94)

#### 1.4.15 Teşxîs

Bingehê vê hunerê ew e ku taybetîyên însanan bide heyînên din û wan bibihînin mirovan;yanî nebat an jî heyînên bêcan bi insanan bèn şibihandin, hunera teşxîsê derdixîne holê. Di teşxîsê de, heyîn tenê bi mirovan tên şibihandin û

---

<sup>91</sup> Kocakaplan, h.b.r. 79.

<sup>92</sup> Kocakaplan, h.b.r. 20.

taybetîyên mirovan hiltînin.<sup>93</sup> Di mînakên jêr de, “**girîn û mehzûn**” taybetîyên mirovan in; di Mînaka ewil de, **nebat û ax**; di ya duyem de jî **ajal** digirîn.

Rûhîya! Bes bêje van şî'rê şewat ê pur-hezîn

Bo te **digrîn** dar û ber, deşt û çiya, ax û turab (r. 47)

**Baz û kebk û teyr û heywan**, dê bibin **mehzûn û giryan**

Bişnewed er barê êşan; sewtê zarîne di min (r. 139)

#### 1.4.16 Qelb

Ji ber ku yek ji Hunerên Lefzê ye ku girêdayî hunera cînâsê ye, jê re Cinas-i Qelb, Tecnîs-i Qelb, Maqlûb tê gotin. Di helbestekê de, cihê tîpên peyvekê bê guherandin an jî bi van tîpan peyvên cuda bên çêkirin, ji vê hunerê re Qelb tê gotin.<sup>94</sup>

Ji **nefxa** sûrê hîcranê, dikim feryad û **efxanê**,

Ketim deryayê nîranê, şukur dîsa ji baxwê<sup>95</sup> ra

Di vê malikê de cihê tîpên peyva **nefxayê** hatiye guhertin û peyveke nuh derketiye holê. Ew jî peyva “**efxan**” e.

#### 1.4.17 Mulemme'

Misrayên helbestekê yan jî beşekî wê bi zimanên cuda bên nivîsîn, hunera Telmî'ê derdikeve holê.<sup>96</sup> **Wek mînak:**

Zî-leffê zulfê şebreng î, li dêmê hemçu meh yara

**Nemîbaşed sebûrî û şekîbayê dilê ma ra**

**Le qed edremtî mîn cemrî'l-xudûdffî'l-heşa nara**

Di mulkê dîlberê da, padişahê mulkê me'mûr î

Di benda jor de herdu misrayên ewil, Farisî ne, ya sêyem Erebi ye ya dawî jî Kurdî ye.

<sup>93</sup> Kocakaplan, h.b.r. 176-177.

<sup>94</sup> Külekçi, h.b.r. 273.

<sup>95</sup> Ev peyv hat sererastkirin. M. Emîn Hêvîdar wek “ba Xudê” nivîsandibû lê divê wiha bê nivîsandin. Baxwê, tê wateya serokê gund û êlê, Mîr. Mebest jê Xweda ye. Bo zêdetir agahî, bnr. Mela Ebdusselam Cizîrî, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, Amadekar: Tehsîn Îbrahîm Doskî, Werger ji Erebi: Jan Dost, Weşanên Dara, Diyarbakir Avrêl 2018, r. 101

<sup>96</sup> Kocakaplan, h.b.r. 147.

**Fe lemma en reeytû'l-qedde mîsl'el-banî yenqadû**

**We lehz'ul-'eynî ke'd-dirxamî lî'l-'uşşaqî yestadû**

**Tesellemtû îlel qetlî lî enne's-sebbe ye'tadû**

Bikuj ‘aşîq bi van nazan, di rojê heşrê mexfûrî (r. 149-150)

Di vê bendê de jî hersê misrayên ewil Erebi ne ya dawî jî Kurdî ye.

#### **1.4.18 Irsal-i Mesel (Irad-i Mesel)**

Ji boyî îspatkirin û xurtkirina ramanekê yan jî ji bo ew raman bi bandor be, di vegotina devkî û nivîskî de -nemaze di helbestê de-, helbestvan gotinên pêşîyan û biwêjan bi kar bîne, ji vê hunerê re Irsal-i Mesel tê gotin.<sup>97</sup> Ev Gotinên Pêşîyan û Biwêjên tîkî bîkaranîn, dibe ku Farisî, ‘Erebî bin an jî gotinên navdar bin.<sup>98</sup>

Seh ke emsalê ‘‘Ereb: **“Derbu'l-hebîbî, ke'z-zebîb”**<sup>99</sup>

‘Îbret bigre ji perwanê, mekêşe xefletê (r.165)

#### **1.4.19 Teraduf (Sînonîm)**

Du an zêdetir peyvên bi heman maneyê an jî maneyên wan nêzê hev li dû hev bîkî rêzkirin, jê re Teraduf tê gotin.<sup>100</sup>

Yexma kirin, Rom û Hebeş; **bîmar** û mecrûh û **nexweş**

Mam di bendeê xalê di reş; hetta demê heşr û neşer (r.77)

Ahuyê wehşî; me, dam lêda ji nêva **qelb û dil**

Min nizanî murxê canê min bi kakul bit ‘îqal (r.107)

#### **1.4.20 Tezmîn**

Helbestvanekî di helbesta xwe de perçeyek ji şî'ra helbestvanekî din bi kar bîne, ji vê hunerê re Tazmîn tê gotin. Divê helbestvanê ku perçeyek ji şî'ra wî hatiye hilanîn navdar be, heger navdar nebe, divê helbestvan di nav helbesta xwe de navê

<sup>97</sup> Macit- Soldan, h.b.r. 99.

<sup>98</sup> Kûlekçi, h.b.r. 46.

<sup>99</sup> Tehde û lêdanên yarê, ji aşîq ra wek mewjê ye. Yanî xweş e.

<sup>100</sup> Zeki A. Elbaghdadi, Eş Anlamlılık Olgusu ve Eş Anlamli Kelimelerin Arapça Öğretimindeki Yeri, *KSÜ İlahiyat Dergisi* 19 (2012), r. 144.

wî helbestvanî jî bi kar bîne.<sup>101</sup> Aqtepî jî di hin cihan de ji helbestên Melayê Cizîrî sûd werigitiye. Ji ber ku Melayê Cizîrî kesekî navdar e, Aqtepî navê wî bi kar neanîye. Em ê du mînakên ji dîwanê tev li malikên Cizîrî jî, li jêr binivîsin:

### **Mînak 1**

#### **Aqtepî**

Şahîdê şîrîn şemail, hate bezma bêdilan  
Şerbeta xemra ‘eqîqî, dûrî bû nêv bulbulan  
Zulfê muşkîn dan; du sed te’ne li nesrîn û gulan  
Îd û newroz in li min da çerxê etles xulxulan  
Serfiraz im vê demê **nîşan hinarin hem xelat** (r. 49)

#### **Cizîrî**

Qasid bi meqşûda me hat, ba mujde û emr û berat  
**Nîşan hinarin hem xelat**, şehzadeya gulgûn qeba

### **Mînak 2**

#### **Aqtepî**

Sebr û saman, bûn mubeddil; hub li min zehr û helahîl  
**Şubhê murxê nîmê bismil**, qelbê xemgîn ê di min (r. 141)

#### **Cizîrî**

Bi dama muhbetê bend im xedenga firqetê dil nuht  
Bi **şubhê murxê nîmbismil** di hev wertêm di xûnê da

### **1.4.21 Redd’ul- Acuz Ale’s-Sadr**

Wek hunera Iadeyê ye. Di Iadeyê de, heman peyvên ku li dawîya malika pêşîyê, di serê malika din de tînen dubarekirin. Di vê hunerê de jî peyva li serê malik an hevokê, di dawîya malik an hevokê de tînen dubarekirin.<sup>102</sup>

J’**îzdîhamê** zulf û perçem, ber ruxê bedre munîr

Her nefes, ber dil dikêşin, leşkerê xem, **îzdîham** (r. 110)

<sup>101</sup> Saraç, h.b.r. 280.

<sup>102</sup> Kocakaplan, h.b.r. 116.

**Bi qurban** perçem û gîsû û xalan!  
Digel wan awur û çeşmê xezalan,  
Te ez kuştim bi van naz û delalan,  
Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban bim, **bi qurban!**(r. 130)

#### 1.4.22 ‘Îade

Heger peyva dawîya malikê di serê malika din de were dubarekirin, ji vê hunerê re Îade tê gotin.<sup>103</sup> Di Îadê û Redd’ul-Acuz Ale’s-Sadr’ de, peyvên ku tê dubarekirin dibe ku bi daçek bin. Daçek jî ji bo vê hunerê ne pirsgirêk in. Carna peyvên ku tên dubarekirin ne wek hev in, lê ji heman kokê ne yan jî nêzî hev in.<sup>104</sup> Ev yek jî tê wê wateyê ku peyvên hunera Îştîqaqê jî ji bo vê hunerê dikarin wek mînak werin bikaranîn. **Wek mînak:**

Cîhan pur bû, ji efxanê, ji ber husna şekerxaê,  
Mûtî’ in em di fermanê, ji ber hukmê te **padşahê**

**Hukumdar** esweda şehla, li pîr û berne û kehla  
Dikêşim ah û waweyla, ji hîcrê mahî-sîmaê (r. 157)

Her çi qas ku **Padişah û Hukumdar** cuda jî hatibin nivîsîn, ji aliyê maneyê ve wek hev in.

Hebîba nazîdara min, zerîf û şeng û yara min  
Qewî şêrîn nîgara min, temenna ye **di ‘uqbaê!**

**Di ‘uqbaê** wekî rabim, bi didara te ez şa bim  
Wekî Mecnûnê Leyla bim, ji sewdaya te Leylaê (r. 158)

Ji dil, daxwaza yarê me, qewî mexmûrê bade me  
Murîdê saz û camê me, bi îxlas û **temennaê**

**Temenna** nergise mexmûr, şeraba cewhera engûr  
Dil û canê me, kir rencûr kirim yexsîrê sewdaê (r.161)

<sup>103</sup>Küleççi, h.b.r. 289.

<sup>104</sup>Saraç, h.b.r. 263.

#### 1.4.23 ‘Eks / Tard-û ‘Eks / ‘Eks û Tebdîl

Jê re, Tard û ‘Eks, ‘Eks û Tebdîl jî tê gotin. Bi berovajîkirina misrayekê û ji vê misrayê misrayeke nû lê bi heman wateyê bê çêkirin, jê re ‘Eks tê gotin. Pêwîstîya vê hunerê bi zîrekî û qabiliyet heye. Dema ku xweşik bê rêzêkirin, vegotinê xurttir dike. Du cûreyên wê hene: ‘Eksa Tam û ‘Eksa Nîvco.<sup>105</sup> Em di dîwanê de tenê rastî ‘Eksa nîvco hatin. Aqtepî di mijara ‘Eksa Nîvco de gelek serkeftî ye û gelek sûd jê wergirtiye. **Wek mînak:**

Şehîdê çeşmê cellad im, hewadar im bi bejnê ra,  
Di ‘ilmê ‘îşqê neqqad im, **rîwayet kim ji ‘amê ra**

**Ji her kes ra, rîwayet kim;** hemî xelqan hîdayet kim  
Nikatan e dirayet kim; müheyya me ji dersê ra (r. 37)

Di fecr û zuhr û êvaran, dikim feryad û hawaran  
Qewî dûr im, ji nazdaran, **birîndar im ji hîcrê ra**

**Ji hîcra te birîndar im;** hezîn û dilkul û jar im  
Serapa, cemre wek nar im; bi telef bû ruh û can pê ra (r. 38)

#### 1.4.24 Tewrîye (Îham)

Peyveke ku zêdetirî maneyeke li xwe digire lê ji alîyê helbestvan ve ne di maneya wê ya ji alîyê her kesî ve naskirî – Muwerrî-î Bîh- , maneya wê ya din ya dûr – Muwerrî-î Anh- de hatibe bikaranîn, jê re tewrîye tê gotin.<sup>106</sup> **Wek mînak:**

Çare min nîn e, ji ‘îşqê; ey hebîba çaresaz!  
Şu’leya hîcra te, bû narê cehîma cangudaz  
Min bi weslî ke demek, şahê cîhan ê serfiraz!  
**Bêney û qanûn û ‘ûd û, bêribab û çeng û saz**  
Dê ji efxanan vekim, bo te hezaran nexemat (r. 51)

<sup>105</sup> Kocakaplan, h.b.r. 18.

<sup>106</sup> Kûlekçi, h.b.r. 95.

Nexme min têtin ji dil, reng rengê mislê **mûsîqar**  
Her sehergahan, ji min têtin ah û efxan sed hezar  
Şêt û şeyda me, eman aware ez yar û dîyar  
Ger binoşim ez ji le'lan, badeê şêrin û guwar  
Heqq e ew xweştir ji cennet ez qusûr û 'alîyat(r. 52)

Du wateyên **mûsîqarê** hene; yek, navê **amûreke muzîkê** ye, a din jî navê **çivîkekê** ye. Aqtepi, di benda ewil de navê amûrên muzîkê dihejmêre û dûre peyva mûsîqarê bi kar tîne. Dema ku em li bendê dinihêrin, em dibêjin ku qey behsa amûreke muzîkê dike, lê Aqtepi delîlek bo xwîneran hiştiye ku xwîner lê derxin, mûsîqar di maneya amûrê de nehatiye bikaranîn. Ew delil jî peyva “**Sehergahan**” e. **Sehergah**, tê maneya serê sibê. Wek ku tê zanîn, çivîk herî zêde serê sibehan dixwînin. Loma, em ji vê peyvê fehm dikin ku helbestvan “Mûsîqar” di maneya “çivîkê” de bi kar anîye.

#### 1.4.25 Îstixdam / Sarfû'l- Hizâne

Peyveke ku bi zêdetirî maneyekê di beytekê de bê bikaranîn, jê re Îstixdam tê gotin. Yanî ji bo her peyvê remzek cuda heye.<sup>107</sup> Bi vê hunerê, helbestvan di beyt an malikan de, maneyên din bi awayekî aşkera rasterast li ber çavan radixîne.<sup>108</sup> **Wek mînak:**

“Len tenalu'l bîrre, hetta tunfiqû bişnew bi **can**

**Can**, nîsarê xakî-payê yarê ke, bê muhletê (r.165)

Di vê mînakê de, “can”a di nîvmalika ewil de bi awayekî mecazî hatiye bikaranîn; ew jî maneya “baş bala xwe bide, baş guhdarî bike” dide. Di ya din de, bi maneya “ruh, can” hatiye bikaranîn.

#### 1.4.26 Husnu –I Te'lîl (Şîroveya Xweşik)

Ji bo xweşikkirina vegotinê; sedema qewimîna bûyerekê, ji eslê wê cuda, bi sedemeke din ve bê girêdan, ji vê hunerê re, **Husnu –I Te'lîl** tê gotin.<sup>109</sup>

Rihan û lale û qetmer û zibad û mawer û 'enber

**Ji rengê bûyê te yekser, 'ezîz in ew ji xelqê ra** (r. 40)

<sup>107</sup> Kûlekçi, h.b.r. 102.

<sup>108</sup> Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b.r. 92.

<sup>109</sup> Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b.r. 94.



Di vê malikê de, helbestvan xweşîkbûn û bêhnxweşîya **rihan û lale û qetmer** û bêhnên din bi yarê ve girê dide; yanî ji ber ku ji rengê yarê ne, ewqas xweşîk, bêhnxweş in, loma li ber dilê însanan bi qîmet in.

#### 1.4.27 Tecrîd

Di vê hunerê de, helbestvan xwe dike di şûna kesekî din de, xwe wek kesekî Mûcerred dihesibîne û bangî xwe dike.<sup>110</sup> Ev yek jî bêtir di malikên mexlesê de derbas dibe.<sup>111</sup> **Wek mînak:**

**Rûhîya!** Bes bêje van şî'rê şewat ê pur-hezîn

Bo te digrîn dar û ber, deşt û çiya, ax û turab (r. 47)

Çunkî ev dîlber, gulê cur in di gulzarê cemal

**Rûhîya!** Wek bulbulan herdem bibe efxanîkeş(r. 80)

Wesfê derdê 'îşqê dîlber, çun mufessel nabitin

**Rûhîya!** Mucmel te go; lîkîn bike teyyê meqal (r. 107)

**Rûhîya!** Ta key şikayet kî ji cewra dîlberê

Muxteser bibêje evî derdê mutewwel, we's selam! (r. 113)

#### 1.4.28 İltîfat

Di helbest an jî pexşanekê de, dema ku helbesvan kesê yekem, duyem an jî sêyem bi kar tîne û ji nişka ve derbasî kesekî din bibe, ji vê hunerê re **İltîfat** tê gotin.<sup>112</sup> Yanî, heger helbesvan di malikekê de bi kesê yekem re biaxive û ji nişka ve derbasî kesê duyem an jî sêyem bibe, ev huner dertê holê. Ev huner girêdayî kelecane ye; dema ku bûyer an helbest tên vegotin, ji ber bandora kelecane ev huner dertê holê.<sup>113</sup> **Wek mînak:**

Xûnê xakê Kerbela, her dem **dikim** fikr û xiyal

Lew bi xûnê dil, nivîsandin **me** ebyat û qesîd

---

<sup>110</sup> Kûlekçi, h.b.r. 185.

<sup>111</sup> Pala, h.b.r. 445.

<sup>112</sup> Saraç, h.b.r. 204.

<sup>113</sup> Kocakaplan, h.b.r. 60.

Di misraya ewil de kesê yekem e, di ya duyem de kesê sêyem.

Şû'ledar **im**, ser te ser ateş dibarit ji **min** ah  
Bê, du ebrûyê hîlal **im**; dil **me** bû kûyê zexal (r. 105)

Di vê mînakê de, helbestvan behsa xwe dîke û bi kesê yekem re diaxive, ji nişkê ve derbasî kesê sêyem dibe. Dil li helbestvan yan li wan bûye kûyê zexal?

#### 1.4.29 Irsad / Teshîm

Dema ku helbestvan di malîkekê de bi rêya serwayê, di pexşanekê de jî bi rêya secî'ê, xelasbûna gotinê bi xwendavan bide hîskirin, jê re **Irsad** tê gotin. Helbestvan di misreya ewil de -an jî dawîya hevokê de- gotinên wisa bi kar tîne ku ji alîyê xwîner ve dawîya misrayê tê texmînkirin. Ev huner çawan ku bi rêya serwayê tê çêkirin, her wiha bi rêya maneyê jî dikare bê çekirin.<sup>114</sup>

Kirim yexsîr û napeyda; cunûn û waleh û şeyda  
Verestim ez ji nêv qeyda; wekî **Mecnûn bi çolê ra**(r.39)

Di misreya ewil de, helbestvan peyvên wek “cunun, waleh û şeyda” her wiha dibêje: “Kirim yexsîr û napeyda”. Dema ku em misreya ewil dixwînin, em texmîn dikin ku yê behsa Mecnûn û çolê bike; çunkî ev taybetîyên Mecnûn in, Mecnûn jî ji ber eşqê dîn bûye.

#### 1.4.30 Tecahula ‘Arif

Tiştê ku helbestvan di rastîyê de pê dizane lê bi rêya hin peyaman bi xwîneran bide dîyarkirin ku ew pê nizane yan jê bi wî awayî tev bigere, jê re Tecahula ‘Arif tê gotin. Du cûre Tecahula ‘Arif hene: Yek bi bandora kelecane bi awayê pîrskirinê ye, a din jî fikreke ku bi mebesteke wek bersîvdayina pîrsekê bê çêkirin.<sup>115</sup> **Wek mînak:**

Dîn û dil, yekser ji min bir van şêrînan bêfutûr  
**Ey gelo qatî’ terîq in, ev perî rû ya keleş ?** (r. 80)

<sup>114</sup> Kocakaplan, h.b.r. 62-63.

<sup>115</sup> Kocakaplan, h.b.r. 139.

Di vê malikê de, helbestvan bersîva vê pirsê dizane, lê ji bo ku vegotin xurt bibe wek ku nizanibe tev digere.

#### **1.4.31 Tefrîq**

Ji du unsurên, yek di ser ya din re be û di navbera wan de ferq hebe lê ji aliyê helbestvan ve bê nîşankirin ku ne wek hev in, jê re Tefrîq tê gotin.<sup>116</sup> Di vê hunerê de, berawirdkirin heye. **Wek mînak:**

Bêne cunbuş, ger digel badê seba, zulfê du ta  
Mîskê ezfer, ‘enberê sara, qewî erzan dîkin (r. 136)

Ji aliyê her kesî ve tê zanîn ku bêhna misk û enberê pir xweş e, lê helbestvan dibêje heger ku du tayên zulfên yarê di gel badê seba li hev bikevin; yanî bêhna yarê belav bibe wê bêhna misk û ‘enberê pir erzan (bêqîmet) bibe. Welê xuya dike ku helbestvan zulfên yarê û misk û enberê berawird dike û bêhna pora yarê di ser misk û enberê re dibîne.

#### **1.4.32 Tenkîku’s-Sifet (Wesfandina Domdar)**

Maneya wê ya ferhengî, rêzkirina wesfên heyînekê ye. Wek têgeheke Belaxetê; di helbest an jî peşanekê de sifetên şexs an jî yên tiştêkî li dû hev bîr rêzkirin û wesfandin, jê re Tenkîku’s-Sifet tê gotin. Di vê hunerê de divê malik ji aliyê serwayê ve li gorî hev bin. Ev wesf dikarin xeyalî yan jî rastîn bin jî; yanî ev wesf dikarin di rastîyê de ne sifetên wî şexsî an tiştî bin, dibe ku helbestvan li gorî xeyala xwe wesifandibin.<sup>117</sup> **Wek mînak:**

**Şîrê Yezdanê Kerîmî Heyderê Kerrarê sef**  
**Canişînî Fexrê ‘Alem, Şahê ewreng ê Necef**  
Ber zeban ranem, hemîn misraê peyda û bexef  
**La feta îlla ‘Elî, la seyfe îlla Zu’l-feqar**

**Şahê Merdan, Şîrê Yezdan; Îbnu ‘emmê Mustefa**  
Rehberê rahê heqîqet, ustê Sultanê Huda

<sup>116</sup> Kocakaplan, h.b.r. 145: Saraç, h.b.r. 176.

<sup>117</sup> Saraç, h.b.r. 185.

Fikr û efkarim hemîn bes ya ‘Elîyy’ul-Murteza!

**La feta îlla ‘Elî, la seyfe îlla Zu’l-feqar!** ((r. 71-72)

Ev sifet di rastîyê de jî ji bo Hz. ‘Elî (s.l) hatine bikaranîn.

**Şehriyarê mesnedê Lewlak î, Şahê Enbîya!**

Ya Resûlellah dexîl im! Ya Hebîbellah dexîl!

**Qabê qewseyn paye-et, ser xeylê cem’ê esfîya**

Ya Ebe’l- Qasim dexîl im! Ya Ebe’l-Zehra dexîl! (r. 96)

Di vê mînakê de jî wesfên Hz. Pêxember (s.x.l), li dû hev hatine rêzkirin.

**Şehriyarê textê seddîq î, Şehê ‘alîcenab**

**Feth û nesret hem ‘înan îqbal û dewlet der rîkab**

**Gewherê tacê serê têk ewlîya bêirtîyab**

‘Asiyane rû be-dergahê tok erdem rûmet-ab

El-eman, şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me!(r. 143-144 )

Aqtepî, Behaiddînê Pîrê Terîqeta Neqşîbendiyê li gorî xwe wesifandiye.

### **1.4.33 Teşabîhu’l Etraf**

Heger helbestvan di destpêkê de behsa fikirekê bîne ziman û di dawîyê de jî bi fikireke munasibê wê biqedîne, ji vê hunerê re Teşabîhu’l Etraf tê gotin.<sup>118</sup> **Wek mînak:**

Ey dil sebir ke ber-fîraq; e’s-sebrû mîftah’ul- ferec

Çendî bikêşî îhtîraq; e’s-sebrû mîftah’ul- ferec(r. 55)

Di destpêka vê malikê de helbestvan behsa sebirê dike û di dawîyê de jî bi fikireke li gorî wê daye qedandin.

Dilberê gulbun, çu gul hîna vebe der ‘alemê

Ewwel û axir, gul e;‘alem hemî, gulzar e gul(r. 95)

<sup>118</sup> Saraç, h.b.r. 160.

Di vê malikê de jî di destpêkê de behsa gulê (yar) tê kirin, di dawîyê de jî li gorî wê diqede. Ev helbest di dîwanê de di rêza 14an de ye û ev helbest bi tevayî ji bo vê hunerê dibe mînak.

#### 1.4.34 Muwazene

Ev huner girêdayî hevşibîha weznê ye. Di pexşanekê û helbestekê de peyvên fasilayê yanî peyvên dawîya misrayan û hevokan tê ger ji aliyê weznê ve wek hev bin, ev huner derkeve holê. Di vê hunerê de heman deng nayê dubare kirin tenê ji aliyê weznê ve yanî hêjmara kîteyan wek hev in.<sup>119</sup> **Wek mînak:**

Hifreê nîranê, ye'nî got û ber gorê **xebîs**

Pur bikî ya Reb, ji narê zat ê lehbîn we **weqîd!** (r. 68)

Peyvên “xebîs û weqîd” di nav xwe de ne bi serwa ne, lê ji aliyê weznê ve wek hev in yanî herdu jî du kîte ne.

Jan didit dil, cîger sota, li min sîne û **hinav**

Cumle e'za, derdînar in; têk kebab in ey **heval!** (r.104)

Peyvên “Hinav û heval” ne bi serwa ne lê herdu jî du kîte ne.

#### 1.4.35 Tesmît

Ger xezel an jî qesîde bi terza masammatê de bên nivîsandin, ji vê hunerê re tesmît tê gotin.<sup>120</sup> Yanî di vê hunerê de nava misrayên malikên piştî matlayê tên û dawîya misraya ewil ya malika piştî matlayê di nav xwe de bi serwa ne. Dawîya misraya duyem jî girêdayî matlayê ye.<sup>121</sup> Ji vê hunerê re qabiliyet divê ji ber ku rêzkirina van peyvên bi serwa, karekî hêsan nîne. Dema em li dîwanê dinihêrin, em dibînin ku Aqtepî xezelên xwe bi gelemperî bi vê hunerê nivîsîne, ev jî bi me dide zanîn ku Aqtepî di vî warî de gelek serkeftî ye. **Wek mînak:**

Bi çeşmê reş **îşaret kir**, li min mujde'w **bişaret kir**

Welê teyyê **îbaret kir**, nîşan dame ji xelwê ra (r. 39)

<sup>119</sup> Saraç, h.b.r. 258: 113.

<sup>120</sup> Tahir-ül, Mevlevî, *Edebiyat Lügati*, Enderun Kitabevi, İstanbul, 1994, r. 168.

<sup>121</sup> Bnr. Beşa Teşeyên Nezmê, Xezela Musammat.

Her dem li min dil **çakîçak**; dûdê cîger çû ta **semak**,  
Sotim di ahê **derdînak**; e's-sebrû mîftah'ul-ferec (r. 57)

Qelbî, nalan û **hezîn e**; b'ah û feryad û **girîn e**  
Rehm û lutfek lê **tunîn e**; horî-narînê di min (r. 141)  
Menî' kir wesleta **yarê**, şepal û şox û **nazdarê**  
Ji ber sewda û **ezkarê**, rewanê'm kefte xewxaê (r. 159)

#### **1.4.36 Leff û Neşr**

Bi gelemperî di malikekê de, di misraya ewil de herî kêr du peyv bên gotin, di pişt re, di misraya duyem de peyvên hevşibîyên van an jî peyvên ku bi wan re têkildar bên gotin, ji vê hunerê de Leff û Neşr tê gotin. Ev huner di nav xwe de dibe du beş:<sup>122</sup>

##### **1.4.36.1 Leff û Neşra Muretteb / Leff û Neşra bi Rêkûpêk**

Peyv an jî tiştên ku di misraya ewil de tên gotin, peyvên beranberî wan bi awayekî rêkûpêk di misraya duyem de bên rêz kirin, ev dibe Leff û Neşra muretteb yanî bi rêkûpêk.<sup>123</sup> **Wek mînak:**

Bêne cunbuş, ger digel **badê seba, zulfê** du ta  
**Mîskê ezfer, 'enberê sara**, qewî erzan dikin (r. 136)

Di vê mînakê de pêwendiyek di navbera peyvên “Badê Seba û Mîskê ezfer” û “zulf û ‘enberê sara” de heye. Ji ber ku Badê Seba her tim bêhna yarê yanî bêhna mîskê ji ‘aşiq re tîne û dîsa ji ji ber ku yarê bêhna ‘enberê ji zulfên yarê tê pêwendiyek di navbera van peyvên de heye.

##### **Weqtê qîyama sa'etê; bêwerdê baxê wusletê**

Wellahî naçim **cennetê**; nadim li **Fîrdewsê** nezer(r. 77)

Di vê malikê de jî “weqtê saeta qiyamê” girêdayî peyva “cennet”ê ye. “Baxê wesletê” baxçeyê hevdişinê jî girêdayî “Firdews”ê ye.

<sup>122</sup> Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b.r. 97; Saraç, h.b.r. 179.

<sup>123</sup> Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b.r. 98.

#### 1.4.36.2 Leff û Neşra Muşewweş / Leff û Neşra Bêtertîb

Peyv an jî tiştên ku di misraya ewil de tîn gotin, peyvên beranberî wan bi awayekî bê tertîb an jî tevlîhev di misraya duyem de bîn gotin, ji vê cureyê re jî Leff û Neşra Muşewweş yanî bê tertîb tî gotin.<sup>124</sup> **Wek mînak:**

Xedenga **fîrquetê** da dil, dinalim şubhetê **bulbul**

Ji hîcra xunçeya **sorgul**, dikêşim **cewr û zîbaê** (r. 158)

“Fîrquet = cewr” an jî “Xedenga fîrquetê da dil = dikêşim cewr û zîbaê”

“Bulbul = Sorgul” an jî em dikarin wiha jî bêjin: “ji hîcra xunçeya sorgul = dinalim şubhetê bulbul”

Di misraya duyem de peyvên beranberî fîrquet û bulbulê, bi awayekî bê tertîb hatine bikaranîn. ewil peyva cewr paşê sorgul bihate gotin wê demê; ew dibû leff û Neşra Muretteb lê di misraya duyem de peyvan cih guhertine.

#### 1.4.37 Sihra Helal

Di nava malikan de peyv an jî komepeyvên ku hem di dawiya misraya ewil hem jî destpêka misraya duyem de bikaribin bîn bikaranîn, ji vê hunerê re sihra Helal tî gotin.<sup>125</sup>

Nexme min tîtin ji dil, reng rengê **mislê mûsîqar**

(**mislê mûsîqar**) Her sehergahan, ji min tîtin ah û efxan sed hezar

Şêt û şeyda me, eman aware ez yar û dîyar

Ger binoşim ez ji le’lan, badeê şêrin û guwar

Heqq e ew xweştir ji cennet ez qusûr û ‘alîyat(r. 52)

Di vê mînakê de “ mislê musîqar” hem li dawiya misraya yekem hem jî li destpêka misraya duyem tî.

<sup>124</sup> Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b.r. 98.

<sup>125</sup> Kûlekçi, h.b.r. 246.

### 1.4.38 Rucû'

Di vê hunerê de ji bo vegotin xurt bibe, fikra ku ewil hatiye gotin, paş ve tê kişandin. Helbestvan ji gotina xwe dizivire, tiştê ku ewil gotî betal dike. Di vê hunerê de mebesta helbestvan xurtkirina û balkiştandina fikra ku ewil gotiye. Ji bo vê jî bi peyvên nû ev fikr û gotin tên xurtkirin. Peyvên wek “ na, na na, ne wisa ye, na ne wisa ye, min xelet got” tên bikaranîn.<sup>126</sup> **Wek mînak:**

Rehrew im ez, rahê min dûr e: xerîb im, bê weten  
Zêde **berfê**, da li cergê min, du sed tîr û nîşab

Dil, hemik nakit: firaqa dîlbera nazik-beden  
Lê, çi kim **berfek** ‘ecayîb kefte, rê bûye hîcab

**Qesda dilê min ne berf e**, lê ji destê firqetê

Berf û bapûkê, dikim me’na: ku şêrîn bit xîtab (r. 46-47)

Di vê mînakê de helbestvan gotina xwe ya ku ewil behs kiriye, vegeziyaye û ew bi xwe mebesta xwe aşkere dike dibêje ji bo gotinên min şêrîn bin min wiha got.

### 1.4.39 Telmîh

Di nava gotinê de îşaret bi bûyereke kevin, çîrokên navdar, efsaneyan, şexsekî, hin baweriyên, ayetan an jî hedîseyan bê kirin, ji vê hunerê re Telmîh tê gotin. Ev huner jî girêdayî kelecane ye. Ev kelecane tişteke din tîne bîra helbestvan. Di navbera tiştê ku dibe sedema kelecaniya helbestvan û ew tiştê ku tîne bîra wî de şibhandin heye. Di Telmîhê de helbestvan gotina ku dixwaze bêje an jî bi rêya Teşbîha Xeyalî bi fikreke din û bi xeyalî vedibêje.<sup>127</sup> Helbestvan, di mînaka jêr de gotinên “Narê Nemrûdî” û “Baxê Ne’îm” hem ji bo rewşa di navbera ‘aşiq û Me’şûq te bîne ziman bikaraniye hem jî xwestiye ku bûyera Hz. Îbrahîm (s.l) bîne bîra xwîneran:

<sup>126</sup> Kûlekçi, h.b.r. 174.

<sup>127</sup> Kûlekçi, h.b.r. 197.



Bes tezellum ke ji destê firqetê pur derd û xem  
 Ateşek berda dilê min, te'j kalamê ba-elem  
 Weqtê şefqet kim; li te, zulfan vekim şubhê 'elem  
**Narê Nemrûdî bikim** ser te wekî **baxê ne'îm**(r. 116)

#### 1.4.40 Pirs û Bersîv

Ger di malikekê de hem pirs hem jî bersîv hebe ev huner derdikeve holê. Di dîwanê de gelek malik bi vî awayî hatine nivîsîn. **Wek mînak:**

Mîslê bulbul, bêhîşê yarê gul-endam im çira?  
 Çunkî; gîsû, helqedar in, perçemê 'eyyar e gul(r. 94)

Bulbulê sadiq, heqîqet sinfê 'uşşaq in çira?  
 Der buhar û der xezan, seyf û şîta; efxan dîkin. (r. 136)

#### 1.4.41 Tarîx

Dema ku peyvek, hevokê, malikek an jî misrayeke ku ji bo tarîxa bûyerekê bide nişandan li gor -beranberî her herfê hêjmarek- sîstema ebcedê bê hesab kirin, ji vî hunerê re Tarîxdanîn tê gotin.<sup>128</sup>

(Kelemen)				(Huttî)			(Hewwez)				(Ebced)			
ن	م	ل	ك	ى	ط	ح	ز	و	ه	د	ج	ب	ا	
50	40	30	20	10	9	8	7	6	5	4	3	2	1	
(Dazux)				(Sexiz)			(Qereşet)				(Se'fes)			
غ	ظ	ض		ذ	خ	ث	ت	ش	ر	ق	ص	ف	ع	س
1000	90	800		70	60	50	40	30	20	10	90	8	7	6

Di dîwanê de tenê di bendekê de ev huner hatiye bikaranîn. ew jî ji bo aşkerekirina tarîxa nivîsandina dîwanê ye.

Ji şewqa nûn û sad û mîm, ji **xeyn û ra û sad û cîm**,  
 Min ev beyta kirî tenzîm, kirî peşkeşe Mewlaê (r. 162)  
 Xeyn: 1000  
 Ra: 200  
 Sad: 90  
 Cîm: 3

<sup>128</sup> Saraç, h.b.r. 300.

Li gor hesabê Ebcedê dîwan di sala 1293ê mişextî de hatiye nivîsandin. Ev jî teqabulî sala 1876ê mîladî dîke.



## BEŞA DUYEM

### VEKOLÎNA DÎWANÊ JI ALİYÊ TEŞEYÊ VE

#### 2.1 TERTÎB Ê DANASÎNA GIŞTÎ YA DÎWANÊ

Di edebîyatê de, deftera ku şair helbestên xwe bi birêkûpêkî tê de dide komkirin, jê re “Dîwan” tê gotin. Bikaranîna vê peyvê ya herî taybet û belavbûyî, bi vî rengî ye:

“Di edebîyatên Îslamî de, helbestvanên helbestên xwe li gorî metoda edebîyata klasîk nivîsandî û bi birêkûpêkî di kovar û kitêban de berhevkirî.” Dîwanên ku helbestvan helbestên xwe tê de li gorî tertîbekê û birêkûpêk berhevkirî, jê re “Dîwana Muretteb” tê gotin, ev tertîb an jî rêzkirin, carna ji aliyê helbestvan bi xwe ve carna jî piştî mirina wan ji aliyê hin kesên din ve tê tertîbkirin. Di dîwaneke Muretteb de, helbest bi vî şikilî tê rêzkirin: “Qesîde, tarix, Musemmet (Terkîb-i bend, Murebbe’, Texmîs, hwd.), Xezel, Kita.”<sup>129</sup> Di dîwanan de, hinek şair helbestên xwe li gorî kronolojîya alfabeya Erebî tertîb dikan, hinek jî li gorî teşe û cûreyên nezmê tertîb dikan.<sup>130</sup>

Dema ku em li dîwana Rûhî dinihêrin, em lê derdixin ku ne dîwaneke Muretteb e. Helbestvan bi tevahîya herfên Erebî helbest nenivîsîne, lê bi hinek herfan sê-çar helbest nivîsîne. Ji xeynî herfên Erebî, bi du herfên Kurdî yên wek “ئ - ê” û “گ - g”yê jî bi tevahî 4 helbest lê kirine. Ji aliyekî din ve jî, bi hemû teşeyên nezmê helbest nenivîsîne.

Wek ku xuya dike, Aqtepî herî zêde bi herfên “ل - l, د - d, م - m, ن - n, ئ - ê” helbest nivîsîne. 4 helbest bi herfa “ل - l”, 3 helbest jî bi herfên din “د - d, م - m, ن - n, ئ - ê” nivîsîne.

---

<sup>129</sup> Pala, h.b.r. 119.

<sup>130</sup> Yunus Demir, *Dîwana Namî (Fehmî Begê Pêçarî): “Megmuru’ d- Dewawîn, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstituya Zimanên Zindî Yên li Turkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind, Mardin 2019, r. 71.*

Herf	Hejmara Helbestan	Rêza Helbestan a di Dîwanê de	Teşeyên Nezmê
ا - a	1	1	Xezel
ب - b	2	2, 3	Murebbe', Xezel
ت - t	1	4	Muxemmes
ج - c	1	5	Xezel
د - d	3	6, 7, 8	Muxemmes, Xezel, Qesîde
ر - r	2	9, 10	Murebbe', Xezel
ش - ş	1	11	Xezel
گ - g	1	12	Muxemmes
ل - l	4	13, 14, 15, 16	Muxemmes, Xezel, Murebbe', Xezel
م - m	3	17, 18, 19	Xezel, Murebbe', Mustezad
ن - n	3	20, 21, 22	Murebbe', Xezel, Xezel
ه - h	1	23	Muxemmes
ی - y	2	24, 25	Murebbe', Xezel
ع - ê	3	26, 27, 28	Xezel, Xezel, Xezel

**Tablo 5 Rêz, Hejmar, Teşeyên Nezmê û Herfa Qafiyeyê ya Helbestan**

Dîwana Rûhî, nayê zanîn ku di kijan salê de hatiye nivîsîn lê di dîwanê de helbesta di rêza 26an de tê gotin ku ew helbest di sala 1293ê mişextî/ 1876ê zayînî de hatiye nivîsîn. Ev tarîx ji aliyê Aqtepî ve li gorî hesabê Ebcedê hatiye aşkerekirin lê em nikarin bibêjin ku dîwan di wê salê de hatiye xelas kirin lewra dibêje min ev beyt di sala 1876an de nivîsiye nabêje min dîwanê nivîsiye.

Ji şewqa nûn û sad û mîm, ji **xeyn û ra û sad û cîm**,

Min ev beyta kirî tenzîm, kirî peşkeşe Mewlaê (r. 162)

Orjînalê wê dîwanê 50 rûpel in û li ber destê neviyên wî yên bi navê Şêx Ebdurrehman û Şêx Kербela Işık e.<sup>131</sup>

Mehmet Şefik Korkusuz, di kitêba xwe ya bi navê “Osmanlı Dönemi Diyarbekir Şairleri” de dibêje ku helbesta li jêr jî di dîwana Aqtepî de heye.

Bila çil sala li zindana bimînîm

Her roj sed mar û dûpîşkan bibînîm


<sup>131</sup> Aqtepî, h.b.r. 30.

Li hevraza barê aşan bikşînim  
Li berwara pezkovîyan biçêrînim

Zivistanan li ser avan bimînîm  
Ne ku carek yekî ehmeq bibînîm<sup>132</sup>

## 2.2 TEŞEYÊN NEZMÊ

Em dikarin bibêjin ku Aqtepî herî zêde ji Xezelan hez kiriye. 15 helbest bi teşeyê Xezelê nivîsandine. Helbestek bi teşeyê Mustezadê, helbestek bi teşeyê Qesîdeyê, 6 helbest bi teşeyê Murebbe'ê û 5 helbest jî bi teşeyê Muxemmesê nivîsandine. Di dîwanê de, bi tevahî 28 helbest hene.



Şekil 1 Grafika rêjeya Teşeyên Nezmê

### 2.2.1 Xezel

Teşeyê nezmê yê ku serwaya wî ji “aa, ba, ca...” pêk tê, jê re xezel tê gotin. Di xezelê de malika yekem di nav xwe de bi serwa ne. Di nîvmalika ewil a malika duyem de jî serbest, a duyem girêdayî malika yekem e. Ji malika yekem ya xezelê re “Matla”, ji ya bi dû de “Husn-u Matla”, ji malika dawî re “Makta” û ji malika berîya

<sup>132</sup> M. Şefîk Korkusuz, *Osmanlı Dönemi Diyarbekir Şairleri*, Nurefşan Yayınları, İstanbul 2016, r. 33.

“Makta”yê re jî “Husn-u Makta” tê gotin. Ji malika herî xweş a Xezelê re “Şah-beyt” an jî “Beyt-ul Gazel” tê gotin. Helbestvan, bi gelemperî mexlesa xwe di malika Makta’ê yan malika berîya Makta’ê de bi kar tîne. Malika ku helbestvan mexlesa xwe tê de bi kar tîne, jê re Beyta Mexlasê yan Tahallus tê gotin.<sup>133</sup>

Di dîwanê de, teşeyê ku herî zêde hatiye bikaranîn, xezel e. Aqtepi, bi tevahî 15 helbest bi vî teşeyî nivîsîne. Helbestên di rêza “1,3, 5, 7, 10, 11, 14, 16, 17,21, 22, 25, 26, 27, 28”an de xezel in.

Rêza Xezelê ya di dîwanê de	Hêjmara Malikan
7, 11	7
28	11
14	13
3, 27	15
5, 21,22	20
1	21
25, 26	22
17	23
16	24
10	25

**Tablo 6 Rêza Xezel û Hejmara Malikan**

### 2.2.1.1 Xezela Musammat

Hinek xezel hene bi dubakirina du qalibên ‘Erûzê, an bi qaliba Mefa’îlun (car caran) an jî bi qaliba Mustef’îlun tî nivîsandin û her misrayên wê dikarin bibin du perçeyên wekhev. Xezelên ku bi van qaliban tî nivîsandin û di nava nîvmalikê û dawîya misrayên yekem de -malikên piştî Matlayê- bi heman serwayê bî honandin, ji wan re re Xezela Musammat tê gotin.<sup>134</sup>

#### **Wek mînak:**

Rûyet- siyeh bad ey **firaq**, cergê me sota serteser  
Herdem bi şewq û **iştîyaq**, qelbê me kir zîr û zeber

Zîr û zeber qelbê **hezîn**; daîm bi feryad û **girîn**  
Hem ah û efxan û **enîn**, goşê supehrê kirye kerr

‘Aciz melaîk bûn **heme**, ji bangê bi soz û **zemezeme**  
Gêj bûn cemî’ê **alem e**, ey dîlbera nazik beşer (r. 73)

<sup>133</sup>Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b.r. 250.

<sup>134</sup>M. A. Yekta Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi -Biçim, Ölçü, Kaftiye-* Gökkubbe Yayınları 7. Baskı İstanbul 2013 r: 48.

Dema ku em lê dinêrin, em dibînin ku di nava nîvmalikên piştî Matlayê - malika yekem- û dawîya misraya yekem a van beytan, bi heman serwayê ne: **“hezîn, girîn û enîn”** di navbera xwe de bi serwa ne. **“heme, zemzeme û alem e”** jî bi heman şikilî di navbera xwe de bi serwa ne. Lê taybetîyeke Xezelên Musammet ên Aqtepî hene, wek ku di vê mînakê de jî xuya dike, nava misrayên malika yekem jî bi serwa ne; yanî **“fîraq û îştîyaq”** jî bi serwa ne. Ev jî wê yekê bi me dide zanîn ku Aqtepî di mijara serwayê de pir serkeftî ye.

### 2.2.1.2 Xezela Mukerrer

Xezelên ku bi hunera ‘Eks’ê hatibin nivîsîn, jê re Xezela Mukerrer tê gotin.<sup>135</sup> Di dîwanê de, ev cûre Xezel bi awayekî serbixwe nehatiye nivîsîn û taybetîyên xezela Musammatê jî di nav xwe de dihewîne, lê ji bo mînakdayinê em ê çend malikên ji dîwanê li binê rêz bikin:

Şehîdê çeşmê cellad im, hewadar im bi bejnê ra,  
Di ‘îlmê ‘işqê neqqad im, **rîwayet kim ji ‘amê ra**

**Ji her kes ra, rîwayet kim;** hemî xelqan hîdayet kim  
Nikatan ez dirayet kim; **muheyya me** ji dersê ra

**Muheyya hazir im** her dem, esîr û bêhîş û sersem  
Ku zulf û kakul û perçem, **bi lef bêtin** bi baê ra

**Bi lef bîn** gîsûyê taze; bi saz û coş û awaze  
Rûxê ‘aşiq, dibit xaz e; **ji ber tîrê di cergê** ra

**Xedengên min di nêv cergê;** kişandim haletê mergê  
Dema davêje dil zergê; **dikim efxan, bi derbê ra**(r. 37)

---

<sup>135</sup>Saraç, h.b.r. 50.

### 2.2.1.3 Xezela Mutawwel (Dirêj)

Xezelên ku ji 15 malikan zêdetir be, ji wan re xezelên Mutavvel tê gotin.<sup>136</sup> Di dîwanê de neh xezel ji 15 malikan zêdetir in.

### 2.2.1.4 Xezela Yekaheng

Di Xezelekê de, heke malik ne tenê ji aliyê wezn û serwayê ve, lê ji aliyê maneyê ve jî girêdayî hev bin -yanî seranserê xezelê heman mijar be- ji wan re Xezela Yekaheng tê gotin.<sup>137</sup> Di dîwanê de, helbesta di rêza sêyem de: “Pur Hezîn im” dibe mînak; lewra, ji malika yekem bigire heta bi malika dawî, mijar her li dor hîcran û xurbetê ye. Helbestvan ji ber hîcran û fîraqbûnê gelek xemgîn e û ji bo helbesta xwe bi awayekî bi bandor û bi aheng binivise, berfê dike hêcet; yanî bi şayensandina vê rewşê bi me dide hîskirin. Em ê çend malikên vê helbestê wek mînak binivîsin:

Pur hezîn im, **dûrê** dest im, **xurbetê** dil kir kebab

**Dûr** û mehcûr im ji yarê nazik ê ‘alîcenab

Berf û bapûkê tijî kir; **dûr** bû rahê ‘alemê

Mam di darê **xurbetê**, dûr im ji dildarê şebab

Der-**xerîbê** berf û ba, rozê ‘ecayîb dil kewand

Dê çikim Ya Reb meded! Dunya li min têk bû ‘ezab

J’asîmanan berf dibarî; tête xwarê wek serad

Agirê **hîcran** û **xurbet**, min, di dil bû îltîhab(r.45)

### 2.2.1.5 Xezela Yekawaz

Xezelên ku hemû malikên wê wek hev bihêz û xweşik bin, ji van xezelan re Xezela Yekawaz tê gotin.<sup>138</sup> Binavkirina van xezelan ne tişteki objektîv e.<sup>139</sup> Di

---

<sup>136</sup>Saraç, h.b.r. 48.

<sup>137</sup> Haluk İpekten, *Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz*, Dergah Yayınları, 12. Baskı, İstanbul 2010, r. 18.

<sup>138</sup> İpekten, h.b.r. 18.

<sup>139</sup> Saraç, h.b.r. 53.



dîwanê de, helbesta di rêza çardehan de, vê bihêzbûnê bi me dide hîskirin; ew ji bo vî cûreyî wek mînak tê destnîşankirin. Em ê çend malikan ji vê helbestê li xwarê rêz bikin:

Leb-gul û gerden-gul û xebxeb-gul û ruxsar e gul  
Dêm-gul û çehre-gul û ten-gul, ser a ser yar e gul

Qedd-gul û qamed-gul û xeddê munewwer gulgulî  
Cebhetê beyza gul, gul turreê terrar e gul

Çendî nazik herekat e, butê gul pîrehenem  
‘Îşwe-gul, nazî-gul û rûniştin û reftar e gul(r. 93)

#### 2.2.1.6 Xezela Mureddef

Xezelên ku bi redîf; yanî redîfên wê hebin, jê re Xezela Mureddef tê gotin. Di dîwanê de, helbestên di rêzên “5, 7, 21, 22”yan de ji bo vî cûreyî dibin mînak.

Ey dil sebir ke ber-fîraq; **e’s-sebrû mîftah’ul- ferec**  
Çendî bikêşî ihtîraq; **e’s-sebrû mîftah’ul- ferec**

Ger bêkes û bêçare î; dûr-hebîb, aware î  
Wer-derê kuhsare î; **e’s-sebrû mîftah’ul- ferec**(r. 55)

#### 2.2.2 Mustezad

Koka vê peyvê “zîyade”ya Erebi ye, tê wateya “lêzêdekirin, pêvekirî.” Mustezad, wek teşeyekî nezmê, ji xezelê hatiye dariştin. Mustezad ji çar misrayên ku yek dirêj û yek kurt pêk tê.<sup>140</sup> Di dîwana Rûhî de tenê helbesteke bi vî teşeyî hatiye nivîsîn, ew jî helbesta 19an e û ji yanzdeh bendan pêk hatiye. **Wek mînak:**

Me’lûm e her kes, ku li min ‘îşqê, nişan e,  
Emma ku nîhan e.  
Me’şûq e, me nik cumle edanî û e’alî  
Der ‘eynê yeqîn im. (r.126)

<sup>140</sup> İpekten, h.b.r. 33.

### 2.2.3 Qesîde

Peyveke Erebi ye ku tê wateya “qestkirin, arastebûn, nêzîkîbûn”ê. Malika yekem a qesîdeyê di nav xwe de bi serwa, nîvmalika ewil a malika duyem serbest û ya duyem jî bi malika yekem ve girêdayî ye.<sup>141</sup> Yanî serwaya Qesîdeyê jî wek ya Xezelê ye: “aa, ba, ca...”

Ji malika yekem a Qesîdeyê re “Matla”, ji ya dawî re “Makta”tê gotin. Ji malika herî xweş a Qesîdeyê re, Şahbeyt an jî Beytu’lqasid tê gotin. Hejmara malikên Qesîdeyê, bi gelemperî 33-99 e, lê qesîdeyên ku ji 33 malikan kêmtir û ji 99 malikan zêdetir jî, ne kême.<sup>142</sup>

Di Dîwanê de, tenê helbestek bi vî teşeyî hatiye nivîsandin.. Helbesta di rêza “8”an de Qesîde ye, ji 23 malikan pê tê û li ser bûyera Kerbelayê ye. **Wek mînak:**

El’eteş goyanê deştê Kerbela tèn fikrê min  
Her zeman, le’net dixwînim, ez li ser canê pelîd

Çunkî cergê min tijî xûn e, ji ber Şehzadeyan  
Le’netê her dem dibêjim, ser Yezîdê bêumîd

Ez ku sergerdanê ‘îşqê Xanedan im eşkera  
Le’neta kafir şebîhan, nik me ‘eynî rojê ‘id (r. 65)

### 2.2.4 Murebbe’

Bendên ku ji çar misrayan pêk tê, jê re Murebbe’ tê gotin. Di murebbe’an de, herî zêde serwaya “aaaA, bbbA...” hatiye bikaranîn. Hejmara bendên wê di navbera 2-27an de ye. Murebbe’ li gorî şemaya Serwayê dibin du beş: Mutekerrir û Muzdewic. Di Murebbe’an de mijara herî zêde hatiye bikaranîn eşq e. Ji xêncî eşqê, di mijarên wek “methiye, mersiye, îd, bihar, h.w.d.” de jî bi Murebbe’ê hatine nivîsîn.<sup>143</sup>

Di dîwana Rûhî de 6 helbest bi vî teşeyî hatine nivîsîn. Hejmara bendên Murebbe’ê yên di dîwanê de, di navbera 13-21an de ne. Murebbe’a herî kême ji 13 bend, a herî dirêj jî ji 21 bendan pêk hatiye. Murebbe’ên di dîwanê de, di rêza “ 2, 9,

<sup>141</sup> Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b.r. 245.

<sup>142</sup> Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b.r. 245.

<sup>143</sup> Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b.r. 257.

15, 18, 20, 24”an de ne. Wek me li jor jî qal kiribû, Murebbe’ li gorî şemaya serwayê dibin du beş. Di dîwanê de, mînakên her du cûreyan jî hene. Ji boyî ku mijar bê fehmkirin em ê mînakên her du cûreyan jî li jêr binivîsin:

#### 2.2.4.1 Murebbe’a Muzdewic

Di murebbe’a Muzdewic de, benda ewil di nav xwe de bi serwa ne, bendên din jî her sê misra di nav xwe de bi serwa ne, misraya dawî jî girêdayî benda ewil e;<sup>144</sup> yanî Serwaya wê wiha ye: “aaaa, bbba, ccca, ddda...”

Hewar e! Hey hewar e! Bûm hilak ez derdê mehcûrî	<b>a</b>
Fewe’l-lahî, nema min taqetê bêyarî û dûrî	<b>a</b>
Neharê ferh û şahî, nik me yekser leylê deycûrî	<b>a</b>
Diheş xordem, ji bîhna dîlberê hem çûn gula cûrî	<b>a</b>
Ji te’sîratê ‘îşqê, bûme yekser cemre wek ateş	<b>b</b>
Qetîlê tîrê mujgan im, ji qewsê ebrûwanê reş	<b>b</b>
Cunûn û bêhiş im, asarê ‘îşqê, ez dilê serxweş	<b>b</b>
Cudaa nakin, du sed Şeyxê Geylanî û Teyfûrî(r. 147)	<b>a</b>

#### 2.2.4.2 Murebbe’a Mutekerrir

Di Murebbe’a Mutekerrir de, benda ewil û her sê misrayên bendên din di nav xwe de bi serwa ne. Lê misraya benda ewil û misraya çaran a bendên din dubare dibe. Serwaya wê “aaaA, bbbA, cccA...ye.”<sup>145</sup>

Yek qedem danî Te, ez-‘erdan heta heftem tebeq	<b>a</b>
Ferşê pa-bûsê nî’alê, eşrefet şod ‘erşê Heq	<b>a</b>
Mam di bin barê guneh; pur dîn ji min yaran, sebeq	<b>a</b>
<b>Ya Resûlellah dexîl im! Ya Hebîbellah dexîl!</b>	<b>A</b>

<sup>144</sup> Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b.r. 257.

<sup>145</sup> Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b.r. 257.

Gerçî ‘asî û gunehkar im, feqîr im, pur hezîn **b**  
 Şukru’lîllah! Ket’me rahê şer’ê heq, dînê mubîn **b**  
 Rûreşek bêkesb û kar im, ey Şefî’el- Muznîbîn! **b**  
**Ya Resûlellah dexîl im! Ya Hebîbellah dexîl! (r.99) A**

### 2.2.5 Muxemmes /Pencîn

Tê wateya pêncaneyê; bendên ji pênc misrayan pêk tên, jê re Muxemmes tê gotin. Bi gelemperî ji 4-8 bendan pêk tê. Lê Muxemmesên ku ji 12-13 malikan pêk tên jî hene.<sup>146</sup>

Di dîwana Rûhî de, 5 helbest bi vî teşeyî hatine nivîsîn. Helbestên 4,6, 12, 13, 23yan Muxemmes in. Hejmara bendên Muxemmesên di dîwanê de di navbera 10-13an de ne. Muxemmesa herî kurt 10 bend, a herî dirêj 13 bend in.

#### 2.2.5.1 Muxemmesa Muzdewic

Heger misraya dawî ya Muxemmesê neyê dubarekirin, ji van re Muxemmesa Muzdewic tê gotin. Serwaya, Muxemmesa Muzdewic “aaaaa, bbbba, cccca...” ye.<sup>147</sup>

Fa’ilatun fa’ilatun fa’ilatun fa’ilat<sup>148</sup> **a**  
 Hat bi ser min da ji eywanê, hebîba pur- sîfat **a**  
 Zînet û xemla mubarek, xawera şerqê, hilat **a**  
 ‘Eks û nîşan in, tedarek xemilîn dar û nebat **a**  
 Ehsenellahû tebarek, dîlbera şêrîn- sîfat **a**

Nagihan hilbû li min, berqek ji sethê cebhetê **b**  
 Perçemê purçîn veda ‘etr û şemîma cennete **b**  
 Saxerê sîmîn, bikef meş’ya, kemala suhbetê **b**  
 Bûm xerîqê luccê behra xumar û dehşete **b**  
 Mîslê Pîrê Xaniq e, lê bêtecellî nûrê zat(r. 48) **a**

<sup>146</sup> İpekten, h.b.r. 96.

<sup>147</sup> Saraç, h.b.r. 123.

<sup>148</sup> Ev peyv ji aliyê Mehmed Emîn Hêvîdar ve wek “fa’ilun” hatiye nivîsîn. Lê li gorî tespîtên me ev peyv xelet hatibû nivîsîn. Me hewcadarî bi sererastkirinê dît û me wek “Faîlat” nivîsand.

Honaka serwaya vê helbestê “aaaaa, bbbba, cccca...” ye lewma ev helbest Muxemmesa Muzdewic e.

### 2.2.5.2 Muxemmesa Mutekerrir

Misraya dawî ya bendan bi heman şikilî bê dubarekirin, ji van Muxemmesan re Muxemmesa Mutekerrir tê gotin.<sup>149</sup> Serwaya Muxemmesa Mutekerrir “aaaaA, bbbbA, ccccA an jî aaaAA, bbbAA, cccAA” ye.<sup>150</sup>

Qubbeê neh taqê mîna ye, li min tarîk û teng **a**

Pey bi pey ez çêsmê dîlber tîn cîger tîr û xedeng **a**

Her zeman, ber qel’ê dil mutessil top û tifeng **a**

Sedmeta ‘îşqa nîgarê, da me nêv penca puleng **a**

**Ah û sed efxan, ji hîcra dîlbera ala Fireng **A****

Dûr e ez dîdarê min, ew şahê textê dîlberî **b**

Muxtefî ez çêsmê min, teşbîhê ecsamê perî **b**

Ledxe-gîr qelbê me, ejderhayê zulfê ‘enberî **b**

Min nevê xûbanê ‘alem, xeyrê yarê enwerî **b**

**Ah û sed efxan ji hîcra dîlbera ala Fireng(81) **A****

Honaka serwaya vê mînakê jî “aaaaA, bbbbA, ccccA...” ye û misraya dawî hatiye dubare kirin ji ber vê yekê ev mînak jî Muxemmesa Mutekerrîr e.

<sup>149</sup> Saraç, h.b.r. 123.

<sup>150</sup> İpekten, h.b.r. 96.

## 2.3 CÛREYÊN NEZMÊ

### 2.3.1 Ne't

Ew helbestên ku di edebîyata Îslamî de ji bo pesnê Hz. Pêxember (s.x.l.) bê dayin, ji bo jê şefaet bê xwestin, behsa taybetî û pêxemberbûna Wî bê kirin, tên nivîsîn, jê re Ne't tê gotin.<sup>151</sup> Rîsale û mucîzeyên Hz.Pêxember (s.x.l.), bûyera Hicreyê û zehmetîyên ku kişandine jî dibin mijara Ne'tê. Ne't, her çiqas ku li gorî qesîdeyê be jî, helbestvanên ku teşeyên wek: “Xezel, Murebbe’, Mustezad, Terkîb-î bend, Musemmet, Kit’a” ceribandî jî hene.<sup>152</sup>

Di dîwanê de, Murebbe’ek bi vî cûreyî hatiye nivîsîn. Aqtepi ji gelek alîyan ve Hz. Pêxember (s.x.l.) wesifandiye, şefaet û alîkarî jê xwestiye û pesnê wî daye. Em ê çend bendan ji wê Murebbe’ê l binî binivîsin:

Nefs û Şeytan bûn musellet; **Ya Resûlellah eman!**

Bû telef ‘umrê ezîzê’ m zîrê ‘isyanê giran

Destî damanê’ m bi sed zarî **Şefî’ê ‘asiyan**

**Ya Resûlellah dexîl im, ya Hebîbellah dexîl!**

Gerçî pur-sûc û gunah im, xafil û bêta’et im

Zar û şermende, bitûn xerqê xeta û zulmet im

Lê **bi hêvî me ji Te** ferdek ze’îfê ummet im

**Ya Resûlellah dexîl im, ya Hebîbellah dexîl!** (r.98)

### 2.3.2 Medhiye

Ew helbestên ku ji bo pesnê yekî bidin tên nivîsandin, jê re Medhiye tê gotin. Ev cûre ji bo pesndayina padîşahan, wezîran, Şêxulîslaman, Çar Xelîfeyan, Eshab-i Kîram an jî ji bo welîyan tên nivîsîn. Hin helbestvanên derwêş, ji bo pîrê terîqata ku pê ve girêdayî yan jî ji bo murîdên li ber dilê wan biqîmet jî bi vî cûreyê helbest nivîsandine.<sup>153</sup>

<sup>151</sup> Pala, h.b.r. 351: Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b.r. 108.

<sup>152</sup> Pala, h.b.r. 351.

<sup>153</sup> Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b.r. 112.

Di dîwanê de, Murebbe'a<sup>154</sup> ku li ser Hz. Eî hatiye nivîsîn bi vî cûreyî hatiye nivîsîn. Murebbe' bi zimanê Farisî hatiye nivîsîn û ji 7 bendan pêk tê. Bi van sifet û nasnavan pesnê Hz. Elî (s.l) tê dayin: “ La feta îlla ‘Elî, la seyfe îlla Zu’l-feqar, Şêrê Yezdanê Kerîm, Heyderê Kerrar, Canîşînî Fexrê ‘Alem, Şahê Ewrengê Necef, Şahê Merdan, Şîrê Yezdan, Îbnu ‘emmê Mustefa, Rehberê rahê heqîqet, ‘Elîyy’ul-Murteza, Xwecayê Qenber, Fatîhê Xeyber...”

Ji xeynî Murebbe'ê, Musemmetên di rêza 6 û 23yan de jî bi vî cûreyî hatine nivîsîn. Aqtepî di van Musemmetan de behsa Behauddînê Pîrê terîqeta Neqşîbendê dike û pesnê wî dide. Carna bang lê dike carna jî dibêje ew kesê ku çareserkar, kesê ku alîkarîyê dike û siran dizane.

### 2.3.3 Recmîyye (Le'netname)

Le'netname cûreyek ji teşeyê Qesîdeyê ye; ji ber ku di forma le'netbarandinê de ye ev wek cûreyekî serbixwe hatiye binavkirin.<sup>155</sup> Di dîwanê de, Aqtepî bi xwe ev cûre wek Recmîyye bi nav kiriye û dibêje ku derdê min dûr û dirêj e nayê gotin, ez vê Recmîyyeyê dinivîsim. Ev helbest di dîwanê de di rêza şeşan de ye û wek ku me li jor jî behsê kiribû, mijara wê li ser bûyera Kerbelayê ye. Aqtepî, di vê helbestê de le'neta li ser Yezîd û alîgirên wî yên wek ‘Emr, Şemr û Îbnî Zîyad dibarîne. Di hin malikan de bangî Xwedê dike û dibêje di Cehnemê de cihê herî kûr û pîs para Yezîd û alîgirên wî be. Em ê çend malikan ji vê helbestê wek mînak binivîsin:

**Xûnê xakê Kerbela**, her dem dikim fikr û xiyal

Lew bi xûnê dil, nivîsandin me ebyat û **qesîd**

Derdê min, dûr û diraz e, naêtin hedd û hîsab

Lew, evê **recmîyyeê**, înşa dikim hinde medîd

Rûhîya! derdê zeban bibêje hemî şam û seher

**Le'netullahî ‘ela ruh’îl- Yezîdî fî’l-mezîd** (r.69)

<sup>154</sup> Ev helbest ji aliyê Mehmet Emîn Hêvîdar ve bi malikan hatiye nivîsîn lê ji serwayê aşkere dibe ku ev ne xezele an jî qesîde ye, ev bi teşeyê Murebbe' hatiye nivîsîn.

<sup>155</sup> Bo agahiyên berfireh bnr. M. Zahir Ertekin, Recmîyye/Le'netname Wek Cûreyek Nezmê û Le'netnameya Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepî ( Lêkolîn-Ferheng), *e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*, Nisan-2019, Cilt: 11, Sayı: 1(23), sayfa: 36-51.

## 2.4. SERWA (QAFÎYE)

Serwa, ji hevşibîya dengan ku dubarekirina peyvên nivîsîna wan wek hev, lê ji alîyê maneyê ve ji hev cuda, pêk tê. Ev dubarekirin dawîya herî kêr du nîvmalikan ava dibe.<sup>156</sup> Helbestvan kîjan teşeyê nezmê bi kar bîne divê li gorî wî teşeyî serwayê pêk bîne;<sup>157</sup> yanî heger xezel be divê serwa li gorî xezelê be. Di helbestan de, piştî weznê, hêmana herî girîng a ahengê ye<sup>158</sup> Du astên serwayê hene; yek “Asta Deng”, a din “Asta Peyvê” ye.

### 2.4.1 Asta Deng

Serwa ji alîyê asta dengan ve sê cûre ne.

#### 2.4.1.1 Rewî

Rewî ew dengê dawî yê ku li dawîya peyvên malikan tê.

#### 2.4.1.2 Pêşrewî

Ew dengên ku li pêş dengê rewî tên û bi hev re serwayê dirust dikin. Ev deng bêhtir dengêkî bideng (dengdêr) e.

#### 2.4.1.3 Paşrewî

Dengdêrekî kurt e yan jî formeke rêzîmanî ye.<sup>159</sup> **Wek mînak:**

Bû telef ‘umrê ezîzê’ m der-fîraqê **ateşî**

Bêkes û zarê te me bes ke li min ev **serkeşî!**

Kewkeba çerxa berin î, hem şeh î hem mehweş **î**

Paşê, pîr bim yan neqîl bim, dê li ser min bî nedîm

“**ateşî, serkeşî û mehweş î**” peyvên serwa ne. Tîpa “ş”yê Rewî, tîpa “e”yê Pêşrewî, tîpa “î” jî Paşrewî ye.

Ber textê mehebbet, bi xwe Mehmûdê **Eyaz im,**

Gerden di **firaz im.**

<sup>156</sup> Cihan Okuyucu, *Divan Edebiyatı Estetiği*, Kapı Yayınları 4. Baskı İstanbul 2011 r. 163.

<sup>157</sup> Muhsin Macit, Uğur Soldan, h.b.r. 233.

<sup>158</sup> Saraç, h.b.r. 257.

<sup>159</sup> Hêmin Omar, *Notên Dersê*, 2017-2018.



“Eyaz û firaz” peyvên serwa ne. Tîpa “z”yê Rewî, tîpa “a”yê Pêşrewî û qertafa “-im” Paşrewî ye.

#### 2.4.2 Asta Peyvê

Serwa, li gorî asta peyvê ve sê cûre ye.

##### 2.4.2.1 Peyvên Serwa

Ew peyvên ku di dawîya rêzekê yan malikekê de tên, yek deng yan çend dengê wê wekhev ku li dawîya malikan in.

##### 2.4.2.2 Pêşserwa (Hacîb)

Peyvek an çend peyvên ku bi heman mane li pêş peyvê tên dubarekirin.

##### 2.4.2.3 Paşserwa (Redîf)

Peyvek an çend peyvên ku bi heman maneyê di dawîya peyvên serwayê dubare dibin.<sup>160</sup> **Wek mînak:**

Xoşa an dil ki ez-‘işqê cemalê **to xeber dared**

Zehî an ten ki ba-derdê xîyalê **to eser dared** (63)

“**xeber û eser**” peyvên serwa ne. “**to**” Pêş Serwa, “**dared**” Paş Serwa ye.

Paşserwa (Redîf) di dîwanê de carna ji hevokekê pêk hatiye.

Ey dil sebir ke ber-fîraq; **e’s-sebrû mîftah’ul- ferec**

Çendî bikêşî ihtîraq; **e’s-sebrû mîftah’ul- ferec**(r. 55)

“**fîraq û ihtîraq**” peyvên serwayê ne. “**e’s-sebrû mîftah’ul- ferec**” Paşserwa ye.

Paşserwa di dîwanê de carna ji lêkeran pêk hatiye. **Wek mînak:**

Kakul û zulf û çeşmeş, çunkî qesdê can **dikin**

Wan dizanim kafir in, qetlê Musulmanan **dikin** (r.133)

---

<sup>160</sup> Omar, n.d., 2017-2018.

“can û musulmanan” peyvên serwayê ne. Lêkera “**dikin**” Paşserwa ye.

### 2.4.3 Cureyên Serwayê / Qaffiyeyê

#### 2.4.3.1 Serwaya Mucerred

Ev cure tenê bi dubarekirina herfa rewîyê pêk tê. Wek “...ser / ... seher” .<sup>161</sup>

##### **Wek mînak:**

Rûyet sîyeh bad ey fîraq; cergê me sota ser te **ser**

Her dem bi şewq û îştîyaq; qelbê me kir zîr û **zeber** (r. 73)

Di vê mînakê de herfa rewiyê “r” ye.

Kesk û sor û şîn û zer, narenci û mawî û **reş**

Sef bi sef seyran konan tèn dîlberanê **mahîweş**(r. 79)

Di vê mînakê de herfa rewiyê “ş” ye.

#### 2.4.3.2 Serwaya Murekkeb

Sê cureyên Serwaya Murekkeb hene. Di dîwanê de herî zêde ev cure serwa hatiye bikaranîn.

##### 2.4.3.2.1 Serwaya Murdef

Serwaya murdef, ew serwa ye ku di xwe de herfa “rîdf”ê dihewîne yanî ger beriya herfa rewiyê herfên rîdfê “a, û, î” bên, ev cure derdikeve holê.<sup>162</sup> Di dîwanê de cureya herî zêde hatiye bikaranîn ev e û peyvên wek “...hebîb, ...kebîb”, ...kebab, ...alîcenab”, “...faîlat, ...sifat, ...hilat, ...nebat, ...sifat”, “...fîraq, ...îhtîraq”, “...şedîd, ...yezîd”, “...namîdar, ...cebbar, ...kufar, ...zulfeqar”, “...heval, ...al, ...xîyal, ...webal, ...xezal”, “...rûxsar, ...yar” “...sual, ...hal” “...menam, ...’ewam”, “...layezal, ...helal, ...şemîm, ...kerîm” “...xezal, ...delal” “...hezîn, ...girîn” “...can, ...musulman”, hwd. di dîwanê de cih girtine. **Wek mînak:**

Pur hezîn im, dûrê dest im; xurbetê dil kir **kebab**

Dûr û mehcûr im ji yarê nazik ê ‘alîcenab (r. 45)

<sup>161</sup> Saraç, h.b.r. 272.

<sup>162</sup> Adak, h.b.r. 397: Muhsin Macit- Uğur Soldan, h.b.r. 236.

Sed hezar le'net muza'ef, şubhê baranê şedîd  
Her zeman, la yanqetî bin, ew li ser ruhê Yezîd(r. 65)

#### 2.4.3.2.2 Serwaya Muqayyed

Ev cure ji herfên ku -ji xeynî herfên ridfê- beriya rewîyê tên pêk tê. Wek  
“...derd, ...merd”, “...ayb, ...gayb”<sup>163</sup>

Qubbeê neh taqê mîna ye, li min tarîk û **teng**  
Pey bi pey ez çêşmê dîlber tên cîger tîr û **xedeng**  
Her zeman, ber qel'eê dil mutessil top û **tifeng**  
Sedmeta 'işqa nîgarê, da me nêv penca **puleng**  
Ah û sed efxan, ji hîcra dîlbera ala **Fireng**(r. 81)

#### 2.4.3.2.3 Serwaya Muesses

Dema ku di navbera herfa elifê û rewîyê de herfeke bi hereke hebe, jê re  
Te'sîs tê gotin. Wek: “...mail, ...kabil”<sup>164</sup> Serwayên ku di nav de herfa Te'sîs hebin,  
ji wan re jî Serwaya Muesses tê gotin.<sup>165</sup> **Wek mînak:**

Çi yarek min heye, şêrîn **tebarek,**  
Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban!  
Di subhê 'Îdê Qurbanê **mubarek,**  
Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban!

Ji min, yekser te bir 'eql û **kisayet**  
Li nik min nîn e, qet fikr û **feraset**  
Were ser **mulkê dil, textê riyaset!**  
Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban!(r. 127)

Di vê mînakê herfên “k” û “t” rewî ne. Di navbera herfa elif û rewî de herfeke  
bi hereke heye ew jî herfa “e”ye.

---

<sup>163</sup> Saraç, h.b.r. 271.

<sup>164</sup> Saraç, h.b.r. 270.

<sup>165</sup> Saraç, h.b.r. 272.

### 2.4.3.3 Zû- Qafiyeteyn

Helbestên ku du serwayê wê hebin, jê re Zû- Qafiyeteyn tê gotin. Helbestên bi vî şiklî ji aliyê ahengê ve gelek bihêz in.<sup>166</sup> Aqtepî jî di gelek helbestan de serwayê bi vî awayî bikaranîye. **Wek mînak:**

Kakul û zulf û çeşmeş, çunkî **qesdê can** dikin

Wan dizanim kafir in, **qetlê musulmanan** dikin (r. 133)

Ateş û meş'el **dibarin**, ji ah û **nalînê** di min

Cin û însan, çun **kenar in**; ji bang û **qîrînê** di min (r. 138)

### 2.4.3.4 Zû'l- Qavafi

Helbestên ku serwaya wê ji duduyan zêdetir bin, jê re Zû'l- Qavafi tê gotin. di navbera herdu serayan de tekrir hebin, ew helbest bi qîmet û xurt tînen qebûl kirin. Ji serwaya ku dawîya misrayan tê jê re “serwaya eslî” yê din re “serwaya Mulhaka” tê gotin.<sup>167</sup> dema em dîwana Aqtepî dinihêrin em dibînin ku helbestên wî him ji aliyê serwaya Zû- Qafiyeteyn, him jî ji aliyê serwaya Zû'l- Qavafi ve gelek dewlemend in. Ev rewş jî me dide zanîn ku Aqtepî di mijara serwayê de gelek serkeftî ye û helbestên wî jî ji aliyê serwayê ve gelek xurt in. **Wek mînak:**

**Şehîdê çeşmê cellad im, hewadar im bi bejnê ra,**

**Di ‘îlmê ‘işqê neqqad im, rîwayet kim ji ‘amê ra (r.37)**

Di vê mînakê de “bejnê û amê” Serwaya ‘Eslî ye, yê din Serwaya Mulhaka nin.

Xoşa an dil ki ez-‘**işqê cemalê to xeber** dared

Zehî an ten ki ba-**derdê xîyalê to eser** dared (r.63)

“xeber û eser” Serwaya ‘Eslî ye, yê din serwaya Serwaya Mulhaka nin.

<sup>166</sup> Saraç, h.b.r. 268-269.

<sup>166</sup> Saraç, h.b.r. 271.

<sup>167</sup> Saraç, h.b.r 269.

## 2.5 WEZN (‘ERÛZ)

‘Erûz di helbestan de wezneke girêdayî rêzbûna girtîbûn an jî vekirîbûna kîteyan e<sup>168</sup> ku di sala VIIIan de di edebîyata Ereban de derketiye holê û dûre bi tesîra edebîyat û kevneşopîya Ereban di edebîyatên gelek civakan de hatiye bikaranîn. Ev wezn, dema di edebîyatên din de hatiye bikaranîn, li gorî taybetîyên wan edebîyatan hinekî guherîye.<sup>169</sup>

Bikaranîna ‘Erûzê di Dîwana Rûhî de

### 2.5.1 Behra Hezecê

Peyva hezecê ji koka peyva ku “hezice, yehzecû, hezecen”ê ya bi maneya “strandin, gotinên bi awayê name” hatiye dariştin. Hezec di nav behra şî’rên Erebi de di rêza şeşan de ye.<sup>170</sup> Di dîwanê de, du qalibên Hezecê hatine bikaranîn:

#### 1 - Mefa’îlun/ Mefa’îlun/ Mefa’îlun/ Mefa’îlun

Xedengên min / di nêv cergê;/ kişandim ha/ letê mergê

Dema davê /je dil zergê;/ dikim efxan,/ bi derbê ra (r. 37)

u - - - / u - - - / u - - - / u - - -

(me fa î lun / me fa î lun / me fa î lun / me fa î lun)

#### 2 - Mefa’îlun/ Mefa’îlun/ Mefa’îl (fe’ûlan)

Ji min yekser/ te bir ‘eql û /kisayet

Li nik min nî/ne qet fikr û /feraset

Were ser mul/kê dil, textê /riyaset!

Bi qurban bim, /bi qurban bim,/ bi qurban (r. 12)

u - - - / u - - - / u - - me fa î lun / me fa î lun / fe û lun

u - - - / u - - - / u - - me fa î lun / me fa î lun / fe û lun

u - - - / u - - - / u - - me fa î lun / me fa î lun / fe û lun

u - - - / u - - - / u - -. me fa î lun / me fa î lun / fe û lan

<sup>168</sup> İbrahim Yılmaz, *Arap Edebiyatında Aruz*, Araştırma Yayınları, Ankara, Ocak 2009, r. 2.

<sup>169</sup> Ahmet Doğan, *Açıklamalı ve Örnekli Aruz Bilgisi*, Akçağ Yayınları, Ankara 2005, r. 11.

<sup>170</sup> Yılmaz, h.b.r. 59.

### 2.5.2 Behra Recezê

Recez di nav behrên şî'ra Erebî de ya herî zêde berfireh e.<sup>171</sup> Di dîwanê de tenê qalibeke recezê hatiye bikaranîn.

#### **Mustef'ilun / Mustef'ilun / Mustef'ilun / Mustef'ilun**

Nalîn dikim /wek bulbulan; /dûr im ji bîh/na sorgulan

Sebr û sikû/na bêdilan; /e's-sebrû mîf/tah'ul ferec(r. 56)

- - u - / - - u - / - - u - / - - u -

( Mus tef 'i lun / Mus tef 'i lun / Mus tef 'i lun / Mus tef 'i lun )

Îhsan li min/ kit, yek wîsal; /ew nazika /gerdenxezel

'Îşqa me, dê/ bigrit kemal;/ yek car ji per/dan, bême der(r. 75)

- - u - / - - u - / - - u - / - - u -

( Mus tef 'i lun / Mus tef 'i lun / Mus tef 'i lun / Mus tef 'i lun )

### 2.5.3 Behra Remelê

Peyva remelê ji koka "r,m,l"ê pêk hatiye û tê wateya "revîn, xemilandina bi kevirên qiymet; re".<sup>172</sup> Di dîwanê de du qalibên Remelê hatine bikaranîn.

#### **1 - Fa'ilatun/ Fa'ilatun/ Fa'ilatun / fa'ilat (fa'ilan)**

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilat

Hat bi ser min da ji eywanê, hebîba pur- sîfat

Zînet û xemla mubarek, xawera şerqê, hilat

'Eks û nîşan in, tedarek xemilîn dar û nebat

Ehsenellahû tebarek, dîlbera şêrîn- sîfat

- u - - / - u - - / - u - - / - u - . fa 'i la tun / fa 'i la tun / fa 'i la tun / fa 'i lan

- u - - / - u - - / - u - - / - u - . fa 'i la tun / fa 'i la tun / fa 'i la tun / fa 'i lan

- u - - / - u - - / - u - - / - u - . fa 'i la tun / fa 'i la tun / fa 'i la tun / fa 'i lan

- u - - / - u - - / - u - - / - u - . fa 'i la tun / fa 'i la tun / fa 'i la tun / fa 'i lan

- u - - / - u - - / - u - - / - u - . fa 'i la tun / fa 'i la tun / fa 'i la tun / fa 'i lan

<sup>171</sup> Yılmaz, h.b.r. 65.

<sup>172</sup> Yılmaz, h.b.r. 95-96.

Pur hezîn im, /dûrê dest im; /xurbetê dil/ kir kebab

Dûr û mehcûr/ im ji yarê/ nazik ê ‘a/lîcenab (r. 45)

- u - - / - u - - / - u - - / - u - . fa ‘i la tun /fa ‘i la tun / fa ‘i la tun / fa ‘i lan  
 - u - - / - u - - / - u - - / - u - . fa ‘i la tun /fa ‘i la tun / fa ‘i la tun / fa ‘i lan

## 2 - Fa’ilatun/ Fa’ilatun / Fa’ilatun / Fa’ila (fa’ilun)

‘Aşiq im wek/ bulbulê fes/la buhar ê/ gul bi dest

Lew di nêv ca/mê me, îxfâ/ ye gul û îz/har e gul (r. 94)

- u - - / - u - - / - u - - / - u - . fa ‘i la tun /fa ‘i la tun / fa ‘i la tun / fa ‘i lan  
 - u - - / - u - - / - u - - / - u - fa ‘i la tun /fa ‘i la tun / fa ‘i la tun / fa ‘i lun

Ji xêncî van helbesteke bi teşeya Mustezadê hatiye nivîsîn û wezna wê Hezecî  
 8 pengavî exrebê mekfûfî mehzûf e. “Mef’ûlu / Mefa’îlu / Mefa’îlu / fe’ûlun”

Qalib	Helbestên di Dîwanê de
Hezecê 8 pengavî tamam Mefa’îlun/ Mefa’îlun/ Mefa’îlun/ Mefa’îlun ( u - - - / u - - - / u - - - / u - - - )	Şehîdê Çeşmê Cellad im (1), Xoşa an dil ki (7), Hewar e! Hey Hewar e (24), Di kuncê xelwetê (25), Cîhan pur bû ji efxanê (26), Ji eşqa dîlbera nûrîn, şev û rojan xew me naê(28)
Hezecê 6 pengavî Meqsûr Mefa’îlun/ Mefa’îlun/ Mefa’îl (fe’ûlan) ( u - - - / u - - - / u - - . )	Çi yarek min heye, şêrîn tebarek (20)
Recezê 8 pengavî tamam Mustef’îlun/Mustef’îlun/Mustef’îlun /mustef’îlun ( - - u - / - - u - / - - u - / - - u - )	Ey dil sebir ke ber-fîraq; (5), Rûyet sîyeh- bad ey fîraq; (10)
Remelê 8 pengavî Meqsûr Fa’ilatun/ Fa’ilatun/ Fa’ilatun / fa’ilat (fa’ilan) ( - u - - / - u - - / - u - - / - u - . )	‘Îd e Îro (2), Pur Hezîn im(3), Hat bi ser min da ji eywanê, hebîba pur-sîfat (4), Sed Hezar Le’net Muza’ef (8), Şehsuwarê ‘Irseê (9), Qubbeê neh taqê mîna ye(12), Ketme êşa cerx û zexman(13), Şehriyarê mesnedê Lewlak (15), Hey werin yar û bira (16), Nazikek peyker-perî(17) Ez zebanê ‘aşiq û Me’sûq (18)
Remelê 8 pengavî Mehzûf Fa’ilatun/ Fa’ilatun / Fa’ilatun / Fa’ila (fa’ilun) ( - u - - / - u - - / - u - - / - u - )	Peyrewê dermandeem (6), Kesk û sor û şîn û zer (11), Lebgul û gerdangul (14), Kakul û zulf(21), Ateş û me’sel dibarin(22), Kelbê Şahê Neqşîbend im (23) Pîrpizêk min girte yed (27)

**Tablo 7 Qaliba ‘Erûzê di Helbestên Dîwanê de**

## BEŞA SÊYEM TEHLÎLA DÎWANÊ

### 3.1 DÎN

Dewletên ku Îslamiyetê pejirandine di gelek qadên cîhanê de -yên wek huner, zanist û jiyana civakî- di bin bandora hevdu de mane. Yek ji van qadan jî edebiyat e. Edebiyatên ku di bin têsîra heman dînî de mane ji her alîyî ve xwedî taybetiyên hevpar bûne. Di berhemên xwe de heman teşeyê, heman weznê, heman mijarê, hwd. bikaranîne. Em nikarin edebiyata kurdî ya klasîk jî bêyî çarçoveya dînî bifikirin. Helbestvanên klasîk di berhemên xwe de ji unsûrên dînî sûdwegirtine û di helbestên xwe de alîkarî ji Xwedê xwestine û pesnê Hz. Pêxember (s.x.l) dane û hezkirina xwe bi me dane hîs kirin. Her helbestvanî; bûyerên ku hatine serê pêxember, çarxelîfe û sehabeyan bi şewazeke taybet anîne ziman. Hinek helbestvanan jî bûyerên ku zêde têsîrê li wan kirine, xwestine bi xwîneran bidin zanîn û wan ji van bûyeran agahdar bikin. Herwiha girîngî dane, çavkaniyên sereke yê dînê Îslamê –Qur'an û Hedîs- û bi rêya îqtîbasan ayet û hedîsên Resûlê Xweda (s.x.l.) di helbestên xwe de zikir kirine. Aqtepi jî di dîwana xwe de cih dane van têgehên. Em ê li jêr yek bi yek van têgehên rave bikin û ji malikên dîwanê mînakên bidin:

#### 3.1.1 Navê Xwedê

Di dîwana Aqtepi de, di nav teşeyên nezmê yê ji hev cuda de behsa nav û sifetên Xwedê hatiye kirin. Hin ji nav û sifetên ku di dîwanê de hatine behskirin ev in: “Wellah, Mewla, Ey Xuda, Huda Yezdan, Ya Reb, Ya Îlahî, Mewlayê Kebîr, Heq, Lîllah, Padşahê mezin, Şukru'lîllah, Padîşahê layezal, Bîllah, Hesbete'llah, Xudaya, hwd.”

Carna Aqtepi bangî Xwedê kiriye û alîkarî xwestiye, carna jî şukir jê re kiriye û mezinahîya Xwedê anîye ziman. Em ê hin mînakên ji dîwanê li jêr binivîsin:

**Şukur dîsa Xudê** da min, ji kê kim lewme û gazin

Hebîba dil wekî ah in, kirim toz ez bi xebrê ra (r. 39)

Der-xerîbê, berf û ba, rozê 'ecayîb dil kewand

Dê çi kim **Ya Reb meded!** Dunya li min têk bû 'ezab (r.45)



### 3.1.2 Melek

Melek di dîwanê de wek “melek, melaik, melek teb” derbas dibe. Aqtepi ji ber mizac, xulqşîrînbûn û xûyên melekan, dîlbera xwe (me’şûq) dişibihîne melekan.

#### Wek mînak:

Çi yarek taze bû dîlber, **melek- xwûyê**, perî-peyker  
Ji perdan, weqtê derket der; munewwer bû cîhan vê ra(r. 40)

‘Eceb şerînxeber xoncedîhen, nazikbeden ya Reb!  
Perîpeyker, sîfethorî, **melek teb’** û şekerxaê ! (r.167)

### 3.1.3 Kitêbên Pîroz

#### 3.1.3.1 Qur’an

Di dîwanê de ji kitêbên pîroz, tenê Qur’an cih girtiye. Aqtepi careke tenê behs kiriye. Di helbesta şeşan de derbas dibe.

Xelwetê der encumen, an şahê zîba mîkoned  
Hem şehînşahê cîhan, hem çeşmê ber pa mîkoned  
Hebbeza! Esrarê **Qur’anî** huweyda mîkoned  
Der lîbasê ehlê dunya, karê ‘uqba mîkoned  
Xerqeê fiqrest ê punhan, ser qebayê Neqşîbend (r. 61)

### 3.1.4 Pêxember

#### 3.1.4.1 Hz. Muhemmed

Pêxemberê dawî û yê herî mezin e. Di edebîyata klasîk de, cihekî taybet digire û bûye mijara helbestên klasîk. Helbestvanên klasîk di gelek teşeyên nezmê de behsa pêxemberbûna wî û taybetîyên wî kiriye û her wiha helbestvanan di helbestên xwe de hezkirina xwe anîye ziman û şefaet û alîkarî jê xwestine.

Di dîwanê de, Murebbe’a di rêza 15an de bi awayekî berfireh behsa Hz. Pêxember (s.x.l) tê kirin. Di vê Ne’tê de, bi van nav, nasnav û sifetan derbas dibe: “Şahê Enbîya, Resûlellah, Hebîbellah, Ebe’l- Qasim, Ebe’l-Zehra, Ebe’t-Teyyîb, Ebe’t-Tahir, Muqtedayê serfirazan, ‘Ul’ul- ‘ezmî’r- rusul, Şahê ‘Alem, Sultanê Şefî’ê,

Destegîr, Cedd'îl- Hesen Şahê Huda, Şefî 'el-muznîbîn, Şahê Herdu Sera, Sultanê Fexru'l 'Alemîn, Şehê Sahibqebûl, Şefî'ê 'Ummetê, hwd.”

Dîsa di Murebbe'a ku bi terza Medhîyeyê li ser Hz. Elî hatiye nivîsîn, wek Ehmed û Mustefa hatiye behskirin û her wiha bi rêya hunera Telmîhê di hedîsa “lewlak”ê de jî hatiye behskirin. **Weke mînak:**

Reş me kir defter ji 'îsyân û gunehan, wey li min!

Bê'emel, rûreş li ber dergahê Padşahê Mezin

Dad û feryada me, **Sultanê Şefî'ê îns û cin**

Ya **Resûlellah** dexîl im! Ya **Hebîbellah** dexîl! (r. 98)

#### **3.1.4.1.1 Zarokên Hz. Pêxember (s.x.l)**

Navê du zarokên Hz. Pêxember (s.x.l.) derbas dibe: Qasim û Fatimatuz-Zehra.

Hz. Fatima di du helbestan de derbas dibe. Di helbesta ne'tî de ji bo Hz. Pêxember (s.x.l) wek “Ebe'l-Zehra” derbas dibe; yanî bavê Zehrayê, ev têgeh ji bo Pêxemberê me hatiye bikaranîn. Di medhîyyeya ji bo Hz. Elî de, heke navê wê na, leqeba wê “Betûl” derbas dibe. Aqtepi, ji bo Hz. Elî (s.l) dibêje: “Mêrê jina paqij û betûl; yanî mêrê jina binamûs û bişeref”.

Hz. Qasim, ew jî wek . “Ebe'l- Qasim” cih girtiye. Ew jî wek nasnavên Hz. Pêxember (s.x.l) e û tê maneya “Bavê Qasim.”

Canfîdayê rahê heq, kîşwer guşa behrê Resûl

Ber konendê babê Xeyber, **şewherê pak ê Betûl**

Roz û şeb, qûtê rewanim, ey şehê sahibqebûl!

La feta îlla 'Elî, la seyfe îlla Zu'l-feqar (r. 72)

Şehriyarê mesnedê Lewlak î, Şahê Enbîya!

Ya Resûlellah dexîl im! Ya Hebîbellah dexîl!

Qabê qewseyn paye-et, ser xeylê cem'ê esfîya

Ya **Ebe'l- Qasim** dexîl im! Ya **Ebe'l-Zehra** dexîl! (r. 96)

### 3.1.4.1.2 Alê Mustefa / Alê Resûl

“Al” bi Erebi ji alfyê nîjadê ve malbata Hz. Pêxember (s.x.l) e. Ev nisbet ji Hz. Pêxember (s.x.l.) re cismanî dibe. Rewşa zarokên Hz. Resûlellah (s.x.l) dikeve vê komê. An jî, ev nisbet manewî dibe. Alim, Welîyên Kamil, Hakimên Rebbanî jî xwe li nav wê komê digirin.<sup>173</sup> **Wek mînak:**

Wan le’înan, weqtê “**Alê Mustefa**”, dan zehmetê  
Lerze ket ecsamê Kursî, Sîdre û ‘Erşê mecîd

### 3.1.4.2 Hz. Îbrahîm

Navê wî derbas nabe, lê bûyera ku hatiye serê wî bi rêya hunera Telmîh û Şibihandinê hatiye behskirin. **Wek mînak:**

Bes tezellum ke ji destê fîrquetê pur derd û xem  
Ateşek berda dilê min, te’j kelimê ba-elem  
Weqtê şefqet kim; li te, zulfan vekim şubhê ‘elem  
**Narê Nemrûdî bikim** ser te wekî **baxê ne’îm**(r. 116)

### 3.1.4.3 Hz. Mûsa

Pêxemberê sêyem yê ulu’lezmê ye ku jê re kitêba pîroz “Tewrat” hatiye şandin. Yek Pêxemberên ku navê wî di Quranê de herî zêde dibuhire, Mûsa ye.<sup>174</sup>

Ev Pêxember, di edebîyata klasîk de, bi giştî, peyv û navên wek “Kelîm, Kelîmullah, Tecellî, Çîyayê Tûrî û Wadî Eymen” tê behskirin. Di dîwana Aqtepî de jî ev taybetiyên wî cih digirin. Di helbesta ewil de, bi peyvên “Tecella û Çîyayê Tûr” hatiye zikirkin.

Ger muyesser bit ji bo me meclîsek xelwet- kemal  
Kes ji bedxwahan nebit hazir li meydana cemal  
Find û fanosan vekim bo te ji zulf û bisk û xal  
Dê tecellî kim li te carek, **çu Musayê Kelîm**(r. 117)

<sup>173</sup> Ethem Cebecioğlu, *Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*, PDF, r. 16.

<sup>174</sup> Ayşe Merve Hoşab, Sırrî Rahile Hanım Divanı’nda Dinî Kişilikler, *KSÜ İlahiyat Fakültesi Dergisi* 29 (2017) s. 238.

#### 3.1.4.4 Hz. Yûnis

Yek ji pêxemberên Benî Îsrâîlê ye. Ji bo xelkên bajarê Neynewaya li derdora Musulê hatiye şandin. Piştî şandinê û her çi qas ku Pêxember Yûnis (s.x.l) ji miletê xwe re behsa ezaba Xwedê jî kiribe, dîsa jî guh neda gotinên wî û ji seneman re diçûn sicudê. Ew jî aciz bû, çû qeraxê Çemê Dicleyê û bê xeber li keştîyekê siwarê bû. Ji ber ku bêyî îzna Xwedê Teala li keştîyê siwar bû, piştî demekê keştî li nav avê gelekî dilehîst, rabû siwarên pê re, got: “Yekî sûcdar di nav me de heye, em peşkê bavêjin, ji kê re derkeve em ê wî biavêjin avê. Peşk avêt, her sê caran jî ji Pêxember Yûnis re derket. Ew avêtin behrê, hûtekî ew dabeland. Ji ber ku Yûnis (s.x.l) bêyî îzna Xwedê dev ji cihê xwe berda, gelek poşman bû. Efû xwest. Di nava zikê hût de çil rojan tewbe kir. Talîyê Xwedê Teala ew efû kir û hût wî avêt qeraxê behrê. Dema ku Yûnis Pêxember ji zikê hût hat derxistin, hal lê nemabû û gelek zeîf bûbû. Xwedê, ew bi şîrê Xezalan xwedî kiriye. Di wê navberê de, xelkên Neynewayê jî gelek poşman bûne û li wî gerîyane. Dema ku Yûnis Pêxember li Neynewayê vegeîya, xelk jê bawer bûn.<sup>175</sup>

Di dîwanê de jî, bi rêya hunera Telmîhê ev bûyer hatiye bibîrxistin; 2 ‘aşîq bi rêya şibihandinê rewşa xwe anîye ziman. Di malika jêr de, helbestvan dibêje: Çav li rê ye şev û rojan di nava agirê fîraqê de, çav ronî ye, guh li rê ye bi kêfxweşî û şahî, kes tunene carek werin li ba me/ min ey şahê ‘alîneseb, wekî Yûnis Pêxember di behre de, di nava zikê hûtê mezin de. Helbestvan, di vê malikê de rewşa xwe şibihandiye rewşa Yûnis Pêxember. Çawa ku Yûnis Pêxember di nava hûtê mezin de, tenê û guhê wî li rê, li benda Xwedê be, ‘aşîq jî mîna Yûnis Pêxember li benda yara xwe ye.

Muntezîr mame di nêv pêta fîraqê, roz û şeb  
Çeşmê nîr û guh li rê, yek bi yek ba ferh û t’Ereb  
Kes nehin bêk nik me, carek ey şehê ‘alîneseb  
Her wekî **Yûnis** di behrê, der **zikê hûtê** ‘ezîm(r. 116)

#### 3.1.4.5 Hz. Îsa

Ew jî pêxemberekî Xwedê ye û jê re Încîl hatiye şandin. Hz. Îsa, -bi îzna Xwedê- mirî bi hilma xwe sax dikirin, çavên koran vedikirin û nexweşî sax dikirin.

<sup>175</sup> Pala, h.b.r. 483.

Mesîh, Mesîhâ, Rûhullah û Îbnu Meryem navên wî ne. Mûcîzeyâ wî ya ku însanan sax dikirin, yek ji mijarên mezmûnê edebiyata rojhilat in.<sup>176</sup>

Di dîwana Aqtepe de jî bi van taybetîyan derbas dibe.  
Bo te qafî kim, kelimê; guh bide beyta fesîh  
Zanim ez naête destê min, ‘‘aşiqê çendîn melîh  
Abê heywan im, bixwe hem **nefsê enfas ê Mesîh**  
Dê li te pîrî bedel kim, hey bikim ‘ezmê remîm (119)

### 3.1.4.6 Hz. Suleyman

Hz. Suleyman yek ji pêxemberên hikumdar e. Hikumdarekî xwedîyê seltenat û hêzên derasayî ye. Di helbesta klasîk de, gelek behsa textê Hz. Suleyman tê kirin. Li gorî rîwayetan, her çiqas ku kesekî dewlemend, xwedîyê hêzeke bêhempa û li hemû cîhanê hikum kiribe jî, debara xwe bi zembîlfirotinê kiriye. Hz. Suleyman xwedîyê hikumdarî û hêzeke ewqas mezin bûye ku –bi îza Xwedê- ba jê re hatibûye siuxrandin û heta ku bi hikum li cin û şeytan jî bike, lê talîya talî ew jî wek hemî pêxemberan, emrê Xwedê pê tîne û mala xwe bar dike. Ev rewş, ji aliyê helbestvanan ve hatiye vegotin.<sup>177</sup>

Perde û berqe hilanî, da me destûr û tewaf  
Noşî kir ‘aşiq ji le’lan, badeê nûrîn şefaf  
Xatem<sup>178</sup> û **textê Suleyman**, zeptî kir min bêxîlaf  
Şahê textê ‘işq im, ez navê me dunya bêguzaf  
Yek bes e, min yek dizanim dîlbera ‘alîsîmat(r. 49)

### 3.1.4.7 Hz. Eyyub

Hz. Eyyub (s.x.l), gelekî dewlemend bû. Deh kurên wî hebûn, tev jî koça dawîn kir. Gelek bela hatin serê wî. Lê tu carî gazin nedikir; her tim ji Xwedê re şukir dikir. Lewra, îbtîlayeke Xwedê Teala bû. Piştî êş û zehmetîyan, Xwedê dîsa zar

<sup>176</sup> Ahmet Talat Onay, *Açıklamalı Divan Şiiri Sözlüğü – Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar ve İzahı-*, (hazırlayan: Cemal Kurnaz) Kurgan Edebiyat Yayınları, Ankara 2013., h.b.r. 225.

<sup>177</sup> Bo zêdetir agahî bnr. Dursun Ali Tökel, *Divan Şiirinde Şahıslar Mitolojisi*, Fatih Sultan Mehmet Vakıf Üniversitesi Yayınları, 2. Baskı, İstanbul, Ağustos, 2016, h.b.r. 231-240.

<sup>178</sup> Xatem, ji aliyê Mehmet Emîn Hêvîdar ve wek kesayetekî hatiye nîşan dan, lê li gorî tespîta me Xatem ne kesayetek e, Xatem tê maneya muhra Hz. Suleyman.

û mal dayê. Di hemû dîn û edebîyatên rojhilatî de, ji bo tehemul û sebrê ye mîna keke berçav e.<sup>179</sup>

Di dîwana Aqtepe de jî tenê carekê û bi vê tabetîya xwe hatiye behskirin. Aqtepe, ji aliyê sebir û tehemulê ve xwe dişibihîne Hz. Eyyûb.

Mubtela, **Eyyubî weş** bûme di hîcra dîlberê

‘Iraq û ensabê’ m, ji hev weryane, nabin întiqal(r. 105)

### 3.1.4.8 Luqman

Der heqê Pêxembertî yan jî welîbûna wî de (s.x.1), hin cîyawazî hene. Di helbesta klasîk de, yek ji şexsîyetên sembola ferasetê ye. Ji ber hostetîya wî ya der heqê “Tib”ê de, gelek behsa wî hatiye kirin.<sup>180</sup> Di dîwanê de me’şûq bi Luqman hatiye şibhandin.

Bo te bejim “aşiqê min; qenc li nutqê, guh bidêr

‘Eynî îksîr im, bi husnê mest dikim teşbîhê zêr

Rûbehek na-kes, boyî ‘işqa me, da te îsmê şêr

Hem çu **Loqman** im, bi weslê, xweş dikim qelbê seqîm (r. 118)

### 3.1.5 Çar Xelîfe

#### 3.1.5.1 Hz. ‘Elî (s.l)

Ji nav her çar xelîfeyan, Hz. Elî yê dawî ye. Kurmam û zavayê Hz. Pêxember (s.x.1) e. Yek ji wan çar kesên ku ewil Îslam qebûl kiriye, Hz. Elî (s.l) ye. Ji ber ku di 8-9 salîya xwe de Îslam pejirandiye û pê li pûtan kiriye, wek “Kerremallahu wechuhu” rêza wî tê girtin.<sup>181</sup>

Wek ku me di beşa cûreyên nezmê de jî behs kiribû, Aqtepe di dîwanê de Medhîyyeyek li ser Hz. Elî (s.l) nivîsandiye. Di vê Medhîyyeyê de cih daye nasnavên Hz. ‘Elî (s.l): “Şîrê Yezdan, Heyderê Kerrar, ‘Elîyy’ul-Murteza, Şahê Merdan...”

Bi hespê xwe yê bi navê Duldul û şûrê xwe yê bi navê Zulfiqar, gelekî tê zikir kirin. Misraya ku wek “**La feta îlla ‘Elî, la seyfe îlla Zu’l-feqar!**”<sup>182</sup> tê

<sup>179</sup> Onay, h.b.r. 171.

<sup>180</sup> Tökel, h.b.r. 336.

<sup>181</sup> Pala, h.b.r. 18.

<sup>182</sup> Ji xeynî ‘Elî xortê mêrxas nîne, ji xeynî şûrê Zulfeqar, şûr nîne.

nivîsandin yek ji çavkanîyên sereke yên hunera îqtbasê ye. Ev hevok, li gorî rîwayetan, di cenga Uhudê de ji ber jêhatîbûna wî Cebraîl ji bo wî bi kar anîye.<sup>183</sup>

Di Murebbe'ê de jî, Aqtepi vê misrayê di dawîya hemû bendên Murebbe'ê de wek misraya neqaratê dubare kiriye û cûreyê Murebbe'a Mutekerrîrê derxistiye holê. Çend malik ji vê Murebbe'ê:

**Şahê Merdan, Şîrê Yezdan; Îbnu 'emmê Mustefa**

Rehberê rahê heqîqet, ustê Sultanê Huda

Fîkr û efkarim hemîn bes ya **'Elîyy'ul-Murteza!**

**La feta îlla 'Elî, la seyfe îlla Zu'l-feqar!**

**Xwecayê Qenber, siwarê Duldulî** eser ejder sifet

**Fatihê Xeyber**, çeraxê weqtê kufr û mezlemet

Rûhîyê, derwêşî-ra ferman nîgahê merhemet

**La feta îlla 'Elî, la seyfe îlla Zu'l-feqar!**

(r. 71-72)

### **3.1.6 Sehabe**

#### **3.1.6.1 Hz. Huseyn**

Kurê Hz. 'Elî (s.l) û nevîyê Pêxemberê me ye. Di nav 12 îmaman de kesê sêyem e. Di sala 628an de hatiye dunyayê û di sala 683an 10ê meha Muharemê li Kerbelayê şehîd dikeve.<sup>184</sup> Di edebîyatê Îslamî de, der heqê wî de gelek mersîye hatine nivîsîn. Aqtepi jî qesîdeyeke bi cûreyê Le'netnameyê li ser bûyera şehîdbûna wî nivîsandiye. **Wek mînak:**

Gûşîwarê gûşê 'erş î, re'sê pur-xûnê **Huseyn**

Murtefî kir ser sînanan, cümle ew qewmê 'enîd (r. 67)

#### **3.1.6.2 Hz. Hesen**

Hz. Hesen jî kurê Hz. 'Elî (s.l) ye û birayê Hz. Huseyn e. Di dîwanê de, carekê navê wî derbas dibe. Di Murebbe'a ku der heqê Pêxemberê me de (s.x.l.)

<sup>183</sup> Pala, h.b.r. 19.

<sup>184</sup> Pala, h.b.r. 218.

hatiye nivîsîn, navê wî tê zikirkirin, ew jî wek sifetekî ji bo Pêxemberê me ye:  
“Cedd’îl Hesên yanî bapîrê Hesên.”

Cangiran û tenbel û keslan, li ta’etê Xuda  
Lê, li kesba fi’le bed, bêhed xeyûr û canfîda  
Sed hezar îmdadê min, **Cedd’îl- Hesên Şahê Huda!**  
Ya Resûlallah dexîl im! Ya Hebîbellah dexîl!(r. 99)

### 3.1.6.3 Ehlê Bedir

Ehlê Bedir yanî ew sahabeyên ku beşdarî cenga Bedirê bûne, ji wan re tê gotin. Di cihekî Dîwanê de derbas dibe. Aqtepi di Medhîyyeya ku der heqî Şêxê Terîqeta Neqşîbendîyê nivîsandiye de bangî Şêx dîke û dibêje: “Nefs û şeytan li min bûne musellet, zulmê li min dikin, mame di nav însanên bê qedir de, min xwe avêtiye bextê te; yanî min xwe avêtiye maçîkirina lingê te, ji bo xatirê ehlê Bedir, hazirê îmana min be; îmana min biparêze.”

Nefs û şeytan’em li min bêhed kirin cewr û xedir  
Mam di nêv ebnaê cînsê xwe, zelîl û bêqedir  
Dexlê pa-bûsê te me, bo xatirê **ehlê Bedir**  
Hazirê îmana min be; weqtê, ruh tê ser sedir  
El-eman, şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me! (r. 146)

### 3.1.6.4 Qeder

Hukmê Xwedê yê ezêlî ye û yek ji şertên îmanê ye.<sup>185</sup> Di dîwanê de, di nav gotineke Erebi de cih girtiye. Helbestvan dibêje: Min îman bi qederê anîye; yanî ez pê bawer im.

“Rûhî” ji ‘îşq sotinê, çendî dirêj kî gotinê  
Nakim ji ‘ebdan gazinê; **amentû heqqen bi’-qeder**<sup>186</sup>(r.78)

<sup>185</sup> Pala, h.b.r. 247.

<sup>186</sup> Heqîqeten min îman bi qederê anîye, ez pê bawer im.



### 3.1.7 Hin Têgehên din ên Dînî

#### 3.1.7.1 Axret

Dinyaya din. Dema ku qîyamet rabû, hemû heyîn wê dest ji dinyayê berdin û wê jîyana axretê dest pê bike. Jîyana axretê, li gorî emelan, an di Cehennem an jî di Cennetê de wê bidome.<sup>187</sup> Yanî ev jîyan wê li gorî nirxandina emelên mirovan pêk were; kesên ku emelên wan baş bin wê jîyana wan di Cennetê bidome, ên ku emelên wan xerab bin wê ‘ezaban bikşîne. Aqtepî, di helbestên xwe de daxwaza xwe anîye ziman û her tim hêvîdar e ku di axretê de rûyê yara xwe bibîne û bigihêjê. Di malikekê de jî dibêje: “Heger ez di axretê de rûyê yara xwe bibînim, ez ê wek Mecnûnê Leylayê şa bim”. Ev têgeh di dîwanê de bi navê ‘Uqba derbas dibe, **Wek mînak:**

Xudaya! Rûhîyê miskîn, luqebdarê bi Şemsîddîn

Ji wesla dîlbera narîn, nekî mehrûm, di ‘**uqbaê** (r. 162)

Aqtepî, di vê malikê de bangî Xuda dike û dibêje: “Ey Xuda, tu Rûhîyê reben ê ku leqaba wî Şemsîddîn e, di Axretê de bi ghişîna dîlbera narîn/ yara wî mehrûm nekî!”

#### 3.1.7.2 Heşr û Neşr (Qîyamet)

Têgeha qîyametê, di dîwanê de wek “roja qiyametê, roja întîqam û heşr û neşr” derbas dibe. Roja întîqam û heşr û neşr carekê cih girtiye lê peyva “qiyamet”ê di hin cihan de hatiye bikaranîn. **Wek mînak:**

Esfelê safil bikî cayê Yezîd û leşkeri

Reş bikî **roja qiyamet**, cumle wan rûyê pelîd (r. 69)

Di vê mînakê de, Aqtepî le’netê li ser Yezîd û eskerên wî tîne û dibêje: Rûyê wan ê qirêj û rezîl reş bike roja qiyametê.

---

<sup>187</sup> Pala, h.b.r. 12.

### 3.1.7.3 Cennet (Behişt)

Cihê înanên ku emr û daxwazên Xwedê û Pêxember (s.x.l) pêk anîbin û li ser îmanê miribin, jê re Cennet tê gotin.<sup>188</sup> Di Cennetê de, jîyaneke ebedî heye. Di dîwanê de wek “Cennet û buhuşt” derbas dibe. **Weke mînak:**

Di ‘işqa dîlbera nûrî, letîf û wek gula cûrî  
Nevê, min **cennet** û horî, feqîr im, bo tecellaê (r. 160)

Li gorî rîwayetan, heşt cînet hene. Navên wan; Ne’îm, Adn, Huld, Firdews, Me’wa, A’la, Darû’s-selam, Rawza.<sup>189</sup> Di dîwanê de, Aqtepi cih daye “Baxê Ne’îm û Firdewsê.”

### 3.1.7.4 Baxê Ne’îm

Bes tezellum ke ji destê fîrretê pur derd û xem  
Ateşek berda dilê min, te’j kalamê ba-elem  
Weqtê şefqet kim; li te, zulfan vekim şubhê ‘elem  
Narê Nemrûdî bikim ser te wekî **baxê ne’îm**(r. 116)

### 3.1.7.5 Firdews

Weqtê qîyama sa’etê; bêwerdê baxê wusletê  
Wellahî naçim cennetê; nadim li **Fîrdewsê** nezer(r. 77)

### 3.1.7.6 Ava kewser

Di cennetê de, navê çemekî ye. Di edebîyatê de ji şeraba pak, şîrîn û temîz re tê gotin.<sup>190</sup>

Badeya saf ê ‘eqîq î, ez kefê horî weşan  
Lezzeta **kewser** didit, sofî nizanit qîmetê(164)

### 3.1.7.7 Horî

Horî heyîneke ji cennetê ye. Ji ber sipehîtiya xwe, me’şûq dişibihînin hûrîyan.<sup>191</sup> Aqtepi jî di dîwana xwe de carna wek heyînek, carna jî ji bo rûyê yarê an

<sup>188</sup>Nilüfer Karadavut, *Za’îfe Divanı (metin-inceleme)*, Adnan Menderes Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Ana Bilim Dalı TDE-YL-2008-0003, r. 53.

<sup>189</sup> Onay, h.b.r. 106.

<sup>190</sup> Onay, h.b.r. 257.

<sup>191</sup>Nejat Sefercioğlu, *Nev’î Divanı’nın Tahlili*, Akçağ Yayınları, 2. Baskı, Ankara 2001, r. 134.

jî yar bi xwe şibihandiyê hûrîyan. Di vê mînaka li jêr de jî, çavê yarê şibihandiyê hûrîyan:

Sed sebah'ul-xeyrê min, xakîpayê dîlberê  
'Îsewî teb'ê! Kubarê! Nazikê! Dêm-enwerê!  
Çeşmê **horî**, werdê cur î, qedd û qamed-'er'erê  
Der-lehîbê ateşe, ez ket'me pencê beglerê  
El-eman! Sed el-eman! Ey bejn û bala î'tîdal! (r. 87)

### 3.1.7.8 Cehennem (Dojeh)

Beravajî Cennetê ye; cihê ku di Axretê de însanên emr û daxwazên Xwedê û Pêxember (s.x.l.) pêk neanîne û li ser kufrê mirine, jê re Cehennem tê gotin. Ev têgeh di helbesta heştan a bi terza Le'netnameyî de derbas dibe. Aqtepi bangî Xwedê dîke û dibêje: “Ya Îlahî di cehennemê de xûn û ava zer bide Yezîd û alîgirên wî.”

Çûn, nehiştin abê şêrîn te'mî kin alê Resûl  
Ya Îlahî! Der **cehennem** bid'ye wan xûn û sedîd (r.68)

### 3.1.7.9 Eşfelê Safil

Tê maneya kesên herî sefil. Di Cehennemê de cihê herî kûr û pîs e. Aqtepi di helbesta heştan de cih daye vê têgehê. Ev têgeh jî ji bo Yezîd û alîgirên wî hatiye bikaranîn. Aqtepi dîsa bangî Xwedê dîke û dibêje: “Eşfelê safil bike para Yezîd û alîgirên wî.”

**Eşfelê safil** bikî cayê Yezîd û leşkerî  
Reş bikî roja qiyamet, cumle wan rûyê pelîd (r. 69)

### 3.1.7.10 Dîn, Îman, Kufir, Misilman û Kafir

Îman, pejirandin û tesdîqkirina rênimayên ku Dîne Îslamê pê hatiye; wek: Xwedê yek bê hevrê û bê heval e û Muhemmed Pêxember Resûlê wî ye û hwd. Kufir, Berevajî îmanê ye, kesê ku bawerîy wî hebe, jê re mûmîn an jî îmandar, ê ku

înkâr dîkin û bawerîyê pê nayin, jê re kafir an jî gawir tê gotin.<sup>192</sup> Aqtepî di dîwanê de cih daye van her çar têgehên jî. **Wek mînak:**

Vegirin ye'nî li rûhê xwe, derê **kufir** û 'înad  
Dane ser ebwabê rehmet, aşkera qufl û kilîd (r. 67)

Kakul û zulf û çeşmeş, çunkî qesdê can dîkin  
Wan dizanim **kafir** in, qetlê **Musulmanan** dîkin (r.133)

Nefs û şeytan'ê li min bêhed kirin cewr û xedir  
Mam di nêv ebnaê cînsê xwe, zelîl û bêqedir  
Dexlê pa-bûsê te me, bo xatirê ehlê Bedir  
Hazirê **îmana min** be; weqtê, ruh tê ser sedir  
El-eman,şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me! (r. 146)

### 3.1.7.11 Îsayî (Mesîhî û Dêr)

Ji peyrew û bawermendên Hz. Îsa Mesîh û kitêba Incîlê re Îsayî (Mesîhî) tê gotin. Dêr jî perestgeha Mesîhîyan e.

Şerbetek abê surahî, bexşî ke ber î n feqîr  
Da ji îhsanê te, carek cebrî bit qelbê kesîr  
Bendeê Pîrê Muxan im, ey şehînşeh destêgîr  
Sakîne **dêr** im ji bo 'Îsaîyan mame esîr  
El- eman! Sed el-eman! Ey min jî hîcret nalenal! (r. 91)

### 3.1.7.12 Pût (But; Senem)

Heykelên ku ji alîyê muşrîkan ve hatine çêkirin û perestînin, jê re dibêjin “Pût”; ên di şikilê însanan de xweşik hatine tiraştin jî “senem” e.<sup>193</sup> Di edebîyata klasîk de bi rêya hunerên wek Istîfare û Teşbîhê; “Pût û Senem” jî bo me'şûqan tê bikaranîn. Dema ku helbestvanên klasîk behsa me'şûqa xwe dîkin, jî van têgehên sûd

<sup>192</sup> Haluk Aydın, *Cevrî Divanı'nın Tahlili*, Balıkesir Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili Ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Doktora Tezi, Balıkesir 2010, r. 101.

<sup>193</sup> Onay, h.b.r. 99.

werdigirin û xweşikîya yara xwe tînin ziman. Helbestvan/ ‘aşiq jî, ji ber ku van dihebînin, di edebîyata klasîk wek pûtperest de cih girtiye. Ji ber xweşikîya me’şûqan, hişê wan tevlihev bûye û ji bo wan secde dîkin; yanî ‘aşiq gunehkar in û di rola kafiran de ne. **Wek mînak:**

Çendî nazik herekat e, **butê** gul pîrehenem  
‘Îşwe-gul, nazî-gul û rûniştin û reftar e gul(r. 93)

Çi’b kim ez Dicle diçî pêl bi pêl ta mulkê ‘‘Ereb  
Lê çî fayde, zar û mehrûm im, feqîr im teşneleb  
Her ji ber bêkamî û bêçaregî kerbû kezeb  
Nabe carek zû, di tirbê ey **senem** ber min rehîm! (119-120)

### 3.1.7.13 Pûtperest

Kesên wan pûtan (heykel) dihebîne; yanî kafir.  
Dergehê mizgîn û şahî, bazî kir yarê şepal  
Çûm tewafa xalê eswed, ‘aşiqê bêdil, bi hal  
Lezzeta halê wîsalê, nagihê sed ‘ilmê qal  
**Butperest-asa**, me bir secde, li ber dêmê bixal  
Berq û enwarê me pur kir, erd û heftem tebeqat (r. 50)

### 3.1.7.14 Limêj (Secde)

Limêj, di dîwanê de wek ‘‘limêj û secde’’ derbas dibe. Têgeha limêjê di helbesta bîstan de derbas dibe. Secde jî du caran hatiye bikaranîn. ‘aşiq jî ji ber sipehîtiya yara xwe, li ber secde dike, yanî ne wek unsurekî îbadetê, bi maneyeke mecazî derbas dibe. ‘aşiq, ew qas girêdayî me’şûqa xwe ye, bejna xwe li ber yarê ditewîne û li ber secde dike.

Minnet û sed minnet e, ber ‘‘aşiqê bêdil te kir  
Rûhîyê damendera, genca kerem dîsa vekir  
Perde avêtî ji ber dêmê, me halî **secde kir**  
Lew, di nêv ‘‘aşiqê ‘alem; ez bi weslî, bûm wesîm! (r. 122)

### 3.1.7.15 Du'a

Di dîwana Aqtepi de, ev têgeh di teşeyên nezmê yên ji hev cûdatir de cih girtiye. ‘aşiq, gazinan dike û dibêje ez mame di mekanê, cihê xurbetê, lê kes nîne bo min dua bike.

Kes **du'a nakit** ji bo min, mam di darê xurbetê  
Têk cîhan bûz e, sipî nîn e reşayî wek xurab(r.46)

### 3.1.7.16 We'z

We'z tê wateya nesîhetên dînî. Di dîwanê de sê caran cih girtiye.  
Serfê beser, wechê hebîb, yekser di nêv ‘alem xerîb  
Ey wa'izê gotin ‘ecîb, **we'za** xwe bigre muxteser (r.77)

### 3.1.7.17 ‘Ummet

Di ferhengê de wek “kesên ku girêdayî Pêxemberekî, an jî civaka girêdayî dînekî” hatiye pênasekirin.<sup>194</sup> Ev têgeh di dîwanê de du caran derbas dibe; yek helbestvan xwe wek ferdekî ‘ummetê dibîne; a din jî ji bo îfadekirina Hz. Pêxember (s.x.l) hatiye bikaranîn. Di mînaka jêrîn de, “Ey Şefî'ê Ummetê” ew kesê ku şefaetê dike, yanî Hz. Pêxember (s.x.l) hatiye îfadekirin.

“Rûhî”yê derwêş vewestayê li Babê Rehmêtê  
Lê ji ber mewca gunahan, ketye xewf û xeşyetê  
Dûr nekî vî bênewaî, **ey Şefiyê ‘Ummetê**  
Ya Resûlellah dexîl im, ya Hebîbellah dexîl! (r. 102)

### 3.1.7.18 Bende (‘Ebd; ‘Evd)

Di edebîyata klasîk de, wek “‘ebd, çaker, xulam û êsîr” derbas dibe. Gelek caran bi padîşahan re tê bikaranîn. Lewra yar (me'şûq) Sultan e, ‘aşiq jî ‘ebd e. Taybetîyên bendeyan berevajî yên Padîşahan in.<sup>195</sup> Di dîwanê de, her du peyv jî derbas dibin. Helbestvan, hin caran xwe wek bendeyê yara xwe dibîne, hin caran jî xwe di meqamê koletîyê de hîs dike. **Wek mînak:**

<sup>194</sup> Karadavut, h.b.r. 73.

<sup>195</sup> Pala, h.b.r. 66.

Besteê zencîrê zulf im, **bendeê** xalê sîyah

Mubtelayê xebxeb im şefqet ke ya bînt'el-kîram(r. 111)

Di vê malikê de, helbestvan xwe wek xulamê yarê dibîne û dibêje: “Girêdayî pora te ya wek zîncîran bi hev de ketî me, bendeyê xalê (şehnik) te yê reş im. Mubtelayê yan bengîyê gerdena te me, şefqet ke li min yara bi esl!”

### 3.1.7.19 Şehîd

Ew kesên ku di dema şerên rêya Xwedê de bîn kuştin, jê re Şehîd tê gotin. Mumînên ji alîyê asî û talanker ve bîn kuştin, ew jî şehîd in.<sup>196</sup> Di dîwanê de, bi du awayan vê têgehê cih girtiye. **Wek mînak:**

Ah di vê mahê Muharrem da, **Huseynê'm bû şehîd,**

Musteheqqê le'n û teqbîhê ebed, bûye Yezîd (r. 66)

Wek ku tê zanîn, Hz. Huseyn ji alîyê Yezîd ve hatiye kuştin û wek şehîd hatiye hesabandin. Di dîwanê de bi vê munasebetê derbas dibe:

**Şehîdê çeşmê cellad im,** hewadar im bi bejnê ra,

Di 'îlmê 'îşqê neqqad im, rîwayet kim ji 'amê ra (r.37)

Vê têgehê di dîwanê de bi awayekî mecazî jî cih digire. 'aşiq, xwe wek şehîd dihesibîne. Lewra, 'aşiq ji alîyê çavên yarê yên kujer ve, şehîd bûye.

### 3.1.7.20 Heram û Helal

Tiştên di şerîtetê de hatine qedexekirin, heram in. Helal jî berevajî wê ye;<sup>197</sup> yanî tiştên ku li gorî şerîtetê helal e. Di dîwanê de, helal du caran, heram jî carekê derbas dibe.

Îmşebê 'îşret-fîza, dîlber ku mihman e li min,

Ber herîfan xwab û xurdî, mezhebê 'îşqa **heram** (r. 110)

Der-daîreê 'îşqê, çu merkez di mîyan im,

Hemware çunan im.

---

<sup>196</sup> Pala, h.b.r. 423.

<sup>197</sup> Pala, h.b.r. 192.

Medhûşê şerab û meyê ‘îşq im, bi **helalî**,  
Sergeşte û dîn im. (r. 124)

### 3.1.7.21 Qurban

Heywanên ku ji bona rêya heq tê serjêkirin, qurban e.<sup>198</sup> Lê di dîwana Aqtepe de, di vê maneyê de nehatiye bikaranîn. ‘aşiq, ji bona yara xwe, xwe wek qurbanekî dibîne û ji bona yara xwe, xwe qurban dike. Wek ku tê zanîn, di sibeha ‘Îda Qurbanê de, ji bo Xwedê, heywan tî serjêkirin. Di dîwanê de jî ‘aşiq, wek qurbanên ku di sibeha ‘Îda Qurbanê de tê serjêkirin hatiye teswîrkirin; yanî ‘aşiq jî dixwaze di sibeha ‘Îda Qurbanê de, qurbana yara xwe bibe.

Çi yarek min heye, şêrîn tebarek,

**Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban!**

Di subhê ‘Îdê Qurbanê mubarek,

**Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban! (r. 127)**

### 3.1.7.22 Perî

Ev tesewir ji ber bawerîyên der heqê perîyan de ne. Perî nayên dîtin; loma, ji ber ku taybetî li cem me’şûqan jî heye, me’şûqan dişibihînin perîyan.<sup>199</sup> Me’şûq her tim xwe li ber ‘aşiqan vedişêrin û xuya nakin û carna jî sipehîtiya perîyan dibe unsurekî teşbîhê. Di dîwanê de, vî unsurî neh caran cih girtiye. ‘aşiq, rûyê yara xwe dişibihîne rûyê perîyan; yanî li gorî ‘aşiq, rûyê me’şûqa wî wek rûyê perîyan sipehî ye.

Çi yarek taze û dîlber, melek xwuyê, **perîpeyker**

Ji perdan, weqtê derket der; munewwer bû, cîhan vê ra (r. 40)

---

<sup>198</sup> Onay, h.b.r. 270.

<sup>199</sup> Sefercioğlu, h.b. r. 133.



### 3.1.7.23 Cin

Di dîwanê de, ev unsur, bi peyva “ins-insan” re hatiye bikaranîn.

Haletê nez’ê me feryad e, Resûlê Kîbrîya!

Pêşîwayê **îns û cin**, Siltanê cem’a enbîya

Ez nebim serdefterê cem’a xebîs û eşqîya

Ya Resûlellah dexîl im! Ya Hebîbellah dexîl! (r. 102)

### 3.1.7.24 Şeytan

Ev têgeh, di dîwanê de bi du awayan cih digire; yek bi peyva nefsê re derbas dibe, ya din jî reqîb, yanî ew astengên an jî kesên ku dikevin navbera ‘aşîq û me’şûqan, şibihandiye Şeytên. Di mînaka jêrîn de jî, helbestvan reqîb şibihandiye Şeytên; yanî Şeytan ji bo wî neyar e an jî asteng e ji bo gihiştina yar:

Nik me m’elûm e, esîrî bêkes î ‘aşîq li min

Bêumîd î, xeyrî nizanim ji însan û ji cin

Rengê min weslek bida te bêdilê hesret mezin

Lê reqîb guhdarê ser me şubhê **Şeytanê recim**

### 3.1.7.25 Rûh

Bi Erebi, tê maneya “ruh, nefis, Cebraîl, hwd.” Kaşanî, wek tiştêkî mucerred, yanî razber pênase dike. El-Bennacî jî wê wek cismekî ji hîsan wêdetir pênase dike û dibêje ji aliyê gelek kesan ve nayê fehmkirin.<sup>200</sup>

Ji hîcra te birîndar im; hezîn û dilkul û jar im

Serapa, cemre wek nar im; telef bû **ruh** û can pê ra (r.38)

Sed hezar le’net muza’ef, şubhê baranê şedîd

Her zeman, la yanqetî bin, ew li ser **ruhê** Yezîd(r. 65)

Vegirin ye’nî li ser **ruhê** xwe, derê kufr û ‘înad

Dane ser ebwabê rehmet aşkera qufl û kilîd (r.67)

---

<sup>200</sup> Cebecioğlu, h.b.r. 220.

## 3.2 TESEWIF

Tesewif; rêyeke tenik û zirav e, ji şerî'etê derketiye ji bo pakkirina dil. Şerî'et, rave û şîroveya bawerîyê, nimêjê, cihadê, rojiyê, zewacê, zekatê, kar û xebatên dinyewî wek kirin û firotinê, hesabgiriya axretê ye. Lê tesewif, daxwaza tehqîqa van hemûyan e. Xemilandina temamê 'emelan/kirinan bi şahî û kêfxweşiya dil e. Perwerde û pakkirina exlaq ji tarîtiyên siruştî wek; rîya/ rûmetî, cefa, şîrk /hevber a bi dizî, kîn, dujminayî, kibir/qurtî, hesed/çavnebarî û hemû tiştên ku ji dil re nexweşî ne. Her tiştê ku bi perwerdehî û pakkirina dervayê însên ve girêdayî be, şerî'et e. Her tiştê bi batin/derûn ve girêdayî be tesewif e.<sup>201</sup> Di edebiyata klasîk de digel mutesewifan, helbestvanên li derveyê dîn jî helbest nivîsîne behsa tesewifê kirine. Xwestina ku ew jî mîna şa'irên mijarên derolî, di helbestên xwe de behsa, meyxane, şerab, me'şûq, hwd. bikin.<sup>202</sup> Ji van remz û sembolên ku mutesewifan bikaranîne ev in:

### 3.2.1 Saqî

Ew kesê ku şerabê belav dike yan jî raber dike. Di helbesta klasîk, de di zîyafetan de yek ji unsurên herî girîng e. Li gorî helbestvan, yar (me'şûq) wek saqî tê hesabandin, anku me'şûq di pileya saqî de ye. Di hemû rewşan de, saqî bi xweşikîya xwe balê dikişîne. Heta 'aşîq divê ji ber xweşikîya saqî serxweş bibe, ne ji ber şerabê.<sup>203</sup>

Şeraba 'eynê turyaqî, dinoşim ez, ji dest **saqî**

Dibim serxweş û dibim baqî, xerîq im ez, di deryaê (r. 160)

### 3.2.2 Meyxane (Xerabat)

Cihê ara q vexwarinê ye. Di tesewifê de tê maneya tekîye û dergahê. Ji xencî vê, carna çav, qelb û dilê 'aşîq jî wek meyxaneyê tê tesewirkirin.<sup>204</sup>

Meqquer û meskenê min, **goşê meyxane** ye her dem

Lehebsaz e, di dil da, narê 'işqê dîlberê mehkem

<sup>201</sup> Nurettin Ertekin, *Tesewif di Dîwana Şeyda de*, Zanîngeha Bîngolê, Enstituya Zimanên Zindî, Teza Çapnebûyî, Bîngol 2018, r. 22-23.

<sup>202</sup> Pala, h.b.r. 441.

<sup>203</sup> Pala, h.b.r. 387.

<sup>204</sup> Sefercioğlu, h.b.r. 82- 83.

Surahî, min di dest e, daîma medhûş im û sersem  
Bedel nakim bi yekser mulkê ‘alem, şewqê mexmûrî(r. 149)

### 3.2.3 Dergah

Tekîyeya ku Pîr li wir e ku ‘aşîq diçe feyzê (’ilm) dîsitîne.<sup>205</sup> Di dîwanê de, bi vî awayî cih girtiye: “dergahê Behauddîn, dergahê Şah, dergahê hebîbê, dergahê Padşahê Mezin, dergahê Kerîm, dergahê yar, dergahê Sultan...” **Wek mînak:**

Pîrê pîran, der- meqamê bendegî ez- cumle cest  
Her zeman ecramê ‘ulwî, zîrê payê şahê best  
Waqîfê esrarê lahûtî ez-an ‘ehdê elest  
Rû be-**dergahê Behauddîn**, nezer kon zankî hest (r. 60)  
Neh felek manendê der- ban ber serayê Neqşîbend

### 3.2.4 Tewbe (Îstîxfar)

Tewbe, bi Erebi tê wateya “vegerîn û poşmanî”yê. Dema ku însan piştî gunehan poşman bibe û dev ji wan gunehan berde, ji vê re Tewbe tê gotin.<sup>206</sup>

“aşîq im, naête fikra min xîyal, ez xeyrê yar  
Der wuqû’bit weswese carek di dil min, îxtîyar  
Dê **peşîman** bim, bi **îstîxfar û tewbe** sed hezar  
Ger bidin bo min hezaran dîlberê zerîn guhar  
‘Ehd e; min, navê bi xeyr ez herdu çavê muskîrat(r. 52)

### 3.2.5 Sulûk

Bi Erebi, tê wateya “bi rê de çûn, rê kudandin.” Rêwîtîya bi rêbazekî aşkere ber bi Xwedê ve yanî ber bi kemalatê ve ya ew kesê ku girêdayî şêxekî be, jê re Sulûk tê gotin.<sup>207</sup>

Kelbê Şahê Neqşîbend im; ta li dunya zende me  
Me’dena cûd û sexa yî; ez feqîr im hewce me  
Der **sulûkê** rahê heq ez, murxekî per-beste me

<sup>205</sup> Cemal Kurnaz, *Hayalî Bey Divanının Tahlili*, Kurgan Edebiyat Yayınları, Ankara 2012, r. 76.

<sup>206</sup> Cebecioğlu, h.b.r. 271.

<sup>207</sup> Cebecioğlu, h.b.r. 237.

Bêhişê xemra gunah im ‘asîyê şermende me  
El-eman, şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me! (r. 142)

### 3.2.6 Tecellî (Tecella)

Bi Erebi, tê wateya zahir û aşkerekê. Li gorî Kaşanî û Curcanî: Nûrên ku di dil de derkevin holê û ji gaybê tê, jê re “tecellî” tê gotin.<sup>208</sup> Di dîwanê de, ev têgeh li gelek deveran cih girtiye. **Wek mînak:**

Ger muyesser bit ji bo me meclîsek xelwet- kemal  
Kes ji bedxwahan nebit hazir li meydana cemal  
Find û fanosan vekim bo te ji zulf û bisk û xal  
**Dê tecellî kim li te carek,** çu Musayê Kelîm

**Ez geda me bo tecellî** lerze me ber asîtan  
Serxweş û pa-beste daîm, ey şehê kêşwersîtan  
Derdê ‘îşqa te li min sed murxî-zar û bûsîtan  
Hate destê min ji ‘îşqê canê min teb’ê selîm (r. 117)

Di vê murebbe’ a ku bi awayekî dîyalogî hatiye nivîsîn de, Aqtepi ‘aşiq û me’şûq daye peyvandin. Di bendeka ku ji alîyê me’şûq ve tê gotin de, me’şûq dibêje ku ez ê careke li te tecellî bikim û bi te re biaxivim. Ji bo vê rewşê jî bîne ziman, xwestiye ku bi rêya hunera Telmîhê bûyera di navbera Xwedê û Hz. Mûsa de bi bîr bîne û vegotinê xurt bike. Çawan ku Xwedê Teala li ser Çîyayê Tûr, bi Mûsa Pêxember re xeber dabe. Aqtepi jî rewşa di navbera ‘aşiq û me’şûq de şibhandiye vê bûyerê. Benda din jî ji alîyê ‘aşiq ve hatiye vegotin û ‘aşiq xwe ji bo tecellîyê feqîr dibîne û dibêje ez feqîr im ji bo tecellîyê.

### 3.2.7 Sir (Esrar; Raz)

Pirjimara wê esrar e û bi Erebi tê wateya wek tiştên nepenî, sir, kok, bi qîymet û hwd. Sir latîfeyêke Rebbanî ye di dil de.<sup>209</sup> **Wek mînak:**

Bi yumna ‘îşqê sultanê cîhan, şahînşehê xuban  
Ji mahî ta bi meh, **ez cumle esraran,** tu agah î (r. 155)

<sup>208</sup> Cebecioglu, h.b.r. 265.

<sup>209</sup> Cebecioglu, h.b.r. 238.

### 3.2.8 Cam (Cam-i Cem; Qede; Saxer; Peyal)

Cam, qedeha şerabê ye; ji ber ku cara yekem Qedeh ji alîyê Cem (Cemşîd) ve hatiye dîtin, wek Cam-i Cem an jî her du di heman malikê de jî tên bikaranîn. Cam, dev an jî lêvên yar e.<sup>210</sup> Heger şeraba ku di camê de tahl be, ev tê wateya ku peyvên ji devê yarê derdikevin dilazar in. Cam, di edebîyata tesewifê de ji bo qelb tê bikaranîn. Lewra, qelb cihê marîfetê ye.<sup>211</sup> Her wiha di Tesewifê de qedeh tê maneya, halê manewî, şewq, cezbe, wech”ê jî. Şeraba ku di qedehê de ‘eşqa Îlahî, qedeh jî dilê ‘aşiq an jî “Îsmulah”ê îfade dike.<sup>212</sup> Di dîwana Aqtepî de, bi van navan derbas bûye: “ Cam-i Cem, qedeh, saxer û peyal” û carna bi tena serê xwe carna jî wek ravekan hatiye bikaranîn.

#### Wek mînak:

Xerîqê qelzemê ‘işq im, reîsê ekremê ‘işq im

Bide **Cam-ê Cem** ‘eşq im, qewî me ez di de’waê (r. 160)

Bûseyek xeddê nîgarê, nuqteyek ez xalê reş

Nadim ez, wellah bi textê şahê Romî û Hebeş

Pur ke bo Rûhî ji rehmet, **saxerê** bêxîll û xeş

Ta bisozim ser te ser pêş dîlber û dêm mahêweş

Bê nivîsandin ji min çend baqîyatê salîhat(r. 54)

### 3.2.9 Şerab (Bade; Mey; Xemr)

Ava tirîyan e ku însanan serxweş dike. Bi Tirkî, jê re “ Sucî û Çakır” tê gotin. Di Farisî de, ewil jê re Şahduru dihat gotin, paşê helbestvanan bi rêya teşbîh û kînayeyan, gelek navên din jî lê kir.<sup>213</sup> Ehlê Tesewifê ‘işqê wek rêya gihiştina Xwedê, Şerabê jî dilcoşîya ruh dihesibînin. Di tesewifê de, ev peyv bi rewşa “Sekr”ê re pêwendîdar bûye. Sedema serxweşbûnê vexwarina şerab an jî badeyê ye. Mutesewifan jî sedema serxweşbûna manewî wek şerab û xemr şîrove kiriye û

<sup>210</sup> Bo zêdetir agahî bnr. Pala, h.b. r. 82.

<sup>211</sup> Hayrullah Acar, *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr (metn û lêkolîn)*, Nûbihar, İstanbul 2016, r. 132.

<sup>212</sup> H. Dilek Batislam, *Divan Şiirinde Kadeh ve Kadeh Redifli Gazeller*, *Divan Edebiyatı Araştırmaları Dergisi 18*, İstanbul 2017, r.6.

<sup>213</sup> Onay, h.b.r. 382.

mebesta wan jî ji wan ‘eşqa îlahî ye.<sup>214</sup> Li gorî nêrîna tesewifê, şerab dil ji zingaran paqij dike û bi wî awayî dike ku rastîyên îlahî xweşiktir û zelaltir di neynika dilê de bibiriqe.<sup>215</sup> Di dîwana Aqtepe de, wek Bade, Şerab û Mey”ê derbas dibe. **Wek mînak:**

Birim xelwê, di nêv subbet; me noşî, **badeê** cennet  
Ji le’lê yarê pur hîmmet, ‘edem bûm ez bi cur’ê ra (r. 39)

Ey dîlberê rux-afîtab; sotim, di hîcrê bûm kebab  
Îhsan ke yek camek **şerab**, îhya bibit bendê cîger(r. 73)

**Şeraba ‘eynê turyaqî, dinoşim ez**, ji dest saqî  
**Dibim serxweş û dibim baqî**, xerîq im ez, di deryaê (r. 160)

### 3.2.10 Abê Heywan (Ava Jîyanê)

Ava ku li devereke nedîyar e ku yê vedixwe, namirin heta ku dunya heye.  
Yek ji rîwayet û mezmûneke edebiyata Rojhilatî ye.<sup>216</sup>

Bo te qafî kim, kelamê; guh bide beyta fesîh  
Zanim ez naête destê min, ‘‘aşiqê çendîn melîh  
**Abê heywan im**, bixwe hem nefse enfesê Mesîh  
Dê li te pîrî bedel kim, hey bikim ‘ezmê remîm (119)

### 3.2.11 Kebab

Helbestvanan cîgerên xwe yên ji ber eşqê (eşqa îlahî) dişewite anku hemû laşên xwe şibihandine kebabê.<sup>217</sup>

Pur hezîn im, dûrê dest im; xurbetê, dil kir **kebab**

Dûr û mehcûr im ji yarê nazikê ‘alîcenab(r. 45)

Di vê malikê de jî dilê helbestvan ji ber xurbetê, fîraq û hîcrana yarê mîna kebabê dişewite.

<sup>214</sup> Fettah Kuzu, Klasik Şiirde Şarap Kavramı ve Fehîm-i Kadîm’in “Şarâb” Redifli Gazeli Üzerine Bir Tahlil İncelemesi, *Gaziantep University Journal Of Social Sciences*, 2014 13(4), r. 963.

<sup>215</sup> Acar, h.b.r. 131.

<sup>216</sup> Onay, h.b.r. 23.

<sup>217</sup> Onay, h.b.r. 250.

### 3.2.12 Mexrib û Meşriq

Meşriq her çi qas ku wateya wê “rojhilat”, Mexrib jî “rojawa” be, di edebîyata klasîk de ev her du têgeh bi awayekî mecazî cih digirin. Di meşrîqan de, hêvîya helbestvanan yanî ya ‘aşiqan zêde ye, lê dema ku roj diçe ava, hemû hêvîyên wan mîna rojê winda dibin û xema wan zêde dibe.

Sahibê ceşş û heşem serdarê cem’a ewlîya  
**Mexribê** sirrê Îlahî, **meşrîqê** şems’uz-zîya  
Girye û zarî ke, ber dergahê Sultan, Ruhîya!  
Haletê nez’ê, bişîne şehsuwarê Neqşîya  
El-eman, şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me!(r. 146)

Ji **meşrîq** ta **mexrib** şu’leya nûra te kir rewşen  
Mûşe’şe’ berq û tîrêj in ji te, Xurşîd î ya Mah î? (r. 152)

### 3.2.13 Hîcran (fîraq; fîrquet)

Derdê herî mezin ê ‘aşiq hesret e. Ew nikare, ji ber hesretê tehemmul bike. Li şûna ku êşa hesretê/ hîcranê bikişînin, dikarin cefaya me’şûqê bikişînin.<sup>218</sup>

Min, ne Newroz e, ne ‘îd e; min ne keyf û ne surûr  
Dil, ji **hîcranê** melûl e, nabitin şad û sebûr  
Gerçî hala der-**fîraq** im; lê bi qelbê sade nûr  
Der rikîb im, der rikîb im, der rikîb im, der rikîb!(r. 44)

### 3.2.14 Murîd

Kesê girêdayî şêxekî be, jê re murîd dibêjin. Wateya wê ya ferhengî “xwestok, kesê ku daxwaz dike.”<sup>219</sup>

Ji dil, daxwazê yarê, me qewî mexmûrê badê, me  
**Murîdê** saz û camê me, bi îxlas û temennaê (r. 161)

<sup>218</sup> Bo zêdetir agahî bnr. Pala, h. b. r. 195.

<sup>219</sup> Pala, h.b.r. 342.

### 3.2.15 Muxbeça

**Mux:** Tê maneya agirperest, an jî ew kesên ku her tim diçin meyxaneyê. Pirjimara wê ‘Muxan’ e. Li Îranê, berî Îslamê xelk agirperest bûn. Ji vê bawerîyê re Mecûsî dihat gotin. Mux, mezinên vê bawerîyê bûn. Dema ku Îslam di nav gel de belav bû, Mux wek Meyxanevan hat qebûlkin. <sup>220</sup> Berê, li Asyaya Navîn şeraba Muxên agirperest dihat firotin, lewma wek mexyanevan hatiye bikaranîn. <sup>221</sup>

**Muxbeça:** Zarokên Mux, ev peyv jî wek çiraxê meyxaneyê yan jî li şûna saqî hatiye bikaranîn. <sup>222</sup>

Ket’me êşa cerh û zexman, ez ji qewsa rû-heval  
Mîslê baranê dibarin, tîr ji wan mujganê al,  
Kesmekeş tê da me ez, ‘alem li ber çeşmê xîyal  
Dîlberê’ m Tersa ye, natirsit ji zenban û webal  
El-eman! Sed el-eman! Ey **muxbeça** gerdenxezal!(r. 86)

### 3.2.16 Pîr

Bi Farisî, ji kesên ku extîyar bin re ‘Pîr’ tê gotin. Ji serokê tesewifê re jî ‘Pîr’ tê gotin. Berê, ji bo şêxên avakarê terîqetê re jî dihate gotin. <sup>223</sup> Di dîwanê de bi vî awayî cih girtiye: “Pîrê pîran, Pîr Muxan, Pîrê Xaniq, Pîrê ‘Ecem, Pîrê Ereb, Pîrê terîq”

#### 3.2.16.1 Pîrê Terîq (Terîqetê)

Wek ku me li jor jî got, ji bo şêxên Terîqetê tê gotin. Ev şêx usula terîqetê nîşanê sofîyan didin; yanî wek rehberan in. Di dîwanê de wek “Pîrê terîq” derbas dibe. Aqtepi jî bo pîrê terîqeta Neqşîbendîyê bi kar tîne. Di bendekê de jî ji bo pîrê terîqetê dibêje “**Behauddînê Pîr.**” **Wek mînak:**

Halikê nefsa xwe me, ey Xewsê ‘alem- destêgîr  
Agehê razê Xuda î, ey **Behauddînê Pîr!**  
Kâşife sirra derûn î, waqîfê ma fi’ d-demîr  
Malikê kenz-ul-huda î; ez geda me, ez feqîr  
El-eman, şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me(143)

<sup>220</sup> Pala, h.b.r. 329.

<sup>221</sup> Onay h.b.r. 296.

<sup>222</sup> Pala, h..b.r. 329.

<sup>223</sup> Cebecioğlu, h.b.r. 212.



### 3.2.16.2 Pîrê Muxan

Meyxanevanê herî kevn, herî extîyar, li gorî mîtolojîya Yunanan, wek ‘Bakus’, li gorî Îranîyan ‘Pîrê meyxanevanan’.<sup>224</sup> Di edebîyata klasîk de, ev peyv wek mazmunan dihat bikaranîn. ‘Mux, Muxan’ wek mezinên terîfetê, li şûna ‘Murşîd’ dihat bikaranîn.<sup>225</sup> Helbestvanan şerab şibihandine agir; meyxaneyê ateş-gede, meyxanevan jî şibihandine keşîşê (papaz) serek e.<sup>226</sup>

Fetweê **Pîrê Muxan**, der dest e ez-‘ehdê elest  
‘‘aşîqan nîn e qelem; me’fû ne, roja întiqam (r. 110)

### 3.2.17 Derwêş

Ew kesên ku di bin terbîye û emrên şêxekî de be, jê re derwêş tê gotin.<sup>227</sup> Di dîwanê de li du deveran de cih girtiye. Em ji van mînakan fehm dikin ku Aqtepî xwe wek derwêş bi nav dike û girêdayî terîfetê ye:

Xwecayê Qenber, siwarê Duldulî eser ejder sifet  
Fatihê Xeyber, çeraxê weqtê kufr û mezlemet  
**Rûhîyê, derwêşî-ra** ferman nîgahê merhemet  
La feta îlla ‘Elî, la seyfe îlla Zu’l-feqar (r. 72)

**“Rûhî”yê derwêş** vewestayê li Babê Rehmetê  
Lê ji ber mewca gunahan, ket’ye xewf û xeşyetê  
Dûr nekî vî bênewayî ey Şefî’ê Ummetê  
Ya Resûlallah dexîl im! Ya Hebîbellah dexîl! (r.102)

### 3.2.18 Zahid û Sofî

Perhizkarê ku bi îşên dunyayê re têkildar nabe û bi xweşîyên dunyayê re xerîb dimîne, jê re ‘Zahid’ tê gotin. Sofî, ew kesên ku ji Ehlê Tesewifê ne. Her du jî ji alîyê Rindan (munewweran)<sup>228</sup> ve nayên hezkirin.<sup>229</sup> Uslubê Aqtepî jî li hemberî

<sup>224</sup> Onay, h.b.r. 296.

<sup>225</sup> Pala, h.b.r. 329.

<sup>226</sup> Onay, h.b.r. 296.

<sup>227</sup> Bo zêdetir agahî, bnr. Cebecioğlu, h.b.r. 61.

<sup>228</sup> Rind: Pirjimara wê rindân e, di edebiyata klasîk de wek mazmûnekê tê bikaranîn. Helbestvan ango aşîq xwe wek rindan dihesibînin.

<sup>229</sup> Onay, h.b.r. 437.

sofi û zahidan gelek hişk e. Carna bi awayekî aşkere carna jî bi rêya hunera veşartî ew rexne kirine. Çend mînak ji dîwanê:

Şaş kirim cewra hebîbê, der ‘ezabê roz û şeb  
Kes li min leman mekin, ey **zahidanê bêdedeb**  
Can ji min bir, yarê ez xubanê ‘alem muntexeb  
Bêumîd im, dilşikest im, can û dil ender-te’eb,  
Ah û sed efxan, ji hîcra dîlbera ala Fireng (r. 82)

Zulfê muşkîn, xem bi xem; zencîra hûşê ‘aqîlan  
Her xemek, bendê dilê sed **zahidê danîş-temam** (r. 108)

Terkî da min, huş û daniş îbtîda der rahê ‘işq  
Bes melamet ke li min, ey **sofiyê napuxte xam!** 111

Ji ‘işqê, der cîhan riswayê ‘am im, dil û hûş im,  
Me sebhe daye ez kef xerqeê **zuhhadê napûş im**  
Xerabatî û mest im, eşkera bêbak û meynoş im  
Bes e Lî’llah! Meke **sofi** li min, teklîfê mestûrî (r. 148)

Meke men’em ji ‘işqa dîlberê **ey zahidê ‘aqîl**  
Hewa ye, we’zê te nik ‘‘aşiqê naçar ê derya dil  
Hezaran şeyx û ‘alim derkê nakin halê qelbê kul  
Gellek ferq e, mîyanê ‘ilmê hal û zuhdê menfûrî (150)

**Nizanin zahid û sofi**, li ‘‘aşiq germî û serdî  
Hezar şeyx û mela, bên; çare nakin ew li vî derdî  
Egerçî Rûhîyê bêçare û mezlûm û rûx-zerd î  
Welîkîn, ca-nişînê textê Xaqanî û Fexfûrî (r.151)

### 3.2.19 Nefs

Nefs, di Quran û Tesewifê de têgeheke girîng e. Di tesewifê de du maneyên wê hene: Ya ewil ‘Hêza xezeb û şehweta di însanan de’ ye. Mutesewif bi gelemperî di vê maneyê de bi kar tînin, lewra nefis di însanan de dibe sedema wesfên xerab û divê bê terbiyekirin da ku zîyanê negihîne însanan; çunkî nefsa ku nehatibe terbiyekirin dê zererê bide însanan. Maneya duyem jî, ‘heqîqeta însan û însan bi xwe ye’.<sup>230</sup>

**Nefs** û Şeytan bûn musellet; Ya Resûlellah eman!  
Bû telef ‘umrê ezîzê’ m zîrê ‘isyanê giran  
Destî damanê’ m bi sed zarî Şefî’ê ‘asiyan  
Ya Resûlellah dexîl im, ya Hebîbellah dexîl! (r. 98)

### 3.2.20 Xews

Kesê ku bi hawara meriv tê, alîkarîya meriv dike. Di tesewif û terîqetê de jî bo welî û ewliyayên Xwedê tê gotin.<sup>231</sup>

Halikê nefsa xwe me, ey **Xewsê** ‘alem- destêgîr  
Agehê razê Xuda î, ey Behauddînê Pîr!  
Kâşife sirra derûn î, waqifê ma fi’ d-demîr  
Malikê kenz-ul-huda î; ez geda me, ez feqîr  
El-eman, şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me(r.143)

### 3.2.21 Şêx û Mela

Di dîwanê de, her du têgeh bi hev re hatine bikaranîn.  
Nizanin zahid û sofî, li ‘aşîq germî û serdî  
Hezar **şeyx û mela**, bîn; çare nakin ew li vî derdî  
Egerçî Rûhîyê bêçare û mezlûm û rûx-zerd î  
Welîkîn, ca-nişînê textê Xaqanî û Fexfûrî (r.151)

<sup>230</sup> Selçuk Altuntaş, *Gazâlî" de Tasavvuf Felsefesi*. Konya Selçuk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Felsefe ve Din Bilimleri Anabilim Dalı Din Felsefesi Bilim Dalı, Yüksek Lisans Tezî, 2006, r. 36-37.

<sup>231</sup> Aqtepi, h.b.r. 143.

### 3.2.21 ‘Alim

Ji kesên “zana, zanyar” re tê gotin.

Meke men’êm ji ‘işq" a dilbere, ey zahidê ‘aqîl  
Hewa ye, we’zê te, nik ‘‘aşiqê naçar ê derya-dil  
Hezaran şeyx û ‘**alim** derkê nakin halê qelbê kul  
Gelek ferq e mîyanê ‘ilmê hal û zuhdê menfûrî(r.150)

### 3.2.22 Welî (Ewlîya)

“Ewlîya” Pirjimara peyva “Welî” ye û tê maneya dostan; kesên ku şerîetê di rewşa teqwayê de dijîn, jîyana xwe bi micadeleya nefse re derbas dikin û li gorî Hz. Pêxember (s.x.l) dijîn, ji wan re ewlîya tê gotin.<sup>232</sup> Di dîwanê de wek “şahê cumle ewlîya, gewherê tacê serê têk ewlîya, ser cemî’ê ewlîya, serdarê cem’a ewlîya” cih girtiye. Aqtepî ji bo Behaiddînê Pîrê terîqeta Neqşîbendîyê bi kar anîye. Aqtepî, şêxê xwe wek şah û serokê hemû ewlîyayan dibîne.

Mehremê heq, lengerê erd û sutûnê asîman  
Ez bozorgî, namê pak-eş mî negunced der-dihan  
Şahê mutleq, **ser cemî’ê ewlîya** der her zeman  
Bêkesê babê te me, rehmê bike ser bêkesan  
El-eman, şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me! 144

## 3.3 KESAYET

### 3.3.1 Kesayetên Dînî- Mitesewif

#### 3.3.1.1 Şêxê Geylanî û Teyfûrî / Ebû Yezîd Bîstamî

Abdulqadîrê Geylanî, avakarê terîqeta Qadîrîyan e. Ji gundê Nefy’ê yê Başûrê Rojavayê Behra Hezarê ye. Li gorî rîwayetan, eslê wî digihêje Hz. Elî (s.l). Tehsîla xwe li Bexdaya navenda ‘ilm û îrfanê ya wê dewrê tamam kiriye. Piştî ‘ilmên wek “Hedîs, Fiqih û Edebîyat”ê bi xêra Ebu’l-Hayr Muhammed b. ed-Debbâs (.552/ 1131) dest bi tesewifê kiriye û bi dû de bûye zavayê wî. Demekê, ‘ilmên wek “hedîs, tefsîr, fiqih û qîraat”an dane, paşê li Medreseyê dev ji karê tadrîsê

<sup>232</sup> Bo zêdetir agahî, bnr. Cebecioğlu, h.b.r. 77.

(perwerdehiyê) berdaye. Li Bexda û Kerhê, piştî 25 salên jîyana rizayat û înzîwayê<sup>233</sup> Ebû Saîd Mubarek el-Muharrimî ebayê (cil û bergên) Şêxîtiyê lê kiriye.<sup>234</sup>

Teyfûrî; Ebû Yezîd Tayfûr b. Îsa b. Surûşan el-Bîstamî, li Bîstama bajarokê Xorasanê hatiye dunyayê. Di tesewifê de rêya “tewhîd, sekr û fena”yê qebûl kiriye û bi şathîyeyên<sup>235</sup> xwe tê zanîn.<sup>236</sup>

Di dîwanê de, her du bi hev re hatine zikirkirin. Abdulqadirê Geylanî wek “Şeyxê Geylanî”, Ebû Yezîd Tayfûr b. Îsa b. Surûşan el-Bîstamî jî wek “teyfûrî” cih girtiye:

Ji te'sîratê 'îşqê, bûme yekser cemre wek ateş  
Qetîlê tîrê mujgan im, ji qewsê ebrûwanê reş  
Cunûn û bêhiş im, asarê 'îşqê, ez dilê serxweş  
Cuda nakin, du sed **Şeyxê Geylanî û Teyfûrî**(r. 147)

### 3.3.1.2 Behaiddîn

Mihemmed Behaiddîn Şahê Neqşîbend (718-791 hîcrî/ 1318-1398 mîladî.) Navê wî yê esil, Seyyîd Mihemmed Behaiddîn e. Bavê terîqeta Neqşîbendîyan e. Ji bajarê Buxarayê ye.<sup>237</sup> Di dîwanê de du helbestên bi awayê Medhîyeyê li ser wî hatine nivîsîn.

Pîrê pîran, der- meqamê bendegî ez- cumle cest  
Her zeman ecreamê 'ulwî, zîrê payê şahê best  
Waqifê esrarê lahûtî ez-an 'ehdê elest  
Rû be-dergahê **Behaiddîn**, nezer kon zankî hest (r. 60)  
Neh felek manendê der- ban ber serayê Neqşîbend

### 3.3.1.3 Weys'îl Qeran

Di dewra Pêxember (s.x.l.) de jîyaye lê ew neditiye. Ji gundê “Qaren”a girêdayî bajarê Yemenê ye. Pêxemberê (s.x.l.) me nedîtiye û bûye Musulman. Der

<sup>233</sup> rizayat û înzîwa: Rizayet: kesên ku bixwazin perwerdeya terîqetê hîn bibin, ji guneh û xerabiyên dûr dikevin, nefsa xwe terbiye dikin, ji vê re rizayet tê gotin. Înzîwa jî ji xelqê dûr ketin, jiyîna bi tenê.

<sup>234</sup> Hoşab, h.b.r. 25.

<sup>235</sup> Şathiyye: ji aliyê mutasawufan ve hatine nivîsîn. Manzumeyên mîzahî yên dînî-Tesewufî ne. Helbestên ku li ser baweriyên Tesewufê ne û têgihîştina wan girêdayî şîroveyê ne.

<sup>236</sup> Komek Nivîskar, *Metinlerle Tasavvuf Terimleri Sözlüğü*, Kalem Yayınları, İstanbul, Ağustos 2006, r. 16.

<sup>237</sup> Aqtepi, h.b.r. 143.

heqê wî de gelek kitêb hatine nivîsîn.<sup>238</sup> Di dîwanê de, Aqtepî feryada xwe digihîne Weys-îl Qeran û dibêje: “Bax û bostanê biharê tenê ji me re bûye mala huznê”. Dûre, bi rêya hunera mubalexeyê dibêje: “Awazê işqa min çû heta bajarê Şam û Yemenê û derdê ji ber fîraq û hîcranê yarê” feryada xwe digihîne Weys-îl Qeranî.

Bax û bostanê buharê, t êk me bû Beyt-ul Hezen  
Xulxul û awazê ‘işqe’ m çû heta Şam û Yemen  
Çûm hilak ez firqetê feryadê min **Weys-îl Qeran**  
Xemzeê çeşmê di şehla, can deranî ez beden  
El-eman! Sed el-eman! Ey şahê ewreng ê cemal! (r.89)

### **3.3.2 Kesayetên Xerab**

#### **3.3.2.1 Yezîd**

Yezîd wek kesayetekî xerab di dîwanê de cih girtiye. Wek ku tê zanîn, Hz.Huseyn ji alîyê Yezîd û hevalên xwe ve li Kerbelayê şehîd ketiye. Vê bûyerê gelek bandorê li alema Îslamê kiriye; loma, helbestvanên klasîk jî di helbestên xwe de cih daye vê bûyerê. Yek ji wan helbestvanan jî Aqtepî ye. Uslubê Aqtepî yê li hemberî Yezîd, gelekî hişk e û di helbesteke dîwana xwe de le’netê lê dibarîne. **Wek mînak:**

Sed hezar le’net muza’ef, şubhê baranê şedîd  
Her zeman, la yanqetî bin, ew li ser ruhê **Yezîd**(r. 65)

#### **3.3.2.2 ‘Emr, Şemr û Îbnî Zîyad**

Ji ber ku van her sê kesan di bûyera Kerbelayê de alîkarîya Yezîd kiriye, di dîwanê de wek kesayetên xirab cih digirin û bi vê munasebetê behsa wan tê kirin. Di helbesta der barê bûyera Kerbelayê de, bi Yezîd re hatine zikrîkirin. Aqtepî li hemberî van jî gelek hişk e û le’netê li van hersêyan jî tîne.

‘**Emr û Şemr û Îbnî Zîyad** û Yezîdê kufrîdar  
Ey Xuda, bîne li wan pur-le’n û exzabê ‘edîd (r. 66)

#### **3.3.2.3 Nemrûd**

Hikumdar û avakerê Babilê ye. Doza îlahîtiyê kiriye. Vexwandina Hz. Îbrahîm ya ji bo musulmantîyê qebûl nekiriye û Hz. Îbrahîm girtiye û bi çimçîr

<sup>238</sup> Pala, h.b.r. 474.

avêtiye nav agir. Li gorî, rîwayetan, Hz. Îbrahîm bi emrê Xwedê Teala di nav agir de neşewitîye, agir bûye gulistanek. Nemrud jî ji alîyê pêşûyan ve hatiye kuştin.<sup>239</sup>

Aqtepi jî di dîwana xwe de behsa vê mijarê kiriye û bi rêya hunera Telmîhê simbolên wek agir û baxê ne'îm (cinnet) bi kar anîye û xwestiye ku vê mijarê bîne bîra xwîneran. Di Murebbe'a ku bi terza dîyalogî hatiye nivîsîn de, di benda ku bi devê meşûq hatiye gotin de, meşûq dibêje ku bes gazinan bike ji ber firaqê, te bi van gotinên xwe yên bi elem ateşek berda dilê min, dema ku ez li te şefqet bikim û pora xwe mîna beyraqê vekim û nîşanê te kim, Narê Nemrûd, yanî ew agirê te yê wek agirê ku Nemrûd bo Îbrahîm Pêxember dadabû yê te bibe wek bexçeyê buhuştê.

Bes tezellum ke ji destê fîrquetê pur derd û xem  
Ateşek berda dilê min, te'j kelimê ba-elem  
Weqtê şefqet kim; li te, zulfan vekim şubhê 'elem  
**Narê Nemrûdî bikim** ser te wekî **baxê ne'îm**(r. 116)

### 3.3.2.4 Helagû Xan

Nevîyê împaratorê navdar ê Moxolan e. Navê bavê wî Tuluy e. Dewleta Îlhanîyan ava kiriye. Wek kesayetekî xerab tê nasîn.<sup>240</sup> Aqtepi jî xweşikîya yarê dişibihîne Helagû Xan. Di vê malikê de tê gotin ku me'sûq bi çavên xwe yên şîrîn û bi tîrê xemzeyan (gamze) wek Helagû Xan mulkê dil wêran dike; yanî çawan ku Helagû Xan dunyayê talan dike, me'sûq jî bi xweşikîya xwe dilê 'aşiq talan dike.

Dîdeê şehla ku bên cengê, bi tîrê xemzeyan  
Wek **Helagû Xan**, ser a ser mulkê dil wêran dikan (r. 135)

### 3.3.3 Kesayetên Dîrokî û Mîtolojîk (Efsaneyî)

#### 3.3.3.1 Keyxusrew û Cemşîd (Cemşah)

Keyxusrew, ji alîyê helbestvanên klasîk ve wek unsurê berawirdîyê tê bikaranîn û yek ji şexsîyetên sembola desthilatî, qudret û mezinahîyê ye.<sup>241</sup>

Cemşîd, di tarîxa Îranîyan ya mîtolojîk de, Padîşahê çarem ê sulaleya Pişdadîyan e. Kurê Tahmurs e. Di edebîyata klasîk de, yek ji kesayetên herî navdar e.

<sup>239</sup> Onay, h.b.r. 221.

<sup>240</sup> Pala, h.b.r. 216.

<sup>241</sup> Tökel, h.b.r. 172.

Bi unsurên wek; qudret û mezinahîya wî, şerab dîtina wî qedeha wî ya heft xetan pêk tê, merasîmên wî yên ayînî, text û tacê wî yê birqok... hwd. ve ji alîyê gelek helbestvanan ve di dîwanan de hatiye behskirin.<sup>242</sup>

Bi zîr û bîm, were pêşber nîgarê nazenîn-dîlber

Çu in'am, bo te bê; **Keyxusrew û Cemşîd û Cemşah î** (r. 153)

### 3.3.3.2 Eskender

Yek ji kesayetên ku di edebîyata klasîk de hatiye bikaranîn, Eskender e. Ji ber ku cîhangerekî mezin, qehremanekî têkneçûyî û hukimdarekî li dunyayê gerîya ye, ji alîyê helbestvanan ve gelek caran hatiye zikirkirin.<sup>243</sup>

Nebit meyle bikî, bo ser te ser **emlakê Eskender**

Çi hacet bo te dunya, çun tu hingarê sehergah î (r. 155)

### 3.3.3.3 Qubad

Navê wî di Şehnameyê de derbas dibe.<sup>244</sup> Yek ji hikumdarên efsanewî yê Îranîyan e, di heman demê de yek ji şexsîyetên sembola mezinayî û ezametê ye.<sup>245</sup> Di edebîyata klasîk de ji bo nîşaneyê ezamet û mezinayîyê û bi gelemperî, bi tacê xwe re tê bikaranîn. Di dîwana Aqtepî de jî bi tacê xwe re hatiye zikirkirin û wekî şahê 'Ecem hatiye binavkirin.

Sed hezar sewgendê min, ew tarê zulfê xem bi xem

Hem bi an tacê **Qubadê** kec, wekî Şahê 'Ecem

Nabitin dîl, yek nefes xalî, ji seffê derd û xem

Bes ke tedwîlê fîraqê, can me ket'ye ber elem

El-eman! Sed el-eman! Şox û şengê pur delal! (r. 87)

<sup>242</sup> Bo zêdetir agahî bnr. Tökel h.b.r. 98-106.

<sup>243</sup> Tökel, h.b.r. 160.

<sup>244</sup> Şehname: Destana menzum a Îraniyan e. Behsa dîroka Îraniyan dike.

<sup>245</sup> Tökel, h.b.r. 178.



### 3.3.3.4 Xaqanî û Fexfûrî

Berê ji nav û înwane hikumdarên Çînîyan re Fexfûr dihat gotin.<sup>246</sup> Xagan jî ji bo Şahên Tirkan dihat bikaranîn. Bi Tirkî “Hakan”tê gotin.

Nizanin zahid û sofî, li ‘‘aşiq germî û serdî  
Hezar şeyx û mela, bên; çare nakin ew li vî derdî  
Egerçî Rûhîyê bêçare û mezlûm û rux zerd î  
Welîkîn, canişînê textê **Xaqanî û Fexfûr** î (r. 151)

### 3.3.3.5 Esfendar û Rustem

Esfendar kurê Kuştasb e. Li gorî Îranîyan, “Qehremanê Mezin”, li gorî Yunanîyan “Hukimdarê Mezin” bû. Leqeba wî Rûyîn-ten e.<sup>247</sup>

Nevîyê Sam, kurê Zal, bavê Suhhab û Feramurz û bapîrê Bijen e. Rustem di edebîyata klasîk de qehremanîyê sembol dike.<sup>248</sup>

Kes, li min lewman mekin, ev cîlwe û çeşmê siyah!  
Sed çu **Esfendar û Rustem**, beste der zindan dîkin (r. 135)

Di vê malikê de tê gotin ku kes li min gazindan, lewman nekin, ew cilwe û çavên yarê ên reş sed kesên mîna Esfendar û Rustem jî girtîyê zîndan dîke. Yanî kesên mîna wan jêhatî jî mahkumên xweşikîya yarê dibin.

### 3.3.3.6 Mehmûd û Eyaz

Mehmûd (970-1031), hikumdarê dewleta Gaznelîyan e. Navê wî Nîzamuddîn Ebu’l Qasim Gazî Mehmûd, leqeba wî Seyfeddîn e. Yekemîn kese ku înwana Sultanîyê bi kar anîye. Li hemberî pûtperestan, Îslam parastiye. Di dewra xwe de gelek rûmet daye helbest û helbestvanan. Di koşka wî de 400 helbestban hebûye. Di edebîyatê de bi van taybetîyên xwe tê bibîranîn: Bi comerdîya xwe, bi koleyê xwe Eyaz re û ji ber ku helbestvan parastine, tê bibîranîn.<sup>249</sup> Eyaz koleyê wî ye, ji ber ku xwedî feraset, aqil û wefa ye, ji alîyê Mehmûd ve gelek hatiye hezkirin û Mehmûd

<sup>246</sup> Tökel, h.b.r. 131.

<sup>247</sup> Onay, h.b.r. 32.

<sup>248</sup> Bo zêdetir agahî bnr. Tökel, h.b.r. 194-202.

<sup>249</sup> Pala, h.b.r. 295.

jê ewle bûye.<sup>250</sup> Di edebîyata klasîk de, çawa ku Leyla û Mecnûn, Ferhad û Şîrîn, hwd. bi hev re tîn bikaranîn, ev her du kesayet jî bi hev re tîn zikiririn. **Wek mînak:**

Ber textê mehebbet, bi xwe **Mehmûdê Eyaz im,**

Gerden di firaz im.

Der mîhnetê hîcranê, şehînşehê nîhalî,

Ferhadê Şîrîn im. (r. 125)

### 3.3.4 ‘Aşiq û Me’sûq

#### 3.3.4.1 Leyla û Mecnûn

Di edebîyatê Îslamî de, çîrokeke evînîyê ye ku bûye mijara mesnewîyan. Tê gotin ku lehengên çîrokê kesayetê rastîn in. Li gorî rîwayetan; Mecnûn, leqeba helbestvan Qeys b. Mulevvaha’l- Amirî’(m. 698) ye û ev çîrok ji şîroveyên helbestên wî derketiye holê. Lê li gorî hin kesan jî ew xortekî ji malbata Emewîyan e û ‘aşiqê keçmama xwe bûye. Navê Leylayê yê rastîn jî; Leyla Binti Mehdî b. Sa’dî’l-Amirî ye.

Mijara wê bi kurtasî wiha ye: Di Çolên Necîdê de, ji qebîleya Benî Amîrê, Qeys û Leyla hê di piçûkanîya xwe de ji hev hez kiriye. Dema ku gelek gotegot li dor wan gerîyane, dêya Leylayê ew xistiye konekî. Ji ber ku Qeys jî nikare evîndara xwe bibîne dîn bûye û bi çolan ketiye û piştî demekê jî leqeba Mecnûn (dîn) lê hatiye kirin. Dema ku bavê wî seh dike, her çi qas ku diçe ji boyî ku Leylayê jê re bixwaze jî, Qeys, mecnûn bûye, qîza xwe nadin. Bavê wî, bi mebesta ku bi duayan baş bibe ew biriye Kabeyê, lê Qeys dua kirine ku derd û evîna wî zêde bibe. Duayên wî qebûl dibin. Bavê wî bi neçarî vedigere. Mecnûn jî, jîyana xwe di çolan de bi heywanên wehşî re domandiye. Di vê navberê de, helbestên evînî dinivîse. Begekî Erebbê bi navê Newfel, helbestên wî dixwîne û ji boyî ku wî ji vê rewşê xelas bike, Leylayê dîsa ji bavê wê dixwaze. Dema ku bavê wê red dike, tevî leşkerên xwe bi qebîleya Leylayê re şer dike. Mecnûn, ewqas hez ji Leylayê dike ku ji bo tiştê neyê serê wê û qebîleya wê, dua kirine. Piştî duayên Mecnûn, Newfel têk diçe. Lê dîsa nikare nefsa xwe û dest bi şer dike. Vê carê bi ser dikeve lê ji ber ku hay ji duayên Mecnûn dibe, Leylayê ji wan nastîne û vedigere. Paşê Leylayê bi Îbn Seşlam re dizewicînin. Ji boyî

<sup>250</sup> Onay, h.b.r. 283.

ku Leyla ji evîna xwe re dilsoz bimîne, derewan dike û Îbn Selam dixapîne. Piştî demekê, ji ber nifirên Mecnûn, Îbn Selam dimire. Leyla jî diçe li Mecnûn digere, di çolê de rastî wî tê lê Mecnûn wê nas nake. Leyla bê hêvî vedigere û piştî demekê dimire. Dema ku Mecnûn seh dike, diçe li ser tirba wê û ji boyî ku ew jî li dû bimire, duayan dike, duayên wî webûl dibin û li ser tirba Leylayê serê xwe datîne û dimire.<sup>251</sup>

Di dîwanê de, di nav ‘aşîq û me’şûqan de herî zêde behsa Leyla û Mecnûn hatiye kirin. Helbestan ji hunerên wek “Telmîh, Şibihandin, Îham” sûd wergirtiye û ‘aşîq ji ber eşqa me’şûqa xwe, xwe wek Mecnûn dibîne, me’şûqa xwe jî wek Leylayê. Her wiha helbestvan xwestiye ku bi rêya hunera Telmîhê bûyera Leyla û Mecnûnê bîne bîra xwendevanan. Ji bo vê hunerê jî peyvên wek “şeyda, waleh, cunûn (dîn), çol, sehra, deşt” sûd wergirtiye. Lewra, Mecnûn ji ber eşqa Leylayê dîn bûye û bi çolan ketiye. ‘aşîq jî xwe wek Mecnûnê bi çolan ketî hîs dike û ji ber eşqa me’şûqa xwe dîn û şeyda bûye. Mecnûn di helbestekê de wek Qeys jî derbas dibe û di gel ‘aşîqên din - Ferhad û Wamiq hatiye zikirkirin.

Kirim yexsîr û napeyda; cunûn û waleh û şeyda  
Verestim ez ji nêv qeyda; wekî **Mecnûn** bi çolê ra

Li çol û deşt û sehraê, dikêşim wayîweylaê  
Ji hukmê hîcrê **Leylaê**, bi husn û netrîk û zêra(r. 39)

Sed hezar **Leyla** û Şêrîn û Zuleyxa der xiram  
Çeşmê şehla, serwî- bala, xunce-dêm, elfazê xweş (r.79)

Sed çû **Qeys** û Wamiq û Ferhadê ber dergahê yar  
Bo qedem-bûsê hebîbê’ m, cumle îstîzan dîkin (r.134)

Cûyê xûnîn, çûne Çînê; j’cewr û zulmê nazenînê  
Dê ji nû **Mecnûn** vejînê; beytê şêrînê di min(r. 140)

---

<sup>251</sup> Pala, h.b.r. 288-289.

Di ‘uqbaê wekî rabim, bi dîdara te ez şa bim  
Wekî **Mecnûnê Leyla** bim, ji sewdaya te **Leylaê** (r.158)

Di mektebxaneyê ‘îşqê; e’ Ferhad û tu Şîrîn î  
Di babê serxweşî mestî, e’ **Mecnûn û tu Leyla î** (r.167)

### 3.3.4.2 Ferhad û Şîrîn

Çîrokeke ku di edebîyata Îranê de, di nav mijarên mesnewîyê de cihekî girîng digire. Wek “Husrev û Şîrîn” jî tê zanîn û di edebîyata klasîk de jî wek mijara mesnewîyê cih girtiye. Di helbestan de navên “Husrev, Ferhad û Şîrîn” wek Leyla û Mecnûnê gelek hatine bikaranîn. Ji gelek alîyan ve bûye mijara helbestên klasîk. “Gihiştina Husrev û Şîrînê, reqabeta di navbera Ferhad û Husrev de, mirina Ferhad a di nav êş û azaran de” ji ber ku wek Mecnûn ‘aşîqekî dilsoz dinimîne, hwd. bûye mijara helbestên klasîk.<sup>252</sup>

Di dîwanê de, piştî Leyla û Mecnûn herî zêde Ferhad û Şîrîn cih girtiye. Helbestvan ji hunerên “Telmîh û Şibihandin”ê sûd wergirtiye. Çawan ku Ferhad ji ber hîcrana Şîrînê xembar bûye û ketiye di nav êş û janan de, ‘aşîq jî xwe wek Ferhad dibîne her wiha me’şûqa xwe jî wek Şîrîn dibîne. Dîsa di helbestekê de Ferhad di nav ‘aşîqên wek “Mecnûn û Wamiq” de, Şîrîn jî di nav me’şûqên wek “Leyla û Zuleyxa”yê de hatine zikirkirin.

Sed hezar Leyla û **Şîrîn** û Zuleyxa der xiram  
Çeşmê şehla, serwî- bala, xunce-dêm, elfazê xweş (r.79)  
Ber textê mehebbet, bi xwe Mehmûdê Eyaz im,  
Gerden di firaz im.  
Der mîhnetê hîcranê, şehînşehê nîhalî,  
**Ferhadê Şîrîn im.** (r. 125)

Sed çû Qeys û Wamiq û **Ferhadê** ber dergahê yar  
Bo qedem-bûsê hebîbê’ m, cumle îstîzan dîkin (r.134)

---

<sup>252</sup> Pala, h.b.r. 152-153.

Di mektebxaneyê ‘îşqê; e’ **Ferhad û tu Şêrîn î**

Di babê serxweşî mestî, e’ Mecnûn û tu Leyla î (r.167)

### 3.3.4.3 Yûsuf û Zuleyxa

Di edebîyatên Şerqê de, mesnewîya ku mijara xwe ji Quranê wergirtiye, Yûsuf û Zuleyxa ye. Ev Mesnewî, çîroka Pêxember Yûsufê ku herî ku delal tê zanîn vedibêje. Di Quranê de, Sûreya Yûsuf a ku ji 111 ayetan pêk tê, bûyera Yûsuf Pêxember tîne ziman. Di edebîyatê de, form hatiye guhartin, yanî bêtir mijar li ser evîne hatiye honandin û bi vî şikilî di edebîyatê de cih girtiye.<sup>253</sup>

Hz. Yûsuf, di bûyerê de lehengê mêr e, Pêxemberzade ye. Bavê wî Hz. Yaqûb, dêya wî Rahîle Xatûn e. Piştî wefata bavê xwe, dibe Pêxember. Di baweriyên dînî û exlaqî de, ji ber ku pêşberî xweşikîya Hz. Zuleyxayê nefsa xwe diparêze, dibe temsîliyeta nefsê.

Hz. Zuleyxa, di bûyerê de lehenga jin e. Îşq û îhtirasê dinimîne. Keça Padîşahê Mexrîbê ye. Li gel xweşikîya xwe, lehengeke dilsoz e. Di xewna xwe de, Hz. Yûsuf dibîne û ‘aşiqê wî dibe.<sup>254</sup>

Di dîwanê de, helbestvan ji hunerên şibihandin û telmîhê sûd wergirtiye. Zuleyxa di helbestekê de wek temsîliyeta me’şûq, di nav me’şûqên wek “Leyla û Şêrîn” de hatiye zikirkirin. Helbestvan, hem bi peyvên wek “bîr, zîndan, buha, bazar” xwestiye ku bûyerên ku hatine li serê Yusuf bîne bîra xwendevanan, hem jî xwe şibihandiye Hz. Yusuf. Di helbestekê de, gazindan dike û dibêje: “Ez wekî Yusuf di zîndanê de mame û hezîn im, carekê Zuleyxayê, yanî yara min negot ev çi hal e hatiye serê te. **Wek mînak:**

Sed hezar Leyla û Şêrîn û **Zuleyxa** der xiram

Çeşmê şehla, serwî- bala, xunce-dêm, elfazê xweş (r.79)

Şubhê **Yûsif**, zîrê zîndan mame mehbûs û hezîn

Qet nego carek **Zuleyxayê**: Çi hal e, bêmecal? (r.104)

<sup>253</sup> Pala, h.b.r. 484.

<sup>254</sup>Bo zêdetir agahî, bnr. Kerküklü Şair Muhammed Nevrûzî, *Yusuf ile Züleyha*, (inceleme-metin: Çoban Hıdır Uluhan), Atatürk, Kültür, Dil ve Tarih Yüksek Kurumu Türk Dil Kurumu Yayınları; 886/1, Ankara 2007.

Xedengê dîlberê çun tèn li meydan, Rustemê Zal î  
Di bazara mehebbet de buhayê **Yûsufê çah î** (r.152)

#### 3.3.4.4 Wamiq û Ezra

Wamiq û Ezra jî wek Leyla û Mecnûn, Ferhad û Şîrîn, yek ji çîrokên evînîyê yên herî navdar ên Şerqê ye. Nemaze di edebîyata Îranê de, gelek mesnewîyên bi navê Wamiq û Ezrayê hatine nivîsîn. Di edebîyata klasîk de, wek Ferhad û Mecnûn nebe jî ji bo temsîliyeta ‘aşîq hatiye bikaranîn.<sup>255</sup>

Wamiq di helbestekê de wek temsîliyeta ‘aşîq, di nav ‘aşîqên wek “Mecnûn (Qeys) û Ferhad” de cih girtiye.

Sed çû Qeys û **Wamiq** û Ferhadê ber dergahê yar  
Bo qedem-bûsê hebîbê`m,cumle îstîzan dîkin (r.134)

#### 3.4 HEYWAN

Ajal/Heywan yek ji mezmûnên edebiyata klasîk e û di edebiyata kurdî ya klasîk de jî xwedî cihekî taybet digre. Di gelek berheman de navên ajalan him di maneya rastîn de him jî di ya mecazî de derbas dibin. Helbet armanca helbestvanan ne we e ku behsa taybetiyên biyolojîk ên ajalan bikin. Ajal wek hêmaneke sereke ya teşbîh û mecazan di dîwanan de cihê xwe girtiye. Di dîwana Aqtepî de jî ajal hinek caran ji aliyê rengê xwe ve, hinek caran ji aliyê dengê xwe hinek caran jî ji aliyê şiklê xwe ve bûye unsura teşbîh û mecazan. Herwiha çendek ji wan ‘aşîq sembolîze dîkin, çendek jî me’şûq. Em ê li jêr yek bi yek cih bidin van ajalan:

##### 3.4.1 Sîyehmar

Yek ji ajalên ku di edebiyata klasîk de ji bona yarê tê bikaranîn mar e. Şibihandineke di navbera mar û porê yarê ê reş, dirêj û xingalokî de heye.<sup>256</sup>

Wucûda perde, bû e`dem; digel dîlber, şodem hemdem  
**Sîyeh marê** mûyê edhem, xelek bestin ji helqê ra (r. 40)

<sup>255</sup> Tökel, h.b.r. 352.

<sup>256</sup> Sefercioğlu, h.b.r. 148.

### 3.4.2 Teyr (Murx)

Çûk; bi Erebî “Teyr”, bi Farisî “murx” e. Di edebîyata klasîk de, di hin malikan de ‘aşiq rasterast wek çûkekî tê teswîrkirin, carna jî dilê ‘aşiq wek çûkekî tê teswîrkirin. Me’şûq bi çav, por û xalên xwe murxê dil, yanî ‘aşiq dixapîne.<sup>257</sup>

Nîn e **teyrek**, ez verêkim hezretê yarê ‘ezîz  
Xakîya bigrit ziyaret binitin dîsan cewab (r. 46)

Perçem û gîsû û kakul zulf û xalê muşkîsa  
Ez berayê **murxê dil** tîk dane dane da mudam

### 3.4.3 ‘Eqreb

Bi Erebî “Eqreb”, bi Kurdî jî “Dûpişk”, di edebîyata klasîk de, yek ji ajalên ku bi pora yarê tê şibihandin ‘eqreb e. Dûvê wê yê xingalî û rengê wê yê reş, bi pora yarê tê şibihandin.<sup>258</sup> Rû û enîya yarê jî ji ber xweşikbûna xwe dişibihînin heyv an jî rojê. Pora ku li ser rûyê yarê ya wek heyvê, dişibihe eqrebê ye.<sup>259</sup>

Der perişan bin li bedrê **perçemê ‘eqreb-sifet**  
Ez perişanî, dilê bêçare, pur êşan dikin (r.137)

### 3.4.4 ‘Enqa

Çûkekî mezin e ku her çi qas navê wî hatibe bihistîn jî, wek cism nîne. Jê re “Simurg, Zumurudî enqa” jî tê gotin. Li gorî rîwayetan, rûyê wî wek rûyê însanan e, sitûyê wî gelek dirêj û pûrtên wî rengereng in.<sup>260</sup>

Kirim sewda û sermest e, bi mestî, min wîsal qest e  
Welî, ‘**enqa** ye, serdest e, neşim, big’hême ‘enqaê (r. 161-162)

<sup>257</sup> Kübra Eskigün, *Klasik Türk Şiirinde Efsanevi Kuşlar*, Kahramanmaraş Sütçü İmam Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Ana Bilim Dalı, Yüksek Lisans Tezi, Ağustos-2006, r. 1.

<sup>258</sup> Amil Çelebioğlu, Fuzulî’nin Bir Beyti Üzerinde Bazı Düşünceler, *Osmanlı Araştırmaları VII-VIII*, İstanbul 1988, r. 206.

<sup>259</sup> Erdem Can Öztürk, Klasik Türk Edebiyatında Akrep ve Anlam Çevresi, *Türk Kültürü İncelemeleri Dergisi 41*, İstanbul 2019, r. 288.

<sup>260</sup> Onay, h.b.r. 58.

### 3.4.5 Bilbil (Endelîb; Hezâr)

Bi Erebi "Endelîb" û bi Farisî "Hezâr" e. Mezmûneke ku di edebîyata klasîk e gelekî hatiye bikaranîn. Wek simbolîk, "Bilbil" 'aşiq dinimîne û meşûqa wî jî "Gulê" ye. Gul jî yarê simbolîze dike. Bilbil her tim di baxçeyên gulên de bi dengê xweş eşqa xwe tîne zimên, nemaze demsala ku gul geş dibin ev deng dibe dengê huzunbaz û bilbil êdî dinale.<sup>261</sup>

‘Îd e, nik xelqê temaşa ye, wekî fêslê buhar

Nemexwan in her kesek ber werdê weslet, sed hezar

Gul me wenda ye; di hîcranê dinalim zare zar

‘Endelîb im, ‘endelîb im, ‘endelîb im, ‘endelîb(r. 43)

### 3.4.6 Baz (Şahîn; Şahîbaz)

Di edebîyata klasîk de, bi pora yarê tê şibhandin. Rûyê lêkçûn jî nêçîrvanî ye. Şahîn çûkekî nêçîrê ye. Pora yarê, nêçîra murxê - dilê 'aşiq dike, yanî 'aşiq dixapîne.<sup>262</sup>

‘Umr û dewranê’ m fena bûn; xem, li min xeylî cema bûn

Têk di damê 'îşqê da bûn, **baz û şahînê** di min (r. 139)

### 3.4.7 Qijik (Xurab; Zax)

Ji ber ku rengê qijikê reş e, wek lewçû tê bikaranîn; loma, por, birû, şev û birînên yarê bi qijikê tên şibhandin.<sup>263</sup> Aqtepi di van malikên jêr de ji aliyê reng ve sûd jê wergirtiye.

Kes du'a nakit ji bo min, mam di darê xurbetê

Têk cîhan bûz e, sipî nîn e, **reşai** wek **xurab**(r. 46)

Bi qurban! Ew qedê wek serwê baxan,

Bi heyran! Xalê **reş**, teşbîhê **zaxan**,

<sup>261</sup> Hayriye Durkaya, Fehîm-î Kadîm Divanı'nda Hayvanlar Üzerinde Bir İnceleme, *Sosyal Araştırmalar Dergisi*, c. 3, r. 18.

<sup>262</sup> Pala, h.b.r

<sup>263</sup> Kurnaz, h.b. r. 318.



Bi weslek, xweş bike van cerh û daxan,  
Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban! (r. 128)

### 3.4.8 Ahû (Xezal)

Heywaneke dirinde ye. Di gel vê taybetîya xwe, bi xweşikbûna çavên xwe û bîna miska ahûyê, di edebîyata klasîk de cih digire. Bi Erebi jî jê re “Xezal” tê gotin.<sup>264</sup> Di dîwanê de, bi her sê taybetiyên xwe jî cih digire. Herî zêde bi çavên yarê tê şibihandin. Her wiha ‘aşiqên mîna şêran jî nikarin li hemberî xweşikîya ahûyê (me’şûqê) bi ser bikevin. Çend mînak ji dîwanê:

Îhsan li min kit, yek wîsal; ew nazika **gerden-xezal**  
‘Îşqa me, dê bigrit kemal; yek car ji perdan, bême der (r.75)

**Ahûyê wehşî**; me, daam lêda ji nêva qelb û dil  
Min nizanî murxê canê min bi kakul bit ‘îqal(r. 107)

Qalê bûm bêgaz û çakûç û nefax û kure-nar  
Yek nezer weqtê ku da min şengê şoxa **çavxezal** (r. 105)

Ba xîret kes reste nabit, qet ji pencê esmeran  
Gerçî ev **kafir xezal in**; setwetê şêran dîkin.(r. 136)

### 3.4.9 Kebk (Kew)

Kew, bi navê “Kebk” di dîwanê de cih girtiye. ‘aşiq ji bo rewşa xwe bîne ziman, bi rêya hunera tenasubê di nav ajalên din de cih daye vê ajalê û dibêje eger zarîn, q’rîn û êşa min a giran bibihîsin, kew û baz, teyr û heywan jî wê xemgîn bibin û bigirîn.

Baz û **kebk** û teyr û heywan, dê bibin mehzûn û giryan  
Bişnewed er barê êşan; sewtê zarînê di min (r. 139)

---

<sup>264</sup> Onay, h.b.r. 47.

### 3.4.10 Tûtî

Ev ajal bi van taybetîyên xwe, di hemû zimanên cîhanê de cih girtiye: “Dengên ku dibihîse, dikare dubare bike û dema ku hînî gotinekê bê kirin, dikare bîne ziman.” Bi Farisî “Tûtî”, bi Tirkî “Papağan” an jî “Dudu” ye. Di edebîyata klasîk de, herî zêde wek “Tûtî”, carna jî bi navê “Bebga” hatiye bikaranîn.<sup>265</sup>

Kerem ke yek teselli, bo dilê bêçare ê “aşiq  
Ji nîranê firaqê, bîne der, min “aşiqê sadiq  
Bi weslê, dilgûşa ke min çu gul, ey tûtîyê natiq  
Xelas ke bi min yek suhbet, ji hal û derkê meqhûrî (r. 150)

### 3.4.11 Puleng (Piling)

Puleng jî wek şêr heywanekî dirinde ye. Di dîwanê de ji bo zalimbûna yarê hatiye bikaranîn.

Qubbeê neh taqê mîna ye, li min tarîk û teng  
Pey bi pey ez çeşmê dîlber tîn cîger tîr û xedeng  
Her zeman, ber qel’eê dil mutessil top û tifeng  
Sedmeta ‘işqa nîgarê, da me **nêv penca puleng**  
Ah û sed efxan, ji hîcra dîlbera ala Fireng(r. 81)

### 3.4.12 Rovî (Rûbah)

Yek ji ajalên di dîwanê de cih girtî, rovî ye. Bi Farisî Rûbah tê gotin. Di dîwanê de di du cihan de wek “Rûbah” derbas dibe. Di edebiyatê de bi qurnazî, neçarî û zeîfbûna xwe tê zikir kirin. Bi zeîfbûna xwe ji bo ‘aşiq unsura teşbîhê ye.<sup>266</sup>

**Wek mînak:**

<sup>265</sup> Zülfi Güler, Divan Şiirinde Papağan, *Akademik Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Yıl: 2, Sayı: 1, Mart 2014, r. 62.

<sup>266</sup> Osman Aslanoğlu, Abdurrahman Aktepi’nin Divanında Hayvan Mazmunları, *Hoca Ahmet Yesevi, Uluslararası Bilimsel Araştırmalar Kongresi*, 26- 27 Ağustos 2019, Gölbaşı- Adıyaman, r. 425.

Bo te bejim “aşiqê min; qenc li nutqê, guh bidêr  
‘Eynî îksîr im, bi husnê mest dikim teşbîhê zêr  
**Rûbehek** na-kes, boyî ‘işqa me, da te îsmê şêr  
Hem çu Loqman im, bi weslê, xweş dikim qelbê seqîm (r. 118)

### 3.4.13 Perwane

Perperokên piçûk ên bi şev li derdora lempeyê dizîvirin, jê re Perwane dibêjin. ‘aşiqê şem’ê ne, her tim li derdora wê diçin û tên, talîyê xwe diavêje êgir. Di edebîyata klasîk de, perwane, ‘aşiq, şem’e û me’sûq dinimîne.<sup>267</sup> Şem’e û perwane motîfeke ji edebîyata klasîk in. Di dîwana Aqtepî de jî di vê malika jêr de derbas dibe. Helbestvan dibêje: “Îbret bigire ji Perwanê, çawa ku perwane ji bo şem’ê xwe diavêje êgir û xwe qurban dike, ‘aşiq jî wiha ne ku ji bo me’sûqê çî bike jî li ber çavên wan ne tiştek e. Hemû cefaya me’sûqê jî ji bo ‘aşiqan xweş e.

Seh ke emsalê “‘Ereb: “derbu’l- hebîbî, ke’z-zebîb!”  
‘Îbret big’re ji **perwane**, mekêşe xefletê (r. 165)

### 3.4.14 Kelb (Kûçik)

Ev ajal bi sadiqbûna xwe tê zanîn. Di dîwanê de jî helbestvan ji bo dilsozî û sadiqbûna xwe bîne ziman ev ajal bi kar anîye. Helbestvan dibêje heta ez li ser rûyê erdê bim -heta ez bijîm- ez ê kûçikê (dilsoz) Şahê Neqşîbend (Behauddîn) bim.

**Kelbê** Şahê Neqşîbend im; ta li dunya zende me  
Me’dena cûd û sexa yî, ez feqîr im, hewce me  
Der-sulûkê rahê heq; ez murxekî per-beste me  
Bêhişê xemra gunah im, ‘asî û şermende me  
El-eman, şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me

### 3.4.15 Ejder (Ejdeha; Ejderha)

Li gorî ‘Eceman, mexlûqekî biper, çarpê û heftserî ye. Bi mecazî xezebdar û xedar e.<sup>268</sup> Di edebîyatê de li şûna pora yarê tê bikaranîn; çunkî porên yarê yên

<sup>267</sup> Durkaya, r. 24.

<sup>268</sup> Onay, h.b.r. 152.

xingalî dişibihe ejderhayê.<sup>269</sup> Aqtepî jêhatîbûn û qudreta “Duldul” yanî hespê Hz. Elî şibihandiye ejderhayan. Di helbestekê de jî pora yarê şibihandiye ejderhayê û dibêje: “Zulfê mîna ejderhayê qelbê min me ve da yanî ez birîndar kirim.”

Xwecayê Qenber, siwarê Duldulî eser **ejder** sifet  
Fatihê Xeyber, çeraxê weqtê kufr û mezlemet(r. 72)

Dûr e ez dîdarê min, ew şahê textê dîlberî  
Muxtefî ez çeşmê min, teşbîhê ecsamê perî  
Ledxe-gîr qelbê me, **ejderhayê zulfê ‘enberî**  
Min nevê xûbanê ‘alem, xeyrê yarê enwerî  
Ah û sed efxan ji hîcra dîlbera ala Fireng(81)

#### 3.4.16 Şêr (Şîr; Esed)

Şêr, li daristanê û li çîyayan jî dijî. Pençeyê wî xurt, heywanekî dirinde ye.<sup>270</sup> Ev ajal di dîwanê de gelekî hatiye bikaranîn. Di helbesta ji bo Hz. Elî de wek leqaba Hz. Elî de derbas dibe. Yanî Şêrê Xweda (Hz. Elî). Di hin helbestan de jî şêr ji bo ‘aşîq hatiye bikaranîn û di helbestekê de jî ji bo zalimbûna yarê hatiye bikaranîn.

#### Çend mînak ji dîwanê:

Şahê Merdan, **şîrê Yezdan** Îbnu emmê Mustefa  
Rehberê rahê heqîqet, ustê sultanê huda  
Fîkr û efkar im hemîn bes ya ‘Elîyy-ul Murteza  
La feta îlla ‘Elî, la seyfe îlla Zu’l-feqar (71-72)

Tîr û rim, pey pey dibarin ber dilê kul bê ‘eded  
Şewqê yarê keckulah, têk pare kir cerg û kebed  
Xaif û lerzende me, ez ket’me **nêv pencê esed**  
Derdê hîcranê qeti’ kir, canê şêrîn ez-cesed  
El-eman! Sed el-eman! Ey husnê sûret bêmîsal! (r.91)

<sup>269</sup> Pala, h.b.r. 136.

<sup>270</sup> Kurnaz, h.b.r. 320.

### 3.4.17 Edhem (Mehîn)

Di edebîyata klasîk de hesp û mehînên ku tên bikaranîn ev in: Sipî (Duldul, Eşheb, Hink), Belek (buraq), Sor ( Aşkar, Kumeyt, Kureng), Reş (Edhem, Şebdîz, Yaxiz).<sup>271</sup> Edhem cûreyekî mehênan e ku di dîwanê de cih girtiye. Bi Tirkî jê re “Yağız Atı” tê gotin. Reng û pora vê mehîne reş û dirêj e. Aqtepî pora yarê şibihandiyê Mehîna Edhem. Lewra “Mû” por e. Mûyê edhem: pora reş û dirêj.

Wucûda perde, bû e’dem; digel dîlber, şodem hemdem  
Sîyeh marê **mûyê edhem**, xelek bestin ji helqê ra (r. 40)

#### 3.4.17.1 Duldul

Navê hespê Hz. ‘Elî (s.l) ye. Di dîwanê de wiha derbas dibe: “Suwarê Duldulî” yanî “Hz. ‘Elî (s.l).” **Wek mînak:**

Xwecayê Qenber, siwarê **Duldulî** eser ejder sifet  
Fatihê Xeyber, çeraxê weqtê kufr û mezlemet  
Rûhîyê, derwêşî-ra ferman nîgahê merhemet  
La feta îlla ‘Elî, la seyfe îlla Zu’l-feqar (r. 72)

### 3.4.18 Mahî (Masî)

Di edebîyata klasîk de “meh” yanî “hîv, heyv), asîman û bilindahîyê dinimîne. Mahî “Masî” jî erd, binî û nizmâyîyê dinimîne. Ev her du têgeh gelek caran bi hev re hatine bikaranîn.<sup>272</sup> Di dîwanê de bi peyva “meh”ê re hatiye bikaranîn. Bi maneya “erd û binî” hatiye bikaranîn. Li gorî ‘aşiq, me’şûqa wî ji erdê heta asîman; ji hemû sirran agahdar e.

Bi yumna ‘işqê sultanê cîhan, şahînşehê xuban  
Ji **mahî** ta bi meh, ez cumle esraran, Tu agah î (r.155)

<sup>271</sup> Bülent Kaya, Divan Şiirinde At ve Şiirlerde İşleniş, *Türk Bilim Araştırmaları TÜBAV*, Yıl: 2017, Cilt: 10, Sayı: 3, r. 92.

<sup>272</sup> Cenk Açığöz, Klasik Türk Şiirinde Balık, *Uluslararası Türkçe Edebiyat Kültür Eğitim Dergisi*, sayı: 8/1, 2019, r. 204.

### 3.4.19 Musîqar

Du wateyên wê hene; a yekem, yek ji amûrên bayî ye; bi çend heb “ney”an ev amûr pêk tê.<sup>273</sup> A din jî navê “çivîkekî” ye, jê re “Kaknus” jî tê gotin, eslê peyvê ji “Kiknos”a Yunanî ye.<sup>274</sup> Wek ku me di beşa Ciwankarîyê de behsê kiribû, helbestvan hunera Tewrîyeyê bi kar anîye. Her çi qas ku wek amûreka muzîkê xuya bike jî, mebesta helbestvan ji “mûsîqarê çivîk” e; yanî ev jî cûreyekî ajalan e ku di dîwanê de cih girtiye.

Nexme min têtin ji dil, reng rengê mislê **mûsîqar**

Her sehergahan, ji min têtin ah û efxan sed hezar

Şêt û şeyda me, eman aware ez yar û dîyar

Ger binoşim ez ji le’lan, badeê şêrin û guwar

Heqq e ew xweştir ji cennet ez qusûr û ‘alîyat(r. 52)

### 3.4.20 Qaz û Sî

Qaz, teyrek e ku situyê wê dirêj, nikula wê fireh e, pirtûnên wê yan qehweyî yan jî gewr in. Di mîtoloji û çîrokên Tirkan de bi du şikilî derbas bûye, reş û belek.<sup>275</sup>

Dê çawan, ‘îdê temaşa kim li keyf û şahîya

Çunkî muhlet nakevîtin dil ji ah û zarîya

Dûr û mehcûr im ji yarê ser refê **qaz û sîya**

Na-qerîb im, na-qerîb im, na-qerîb im, na-qerîb!(r.42)

### 3.4.21 Nemleê Ez’ef (Mûr)

Ev ajal di helbesta şanzdehan de derbas dibe. Helbestvan di vê helbestê de rewşa xwe vedibêje. Ev ajal jî bi vê munasebetê derbas dibe. Em dikarin vê malikê wiha şîrove bikin: “Li gorî helbestvan, derdê wî ew qas giran e çawan ku mûrekî piçûk barê giran hildigire ew jî xwe li hemberî derdên xwe piçûk dibîne û dibêje, çawa nalîn nekim û axan nekişînim, derdê min zêde ye, ez li gorî derdên xwe gelekî zeîf im.”

<sup>273</sup> Pala, h. b. r. 336.

<sup>274</sup> Bo agahiyên berfireh, bnr. Eskigün, h.b.r. 27.

<sup>275</sup> Eskigün, h.b.r. 89.

Dê çisan nalîn nekîm, ahan nekêşim roz û şeb  
Nemleê ez'ef, çewan erz û sema ket ihtîmal (r. 103)

### 3.5 NAVÊ WELAT Û BAJARAN

#### 3.5.1 Semerqend û Buxara

Semerqend, di sala 535ê berî mîladê de ji aliyê hikumdarê Persê Cyrus ve, Başûrê çemê Zereşanê di dereke bilind de hatiye avakirin. Ji ber ku axa wê berdare û li ser rêyên girîng ên bazirganîyê hatiye avakirin, gelek kes li wir niştecîh bûne.<sup>276</sup>

Buxara, bajarekî Ozbekistanê ye. Ev bajar nuha jîyangeheke li nav sînorê Komara Ozbekistana girêdayî Rusyayê ye. Di erdnîgarîya edebîyata klasîk de, cihekî girîng digire. Bêtir bi bajarê Semerqendê re tê bikaranîn.<sup>277</sup> Di dîwanê de carekê bi bajarê Semerqendê re û carekê jî ji ber ku Behauddînê Pîrê terîqeta Neqşîbendîyê ji vî bajarî ye, di helbesta der barê Behauddîn de hatiye nivîsîn wek “Şahê ewrengê Buxara” derbas dibe, yanî ev ravek ji bo Behauddînê Pîrê terîqetê hatiye bikaranîn.

Bi qurban bim, qed û bejnê dilara!

Ne ez tenha, **Semerqend û Buxara!**

Veke babê kerem carek, Xuda ra!

Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban!(r. 129)

Sefwetê ehlê Xuda, serçeşmeê abê zulal

Şahê ewrengê **Buxara**, haîzê genca kemal

Xeyrê dergahê te, tewbe min nîye, fikr û xîyal

Şukrû'l-lîllah bende me, dest-beste der-seffê nîal

El-eman, şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me! 145

#### 3.5.2 Şam û ‘Iraq

Bajarê Şamê du caran di dîwanê de derbas dibe; carekê bi bajarê Yemenê re, carekê jî bi ‘Iraqê re. ‘Iraq jî carekê derbas dibe.

Mam qewî dermande sergeştî di sehayê fîraq

<sup>276</sup> Bo zêdetir agahî bnr. Seda Yılmaz Vurgun, Buhara Emirliğinin İki Önemli Şehri: Buhara ve Semerkand, *Türk Tarihi Araştırmaları Dergisi*, yıl: 1, sayı 1, Güz 2016, r. 147.

<sup>277</sup> Pala, h.b.r. 75.

Şiddetê hîcran li min teklîfî kir ma la yûtaq  
Xulxulî ‘eşqa me pur kir, xetteê **Şam û Iraq**  
Serteser exker weşim ez narê bu’ d û ihtîraq  
Ah û sed efxan ji hîcra dilbera ala Fireng

### 3.5.3 Firingîstan

Ewrûpa, mebest jê zalimî ye.<sup>278</sup> Welatê Frengan e.  
Can û dil mecrûh û bîmar in, teleb çeşmê sîyah  
Bo tebîbê doqîtor, qesdê **Firingistan** dîkin(r. 133)

### 3.5.4 Mesken Seba

Welatê ku Belqîsa jina Hz. Suleyman li Yemenê hikum lê kiriye Seba ye, welatekî dewlemend û hêzdar e. Ji ber çîroka Hz. Suleyman bi unsurên wek “Hudhud” an jî “Ba”yê re tê bikaranîn.<sup>279</sup>

Zarîn bikim weqtê seba; bo şahîdê Mesken Seba  
Sed ehl û pansed merheba, ey derdê yarê mu’teber(r. 76)

### 3.5.5 Yemen

Yemen, li Başûrê nîvgirava ‘Erebîstanê de dikeve. Di gel stêrka Suheyla û kevirê ‘eqîq tê bikaranîn.<sup>280</sup>

Bax û bostanê buharê, têk me bû Beyt-ul Hezen  
Xulxul û awazê ‘işqe’ m çû heta Şam û **Yemen**  
Çûm hilak ez firqetê feryadê min Weys-îl Qeran  
Xemzeê çeşmê di şehla, can deranî ez beden  
El-eman! Sed el-eman! Ey şahê ewreng ê cemal! (r.89)

---

<sup>278</sup> Aqtepi, h.b.r. 133.

<sup>279</sup> Emine Yeniterzi, Klasik Türk Şiirinde Ülke ve Şehirlerin Meşhur Özellikleri, *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, 3/15, r. 324.

<sup>280</sup> Yeniterzi, h.b.r. 330.



### 3.5.6 Kerbela'

Başûrê Rojavayê Bexdayê ye, cihê ku nevîyê Hz.Pêxember (s.x.l) Hz. Huseyn lê hatiye şehîd ketiye. Tirba Hz. Huseyn jî li wir e.<sup>281</sup> Ev tema li cem Aqtepî cihekî girîng digire. Helbestek der barê vê mijarê de hatiye nivîsîn. Malika xwarê jî ji wê helbestê ye û em dikarin wiha şîrove bikin: “Dema ku ew kesên tîbûyî yên deşta Kerbelayê tîn bîra min; yanî helbestvan li vir dixwaze bibêje ku dema ku Hz. Huseyn tê bîra min, ew bûyer tê bîra min, her tim le’netê tînim li wan kesên rezîl - Yezîd û alîgirên wî- tînim.”

El’eteş goyanê deşta **Kerbela** tîn fikrê min

Her zeman, le’net dixwînim, ez li ser canê pelîd(r. 65)

### 3.5.7 Necef

Li Başûrê Bexdaya paytexta ‘Iraqê ye, bêhtirî nifûsa wê Şî’î ne û tirba Hz. Elî (r.x.l.) li wir e.<sup>282</sup>

Şîrê Yezdanê Kerîmî Heyderê Kerrarê sef

Canişînî Fexrê ‘Alem, Şahê ewreng ê **Necef**

Ber zeban ranem, hemîn misraê peyda û bexef

La feta îlla ‘Elî, la seyfe îlla Zu’l-feqar (r. 71)

Leşkerê sultanê xem û wustan li ser dil, sef bi sef

Yafitem ez yumnê ‘işqê şahê xuban sed şeref

Eşkê xûnê’m şubhê Dicle, çû heta mulkê **Necef**

‘Umrê bêyar, bûye zayî, canê şêrin, bû telef

Ah û sed efxan, ji hîcra dîlbera ala Fireng(r. 85)

### 3.5.8 Çîgul

Ev bajar li Çînê ye û bi xweşikên xwe navdar e.<sup>283</sup> Lê di dîwanê de bi dûrbûna xwe hatiye bikaranîn. ‘aşîqê ku ji ber dûrketina yarê zarîn dike, bi rêya mubalexeyê dibêje zar zarên min diçe heta bajarê Çîgulê.

<sup>281</sup> Yeniterzi, h.b.r. 319.

<sup>282</sup> Yeniterzi, h.b.r. 323.

Zare zarên min di dil da; j'firqeta şemsa humul da  
Çûn heta mulkê **Çîgul da**, cûyê xûnînê di min (r. 139)

### 3.5.9 Çîn

Di helbesta klasîk de yek ji bajarên herî zêde tê behskirin Çîn e.<sup>284</sup>

Cûyê xûnîn, çûne **Çînê**; j'cewr û zulmê nazenînê  
Dê ji nû Mecnûn vejînê; beytê şêrînê di min(r. 140)

## 3.6 ÇÎYA

### 3.6.1 Çîyayê Tûrê

Li Çola Sen'ayê navê çîyayekî ku wek "Çîyayê Tûr"ê an jî "Tûr-î Sîna" tê zanîn.<sup>285</sup> Li gorî zihnîyeta Tesewifê, Tûr ji alîyê maneyê ve nefsa mirov dinimîne.<sup>286</sup> Di dîwanê de di helbesta ewil de bi rêya hunera Şibihandin û Telmîhê cih girtiye. Li ser vî Çîyayî çawan ku Xwedê Teala tecellî kiribe, me'şûq jî bi vî şikilî hatiye şibihandin. Ji ber ku peyvên "Tecellî û Tûr" bi hev re derbas dibin, em dikarin bibêjin ku hunera Telmîhê jî heye, yanî helbestvan rewşa di navbera 'aşîq û me'şûq de şibihandiyê bûyera di navbera Xwedê û Hz. Mûsa de. Û ji ber ku her du peyv derbas dibin, helbestvan xwestiyê vê bûyerê bîne bîra xwendevanan ji bo ku şibihandinê xurttir bike.

**Tecella eqsedê Tûr î**, perî-peyker, sîfethorî  
Bi saxî xistime kûr î<sup>287</sup>; dibim atêş bi nefxê ra(r. 38)

### 3.6.2 Kûhê Qaf (Çîyayê Qaf)

Çîyayekî gelekî mezin e, wek mekanê Enqayê tê tesewîrkirin.<sup>288</sup> Di dîwanê de du caran cih girtiye. Di mînaka jêrîn de wek lewçûya hunera Teşbîhê hatiye bikaranîn. Helbestvan derd û xemên xwe mîna vî çîyayî mezin dibîne.

---

<sup>283</sup> Yeniterzi, h.b.r. 309.

<sup>284</sup> Yeniterzi, h.b.r. 309.

<sup>285</sup> Pala, h.b.r. 461.

<sup>286</sup> Abdullah Eren, Klasik Türk Şiirinde Tasavvufî Açından Tûr-i Sînâ, Rumelide Dil ve Edebiyat Araştırmaları Dergisi, 2018, Özel sayı 4, r. 199.

<sup>287</sup> Ev peyv ji aliyê Muhammed Emîn Hêvidar ve wek "Kûrê" hatiye nivîsîn. Lê gor tespîtên me divê wek "Kûr î" bê nivîsandin. Lewra di vê malike de cinas heye.

Bûm hilak ez hîcrê cansûzê te, yarê'm el-aman!  
Şubhê **Kûhê Qaf** e qelbê min, ji derd û xeman  
Ah û feryadan dikêşim, ey nîgarê'm der-deman  
Şu'leya hîcra te, sotim; bêhtir ez narê cehîm (r. 115)

### 3.7 SÛR – GELÎ - BÎR

#### 3.7.1 Xeyber

Sûra Xeyberê jîyangeheke Cihûyan a di navbera Medîne û Şamê de bû. Di vekirina wê de Hz. Elî qehremanîyeke deraseyî nîşan daye. Ji ber vê yekê wek “Fatihê Xeyber” tê nasîn.<sup>289</sup>

Xwecayê Qenber, siwarê Duldulî eser ejder sifet  
**Fatihê Xeyber**, çeraxê weqtê kufr û mezlemet  
Rûhîyê, derwêşî-ra ferman nîgahê merhemet  
La feta îlla ‘Elî, la seyfe îlla Zu’l-feqar (r. 72)

#### 3.7.1.1 Babê Xeyberê (Babul- Xeyber)

“Derîyê Xeyberê” ji ber ku Hz. ‘Elî (s.l), di vekirina Xeyberê de wek mertal bi kar anîye û xwe parastiye, cihekî girîng digire. Di dîwanê de jî di medhîyyeya ku li ser Hz. ‘Elî (s.l) hatiye nivîsîn derbas dibe.

Canfîdayê rahê heq, kîşwer guşa behrê Resûl  
Ber konendê **babê Xeyber**<sup>290</sup>, şewherê pak ê betûl  
Roz û şeb, qûtê rewanim, ey şehê sahibqebûl!  
La feta îlla ‘Elî, la seyfe îlla Zu’l-feqar (r. 72)

#### 3.7.2 Wadî Eymen

Cihê ku Xwedê li ser Çîyayê Tûr tecellî li Hz. Mûsa kiriye. Di Quranê de wek “Wadîya Tura” derbas dibe.

Narê Mûsa mîn ledûn îsa ji şewqa dêm-durê

<sup>288</sup> Onay, h.b.r. 58.

<sup>289</sup> Yeniterzi, h.b.r. 314.

<sup>290</sup> Ev têgeh ji aliyê Mihemed Emîn Hêvîdar ve wek “babê xeyr” hatiye nivîsîn. Li gorî tespîten me ev “babê Xeyber” e lewma hat sererastkirin.

Nûrê **Wadî Eymenê**, bû der cîger min îştî'al (r.104)

### 3.7.3 Çahê Zemzem

Zemzem di dîwanê de wek “Çahê Zemzem” yanî çalika Zemzemê derbas dibe. Di malika jêr de helbestvan dibêje: “Li ber çeneyê şehnika yarê, mîna zarokên reş e. Her tim li ber çalika zemzemê nobetê digirin.” Em ji vê malikê fehm dikin ku Zemzem bi awayekî mecazî cih digire; helbestvan vê tîgihê dişibihîne çalika xemzeya (çen) yarê an jî dişibihîne devê wê.

Ber zenexdan, xalê reş teşbîhê zengî beççegan

Daîma ber **çahê Zemzem**, newbet û pawan dikin (r. 134)

## 3.8 ÇEM

### 3.8.1 Dicle

Di dîwanê de ji bo hêstirên ‘aşîq hatiye bikaranîn. Helbestvan bi rêya hunerên wek “Şibihandin û Mubalexe”yê cih daye vî çemî.

Leşkerê sultanê xem wustan li ser dil, sef bi sef

Yafitem ez yumnê ‘işqê şahê xuban sed şeref

Eşkê xûnê’**m şubhê Dicle**, çû heta mulkê Necef

‘Umrê bêyar, bûye zayî’, canê şêrîn, bû telef

Ah û sed efxan, ji hîcra dîlbera ala Fireng (r.85)

## 3.9 NAVÊ QEWMAN

### 3.9.1 Turk (Tacik û Qecer)

Di helbesta klasîk de bi taybetîyên wek; zalimi, serxweşî, wêrekî û şerûdî hatiye behskirin û ji bo yarê hatiye bikaranîn.<sup>291</sup>

Sed dax e der- qelbê hezîm; dîlber were carek bibîn!

Min çû ji dest, dunya û dîn; yexma kirim **Turkê Qecer** (r. 77)

---

<sup>291</sup> Pala, h.b.r. 462.

**Turk û Tacîk û Qecer;** ber milkê dil, anîn hucûm  
Pey bi pey, sa'et be sa'et xaretê Kurd'an dîkin (134)

### 3.9.2 'Ereb

Ev qewm jî di dîwanê de li hin cihan derbas dibe.  
Seh ke emsalê **'Ereb:** "derbu'l- hebîbî, ke'z-zebîb!"  
'Îbret big're ji perwane, mekêşe xefletê (r. 165)

### 3.9.3 'Ecem

'Ecem tê maneya kesên Ne'ereb. Ji bo Îran û Îranîyan tê bikaranîn.  
Sed hezar sewgendê min, ew tarê zulfê xem bi xem  
Hem bi an tacê Qubadê kec, wekî **Şahê 'Ecem**  
Nabîtin dil, yek nefes xalî, ji seffê derd û xem  
Bes ke tedwîlê fîraqê, can me ket'ye ber elem  
El-eman! Sed el-eman! Şox û şengê pur delal! (r. 87)

### 3.9.4 Rom û Hebeş

Hebeşî ji xelkê Hebeşistanê re tê gotin. Nuha ji Hebeşistanê re Esiyopya tê gotin; ji ber ku xelkên wê reş in, di edebîyata klasîk de wek unsurê şibihandinê, carna ji bo por û şehnika yarê tê bikaranîn. Di heman demê de bi peyva Romê re wek tezdad jî tê bikaranîn.<sup>292</sup> Rom, ji bo xelkên di Anatolyayê de dijîn dihate gotin, di edebîyata klasîk de bi unsurên wek sipîtî, rewnaqî, roj, xweşîkbûn, hwd. re tê bikaranîn.<sup>293</sup>

Bûseyek xeddê nîgarê, nûqteyek ez-xalê reş  
Nadim ez wellah bi textê şahê **Romî û Hebeş**  
Pur ke bo "Ruhî"yê rehmet saxerê bêxîll û xêş  
Ta bisozim ser te ser pêş dîlber û dêm mahêweş  
Bê nivîsandin ji min çend baqiyatê salîhat(r.54)

<sup>292</sup> Yeniterzi, h.b.r. 311.

<sup>293</sup> Yeniterzi, h.b.r. 324.

Yexma kirin, **Rom û Hebeş**; bîmar û mecrûh û nexweş  
Mam di bendeê xalê di reş; hetta demê heşr û neşer (r.77)

Wek di nîsan rengêreng, çiçek vebin der murxîzar  
Muxtelît bûn têk di çîmen, leşkerê **Rom û Hebeş** (r. 79)

### 3.9.5 Tatar

Tatar di helbestan de bi peyva miskê re tê bikaranîn.<sup>294</sup> Li gorî ‘aşîq zulfê yarê ewqas xweşik û bêhnxeş e ku Muşka Tatarî û gulên biharê jî li ber ne tu tişt in.

Qîmeta muşka **Tatarî**, rûmeta werd û buharî  
Kir’ye napeyda bi zarî, zulfê purçîn ê di min (r. 140)

### 3.9.6 Fireng

Ewropî, Efrenc; yek ji wan qewman e ku di edebîyata klasîk de cih girtiye. Nemaze di gel xweşik, pûk û kafirên xwe... hwd. wek welatê ne-musliman jî û wek cihê ku tê fethkirin jî hatiye bikaranîn.<sup>295</sup>

Di dîwanê de jî di misreya neqaratê ya Musammeta Mutekkerrir de hatiye bikaranîn. Di helbestekê de jî bi Romê re hatiye bikaranîn.

Qet neda ahê sehergahan ji bo min hîçî sûd  
Bexşê dîdarek me kir bo şahê xuban her çî bûd  
Tê ji nalînê me her dem nefxeê qanûn û ‘ûd  
Ta’inanê asîman çû, ez-dilê min nar û dûd  
Ah û sed efxan ji hîcra dîlbera ala **Fireng**(r.82-83)

### 3.9.7 Tersa

Sinifekî Tirkan e. Di edebîyatê de li şûna “êrîşker, zalim, talanker û posteger” de hatiye bikaranîn.<sup>296</sup> Di dîwanê de ji bo bi rêya hunera Îstîfareyê ji bo yar hatiye bikaranîn.

<sup>294</sup> Selami Turan, Necatî Beğîn Şiirlerinde Yer Adları, *SDÜ Fen Edebiyat Fakültesi Sosyal Bilimler Dergisi*, sayı: 20, Aralık 2009, r. 145.

<sup>295</sup> Pala, h.b.r. 158.

Min ji zatê dilberê weslek bi zarî kir meraq  
Zalima **Tersa** bi çi naket bi min re îttîfaq  
Bûme der çerxê firaqê mislê bedra der mehaq  
Muntezir mame ji bo rehmk di nîv narê firaq  
El-eman sed el-eman ey çeşmê ebrû der qital

### 3.9.8 Deylemanî

Deylem; di Gilana Bakurê Îranê de navê herêmekê ye. Rih û pora xelkên wê kirûşk e. Di edebîyatê de bi xweşikên xwe navdar e.<sup>297</sup> **Wek mînak:**

Eşkê al û erxewanî, tên wek enhar û kanî  
Ji hîcrê yarê **Deylemanî**, her ji ahîne di min (r. 138)

Di vê mînakê de helbestvan yara xwe dişbihîne Deylemanîyan (yara ku wek Deylemanîyan xweşik) û dibêje: “Ji dûrketina yara xweşik ahînan dikişînim, feryad dikim û rondikên çavên min ên wek dara erxwanê sor (bixwîn) tên û wek çem û kanîyan rondikên min pir zêde ne.”

### 3.10 NEBAT

Di edebiyat kurdî ya klasîk de wek mezmûnên din nebat jî mezmûneke pircure û girîng e. Helbestvanan ji bêhn, şikl û rengên nebatan sûd wergirtine û wek remz di helbestên xwe cih dane nebatan. Bi tîkiliya helbestvanan û çanda hezar salî di bikaranîna mezmûnan da êdî kevneşopîyek çêbûye û ji bo wan wateyên sereke rûniştîne.<sup>298</sup>

Helbestvanan bi xêra taybetiyên nebatan û qabiliyetên xwe yê hunerî gelek wate li nebatan bar kirine û di helbestên xwe de simbolên cur be cur pêk anîne. Ev wate bi pîranî ji bo yarê û endamên xweşikiya yarê ku armanca wan evîna îlahî ye û wateyê

---

<sup>296</sup> Onay, h.b.r. 402.

<sup>297</sup> Yeniterzi, h.b.r. 310.

<sup>298</sup> Osman Aslanoğlu, Gîya Di Dîwana Şêx Evdirrehman Aqtepe Da, *The Journal of Mesopotamian Studies*, C: 5/1, Winter 2020, r. 3.

tesewwufî ne, hatine bikaranîn.<sup>299</sup>Di dîwana Aqtepe de nebatên ku cih girtine ev in: Mêwe, Zerzewat, Kulîlk, Dar û Muxeylan.

### 3.10.1 MÊWE

#### 3.10.1.1 Engûr (Tirî)

Di edebîyata klasîk de li şûna şerabê tê bikaranîn. Ji ber ku şerab, vexwarineke sor a ji tirî ye, gelek caran bi lêvên yarê hatiye şibihandin.<sup>300</sup> Di mînakên jêr de, di malikê de ji bo şerabê, di bendê de jî ji bo lêvên yarê hatiye bikaranîn.

Temenna nergisê mexmûr, şeraba cewhera **engûr**  
Dil û canê me, kir rencûr, kirim yexsîrê sewdaê (r. 161)

Bi naz û dilrobayî, bête bezmê “aşiqan dîlber  
Muresse’ tacê zer, ber ferqê nazik ez dur û gewher  
Hemî, medhûşî bin, kef ber dîhen bê ‘eql û hiş yekser  
Bi cunbuş, têkde bin ez şewqê yar û **abê engûrî** (r. 151)

#### 3.10.1.2 Sêv

Ev mêwe di dîwanê de wek “muşebbeh bîhî” a hunera teşbîhê hatiye bikaranîn. Helbestvan xwe dişibihîne sêvan û dibêje: “Îd e kêfa herkesî li cih e herkes dilşad e vê rojê, lê ez tenê bê miraz û bê hêvî me. Kêfa hemû “aşiqan li cih e rûyê wan sor e, yanî kêfxweş in, lê ez tenê di vî halî de me.” Helbestvan, di misreya dawî de jî xwe dişibihîne sêvan, xwe wek sêvên zer<sup>301</sup> dibîne û mebesta wî jî ev e ku dixwaze bibêje kêfa min ne li cih e, yanî rûken nîne û bê hêvî ye.

‘Îd e û her kes li keyf û şahî ye ev rojê ‘îd  
Ez, tenê mame di kuncê namuradî, bêumîd  
Cumle “aşiq, surxî-rû; lê ez di vî halê şedîd

**Şubhê sîb im, şubhê sîb im, şubhê sîb im, şubhê sîb(r. 43-44)**

<sup>299</sup> Aslanoğlu, h.b.r. 3.

<sup>300</sup> Pala, h.b.r. 139.

<sup>301</sup> Di beşê rengan de em ê behsa vî rengî bikin.



### 3.10.2 ZERZEWAT

#### 3.10.2.1 Peyaz (Pîvaz)

Ev zerzewat di dîwanê de di nav biwêjê de hatiye bikaranîn. Helbestvan dibêje: “Ger ez bi gihiştina yarê re bi ser bikevim, her du dunya nayê li ber çavên me/ min wek qîmeta pîvazekî jî; yanî heger ‘aşiq negihêje me’şûqa xwe, her du dunya bi qasî pîvazekê jî ne bi qîmet in.”

Ger muzaffer bim, bi wesla dîlbera gerdenbeyaz

**Herdu ‘alem naê ber çeşmê me, qîmet yek peyaz**

Dê li nik emsal û eqranan bikim sed fexr û naz

Tev tefê ‘uşşaqî bim ez mislê teyrê şahêbaz

Dê mu’ella kim bi hîmmet sed nufûsê safilat (r. 53)

### 3.10.3 KULÎLK

Kulîlk, beşa rengîn û bi bîhn û tovdar a giyayan e ku bi wan tovan zêde dibin.<sup>302</sup> Yek ji unsûrên estetikê yên ku wek mezmûn di edebiyata klasîk de derbas dibe, kulîlk in. Ev unsûr di dîwana Aqtepe de bi heft cureyên xwe cih girtiye. Ev kulîlk carna bi rêya îstîareyê di şûna yarê de hatine bikaranîn, carna jî bi unsûrên xweşîkbûnê yên yarê hatine şibhandin.

#### 3.10.3.1 Gul (Werd û Nesrîn)

Gul, kulîlka herî biqîmet, xweşik û bêhnxweş e. Me’şûqa bulbul e, bulbul jî ‘aşiq bi xwe ye. Sitrîyên Gulê jî reqîbê ‘aşiq in; yanî sitrî di navbera gul û bulbul de astengek e.<sup>303</sup> Di Tesewifê de gul; sembola Hz. Pêxember e. Ji xêncî wî, di serî de wehdetê dinimîne. Gula hê vebûyî, yanî xoncegul, tewhîdê, gula vebûyî jî tewhîd û wehdeta di halê kesretê de dinimîne. Her wiha xoncegul, halweta, yek ji esasên bingehê tesewifê, dema sirên di navbera Xwedê û derwêş de dinimîne, gula vebûyî jî kifşbûna van siran simbolîze dike.<sup>304</sup> Wek hemû edebîyatan, di edebîyata Kurdî ya klasîk de jî gul kulîlka sereke ye. Ji ber ku sembola me’şûq e, ji alîyê gelek

<sup>302</sup> Aslanoğlu, h.b.r. 4.

<sup>303</sup> Onay, h.b.r. 97: Pala, h.b.r. 172.

<sup>304</sup> Bo zêdetir agahî, bnr. Sabri Çap, Tasavvufta Gül Sembolü ve Gül İle İlgili Telakkinin Oluşmasında Uydurma Hadislerin Rolü, *Bilimname XXXVI*, 2018/2, r. 455-498.

helbestvanan ve hatiye bikaranîn. Di dîwana Rûhî de jî kulîlka herî zêde hatiye bikaranîn, gul e. Em dikarin bibêjin ku Aqtepî herî zêde hez ji gulan kiriye. Gul carna bi rêya hunera Îstiareyê li şûna yarê hatiye bikaranîn. Helbesta di rêza 14an de unsurên xweşikbûnê yên yarê bi gulê tê şibhandin, yanî li gorî Aqtepî, dêm, lêv, rû, por, endam, qed û qamet, dest û tilîyên, hwd. yarê mîna gulê ye; anku yar bi tevahî gul e. **Çend mînak ji wê helbestê:**

**Leb-gul û gerden-gul û xebxeb-gul û rûxsar e gul**

**Dê-m-gul û çehre-gul û ten-gul seraser yar e gul**

**Qedd-gul û qamed-gul û xeddê munewwer gulgulî**

**Cebhetê beyza gul, gul turreê terrar e gul**

**Çendî nazik herekat e, butê gul pîrehenem**

**‘Îşwe-gul, nazî-gul û rûniştin û reftar e gul (r.93)**

Aqtepî carna bi rêya hunera Îstiareyê, li şûna yarê bi kar anîye û dibêje: “Bi rastî yar (me’şûq) yek e û xweşik e. Bulbul bê tune, beyxûde de’wa gulê di baxçeyan de dikan.

Fîl-heqîqet **gul** yek e, ev nazika şeng û şepal

Bulbulan, bêhûde meylê werdê der bûstan dikan (r. 136)

Nesrîn tê maneya gula kovî. Di dîwanê de du caran bi Gulê re hatiye bikaranîn:

Şahidê şêrîn şemail, hate bezma bédilan

Şerbeta xemra ‘eqîqî, dûrî bû nêv bulbulan

Zulfê, muşkîn dan; du sed te’ne li **nesrîn** û **gulan**

‘Îd û Newroz in li min da çerxê etles xulxulan

Serfiraz im vê demê, nîşan hinar in hem xelat(r. 49)

### **3.10.3.2 Pirpizêk**

Cûreyekî kulîlkan e. Ev kulîlk nîşaneyê biharê ye. Jê re kulîlka Newrozê jî tê gotin. Rengên wê bi gelemperî binefşî û zer in. **Wek mînak:**

**Pirpizêk** min girte yed; lîkîn ji hukmê firqetê

**Pirpizêk** û çîçek û sorgul, di bîra min netê (r. 163)

Wek ku tê zanîn, di biharê de xweza bi kulîlkan tê xemilandin. Di vê malikê de em tê digihêjin ku: “Helbestvan dibêje min bihar bi dest xistiye, derdor hemû kulîlk in, lê ez ji yara xwe mehrûm im, yanî ji yara xwe dûr im lewma kulîlk nayên bîra min û bala min nakşînin.”

### 3.10.3.3 Benefş (Binefş)

Di helbesta klasîk de ji bêhna wê, rengê wê yê tarî, bejna wê ya xwar û şikilê wê sûd hatiye wergirtin. Yek ji unsurên herî berbiçav ên bihar û çîmenê ye. Xala (Şehnik) yarê dişibihe benefşê. Li şûna mûzerikê tê bikaranîn. Ji aliyê reng û bêhna xwe ve wek miskê ye.<sup>305</sup> Di dîwanê de di gel “Gul, Sosin, Pirpizêk”ê li şûna yarê hatine bikaranîn.

Sed gul û sed sosin û sê sed **benefş** û pirpizêk

Yek pare naê, li nik dil, ew di sûka muhbetê (r. 163)

### 3.10.3.4 Nergiz (Nêrgiz)

Nergiz, ji aliyê şikil û rengê xwe ve, di rola lewçûyê de ye. Unsurên wek; zêr, tac, qedeha zêrîn, kase, çerax, stêrk bi nergîzê tîn şibihandin. Herî zêde jî çavên yarê û nergiz tîn şibihandin.<sup>306</sup> Ev kulîlk jî di dîwanê de du caran hatiye bikaranîn. Di malika ewil de bi rêya hunera Îstiareyê li şûna yarê hatiye bikaranîn, di ya duyem de, ‘aşiq ji ber ku ketiye agir û şewata eşqê û ji yara xwe dûr e, meyla wî naçe li ser pirpizêk û nêrgizan; yanî li ber dilê ‘aşiq xweşikbûna nêrgiz û pirpizêkan ne tu tişt e.

Temenna nêrgisê **mexmûr**, şeraba cewhera ungûr

Dil û canê me kir rencûr, kirim yexsîrê sewdaê (r. 161)

Meylê dil, çawa biçit ser pirpizêk û **nergizan**

Çun ji hîcrê yarê serkeş, ket’me pêt û hirqetê(r. 163)

---

<sup>305</sup> Pala, h.b.r. 305.

<sup>306</sup> Kurnaz, h.b.r. 331.

### 3.10.3.5 Lale

Lale, kulîlkeke xweşik e ku ji famîleya riwekên ku wekî pîvaz, pîvok û sosin dikevinê ye.<sup>307</sup> Lale ji ber rengê xwe, bi ‘aşiq, xwînê, birînê, rû, hinarok, bûkan, hwd. û ji ber şikilê xwe, bi qedehê, eskeran, kulahan, fanûsan, hwd. di rola lewçûyê de ye.<sup>308</sup> Di dîwanê de, di du helbestan de derbas dibe. Li gorî Aqtepe, xweşikbûna rihan, lale, qetmer û ew bêhnên xweş, bêhna xwe ji yarê disitîne; loma, li ba însanan bi qîmet in. Di helbesta din de jî, ew kesên ku rûyên wan mîna laleyan xweşik, dişibihîne sitêrka perwînê û dibêje: Ew lale-rû, mîna sitêrkên perwînê, heft û heyşt û pênc û şeş di çîmenê de kom bûne; yanî mîna wan sitêrkan kom bi kom û zêde ne.

Rihan û **lale** û qetmer û zibad û mawer û ‘enber  
Ji rengê bûyê te yekser, ‘ezîz in ew ji xelqê ra (r. 40)

Mîslê perwînê sema, cem’in di çîmen **lale-rû**  
Fewcê fewc in der temaşa heft û heyşt û pênc û şeş (r. 80)

### 3.10.3.6 Sunbul

Kulîlka ku li çol û çîyayan çêdibe, li park û bexçeyên bajran dixemilîne û di gel rengêrengbûna xwe û bêhna xwe ya xweş ku mizgînîya biharê dide, jê re sunbul tê gotin.<sup>309</sup> Helbestvanên edebîyata Kurdî ya klasîk jî di dîwanên xwe de cih daye vê kulîlkê. Di dîwana Aqtepe de jî carekê derbas dibe. Pêwendîya sunbulê bi porê yarê re heye. Bi şikil û bêhna xwe dişibihe porê yarê. Sunbul û gul bi gelemperî bi hev re tên bikaranîn; ji ber ku porên sunbulî dikevin li ser hinavên gulî.<sup>310</sup>

‘aşiqan burdîn sebeq, ez bulbulê dîlber ji gul  
Zulfê muşkîn, te’neha der **sunbul** û reyhan dîkin (r. 136)

<sup>307</sup> Bo zêdetir agahî bnr. Ahmet Kartal, *Klasik Türk Şiirinde Lâle*, Akçağ Yayınları, Ankara 1998, r. 1.

<sup>308</sup> Kurnaz, h.b.r. 331.

<sup>309</sup> Gülay Karaman, Perişan Çiçek Sünbül ve Klasik Türk Şiirinde İşleniş, *İnsan ve Toplum Bilimleri Araştırmaları Dergisi*, c.1, sayı. 2, 2012.

<sup>310</sup> Pala, h.b.r. 414.

### 3.10.3.7 Reyhan

Kulîlkên ku ji ber rengê xwe yê reş û bêhna xwe, bi por, zulf, kakul û mûzerika hinarokên yarê tîn şibihandin, gelek in, yek ji wan jî reyhan e.<sup>311</sup> **Wek mînak:**

‘Îdeyan, yarê xwe girtin, çûne seyra gulşenan

Muntezîr ba-saxer û **reyhan** û werd û sosinan

Bi tenê mame digel eşkan, di kuncê kulxenan

Bê nesîb im, bê nesîb im, bê nesîb im, bê nesîb(r. 41)

Di vê bendê de, helbestvan dibêje: “Ew kesên ku diçin îdê, çûne li bexçeyê gulan temaşe dikin, çavên wan li rê, li benda reyhan, gul û sosinan, li benda yarê xwe ne, çavên min tenê bigirîn in.

### 3.10.4 DAR

Di Edebîyata klasîk de, dar, bejna yarê sembolîze dike. Di dîwana Aqtepî de çar cure dar cih digirin. Sê cûre bejna yarê sembolîze dikin, yek jî bi taybetîya rengê xwe ve cih girtiye. Ji van daran herî zêde serwî (selwî) hatiye bikaranîn.

#### 3.10.4.1 Serwî

Sed hezar Leyla û Şêrîn û Zuleyxa der xiram

Çeşmê şehla, **serwî- bala**, xunce-dêv elfazê xweş

#### 3.10.4.2 Şîmşad

Fikrê min, **ew qameta şîmşadî** ye der-roz û şeb

Roz û şeb; yeksan e, yek reng e ji bom in der-teleb

Gûşê ber qewlê reqîban, kir hebîbê’ m bêsebeb

Min ji ber derdê firaqê, pare bû cerg û kezeb

El-eman! Sed el-eman! Ey keckulahê rû bixal! (r. 87)

#### 3.10.4.3 ‘Er’er

Sed sebah’ul xeyrê min, xakîpayê dîlberê

‘Îsewî teb’ê! Kubarê! Nazîkê! Dêm enwerê!

Çeşmê horî, werdê cûrî, **qedd û qamed ‘er’erê**

<sup>311</sup> Berat Açıl, Klasik Türk Şiirinde Estetik Bir Unsur Olarak Çiçekler, *FSM Araştırmalar, İnsan ve Toplum Bilimleri dergisi*, h.5, sal: bahar 2015, r. 18.

Der lehîbê ateşê, ez ket'me pencê beglerê  
El-eman! Sed el-eman! Ey bejn û bala î'tîdal! (r. 87)

#### 3.10.4.4 Erxewan

Erxewan dareke ji malbata baqîlan e. Di edebîyata klasîk de wek gul û laleyê cihêkî girîng negire jî, dîsa ji ber rengê xwe yê pembeyîyê dişibihe sor, wek gul û laleyê di cihê; şerab, xwîn, hêstirên bixwîn û hinarokên yarê de tê bikaranîn.<sup>312</sup> Di dîwanê de helbestvan ji bo hêstiran bi kar anîye û ku hêstirên sor ên bixwîn in.

Eşkê al ê **erxewanî**, tên wek enhar û kanî  
Ji hîcrê yarê Deylemanî, her ji ahîne di min (r. 138)

#### 3.10.5 Gulzar (Gulşen; Gulbun; Çîmen; Bûsîtan)

Gulzar, gulşen û gulbun, tên maneya baxçeyên gulan. Maneya çîmen û bustan jî baxçe ye. Ev têgeh carna ji bo cihê yarê, wuslata yarê, eşqa wê tê bikaranîn û carna yarê bi xwe dişibihîne baxçeyên gulan.<sup>313</sup>

Dîlberê **gulbun**, çu gul hîna vebe der-'alemê  
Ewwel û axir, gul; 'alem hemî **gulzar** e gul (r. 95)

#### 3.10.6 Xar û Muxeylan

Xar; sitirî, di helbesta klasîk de unsurên ku ezyetê didin 'aşiq, dişibihin sitirî.<sup>314</sup> Muxeylan sitirîyê deveyan e. Sembola eş û izdirabê ye.<sup>315</sup> Di malika ewil de, helbestvan yarê bi xwe dişibihîne sitirîyê û di ya duyem de dilê 'aşiqê ku ji yara xwe dût e tijî sitirî ne, yanî 'aşiq eş û izdirabê dikişîne.

Afetê 'işqa te, ser min cumle gul tên gulşenê  
Meqseda 'aşiq; çu gul bit, seng e gul, hem **xar** e gul (r.95)

Dil tijî xarê **muxeylan** e, ji hîcra sorgulan  
Dê çisan, werd û gulan bîn kim, digel vê mîhnetê (r. 164)

<sup>312</sup> Bo zêdetir agahî, bnr. Şener Demirel, Türk Şiirinde Erguvan Üzerine Bir Deneme, *Uluslararası Türklük Bilgisi Sempozyumu*, Erzurum Atatürk Üniversitesi, 25-27 Nisan 2007, r. 3-5.

<sup>313</sup> Pala, h.b.r. 173.

<sup>314</sup> Pala, h.b.r. 191.

<sup>315</sup> Pala, h.b.r. 328.

### 3.11 AMÛRÊN MÛZÎKÊ

Amûrên muzîkê bi gelemperî ji bo ‘aşiq, ‘aşiqê ku ji ber fîraq û hicrana yarê, ax û nalînê dikişîne bi amûrên muzîkê tê şibihandin, tên bikaranîn. Ax û nalînên ‘aşiq jî mîna van amûran deng derdixînin û bi şewat in.

#### 3.11.1 Ney

Bingehê wê nay e, ji qamîşan çêdibe, amûrekî bayî ye. Kesên ku neyê lê dixînin jê re neyjen tê gotin.<sup>316</sup>

Derdîmend im, bêtebîb im! Ah û efxan bêhîsab  
Her ji narê zenb û ‘îsyar, cerg û dil min bû kebab  
Hem çû ney lerzende me; ez xewfê ehwal ê ‘ezab  
Ya Resûlallah dexîl im! Ya Hebîbellah dexîl’

#### 3.11.2 Qanûn

Amûreke muzîkê ye. Meriv wê datîne ser çokên xwe û lê dixê. Meriv mizrabekê dike her du tilîyên xwe û bi van mizraban li tîlên wê dixê.

#### 3.11.3 ‘Ûd

Amûreke muzîkê ye, ji dara ûdê tê çêkirin. Hejmara tîlên wê digihêje 11-12 heban. Sapa wê, ji ya tenbûrê kintir e.

Helbestvan nalînên xwe dişibihîne dengê qanûn û ‘udê.  
Qet neda ahê sehergahan ji bo min hîçî sûd  
Bexşê dîdarek me kir bo şahê xuban her çî bûd  
Tê ji nalînê me her dem, nefxeê **qanûn û ‘ud**  
Ta’înanê asîman çû, ez dilê min, nar û dûd  
Ah û sed efxan, ji hîcra dîlbera ala Fireng (r. 82- 83)

---

<sup>316</sup> Pala, h.b.r. 358.

#### 3.11.4 Ribab

Cûreyekî kemañçeyan ye, ji qaşîkê qûza Hindistanê tê çêkirin.<sup>317</sup>

#### 3.11.5 Çeng

Cîreyekî arpê ye. Dişbihe qanûnê û sapê wê xwar e. Di reqsên berê de amûra muzîkê ya herî zêde dihat bikaranîn ev bû.<sup>318</sup>

#### 3.11.6 Saz

Jê re tembûr jî tê gotin.

Çare min nîn e, ji ‘îşqê; ey hebîba çaresaz!

Şu’leya hîcra te, bû narê cehîma cangudaz

Min bi weslî ke demek, şahê cîhan ê serfiraz!

**Bêney û qanûn û ‘ûd û, bêribab û çeng û saz**

Dê ji efxanan vekim, bo te hezaran nexemat (r. 51)

Bi lef bèn gîsûyê taze, bi **saz** û coş û awaze

Rûxê, ‘aşîq dibit xaze, ji ber tîrê di cergê ra(r. 37)

#### 3.11.7 Nexme

Nexme, dengê stranan û dengê amîrên mûzîkê ye.<sup>319</sup>

**Nexme** min têtin ji dil, reng rengê mislê mûsîqar

Her sehergahan, ji min têtin ah û efxan sed hezar

Şêt û şeyda me, eman aware ez yar û dîyar

Ger binoşim ez ji le’lan, badeê şêrin û guwar

Heqq e ew xweştir ji cennet ez qusûr û ‘alîyat(r. 52)

#### 3.11.8 Mutrib

Peyveke Erebi ye, ji lêkera “etrebe” ya bi wateya “kêfxweşî çêkir”, ji kesên ku li sazan dide û sitran dibêje re tê gotin.<sup>320</sup>

<sup>317</sup> Yıldırım, h.b.r. 78.

<sup>318</sup> Yıldırım, h.b.r. 78.

<sup>319</sup> Cizîrî, h.b.r. 43.



**Mutrib** û saqî! Werin ba-nexme û cam û zucac!

Da bikin ‘îşret heme, Yexfir lena yewm’el-qîyam(r. 109)

### 3.12 BÊHNA XWEŞ

#### 3.12.1 ‘Etr (Şemîm)

‘Etr peyveke bi Erebî ye ku nebateke ji malbata sardûnyayê ye, bêhn xweş, rengereng e.<sup>321</sup> Ev bêhn ji bo pora yarê hatiye bikaranîn. **Wek mînak:**

Nagihan hîlbû li min, berqek ji sethê cebhetê

Perçemê purçîn veda ‘**etr û şemîma** cennetê

Saxerê sîmîn, bikef meş’ya, kemala suhbetê

Bûm xerîqê luccê behra xumar û dehşetê

Mîslê Pîrê Xaniq e, lê bêtecellî nûrê zat(r. 48)

#### 3.12.2 ‘Enber

Madeyek, nerm, zeliqok, reş û bêhnxweş e ku ji masîyên giravan ên behrên Hindan tê peydakirin.<sup>322</sup> Di dîwanê de, ‘enber wek: “ejderhayê zulfê ‘enberî, enber-şemîm, mûyê ‘enber, ‘enberê sara” derbas dibe û ji bo bêhna pora yarê hatiye bikaranîn.

**Wek mînak:**

Çun bibin awîze, ew **zulfê muselsel ‘enberî**

Der-nefes, bo ‘eqlê zencîr ê cunûn cunban dîkin 137

Di vê malikê de helbestvan dibêje: “Pora yarê ya ku xelek bi xelek û bêhnxweş (enber), dema ku wek awizeyan xwe dileqîne di wê gavê de aqlê ‘aşîq zincîr dîke yanî ji destan disitîne wî sermest û dîn dîke.

---

<sup>320</sup> Cizirî, h.b.r. 28.

<sup>321</sup> Muhammet Ali Demir, *Divan Şîirinde Sevgilinin Saçının Kokusu*, Boğaziçi Üniversitesi, Yüksek Lisans Tezi, 2015,

<sup>322</sup> Pala, h.b.r. 23.

### 3.12.3 Misk (Muşkîn; Muşgîn)

Madeyeke bêhnxeş û reş an jî esmer û tîr e ku ji binê çermê zikê Bizina miskê ya ku li çîyayên bilind ên Asyaya Navîn dijî tê peydakirin.<sup>323</sup> Ev bêhn jî wek bêhnên din ji bo pora yarê hatiye bikaranîn. **Wek mînak:**

Şahidê şêrîn şemail, hate bezma bêdilan  
Şerbeta xemra ‘eqîqî, dûrî bû nêv bulbulan  
**Zulfê, muşkîn** dan; du sed te’ne li nesrîn û gulan  
‘Îd û Newroz in li min da çerxê etles xulxulan  
Serfiraz im vê demê, nîşan hinar in hem xelat(r. 49)

### 3.12.4 ‘Ebîr

Bêhneke xweş e ku ji tevlihevkirina madeyên wek enber, misk, zeferan, koka sunbul, gulasor, dara sandalê ya sipî, sincêrên kulîlkan tê bidestxistin.<sup>324</sup> Di dîwanê de wek “nîkhet-‘ebîr” derbas bûye û ev bêhn ji bo yarê bi kar anîye.

Xwendin em bezma wîsalê, dîlbera **nîkhet-‘ebîr**  
Çûm giham çahê zenexdanê nîgara bênezîr  
Bêhiş û sewda û sergerdanê an bedrê munîr  
Min, der axûş kir, bi kamê di, qed û qamê herîr  
Sed hezar îhsan li min kir, şahê îksîr, îltifat (r. 50)

### 3.12.5 Nafe

Madeya birûn û bêhnxeş e ku ji xwûna zikên ahûyên bi navê Hata û Hutên tê peydakirin.<sup>325</sup>

Tên ji her beytek te, şêrîn bîhn û bûya **nafeya**  
Lezzeta me’nî didit, teşbîhê xemra şûşeya  
Nîm e ez bêhub, welê mani’ li min ke perda heya  
Hem reqîbê kafirê bedxwahê cessasê nemim (r. 121)

<sup>323</sup> Demir, h.b.r. 25.

<sup>324</sup> Demir, h.b.r. 18.

<sup>325</sup> Demir, h.b.r. 33.

### 3.12.6 Bêhna Gulan

Bêhna gulan ji bo yar tê bikaranîn, lewra bêhna yarê, ji bo ‘aşiq wek bêhna gulan e.

Nîn e kes yarek wekî yarê me, yekser gul bitin

Zulfê muşgîn, **bûyê gul**, hem kakulê mekhar e gul ( r. 94)

### 3.13 KEVİRÊN BIQÎMET (GEWHER Ê ALAVÊN XEMLÊ)

Gelek maneyên Cewherê di edebîyatê de hene. Ji kevirên wek, durr, elmas, yaqût û zumrud re tê gotin, wekî din tê maneya qabilîyet û bingehînê û hwd.<sup>326</sup>

Şehrîyarê textê seddiq î, Şehê ‘alîcenab

Feth û nesret hem ‘înan îqbal û dewlet der rîkab

**Gewherê** tacê serê têk ewlîya bêirtîyab

‘Asiyane rû be-dergahê tok erdem rûmet-ab

El-eman, şahê mezsîn! Yexsîrê zencîra te me!(r. 143-144 )

#### 3.13.1 ‘Ac

Navekî Erebi ye, di ferhengên de tê maneya “diranê filan”<sup>327</sup> bi Tirkî jî jê re “Fildişi” tê gotin. Aqtepi, di dîwanê de sipîbûna gerdena yarê dişibihîne ‘acê.

Qed serwe, qerden, sade ‘ac; eswed-uyûn a ser bi tac

Nakit li derde min ‘îlac; e’s-sebrû mîftah’ul-ferec (r. 57)

#### 3.13.2 Yaqût

Yaqût jî cûreyekî cewheran e, kevirê gelekî biqîmet e. Lewra, di edebîyata klasîk de cihekî girîng digire. Herî zêde ji ber rengê wê yê sor û biqîmetbûna wê ya di çêkirina qedeh, gustilk, guhar, gerdanlixan de tê bikaranîn.<sup>328</sup>

Bo dilê sedmet-zede, carek veke babê ‘eta!

Abê **yaqûtî** bide, weqtê seher, ser simê-cam! (r. 113)

<sup>326</sup> Onay, h. b. r. 108.

<sup>327</sup> Yeliz Toprak, *Kanûnî Devri İhtişamının Divan Şiirine Yansıması ( Hayalî, Bakî ve Taşlıcalı Yahya Divanlarında Değerli Taşlar*, Yüksek Lisans Tez, Haziran 2017. r. 29.

<sup>328</sup> Mutlu Melis Özgeriş, Değerli Taşlar Yönünden Ahmet Paşa Divanı, *Türkiyat Mecmuası*, c. 26/2, 2016, r. 309.

### 3.13.3 Elmas

Cewhereke meşhûr e. Bi Erebî “Elmas”, bi Farisî jî “Mas” jê re tê gotin. Koka wê “azamis” a bi Yewnanî ye û tê maneya “polada hişk”. Wek kevirê biqîmet tê nasîn û bikaranîn.<sup>329</sup>

Canê cananê cîhan, zî-bendeê şîmşîr û gah  
Ustê der-rahê heqîqet, turkîtazi şîrê tah  
Şod butadê kufre an **elmasê** enfas-eş tebah  
Çun bulend uftadê îqbalê Bahauddînê şah  
Xulqê ‘alem ra şode pûşeş penahê Nexşîbend (r.62)

### 3.13.4 Dur

Wek navên “Lu’lu, leal, murvard, leali” tê zanîn, di nava sedefê de çêdibe.<sup>330</sup> Di dîwanê de du caran hatiye bikaranîn. Di malika jêr de ji bo rûyê yarê hatiye bikaranîn.

Îd e îro, bêqerar im ez, ji feqda **dêmdurê**  
Bêhebîb im, bêhebîb im, bêhebîb im, bêhebîb  
Her kesek ba-yarê xwo d’ meşîyan di sehrayan li rê  
Pur kebîb im, pur kebîb im, pur kebîb im, pur kebîb! (r. 41)

### 3.13.5. Le’l û Sedef (Mercan

Di helbesta klasîk de yek ji kevirên ku herî zêde tê bikaranîn jî Le’l e. Cewhereke wek yaqut sor û biqîmet e. (mubbi 701) mercan kevirê organîk e. Heywanên piçûk ên di behrên germ de dijîn, jê re mercan tê gotin. Dema ev mercan dimirin, dibin kevir û zinarên mercanan ava dibe.<sup>331</sup> Le’l ji bo lêvên yarê, sedef jî ji bo diranên yarê hatine bikaranîn.

Li **le’lê lêv** û **dindanê sedef**, bû Rûhîyê “aşîq  
Ze’îf û naçar e, ji ‘işqa wê dil-arayê (r. 167)

<sup>329</sup> Onay, h.b.r. 156.

<sup>330</sup> Semih Yeşilbağ, Muhibbî Divanı’nda Değerli Taşlar, *Divan Edebiyatı Araştırmaları Dergisi* 22, İstanbul 2019, r. 694.

<sup>331</sup> Özgeriş, h.b.r. 310.

### 3.13.6 ‘Eqîq

Navekî Erebî ye, di ferhengan de tê maneya “gelî, çem û kevirê sor ê pîrr tarî” ji ber ku bi gelemperî li binrûbara tê dîtin, jê re “kevirê çem” û yê herî baş li Yemenê ne, lewma jê re “Eqîqî Yemanî” jî tê gotin.<sup>332</sup> Bi bandora sitêrka Suheylê rengê wê sor dibe. Ev kevir ji ber ku sitêrka Suheylê herî zêde li Yemenê geş xuya dike û li wê derê tê derxistin.<sup>333</sup>

Şahidê şêrîn şemail, hate bezmaa bédilan  
Şerbeta xemra ‘**eqîqî**, dûrî bû nêv bulbulan  
Zulfê, muşkîn dan; du sed te’ne li nesrîn û gulan  
‘Îd û Newroz in li min da çerxê etles xulxulan  
Serfiraz im vê demê, nîşan hinar in hem xelat(r. 49)

### 3.13.7 Zêr (Zer)

Zêr jî kevirê bi qîmet e ku wek zîv di çêkirina “guhar, tac, qedeh, gustilk û qolye”yê de tê bikaranîn.

Bo te bejim “aşiqê min; qenc li nutqê, guh bidêr  
‘Eynî îksîr im, bi husnê mest dikim **teşbîhê zêr**  
Rûbehek na-kes, boyî ‘işqa me, da te îsmê şêr  
Hem çu Loqman im, bi weslê, xweş dikim qelbê seqîm (r. 118)

### 3.13.8 Zîv (Sîm)

Madeneke biqîmet e ku di çêkirina “guhar, tac, qedeh, gustilk û qolye”yê de tê bikaranîn.

Bo dilê sedmet-zede, carek veke babê ‘eta!  
Abê yaqûtî bide weqtê seher, ser **sîmê cam!** (r.113)

Ez dizanim, sebr e mîftahê ferec; lê der-beden  
Cayê sebrê min nema, çi’b kim ‘îlac, **ey sîmê ten!**  
Muhbet û ‘işqa te, xiste gerdenê dil, sed resen  
Îltifat û suhbetek nakî bi wan şefe besîm (r.120)

<sup>332</sup> Toprak, h.b.r. 30.

<sup>333</sup> Özgeriş, h.b.r. 309.

### 3.13.9 Zîwer û Gerdenlix

Gerdanlix qolyeya jinan e ku ji gelek hêmanan pêk tê û bi gelemperî ji zêr û zîvan tê çêkirin.<sup>334</sup> Zîwer jî zînetek e.

Guhar û zêr û **zîwer**, netrîk û **gerdenlix** û gewher  
Xedeng û tîr û afat in li te çûn mu'minê rahî (r.154)

### 3.13.10 Netrîk

Xemla zivîn ya eniya jinan e.  
Li çol û deşt û sehraê, dikêşim wayîweylaê  
Ji hukmê hîcrê Leylaê, bi husn û **netrîk** û zêra(r. 39)

### 3.13.11 Guhar (Gûşîwar)

Bi gelemperî zîneta jinan e lê ji alfyê mêran ve -kêm be jî- hatiye bikaranîn.<sup>335</sup>  
“aşiq im, naête fikra min xîyal, ez xeyrê yar  
Der wuqû'bit weswese carek di dil min, îxtîyar  
Dê peşîman bim, bi 'istîxfar û tewbe sed hezar  
Ger bidin bo min hezaran dîlberê **zerîn guhar**  
'Ehd e; min, navê bi xeyr ez herdu çavê muskîrat(r. 52)

Hem zenexdan gul; heme gul, sîne gul, ber gul tamam  
**Gûşîwarê zer**, li ser gul û nîkhetê dildar e gul (94)

<sup>334</sup>Melek Dikmen, Kamile Çetin, Klasik Türk Şiirinde Kadın Takı ve Aksesuarları, *Bilig*, sayı: 61, Bahar 2012, r. 78.

<sup>335</sup>Dikmen-Çetin, h.b.r. 74.

### 3.13.12 Gustîlk

Bi Erebî Xatem, bi Farisî Enguşter e.<sup>336</sup>  
Perde û berqe hilanî, da me destûr û tewaf  
Noşî kir ‘aşiq ji le’lan, badeê nûrîn şefaf  
**Xatem** û textê Suleyman, zeptî kir min bêxîlaf  
Şahê textê ‘işq im, ez navê me dunya bêguzaf  
Yek bes e, min yek dizanim dîlbera ‘alîsîmat(r. 49)

### 3.13.13 Tac

Serpûşê bi mucewhere ku di gel nîşaneyê hukimdarîyê, zînetek e ku serê jin an bûkan dixemilîne.<sup>337</sup> Sembola mezinayî û gewretîyê ye.<sup>338</sup> Di dîwanê de, ‘aşiq ji bo yara xwe bi kar tîne. Her wiha Aqtepi di helbestekê de Pîrê Terîqetê gewhera tacê serê hemû ewlîyayan dibîne.

Qed serwe, qerden, sade ‘ac; eswed-uyûn a **ser bi tac**  
Nakit li derde min ‘îlac; e’s-sebrû mîftah’ul-ferec (r. 57)

Şehrîyarê textê seddiq î, Şehê ‘alîcenab  
Feth û nesret hem ‘înan îqbal û dewlet der rîkab  
**Gewherê tacê serê têk ewlîya** bêirtîyab  
‘Asiyane rû be-dergahê tok erdem rûmet-ab  
El-eman, şahê mezşn! Yexsîrê zencîra te me!(r. 143-144 )

### 3.13.14 Kulah

Serpûşek e serê wê tûj û ji kulavan tê çêkirin. Gelek cûreyên wê hene. Di nav wan de ya herî biqalîte “zerrînkulah” e.<sup>339</sup> Keckulah jî, kofixwar, a ku kofiya xwe xwar dide serê xwe. Mecazen, yara binaz û eda ya ku kumê xwe xwar dike û bi meşa xwe ya fexr û kîbrê û quretîyê, ‘aşiqê xwe dibehcîne, diqehirîne, ezîyetê dide wî.<sup>340</sup>

<sup>336</sup>Dikmen-Çetin, h.b.r. 87.

<sup>337</sup>Dikmen-Çetin, h.b.r. 77.

<sup>338</sup> Ayşegül Mine Yeşiloğlu, Zati'nin Gazellerinde Kıyafetlerle İlgili Unsurlar, *Trakya Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, c. 12, s. 1, Haziran 2010, r. 83.

<sup>339</sup> Aqtepi, h.b.r. 91.

<sup>340</sup> Aqtepi, h.b.r. 91.

Dê serfiraz bim şubhê şah; ger dîlberê **zerrîn-kulah**  
Carek li ser borînê rah, îhsan li min kit, yek nezer (r.75)

Tîr û rim, pey pey dibarin ber dilê kul bê ‘eded  
Şewqê yarê **keckulah**, têk pare kir cerg û kebed  
Xaif û lerzende me, ez ket’me nêv pencê esed  
Derdê hîcranê qeti’ kir, canê şêrîn ez-cesed  
El-eman! Sed el-eman! Ey husnê sûret bêmîsal! (r.91)

### 3.13.15 Zencîr (Zincîr)

Di edebîyata klasîk de cefaya ku ‘aşîq dikişîne û pora yarê bi zincîrê tê şibihandin. Ji ber ku dawî li xeman nayê, por jî ji alîyê şikil ve dişibihe zincîran. Ev zincîr ‘aşîq bi xwe ve girê dide, diavêje zîndanê û bi dar ve dike.<sup>341</sup>

**Besteê zencîrê zulf im**, bendeê xalê sîyah  
Mubtelayê xebxeb im, şefqet ke ya bînt’el-kîram (r. 111)

### 3.13.16 Kemer

Yek ji alavên ku hem jin hem jî mêr bi kar tîne, kemer e. Alavên ji bo kemerê tê bikaranîn, digel zêr û zîv, ‘ac, sedef û kevirên bi qîmet in<sup>342</sup> Di dîwanê de, kemer wek alava xemlê nehatiye bikaranîn. Aqtepi, ji bo nîşaneya rêzgirtinê cih daye vê alavê. “Destê hizmet ber kemer” yanî ew destên ku li ser kemerê tê ser hev ji bo rêzgirtinê.

Şehsuwarê ‘erse Taha û mazaxel beser  
Sed hezar sef rûhê qudsî, destê xizmet ber **kemer**  
Der serê karê me, bêkarî ke şefqet yek nezer  
Ya Resûlellah dexîl im! Ya Hebîbellah dexîl!(r.101)

---

<sup>341</sup> Pala, h.b.r. 494.

<sup>342</sup> Dikmen-Çetin, h.b.r. 85.



### 3.13.17 Tûtîya (Kuhl; Kil)

Îlaca li çavan tê kirin û rengê wê reş e. Ji ber ku li çavan tê kirin, cewherek e.<sup>343</sup> Di edebîyata klasîk de cih girtiye. Bi Erebi “Tûtîya û Kuhl” e. Xaka li bin pîyê yarê û di rêya yarê de ji bo ‘aşiq wek tûtîya ye.<sup>344</sup> Di dîwanê de wek “tûtîya û kuhl” derbas dibe û ji bo pîrê Neqşîbendîyê hatiye bikaranîn.

E’s-sela, sed e’s-sela; ber xas û ‘aman der-‘elen

Kelbê in dergahê şah em, ta demê lehd û kefen

**Tûtîya kon Rûhîya in xakê pa der-her zemen**

Hafîz, amed dîde em-ra rewşînaê zankî men

Saxîtem **kuhl’ul-cewahîr, xakêpayê Neqşîbend** (r.62)

Ji xêncî kevirên biqîmet û alavên xemlê “ Zîbeq (Cîwa), Seng û Polad jî cih digire. **Wek mînak:**

Sed ah û cangudaz, têtin ji nêv cergê nesaz

Sergeşte der şîb û firaz; teşbîhê **zîbeq**, bêmefer

Ev qelbê te **seng** e, ya ne **polad**?,

Bi vê zulm û te’edda, bûye mu’tad,

Bike carek minê bêçare, dilşad!

Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban! (r. 132)

### 3.13.18 Perde û Berqe

Burka’. Xêliya li pêj rûyê jinan, melhef, alava ji bo niximandina serê jin û keçan.<sup>345</sup> Perde û berqe’ jî ji ber ku rûyê yarê digre ji bo yarê asteng in. Dibin asteng ku ‘aşiq rûyê yarê bibine. **Wek mînak:**

**Perde û berqe’** hilanî, da me destûr û tewaf

Noşî kir ‘aşiq ji le’lan, badeê nûrîn şefaf

Xatem û textê Suleyman, zeptî kir min bêxîlaf

Şahê textê ‘îşq im, ez navê me dunya bêguzaf

Yek bes e, min yek dizanim dîlbera ‘alîsîmat(r. 49)

<sup>343</sup> Pala, h.b.r. 278.

<sup>344</sup> Pala, h.b.r. 278.

<sup>345</sup> Aqtepi, h.b.r. 49.

### 3.13.19 Nîqab

Xêlî, perdeya li ser rû, pûşî, peçe.<sup>346</sup> Ev alav jî ji bo ‘aşiq astengek e lewra ev jî dibe asteng ku ‘aşiq yara xwe bibîne. **Wek mînak:**

Gelo dîsan bibinim ez ‘eyanî?

Ku dildarê’m, **niqab** ez-dêm hilanî

Bi nazî, saxerek pur bade anî,

Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban! (r. 130)

### 3.14 ALAVÊN DI DÎWANÊ DE

#### 3.14.1 Xedeng (Tîr; Nîşab)

Di edebîyata klasîk de gelek unsurên xweşikîyê bi van têgehên hatine şibihandin. Di van hemûyan de jî rûyê lêkçûnê “rewşa birîndarbûna ‘aşiq” e.<sup>347</sup>

**Xedengên** min di nêv cergê; kişandim haletê mergê

Dema davêje dil zergê; dikim efxan, bi derbê ra (r.37)

Rehrew im ez, rahê min dûr e; xerîb im, bêweten

Zêde berfê, da li cergê min, du sed **tîr û nîşab**(r. 46)

#### 3.14.2 Şîmşîr

Li gel alava cengê, di navbera ‘aşiq û me’şûq de unsûrekî girîng e. Di serî de bijangên yarê, gamzeya wê, cefaya wê bandoreke mîna şûr li ‘aşiq dîke û ‘aşiq birîndar dîke.<sup>348</sup>

Canê cananê cîhan, zî-bendeê **şîmşîr** û gah

Ustê der-rahê heqîqet, turkîtazi şîrê tah

Şod butadê kufre an elmasê enfas-eş tebah

Çun bulend uftadê îqbalê Bahauddînê Şah

Xulqê ‘alem-ra şode pûşeş penahê Neqşîbend 62

<sup>346</sup> Aqtepi, h.b.r. 130.

<sup>347</sup> Pala, h.b.r. 364.

<sup>348</sup> Pala, h.b.r. 269.

### 3.14.3 Top û Tifeng

Di dîwana Aqtepî de, ji xêncî alavên kevn, alaveke nû ya cengê jî cih girtiye:

Qubbeê neh taqê mîna ye, li min tarîk û teng  
Pey bi pey ez çeşmê dîlber tèn cîger tîr û xedeng  
Her zeman, ber qel'eê dil mutessil **top û tifeng**  
Sedmeta 'işqa nîgarê, da me nêv penca puleng  
Ah û sed efxan, ji hîcra dîlbera ala Fireng(r. 81)

### 3.14.4 Gaz (Kerpeten û Çakûç)

Qalê bûm **bêgaz û çakûç** û nefax û kure-nar  
Yek nezer weqtê ku da min şengê şoxa çavxezal (r. 105)

### 3.14.5 Xencer û Teber

Kêreke serê wê xwar û tûj e û her du alîyên wê tûj in. Di helbesta klasîk de, ji ber ku serê wê xwar e bi birûyên yarê û ji ber ku 'aşîq birîndar dike bi bijang û gamzeyên yarê hatiye şibhandin. Wek amûreke cengê jî tê bikaranîn.<sup>349</sup> "Teber" yanî "tevir" jî, di edebîyata klasîk de di nav alavên şer de hatiye behskirin. **Wek mînak:**

Sa'eta yar cîlweger bê, **b'xencer û tîr û teber** bê,  
Dê ji perdan, bi der bê, werd û nesrînê di min(r. 141)

### 3.14.6 Mencil

Ev jî alaveke mezin e ku tê de xwarin tê pijandin. Ev alav wek muşebbeh-bîhî ya hunera teşbîhê hatiye bikaranîn. Helbestvan, agir û şewata hezkirinê dişibihîne qazan; mencela pir germ ya li ser agir.

Sed me'azzellah, j imin dûr e hebîba pur-'ezîz  
Wek meter, her dem dibarînim evan eşkê xerîz  
Lew dibêjim muntezem van gotin û şî'rê temîz  
Dil ji ber narê mehebbet hemçu **mencil** pur-ezîz  
Ah û sed efxan, ji hîcra te dîlbera ala Fireng(r. 83)

<sup>349</sup> Pala, h.b.r. 190.

### 3.14.7 Derzî û Ta

Ev her du amûr ji bo rewşa ‘aşiq hatine bikaranîn. ‘aşiq ji ber eşqê xwe wek “hîlal û derzî û ta” zirav dibîne, yanî ‘aşiq, ji ber eşqê gelek zeîf bûye.

Were rûne li textê dil, nezer de “aşiqê şeyda

Ji ‘işqê wek hîlal û ta û derzî jê xeber naê (r. 166)

### 3.14.8 Ceres

Amûreke ku berê ji bo heywan winda nebin, cihê wan tesbît bikin, dihat bikaranîn. Bêtir ji aliyê dengê xwe ve bala helbestvanan kişandiye. Dengê wê ji ber ku nalînî ye, pêwendîyek di navbera dengê wê û yê “feryad, fîxan, enîn...” de çêkirine.<sup>350</sup>

Bêgazî û **feryadîres, efxan** ji min tèn wek **ceres**

Carek nego ey bu’l-hewes; mekşîne ev çendîn keder (r.74)

## 3.15 ÇAR UNSUR

### 3.15.1 Av (Ab)

Jêdera jîyanê ye, ji bo candaran cihekî girîng digire.<sup>351</sup> Di edebîyata klasîk de ji gelek alîyan ve hatiye behskirin û bûye mijara Teşbîh û Mecazan. Çavê ‘aşiq, kanî ye, hêstirên wî jî ava ku diherike ye.<sup>352</sup> Di dîwanê de wek “av, ab, abê zulal, abê engûr, abê şîrîn, abê surahî, gulab, abê ‘eqîqî, hwd.” derbas dibe. **Wek mînak:**

Heraret da dil û navan, ji le’l û perçem û çavan

**Dimûê min wekî avan**, hebîba nazenîn naê (r.157)

Di vê mînakê de, “Dimûê” hêstir e û lêçûya hunera Teşbîhê ye, av jî, lewçû ye. Hêstirên ‘aşiq bi avê hatine şibihandin.

<sup>350</sup> Bo zêdetir agahî, bnr. Bahir Selçuk, Klasîk Türk Şiirinde Ceres ( Çan /Çingirak), *International Periodical For The Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, Volume 7/3, Summer 2012, p. 2231-2250.

<sup>351</sup> M. Sait Özervarlı, “Su”, DİA, İA, c. 37, r. 432.

<sup>352</sup> Pala, h.b.r. 1.

### 3.15.1.1 Enhar û Kanî

Enhar peyveke Erebi ye û pirjimara peyva “Nehr”ê ye; tê maneya Çem. Di dîwanê de, bi kanîyê re hatiye bikaranîn û wek Lewçûya hunera Teşbihê cih girtine. Hêstirên ‘aşiq bi enhar û kanîyê hatiye şibhandin.

#### Eşkê al û erxewanî, tèn wek enhar û kanî

Ji hîcrê yarê Deylemanî, her ji ahîne di min (r. 138

### 3.15.1.2 Behr û Têgehên der barê wê de

#### 3.15.1.2.1 Behr

Di edebîyata klasîk de helbestvanên ku di rêya Tesewifê de bin, dixwazin xwe bigihînin eşqa Îlahî. Ji bo vê jî behrê wek sembol bi kar tînin. Wekî din, ava ku diherike û xwe digihîne behrê, ji bo balê bikişîne li ser rêya ku diçe li ba Xwedê û yekbûna xwedawendîyê.<sup>353</sup>

#### 3.15.1.2.2 Derya

Di edebîyata klasîk de, peyva ku herî zêde li şûna behrê tê bikaranîn, derya ye. Balûpalîya behrê dinimîne. Di malikên ku der heqê tesewifê de wek yekîtiya heyînê /Xwedê cih girtiye.<sup>354</sup>

#### 3.15.1.2.2.1 Deryaya Dil

Sedema şibhandina dil û deryayê eşq e. ‘aşiq ew qas dilgirtîyê eşqa Îlahî û yarê ye, dilê xwe wek behrê balûpal û vekirî hîs dike. Dilê ‘aşiq ê ku wek behrê hatiye teswîrkirin, ji ber sedema cewr û cefaya yarê wek avê radibe. Ji ber vê yekê pêwendîyek di navbera dil û deryayê de tê çêkirin<sup>355</sup>.

Meke men’em ji ‘işqa dîlberê ey zahidê ‘aqîl

Hewa ye, we’zê te nik “‘aşiqê naçar ê **derya dil**

Hezaran şeyx û ‘alim derkê nakin halê qelbê kul

<sup>353</sup> Betül Mutlu, *Divan Şiirinde Deniz İmgesi ve Şiir Öğretiminde Kullanılması*, Dokuz Eylül Üniversitesi Eğitim Bilimleri Enstitüsü, Türkçe Eğitimi Anabilim Dalı, Türkçe Öğretmenliği Programı, Yüksek Lisans Tezi, İzmir-2012, r. 32.

<sup>354</sup> Mutlu, h.b.r. 55.

<sup>355</sup> Mutlu, h.b.r. 96.

Gellek ferq e, mîyanê ‘ilmê hal û zuhdê menfûrî (150)

### 3.15.1.2.2.2 Deryaya Keder

Ji ber ku ‘‘aşiq her tim bi xembar e, ji ber vê yekê peyva derya û kederê bi hev re tê bikaranîn.<sup>356</sup>

Fikr û eftarê’ m nehin, xeyrê şehê nazikbeşer  
Weqfê dîdarê cemalê dilberê’ m her du beser  
Mehwî bûn xûbanê ‘alem nezdî yarê, çûn qemer  
Dûr ji dîdarê hebîbê ket’ me **deryayê keder**  
Ah û sed efxan, ji hîcra dilbera ala Fireng (r. 83-84)

### 3.15.1.2.2.3 Deryaya Îhsanê (Kerem)

Deryaya îhsan, ji ber mezinahî, dewlemendî û bereketê di helbestan de cih digire. Nemaze di Qesîdeyan ku ji bo mezinahîya wan kesên ku pesnê wan tê dayîn de tê bikaranîn.<sup>357</sup>

Dest û pa, bişkiste der kûh û beyaban mîrewem  
Teşneê leb-xişkî ber **deryayê îhsan** mîrewem  
Rûyê zerd, ez şermîsûyê pîrê pîran mîrewem  
Xwod nemîdanem û uftade û xîzan mîrewem  
Çareê, mî xwahem ez dar’uş-şîfayê Nexşîbend (r.61)

### 3.15.1.2.2.4 Deryaya Rehmê

‘Aşiq çi qas zêde hez ji Xwedê Teala bike, ew jî ewqas rehmê li ebdê xwe dike.<sup>358</sup>

Şahê min, Mewlayê min, axayê min, pîrê terîq!  
Geştîbanê qulzum û ‘emmanê **rehm** î, ez xerîq  
Ateşê şehwatê nefsanî, kirim yekser herîq  
Rehwerê tarikê nefis im, Xuda ra yek berîq  
El-eman, şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me! (r. 144)

<sup>356</sup> Mutlu, h.b.r. 103

<sup>357</sup> Mutlu, h.b.r. 108.

<sup>358</sup> Mutlu, h.b.r. 110.

### 3.15.1.2.3 Qulzum

Qulzum jî behr e.

Şahê min, Mewlayê min, axayê min, pîrê terîq!

Keştîbanê **qulzum** û ‘ummanê rehm î, ez xerîq

Ateşê şehwatê nefsanî, kirim yekser herîq

Rehwerê tarikê nefis im, Xuda ra yek berîq

El-eman, şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me! (r. 144)

### 3.15.1.2.4 Umman

Ji behrên mezin, oqyanûsan re, “umman” tê gotin. Di Tesewifê de jî ev peyv cihekî girîng digire. Ev sembol ji bo Xwedê tê bikaranîn. Her kesekî ku behsa ummanê dikin, dibe ku ne di nêrîna Wehdet-î Wucud de bin. Gelek mutesewifên ku li ser Xwedê û dunyayê difikirin, gelek sofîyên ku yekîfîya di bingeha wê û hîcranê vedibêjin, “umman” weke sembol bi kar anîye.<sup>359</sup>

Şahê min, Mewlayê min, axayê min, pîrê terîq!

Keştîbanê qulzum û **ummanê** rehm î, ez xerîq

Ateşê şehwatê nefsanî, kirim yekser herîq

Rehwerê tarikê nefis im, Xuda ra yek berîq

El-eman, şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me! (r. 144)

### 3.15.1.2.5 Xerîq

Helbestvanên klasîk di helbestên xwe de, xwe wek “xerîq, eşq û mena”yan û helbest jî wek “behr”ê teswîr kiriye. Li gorî helbestvanan, divê ‘aşîq bêtirs noqî avê bibin. ‘aşîqên ku bêtirs xwe diavêjin behra eşqê û dijwarîyên wê dikişînin, ji “umman; oqyanûs”an jî natirsin. Ew ‘aşîqên ku dixwazin xwe bigihînin gewheran/ Eşqa Îlahî, gelek asteng derdikevin pêşîya wan, divê dev ji rêya xwe bernedin. Her çî qas ku ‘aşîq wêrek bin jî, divê bi alîkarîya rêberekî xwe noqî avê bikin. Ev rêber dikare xerîqê behra ‘eşq û hîdayetê bibin. Ev xerîq: Yanî rêber, rê nîşanê ‘aşîqan dikin da ku ‘aşîq xwe bigihînin cewherên bextîyarî û gihandinê.<sup>360</sup>

<sup>359</sup> Mutlu, h.b.r. 81-82.

<sup>360</sup> Bo zêdetir agahî bnr. Cenk Açıkgöz, Klasik Türk Şiirinde Dalgıç, *Uluslararası Türkçe Edebiyat Kültür Eğitim Dergisi*, sayı: 6/2 2017, r. 894-924.

Şeraba ‘eynê turyaqî, dinoşim ez, ji dest saqî  
Dibim serxweş û dibim baqî, **xerîq im ez, di deryaê** (r. 160)

**Xerîqê qulzumê ‘işq im**, reîsê ekremê ‘işq im  
Bide Cam-ê Cem ‘eşq im, qewî me ez di de’waê (r. 160)

### 3.15.1.2.6 Luce

Luce tê maneya ava balûpal. Di beytên ku der heqê behrê de ji bo mezinahî wî bê nîşankirin tê bikaranîn.<sup>361</sup>

Nagihan hilbû li min, berqek ji sethê cebhetê  
Perçemê purçîn veda ‘etr û şemîma cennetê  
Saxerê sîmîn, bîkef meş’ya, kemala suhbetê  
**Bûm xerîqê luceê behra xumar û dehşetê**  
Mîslê Pîrê Xaniq e, lê bêtecellî nûrê zat(r. 48)

### 3.15.1.2.7 Mewc

Tê maneya “pêl”ê. Dil deryayekî wisa ye ku ji ber ‘eşqê her tim pêl dide. Behr bi gelemperî unsureke xwezayê ya biherket e, hereketa wê jî pêlên wê ne. Di edebîyata klasîk de pêwendîya di navbera behr û mewcê de ji gelek alîyên cuda ve hatiye behskirin. Coşa pêlên deryayê tê maneya ku ‘aşiq dixwaze xwe zû bigihîne oqyanûsê yanî Xwedê.<sup>362</sup>

Ketme nêv **mewca guneh**, defter me reş kir bê ‘eded  
Xergê deryayê xeta me, Şahê ‘Alem, el-meded  
Min şefa’et ke bi heqqê Qul Hû we’l-lahû Ehed  
Ya Resûlellah dexîl im! Ya Hebîbellah dexîl! (r. 100)

<sup>361</sup> Mutlu, h.b.r. 89.

<sup>362</sup> Mutlu, h.b.r. 129- 133.



Rûhî”yê derwêş vewestaye li Babê Rehmetê  
Lê ji ber **mewca gunahan**, ket’ye xewf û xeşyetê  
Dûr nekî vî bênewayî ey Şefî’ê Ummetê  
Ya Resûlellah dexîl im! Ya Hebîbellah dexîl! (r.102)

Xîtabek taze “Rûhî” kir digel dil ba du sed tehsîn  
Ku her kes guh bidê, tê der **mewcê behrê gumrah î** (r. 156)

### 3.15.1.2.8 Keştîban

Ew kesê ku keştîyê beralî û bi rê ve dibe, jê re Geştîban tê gotin.<sup>363</sup> Di dîwanê de pîrê terîq wek geştîban hatiye teswîr kirin. Lewra alikariya ‘aşîq dike ku ‘aşîq xwe bigihîne eşqa Îlahî.

Şahê min, Mewlayê min, axayê min, pîrê terîq!  
**Keştîbanê** qulzum û ‘emmanê rehm î, ez xerîq  
Ateşê şehwatê nefsanî, kirim yekser herîq  
Rehwerê tarikê nefis im, Xuda ra yek berîq  
El-eman, şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me! (r. 144)

### 3.15.1.2.9 Girdab

Girdab, jî weke mewcê têgehekê behrê ye. Di helbestan de coşbûna dilê ‘aşîq temsil dike.<sup>364</sup>

Xerqeyê **girdabê** ‘îsyane, feqîrem bêxired  
Pakê xwahem, jengê dil ra lîkê ber çeşmeş remed  
Rûsiyeh pesmande em ey pîrê pîran el meded  
Muşkîlatê rahê ma hergiz neyayed der ‘eded  
El meded ey xwacê muşkil guşayê Neqşîbend! (r. 61)

Xerqê **gîrdabê** hîrman im, Xuda-ra hîmmetî  
Ah û feryadê me, da xelqê cîhan yekser melal (r.106)

---

<sup>363</sup> Mutlu, h.b.r. 160.

<sup>364</sup> Mutlu, h.b.r. 178.

### 3.15.1.2.10 Lenger

Di beytên ku maneya tesewfî tê de zêde bin, “Lenger” tê maneya îmanê, çapaya îmanê.<sup>365</sup>

Mehremê heq, **lengerê** erd û sutûnê asîman  
Ez bozorgî, namê pak-eş mî negunced der-dihan  
Şahê mutleq, ser cemî’ê ewlîya der her zeman  
Bêkesê babê te me, rehmê bike ser bêkesan  
El-eman, şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me! (r. 144)

### 3.15.1.3 Baran

Baran di dîwanê de wek lewçûya hunera teşbîhê cih girtiye. Xemên ‘aşiq bi baranê hatiye şibihandin. Tîrên bijangên yarê bi baranê hatine şibihandin û di helbestekê de jî ji bo le’netê hatiye bikaranîn. Helbestvan ji bo Yezîd bi kar anîye û dixwaze Xwedê le’netê mîna baranê, bi qasî baranê li ser wî bibarîne. **Wek mînak:**

Sed hezar le’net muza’ef, **şubhê baranê şedîd**  
Her zeman, la yanqetî bin, ew li ser ruhê Yezîd(r. 65)

Ket’me êşa cerh û zexman, ez ji qewsa rû-heval  
**Mîslê baranê dibarin**, tîr ji wan mujganê al,  
Kesmekeş tê da me ez, ‘alem li ber çeşmê xîyal  
Dîlberê’m Tersa ye, natirsit ji zenban û webal  
El-eman! Sed el-eman! Ey muxbeça gerdenxezal!(r. 86)

Me yarê nazenîn wunda ye, keftim narê hirmanê  
Li min berq û birûsk e, **xem dibarin şubhê baranê**  
Gelo dîsa bibînim ez, ku dilber bête meyxanê?  
Perîşan zulf û leb, der xende ber kef camê ferfûrî (r. 151)

---

<sup>365</sup> Mutlu, h.b.r. 160.

### 3.15.1.4 ‘Ewr

Di helbestekê de derbas dibe. Li gorî ‘aşiq, ‘ewr wek perdeyê ye; astengek e ku ‘aşiq rûyê yarê yê wek rojê û birûyên wê yên wek hîvê bibîne.

Der fîraq im, bêdil im dîdarê dilber napedîd

Perde ye ber mahê ebrû, şemsê rux ‘ewr û xemam(r.113)

### 3.15.2 Ba

#### 3.15.2.1 Bayê Nesîm

“Bayê sivik” anku “Sira Bayê Sibehî”. Di edebîyata klasîk de bêhna yarê hildigire. Diçe taxa ku me’şûq lê, pêwendîyeke xurt di navbera pora yarê û bayê nesîm de heye. Ji vî alîyî ve wek xeberdar tê qebûlkin. ‘aşiq bi bayê nesîm, xeberan (agahî) ji yar disitîne. Ev ba serê sibê tê.<sup>366</sup> **Wek mînak:**

Hem selamê canfîzayê Padişahê Qudretê

Pertewa wechê me lê bit, dem be dem her sa’etê

Zulfê şeb-reng im, şemîma muşkê Tetarî de tê

Bit li canê ‘aşiqê min, **her sehergeh ba nesîm(r. 114)**

#### 3.15.2.2 Bayê Seba (Badê Seba)

Bayê ku ji alîyê Rojhilat de tê, jê re “Bayê Seba” tê gotin. Ev ba, di edebîyata klasîk de ji ber ku bêhna yarê tîne û belav dike, wek sembolekê ye. Ev ba her tim nîşaneyê ji porê yarê hildigire û wekî postavan e ku xeberên yarê ji ‘aşiq re tîne.<sup>367</sup>

Di dîwanê de bayê ku herî zêde hatiye bikaranîn ev e. Di helbestekê de bo hunera Cînasê hatiye bikaranîn, di helbestên din de bi peyva zulfê re, yanî bi pora yarê re hatiye bikaranîn. **Wek mînak:**

Bêne cunbuş, ger digel **badê Seba**, zulfê du ta

Mîskê ezfer ‘enberê sara, qewî erzan dîkin (r. 136)

---

<sup>366</sup> Pala, h.b.r. 357.

<sup>367</sup> Pala, h.b.r. 383.

### 3.15.3 Agir (Nar; Pêt; Ateş; Nîran)

Agir bi van peyvân di dîwanê de cih girtiye: “nar, pêt, ateş, nîran” û ji aliyê reng şewatê ve hatiye bikaranin. Herî zêde ji bo ‘aşiq hatiye bikaranin. Di dîwanê de pêwendîyeke xurt di navbera ‘aşiq û agir de heye; ‘aşiq ji ber derdê dûrbûna yarê, hicrana yarê wek agir dişewite. Ji bilî vê, di helbestekê de ji aliyê reng ve, wek “şeraba ateşî” derbas dibe. Ew jî tê vê maneyê şeraba pîrsor a di rengê agir de. **Çend mînak ji dîwanê:**

Ji hîcra te birîndar im; hezîn û dîkul û jar im

Serapa, cemre wek **nar im**; telef bû, ruh û can pê ra(r. 38)

**Narê hîcra** te, li ser min zêde xurbet ah û ah

Çendî zehmetkêş im, ez firqet li min bûye kemal (r. 103)

Min ji destê dîlberê, noşî **şerabê ateşî**

Pêl bi pêl hîlbû ji te’sîreş li dil narê xiram (r. 109)

Meylê dil, çawa biçit ser pîrpizêk û **nergizan**

Çun ji hîcrê yarê serkeş, ket’me pêt û hirqetê(r. 163)

### 3.15.4 Ax (Turab; Xak)

Di dîwanê de, wek “Ax, turab û Xak” derbas dibe. Ax û Turab bi rêya hunera Teşxîsê wek heyîneke bican hatiye teswîrkirin. Li gorî helbestê, ax û turab ji bona rewşa helbestvan digirîn. Her wiha bi peyvên wek: “dar û ber, deşt û çîya” hatiye bikaranin û hunera Tenasubê derketiye holê. Ji xêncî vê, di helbesteke Farisî de wek Xak derbas bûye. Di wê helbestê de helbestvan ji bo xaka li bin pêyê Neqşîbend bi kar anîye. **Wek mînak:**

Rûhîya! Bes bêje van şî’rê şewat ê pur hezîn

Bo te digrîn dar û ber, deşt û çîya, **ax û turab**(r.47)

### 3.16 UNSURÊN GERDÛNÎ

#### 3.16.1 Felek

Tê maneya “asîman, rûyê asîman, sema, siûd, bext, qeder; tebeqeya asîman a mexsusî her gerstêrkê. Pirjimara wê eflak e. Li gorî sîstema Batlamyos, dunya navenda kaînatan ye. Neh felek dunyayê dorpêç dikin. Ev, di nav hev de ne mîna zarên pîvazan dunyayê dorpêç dikin û heft hebên wê, feleka heft gerstêrkan e. Feleka ewil ji hîvê dest pê dike û li gorî rêzê gerstêrkên mîna Utarid, Zuhre, Şems (roj), Mirrih (Merîh), Muşterî û Zuhal hene. Feleka heştan, a stêrkên sabit û bircan e. Feleka nehan, feleka herî mezin û bilind e ku hemû felekan dorpêç dike. Ji vê felekê re “Felek-i Atlas”, “Felek-i Azam” û “ Feleku’l- eflak” jî tê gotin. Di edebîyata klasîk de, herî zêde ji bo gazindê tê bikaranîn. Lê hin rengdêrên di hevedudanî de, bi maneya erênî jî tê bikaranîn, wek: felek-cah, felek-rif’at, felek-paye, felek- meşreb, felek-reftar û hwd. Felek, bi peyvên hemwate yên mîna eflak, çerx, gerdûn, sema, asîmanê jî tê bikaranîn û bi taybetîyên wek: rewnaqî, bilindayî, mezinayî, ebedîtî tê zikirkirin. Qîmeta yarê ji felekê jî mezintir e. Felek bi zivirîna/ çerxa xwe wek: “sergerdan” tê wesfandin.<sup>368</sup> **Wek mînak:**

Şahîdê şîrîn şemail, hate bezma bêdilan  
Şerbeta xemra ‘eqîqî, dûrî bû nêv bulbulan  
Zulfê muşkîn dan; du sed te’ne li nestrîn û gulan  
Îd û Newroz in li min da **çerxê etles** xulxulan  
Serfiraz im vê demê nîşan hinar in hem xelat (r. 49)

Pîrê pîran, der- meqamê bendegî ez- cumle cest  
Her zeman ecreamê ‘ulwî, zîrê payê şahê best  
Waqifê esrarê lahûtî ez-an ‘ehdê elest  
Rû be-dergahê Behauddîn, nezer kon zankî hest (r. 60)  
**Neh felek** manendê der- ban ber serayê Neqşîbend

Naleê wa ‘eteşa çû gûşê sukkanê **felek**  
Halê mel’ûnan çi bîtin ey gelo rojê we’îd? (r. 68)

<sup>368</sup> Bo agahiyên berfireh bnr. Pala, r. 149-150.

### 3.16.2 Qemer (Bedr)

Hîcra te, da min ev elem; bi ‘îşq û mehebbet, bûm ‘elem  
Lîllah veke babê kerem; rewşen bike min wek **qemer**

Wek **bedrê** nêv hendê sema, berqî li min de çend dema  
Da ez bikêşim van xema, bim serfiraz ez yek qeder 75

### 3.16.3 Afîtab (Şems; Xurşîd)

Ey dilberê **rûx-afîtab**; sotim, di hîcrê bûm kebab  
Îhsan ke yek camek şerab; îhya bibit bendê cîger<sup>73</sup>  
Der fîraq im, bêdil im, dîdarê dîlber na pedîd  
Perde ye ber mahê ebrû, **şemsê rux** ‘ewr û xemam 113

Ji meşrîq ta mexrîb şu’leya nûra te kir rewşen  
Mûşe’şe’ berq û tîrêj in ji te, **Xurşîd** î ya Mah î? (r. 152)

### 3.16.4 Kewkeb

Reng **kewkebê** rûyê sema, eşkan dibarîn her dema  
Gerçî disozî dil ema; e’s-sebrû mîftah’ul ferec 56

Çi **kewkeb** min heye, der burcê esman  
Ku peyda nabe, ez dîlber tu nîşan,  
Li min şefqet ke carek ez bi heyran  
Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban! (r.131)

### 3.16.5 Kursî Sîdre Erşê Mecîd

Wan le’înan, weqtê “Alê Mustefa”, dan zehmetê  
Lerze ket ecsamê **Kursî, Sîdre û ‘Erşê mecîd** 67

### 3.17 BURC

#### 3.17.1 Burca Sewrê û Mahî

Birca Sewrê (Ga):

Komeke stêrkan e ku di feleka sewabî de wekî ga xuya dibe. Birca gayî ku elementa wê ax e, birca biharê ye û gerstêrka wê Wenûs, anku sitêrka Zuhreyê ye. Ev birc di gelek çavkanîyan de wekî birca heyvê derbas dibe. Di navbera 21ê Nîsanê û 21ê Gulanê de, tarîxên birca Gayê ne. Ev birc wekî “Burcê gav”, “Burcê Sureyya” jî tê zanîn. Gava heyv di vê bircê de be tiştên wekî “zewac, çandinî û wergirtina çekên nû” bi awayê erênî hatiye şîrovekirin.<sup>369</sup>

Birca Mahî (Hût, Masî, Simak)

Ev birc, di çavkanîyan de wekî “Burcê Mahî” û “Hûtê felek” an jî “Kewkebetu’s Semekeyn” jî derbas dibe. Elementa wê av, gerstêrka wê Muşterî ye. Di navbera 20ê Sibatê û 20ê Adarê de karîger e. Dema ku ji zivistanê derbasî biharê dibe, birca dawî ye. Dema ku tav tê vê bircê, wê gerîna xwe ya duwazdeh parî ya hizrî tamam dike. Ev birc jî di edebîyatê de ji ber navê xwe bi peyvên wek derya, behr û keştîyê tê zikirkirin.<sup>370</sup> **Wek mînak:**

Çi yarek taze bû dîlber, **melek-xwûyê**, perî-peyker

Ji perdan, weqtê derket der; munewwer bû cîhan vê ra(r. 40)

Cîhan bû xulxul û şahî, ji burcê **sewrê, ta mahî**

Ji husna mahê xergahî<sup>371</sup>, diheş girtin ji şewqê ra(r. 40)

Ji ber ku birca Ga, nîşaneyê tiştên erênî ye, em ji malika yekem tê digihêjin ku yar yanî me’şûq xwe nîşanê ‘aşîq dike. Dema ku yar xuya dike, ji bo ‘aşîq dunya dibe xulxul û şahî, ‘aşîq kêfxweş dibe. Çawan ku dema ku roj diçe ava, heyv li asîmanan dibiriqe û derdorê ronahî dike, ‘aşîq jî yara xwe wek heyva li asîmanan dibîne û rûyê yara xwe jî wek heyva ku şev li asîmanan dibiriqe teswîr dike.

<sup>369</sup> Acar, h.b. r. 147.

<sup>370</sup> Acar, h.b.r. 152.

<sup>371</sup> Peyva “Xergah” di dîwanê de wek Çadir hatiye pênasekirin lê em têgihîştin ku di maneya esman/asîman de hatiye bikaranîn.

### 3.17.2 Burca Humul (Hemil)

Hemil yanî birca Beranan, ji ber ku dirûvê beranan dide sitêrkan ev nav sitandiye. Ev birc di Farisî de bi navên “Burcê berre” yan jî “Berreê felek” jî tê zanîn. Elementa birc, agir; gerstêrka wê Merîx (Mars) e. Gerstêrka Marsê ji gerstêrkên bêyom tê hesabandin. Ji xeynî vê heke heyv an jî tav were birca Hemilê, îca ev bêyom e. Hizreke wisa heye ku di van deman de “çûna nêçîrê, ger û geşt an jî destpêka karekî” baş e. Bawerî heye ku bandora birca Berên di navbera tarîxên 21ê Adarê û 20 Nîsanê dewam dike. Tav di 21ê Adarê de yanî bi destpêka ku bikeve birca Beran, ku yekem birc e. Wekî ku ji vê jî tê famkirin ku birca Beran, birca biharê ye. Ji ber vê birca Hemil di edebîyata klasîk de di gelek cîyan de wek destpêkera biharê û bi teswîrên Newroz û biharê derbas dibe.<sup>372</sup> Di biharê de, ji ber ku kulîlk vedibin, xweza xwe nû dike, hêvîyên ‘aşîqan jî zêde dibin.

Li ser malika jêr, em dikarin bi du tiştan bifikirin; an helbestvan li şûna peyva yarê ev peyv bi kar anîye û hesreta xwe anîye ziman û dixwaze bibêje ku ji ber firaqa yarê dilê min bi axîn e û hêstirên min yên bi xwîn çûn heta welatê Çîgul; yanî bi rêya hunera Mubalexeyê dixwaze hesreta xwe bîde hîs kirin, an jî bi vê têgehê dixwaze bêhêvîbûna xwe nîşan bike; yanî piştî derbasbûyîna vî wextî, dibe ku behsa Newroz an jî serê biharê bike, lewra di van wextan de hêvîya helbestvan/ ‘aşîqan pir zêde ye û helbestvan jî bê hêvî ye, dilê wî bi axîn û hêstirên wî yên bixwîn zêde ne; gelek hêstiran dibarîne ji ber bêhêvîbûnê û dixwaze xembarîya xwe bîne ziman.

Zare zarên min di dil da; j’firqeta **şemsa humul** da

Çûn heta mulkê Çîgul da, cûyê xûnînê di min (r. 139)

## 3.18 DEM

### 3.18.1. ‘Îd

Roja ‘Îdê, ji bo ‘aşîq, xwegihandina yarê wek ‘îdê ye. Rondikên ‘aşîq wek ava gulan, xebera wuslata yar jî wek belavkirina şekirê ‘îdê ye.<sup>373</sup> Lê li cem Aqtepi, ev tema hinekî cuda ye. Di hin cihan de behsa kêfxweşîya vê rojê kiriye û kêxweş e, di hin cihan de jî dibêje her çi qas ku ev roja keyfê be jî, kêfa min ne li cih e.

<sup>372</sup> Acar, h.b.r. 146-147.

<sup>373</sup> Pala, h.b.r. 223.



Di dîwanê de, mijara Murebbe'ekê 'îd e, helbestvan di hemû bendan de behsa 'îdê dike û dixwaze xwîneran agahdar bike ku roja 'îdê ne roja xem û derdan e. Lê dibêje ez tenê wisa me vê rojê, hûn li xelkê temaşa bikin, kêfa hemûyan li cih e, ez tenê xembar im; yanî dixwaze xwîner agahdar bibin ku ev roj, roja şahî û keyfê ye. Di benda jêr de jî helbestvan dibêje her çi qas ku ev roja 'îdê be jî, agir bi dilê min ketiye, ji ber derdê ji dûrbûna yarê, di misreya dawî de jî dibêje bê tehemul im; bê sebr im û vê hevokê dubare dike.

**Gerçî îro 'îd e**, emma cergê min ateş kete  
Dil, tehemmul naketin, seyra rîyazê cennetê  
Min hebîb, nexuyaye; weyla ket'me pêta firqetê  
Bêşekîb im, bêşekîb im, bêşekîb im, bê şekîb! (r. 43)

Di murebbe'eke din de jî, Aqtepî xwe wek qurbanê sibeha 'Îda Qurbanê hîs dike û ji bona yarê dixwaze qurban bibe, çawan ku sibeha 'îda qurbanê heywan tê serjêkirin, 'aşîq jî dixwaze vê sibehê ji bona yarê qurbanekî mîna sibeha 'Îda Qurbanê were serjêkirin, bibe. **Wek mînak:**

Çi yarek min heye, şêrîn tebarek,  
Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban!  
**Di subhê 'Îdê Qurbanê mubarek,**  
**Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban!** (r. 127)

Aqtepî di malikeka qesîdeya ku li dor Kerbelayê hatiye nivîsîn de dîsa cih dide vê temayê û dibêje: Le'neta wan kesên ku dişibihin kafiran (Yezîd û aligîrên wî) li ba me wek roja 'îdê ye; çawan ku roja 'îdê her kes dilşad û bi keyf e, em jî wiha ne. **Wek mînak:**

Ez ku sergerdanê 'îşqê Xanedan im eşkera  
**Le'neta kafir, şebîhan, nik me eynî rojê 'îd e.**<sup>374</sup>

---

<sup>374</sup> Aqtepî, h.b.r. 65.

### 3.18..2 Newroz

Ev tema jî wek temaya ‘îdê nîşaneyê keyf û dilşadîyê ye. Di Murebbe’eke dîwanê de ‘aşiq dibêje ku Newroz li min nayê ji ber fîraq û hîcrana yarê. Dîsa di Musemmeteka dîwanê de ‘aşiq dibêje: Wek roja Newrozê kêfxweş û serfiraz im.

#### **Wek mînak:**

**Min, ne Newroz e**, ne ‘îd e; min ne keyf û ne surûr  
Dil, ji hîcranê melûl e, nabitin şad û sebûr  
Gerçî hala der-fîraq im; lê bi qelbê sade nûr  
Der rikîb im, der rikîb im, der rikîb im, der rikîb!(r. 44)

Şahîdê şîrîn şemail, hate bezma bêdilan  
Şerbeta xemra ‘eqîqî, dûrî bû nêv bulbulan  
Zulfê muşkîn dan; du sed te’ne li nesrîn û gulan  
**Îd û Newroz in** li min da çerxê etles xulxulan  
Serfiraz im vê demê nîşan hinar in hem xelat (r. 49)

### 3.18.3 Leyl

Leyl tê maneya şevê. Di dîwanê de wek “Leyl û leylê deycûr” derbas dibe. Ji ber tarîfî û reşbûnê, di dîwanê de cih girtiye û di rola muşebbeh-bîhî de ye. **Wek mînak:**

Rojê îdê tarî ye; **wek leylê bêsem’ û çira**  
Ser xerîb û bêkesê dûr bit ji yar û hogira  
Şadiya ‘îdê li min huzn e, gelî yar û bira  
Dilkeîb im, dilkeîb im, dilkeîb im, dilkeîb! (r.42)

Di vê mînakê de helbestvan roja ‘îdê dişibihîne leylê; leyl di rola Muşebbeh-bîhîya teşbîhê de ye, yanî ji ber ku di roja ‘îdê de helbestvan bê keyf û xembar e, ronahîya roja ‘îdê bû ‘aşiq/ helbestvan tarî bûye, vê rojê dişibihîne Leylê.

### 3.18.4 Meh

#### 3.18.4.1 Meha Muhherremê

Ev meh bi munasebeta bûyera Kerbelayê cih digire, ji ber ku Hz. Huseyn di vê mehê de şehîd ketiye. Di dîwanê de jî di qesîdeya der barê bûyera Kerbelayê de cih girtiye.

Ah di vê **mahê Muhherrem da**, Huseynê'm bû şehîd,  
Musteheqqê le'n û teqbîhê ebed, bûye Yezîd (r. 66)

#### 3.18.4.2 Meha Nîsanê

Di edebîyata klasîk de, ev meh comerdîyê, baranê, bereketê, ewran û hatina biharê dinimîne. Gul di vê mehê de geş dibin, yar di vê mehê de diçe seyranê.<sup>375</sup>

Wek di **nîsan** rengêreng, çîçek vebin der murxîzar  
Muxtelît bûn têk di çîmen, leşkerê Rom û Hebeş (r. 79)

### 3.18.5 Fesil (Demsal)

#### 3.18.5.1 Fesla Buharê

Di vê demsalê de, ji ber ku xweza xwe nû dike û kulîlk vedibin, di edebîyata klasîk de gelekî hatiye bikaranîn. Di dîwanê de, li hin cihan ji bo kêxweşîyê bi kar anîye, lê ev tema jî li ba Aqtepi wek Newroz û 'Îdê ye. Yanî xwîneran ji taybetîyên vê demsalê agahdar dike, lê dibêje ku tenê li ba me/ min wek huznê ye ev demsal. Di helbestekê de jî bi peyva Payîzê re wek tezat bi kar anîye û hêvîdar e ji vê demsalê. Mînakek ji dîwanê:

Bûm serxweşê hîcra nîgar, çêbû li dil daxek xeddar  
Payîz e, dê **bêtin buhar**, e's-sebrû miftah'ul-ferec (r.57)

#### 3.18.5.2 Fesla Xezan

Ev demsal di edebîyata klasîk de berevajî biharê ye; sembola huzn û xemê ye. Di malika jêr de jî 'aşiq/ helbestvan xwe wek bulbulê vê demsalê hîs dike û feryadê dike.

---

<sup>375</sup> Pala, h.b.r. 360.

Wek bulbulê **fesla xezan**, feryadê min çûn asîman  
Çendîn bikî ax û fixan, e's-sebrû miftah'ul-ferec (r. 55)

### 3.18.5.3 Havîn û Zivistan (Seyf û Şîta')

Ev her du demsal di helbestekê de bi payîz û biharê re hatine bikaranîn.  
Bulbulê sadiq, heqîqet sinfê 'uşşaq in çira?  
Der buhar û der xezan, **seyf û şîta**; efxan dîkin(r. 136)

## 3.19 RENG

### 3.19.1 Reş (Sîyeh)

Di dîwanê de, rengê herî zêde hatiye bikaranîn reş e. Rengê çav, xal (şehnik), zulfê yarê her tim reş e. Carna ji aliyê helbestvanan ve por bi şevê, carna jî bi ajalekî rengê wî reş tê şibhandin. Di dîwanê de, ji xêncî van unsurên di helbesta rêza heştan a li dor bûyera Kerbelayê hatiye nivîsîn, piştî malika ku behsa şehîdketina Hz. Huseyn tê kirin, ji aliyê helbestvan ve tê vegotin ku hemû însan divê cilê reş li xwe bipêçin; loma, ji xêncî ku ev reng nîşaneya unsurên yarê, hem nîşaneya matemê ye hem jî kevneşopîyek e. Li gorî helbestvan, divê piştî bûyerên bi vî şikilî însan cilên reş li xwe bikin. Çend mînak ji bo vî rengî:

**Bi çeşmê reş** îşaret kir, li min mujde'w bişaret kir  
Welê teyyê 'îbaret kir, nîşan da me ji xelwê ra (r.39)

Bi qurban! Ew qedê wekî serwê baxan,  
Bi heyran! **Xalê reş** teşbîhê zaxan,  
Bi weslek, xweş bike van cerh û daxan,  
Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban! (r.128)

**Zulfê şeb-reng ê sîyah ê** peçe pêçê xem bi xem  
Fushetê 'alem, li min kir tengîna tar û zelam (r.112)

**Qenc e, em cumle sîyeh-came bipoşin ma'temê**  
Hem bi van dem'ê di xûnî, em bikin dîde sefid (r.67)

### **Nagihê Selma<sup>376</sup> xwe ey dil, reş bipoşe ma'temê!**

Hêstirê xûnîn bibarîn, dûr ketî weqtê wîsal(r. 106)

#### **3.19.2 Sor (Al; Erxwenanî)**

Sor jî wek reş, di dîwanê de yek ji wan rengên sereke ye; “lêv, dêm, rû, eşkên” yarê bi vî rengî tên şibihandin. Lêvên yarê bi cewherê sor ê mîna êqîq tên şibihandin. Ji ber ku rengê gulê sor e, dêm û rûyê yarê bi gulê tên şibihandin, li aliyê din jî, ji ber ku cewhera durr jî sor e, dêmên yarê bi vê cewherê jî tên şibihandin.

Di edebîyata klasîk de, hêstirên ‘aşiq her tim bixwîn in. xwîn jî ji ber ku sor e, hêstirên yarê jî sor in. Ji xeynî van unsurên, rengê şerabê jî sor e. Şerab carna di rengê cewhera rengsor a yaqûtê de, carna mîna engûr (tirî), carna jî mîna ateş sor e. Çend mînak:

‘Îd e û her kes li keyf û şahî ye ev rojê ‘îd  
Ez, tenê mame di kuncê namuradî, bêumîd  
Cumle “aşiq, **surxî-rû**; lê ez di vî halê şedîd  
Şubhê sîb im, şubhê sîb im, şubhê sîb im, şubhê sîb(r. 43-44)

Îhya bike vî bêdilî; carek bi **dêmê sorgulî**

Wek,cilwehayê bulbulî, bêtin ji min sed fetl û ger (r.73)

Min ji destê dîlberê, noşî **şerabê ateşî**

Pêl bi pêl hîlbû ji te'sîreş li dil narê xiram (r. 109)

Li **le'lê lêv** û dindanê sedef, bû Rûhîyê “aşiq

Ze'îf û naçar e, ji ‘îşqa wê dil-arayê(r. 167)

#### **3.19.3 Spî (Beyza)**

Piştî wan her du rengan, herî zêde ev reng hatiye bikaranîn; “gerden, diran, zend û enîy” a yarê sipî ne. Ji ber ku vewhera ‘ac sipî ye, gerdena yarê dişibihîne vê cewherê û diranê yarê jî mîna cewhera sedefê sipî ne.

---

<sup>376</sup> Selma, di edebiyata klasîk de ji aliyê hin helbestvanan ve (wek Melayê Cizîrî) ji bo Me'suqê tê bikaranîn.

Di helbestekê de jî piştî şehîdketina Hz. Huseyn, helbestvan dibêje ku em piştî vê matemê ew qas bigirîn çawa ku Hz. Yaqûb, piştî Hz. Yûsuf girîye heta ku çav lê sipî bû; dibêje ku bila çavên me jî bi girînê wiha bibin. Çend mînak ji bo vî rengî:

Ger muzaffer bim, bi wesla dîlbera **gerdenbeyaz**  
Herdu ‘alem naê ber çeşmê me, qîmet yek peyaz  
Dê li nik emsal û eqranan bikim sed fexr û naz  
Tev tefê ‘uşşaqî bim ez mislê teyrê şahêbaz  
Dê mu’ella kim bi hîmmet sed nufûsê safîlat (r. 53)

Qenc e, em cumle sîyeh-came bipoşin ma’temê  
Hem bi van dem’ê di xûnî, em bikin **dîde sefid** (r.67)

Qedd-gul û qamed-gul û xeddê munewwer gulgulî  
**Cebhetê beyza** gul, gul turreê terrar e gul (r.93)

#### 3.19.4 Zer (Zerd)

Di helbesta klasîk de, rû û laşê ‘aşîq zer û çilmisî ne. Ev rewş delîla ‘aşîqan e.<sup>377</sup> Di dîwanê de, ev reng wek rengên din zêde nehatiye bikaranîn, tenê ji bo ‘aşîq hatiye bikaranîn. Rûyê “‘aşîq ji ber dûrketina ji yarê/ me’şûqa xwe zer e. Di helbestekê de jî ji ber derdê firaqê ‘aşîq xwe wek sêvên zer dibîne; xembarîya xwe tîne ziman. Wek ku tê dîtin, ev reng wek rengên din bo yarê nehatiye bikaranîn, ji ber ku rengêkî negatîv e, ‘aşîq/ helbestvan ji bo xwe bi kar anîye. **Wek mînak:**

‘Îd e û her kes li keyf û şahî ye ev rojê ‘îd  
Ez, tenê mame di kuncê namuradî, bêumîd  
Cumle “‘aşîq, surxî-rû; lê ez di vî halê şedîd  
**Şubhê sîb im, şubhê sîb im, şubhê sîb im, şubhê sîb**(r. 43-44)

**Rûyê zerd** û eşkê xûn in, her du şahid hukmî kir  
Dê’wîyê ‘işqê li ser min, çun bikim ez îktûtam? (r.113)

<sup>377</sup> Ahmet Öntürk, Divan Şiirinde Renkler, ulakbilge, cilt. 5 sayı. 12, 2007, r. 980.

### 3.19.5 Belek

Ev reng tenê di hin malikan de derbas dibe, ew jî bo çavên yarê tê bikaranîn.

#### Wek mînak:

‘Îdeyan, îftar kirin dîtin mehê nû yek bi yek

Saîm im hêja, me ned’ye meh li ser **çeşmê belek**

Cumle, ba-yar in, firaz in; lê tenê ez tek bi tek

Der-nişîb im, der-nişîb im, der-nişîb im, der-nişîb (43)

### 3.19.6 Hin Rengên Din

Ji xêncî rengên derbasbûyî, helbestek bi rengine cuda di malika xwarê de dest pê dike. Di malika duyem de behsa meha Nîsanê dike. Dibe ku ev reng kulîlkên ku di biharê de derdorê dixemilînin dinimîne. “Reş an Mawî û reş” jî ji bo serwa li hev bê, hatiye bikaranîn:

**Kesk û sor û zer, narencî û mawî û reş**

Sef bi sef seyran kon-an, tèn dîlberanê mahîweş

Wek di **nîsan** rengêreng, çiçek vebin der murxîzar

Muxtelît bûn têk di çîmen, leşkerê Rom û Hebeş (r. 79)

## 3.20 HERF (TÎP)

### 3.20.1 Elîf

Ji ber ku di alfabeya Erebî de tîpa yekem e û şikilê wê rast û wek xençer, şûr, tîr, qelem, minare, tilî, rê, çira, serwî, nêrgis û qerenfîlê ye, wek amrazekî, lê bi giştî ji bo bejn û rastbûnê hatiye bikaranîn.<sup>378</sup>

Cuz **herfê elîf** nîn e, li ser lewhê dilê jar,

Ez qametê dildar.

Der-medreseyê ‘îşqê neda dersê xiyalî,

Ustadê emîn im. (r. 123)

<sup>378</sup>Dursun Ali Tökel, *Divan Şiirinde Harf Simgçiliği*, Fatih Sultan Mehmet Vakıf Üniversitesi Yayınları, 2. Baskı İstanbul, Ağustos, 2016, r. 63.

Di vê bendê de helbestvan dibêje ku ustadê ji xwe bawer im, di medreseyê ‘îşqê de dersên xeyalî nedane, li ser lewhê, dilê reben wek bejna yarê tiştêkî rast tune, herfa elif jî bi qasî bejna yarê ne rast e.

Ela ey dîlberê bêmîsl û manend  
Sîye- çeşme, **elif enfê**<sup>379</sup>, sipî zend  
Bi rehmet, min veke ez-qeyd û ez-bend  
Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban! (r. 128)

Ev tîp carna ji bo pozê yarê jî tê bikaranîn. Di benda jor de helbestvan pozê yarê dişibihîne tîpa elifê.

### 3.20.2 Dal û Lam

Dal: Ev herf wek unsura teşbîhê herî zêde bi bejna ‘aşîq a ku ji ber eşqê wek tîpa dalê xwar bûye, tê bikaranîn. Di heman demê de ji ber ku ev tîp dişibihe çengalan, pora yarê jî bi vê tîpê tê şibhandin.<sup>380</sup>

Lam: Ev herf bi şikilê xwe dişibihe pora yarê ya badokî.<sup>381</sup>

Mûyê ‘enber- bûyê dîlber û meskenê zulm û cefa  
Der serê her yek meqerr e, sed hezaran **dal û lam** (r.112)

Helbestvan di malikekê de ev her du tîp bi hevdu re bi kar anîne. Ji van tîpan du ihtîmal derdikevin holê: Yek jê peyva “DIL” e, yek jî pora yarê ye, ihtîmala mezin ew e ku helbestvan xwestiye ku behsa tayê pora yarê bike, lewra di nîvmalika ewil de behsa pora yarê dike. Dixwaze bibêje ku serê tayên pora yarê wek van her du tîpan badokî ne. Peyva sed hezar jî vê ihtîmala me piştrast dike; ji ber ku hejmara tayên porê jî gelek in.

<sup>379</sup> Ev ravek di dîwanê de wek “elfê elfê” hatiye latinize kirin û ji bo wateya wê jî “bi hezaran” hatiye nivîsîn. Li gorî tespîtên me divê ev ravek wiha be: “**elif enfê**” yanî pozê wek tîpa Elifê. Jixwe “elfe elfê,” ne li gorî vê bendê ye. wateyê xera dike.

<sup>380</sup>Bo zêdetir agahî, Tökel, h.b.r. 117.

<sup>381</sup>Bo zêdetir agahî, Tökel, h.b.r. 147.



### 3.20.3 Nûn û Sad û Mîm

Nûn: Ev herf herî zêde ji bo birûyên yarê tê bikaranîn.<sup>382</sup>

Sad: Ev tîp, ji ber giroverbûna xwe, helbestvan wê di helbesta klasîk de dişihibînin çavan.<sup>383</sup>

Mîm: Ji ber şikilê xwe, bêtir bo lêv û devên yarê tê bikaranîn.<sup>384</sup>

Ji **şewqa nûn û sad û mîm**, ji xeyn û ra û sad û cîm,

Min ev beyta kirî tenzîm, kirî peşkeşe Mewlaê (rt.162)

Helbestvan ev her sê herfan bi hev re bi kar anîne: “nûn, birû”, “sad, çav” û “mîm dev an jî lêvên yarê” ne. Lê mebesta wî ji van hersê tîpan rûyê yarê ye, ji ber ku berîya wan her sê tîpan peyva “Şewq”ê bi kar anîye.

## 3.21 ÎNSAN

### 3.21.1 ‘Aşiq

Wek têgehekî tesewwifê ew kesên ku li Xweda diğerin û ji xeynê Xweda tiştêkî naxwazin û li tiştêkî nagerin, jê re ‘aşiq tê gotin.<sup>385</sup> Di dîwanê de ‘aşiq bi gelemperî bi van sifet û şibihandinan cih girtiye: Îxtîyarê piştê kûz, nemleê ez’ef, Gerden-gec, çeşmê giryan, ‘aşiqê şeyda, perwane, esîr û bendewar, hezîn, derdînak, sîneçak, qelbê melûl ê xem-zede, rûyê zer, qelbê meksûr, qelbê hezîn, qelbê efkar, dilê sedmetzede, qelbê seqîm, dilê jar, qelbê neçar...”

‘Aşiq her tim ji bo me’şûqê bendewar e, mîna Mecnûnê Leylayê şeyda dibe û bi çolan dikeve. Carna wek Ferhadê Şîrîn e carna wek Yusif Pêxember e; esîrê yarê ye. Dêrdê fîraq û hîcranê ew kiriye îxtîyaretî pişt kûz û gerden gec. Her wiha her tim bi girîn û xemdar e. Geh dibe perwane û xwe qurbana yarê dike, geh ji alîyê me’şûq ve tê birîndarkirin û kuştin. Lê ji bo me’şûqê dikare her tiştî bike û xwe qurbana yarê bike. Lewra, derdê fîraqê ji her tiştî diwartir e. Cefaya yarê ji derdê fîraqê çêtir e û şêrîntir e ji bo ‘aşiq.

<sup>382</sup>Bo zêdetir agahî, Tökel, h.b.r. 159.

<sup>383</sup>Pala, h.b.r. 385.

<sup>384</sup>Bo zêdetir agahî, Tökel, h.b.r. 151.

<sup>385</sup>Ertekin, h.b.r. 157.

‘Aşiq nexweşekî rûzer e, ji derdê fîraqê wek pelên payîzê zer e yan jî wek guleke çilmisî ye. Dilê wî jar û hezîn e. **Çend mînak ji Dîwanê:**

Min, ne Newroz e, ne ‘îd e; **min ne keyf û ne surûr**

**Dil, ji hîcranê melûl e, nabitin şad û sebûr**

Gerçî **hala der-fîraq** im; lê bi **qelbê sade nûr**

Der rikîb im, der rikîb im, der rikîb im, der rikîb!(r. 44)

Sed hezar enwa’ê xem, der-dil ji firqet bêhîsab

Cîsmê bêtaqet; di narê ‘işqê dilber, **bû kebab**

**Çeşmê pur nem, sîne pur ateş, cîger pur îltîhab**

Rûhîya! ‘Erz ke li dergahê hebîbê, ev xîtab

Ah û sed efxan, ji hîcra dîlbera ala Fireng (r. 85)

Bêkes û bêda û bêbab im! Yek yetîmê bênewa!

Rûreş û bêçare me, pa-besteê nefis û hewa!

**Dilkul im;** derman tu nîn e, lutfê ke ber min dewa

Ya Resûllelah dexîl im! Ya Hebînellah dexîl! (r. 97)

### 3.21.2 Me’şûq

Di dîwana Rûhî de, ji bo yarê bi gelemperî ev nav û sifet hatine bikaranîn: “Hebîb, gul, mehbûb, nîgar, yar, metlûb, selma, merxûb, canan, çeşmê cellad, mahê xergahî, yarê şepal, nûrîn cemal, rû bixal, sorgul, yarê ba-wefa, reng kewkebê, dilbere horî-xulam, meh- pare, horî-lîqa, rûx-afîtab, gerdexezal, dilberê ‘alîcenab, perî rû, çeşmê şehla, serwî bala, xonçe dem, elfazê xweş, lale rû, çeşmê horî, dilberê gulbun, nazikek peykerperî, kewkeba çerxa berîn, yarê sengin, leb nebat, Tersa, ehzen, xezal, nazîdar, husna şekerxa, dîlbera nûrîn, melekter û hwd.” Ev nav û sifetan carna bi hunera îstîfereyê carna jî bi hunera şibihandinê bi kar anîne. Ji ber ku em ê di unsurên xweşîkbûnê de bi awayekî berfireh cih bidin şibihandinê, em ê çend mînak ji bo hunera Îstîfereyê bidin:

Yarê min, terkîbê endamê gul e; yekser gul e

Derdê min, daîm **gul e;** hem qelbê min, eftar e **gul** (r. 95)

Ji ber derbê hilak im ez; hezîn û derdinak im ez  
Kebab û sîneçak im ez; hewesbaz im bi **yarê** ra

Çend hezaran fikrî tèn qelbê melûl ê xem-zede  
Xurbet û rahê be'îd û hicrê **mehbûbê** delal (r.104)

Hemî ayatê husn û şîwe ber xeddê te ne, mektûb  
Ew e 'îlletê ji nêv xubanê 'alem min Tu yî **metlûb**  
Bi vê tertîbê dildarî, digel ev sûretê **merxûb**  
'Eceb nîn e ku 'aşîq mehwî kî ey hiretê **horî!**

Bûm hilak ez hîcrê cansûzê te, **yarê'm** el-eman!  
Şubhê Kûhê Qaf e qelbê min ji ber derd û xeman  
Ah û feryadan dikêşim, ey **nîgarê'm** der-deman  
Şu'leya hîcra te, sotim; bêhtir ez-narê cehîm(r. 116)

### **Sultana Xuban**

Şefqe ke **Sultana Xuban**, zar û bêzarê te me!  
Melhem û derman bide, dîsa birîndarê te me!  
Qeyd û zencîr in di zend û pa, girîftarê te me!  
Şahîdê şêrîn-suxen, bugşa, derê lutfa 'emîm (r. 118)

### **Senem (Pût)**

Çi'b kim ez Dicle diçi pêl bi pêl ta mulkê "Ereb  
Lê çi fayde, zar û mehrûm im, feqîr im teşneleb  
Her ji ber bêkamî û bêçaregî kerbû kezeb  
Nabe carek zû, di tirbê ey **senem** ber min rehîm! (119-120)

### **Dîlber**

Ji şewqa îltîfata **dîlberê** sermest û heyran î  
Cîhan têk tar û mar bit nik te, daîm xulxul û şahî(r.156)

### **Leyla**

Di ‘uqbaê wekî rabim, bi didara te ez şa bim

Wekî Mecnûnê **Leyla** bim, ji sewdaya te **Leylaê** (r.158)

### **Saqî**

Şeraba ‘eynê turyaqî, dinoşim ez, ji dest **saqî**

Dibim serxweş û dibim baqî, xerîq im ez, di deryaê (r. 160)

### **Canan**

Ey dilo! Bes ke, fixan û nale, ez-destê nîgar

Sebir ke ber cumle mihnet, çun ji **Cananê** te, tê (r.164)

Me’şûq di dîwanê de, di gel xweşikbûna xwe bi zalimbûna xwe jî cih digire.  
‘aşiq her tim derdê fîraqa yarê dikişîne. Me’şûq li ‘aşiq nayê rehmê, çunkî dilê  
me’şûq wek keviran hişk e û ‘aşiq xembar û birîndar dike. **Wek mînak:**

Çi’b kim **hebîbek zalim e**; likîn, ji neqsan salim e

Axir, nekir perwa li me; e’s-sebrû miftah’ul- ferec (r. 57)

Min ji zatê dîlberê weslek bi zarî kir meraq

**Zalima tersa!** bi çi naket bi min re îttifaq

Bûme der çerxê fîraqê mislê bedra der-mehaq

Muntezîr mame ji bo rehmek, di nêv narê fîraq

El-eman! Sed el-eman! Ey çeşm û ebrû der qîtal (r.88)

Beyt û şî’rê îştîyaqê, tèn ji hukmê îftîraqê

Carekê nakit wîfaqê, **yarê sengin ê di min**

**Sengî- qelb** û leb nebatê, bir ji min îsmê heyatê

Her dema, bade seba tê; taze ne, **b’rînê di min** (r. 140)

### 3.21.2.1 Unsurên Xweşikbûnê yên Yarê (Me'şûqê)

#### 3.21.2.1.1 Por (Kakul; Zulf; Perçem; Turre; Gîsû; Mû)

Di edebîyata klasîk de yek ji girîngtirîn unsurên xweşikbûnê por e. Carna wek “Mû, gîsû, kakul..” tê bikaranîn û ji gelek alîyan ve bûye mijara teşbîh û mecazan.<sup>386</sup> Di dîwana Aqtepe de peyvên wek “**Kakul; Zulf; Perçem; Bisk; Turre; Gîsû; Mû**” an ji bo pora yarê yan jî ji bo beşekî pora yarê hatine bikaranîn. Em ê li jêr cih bidin çend mînak:

Muheyya, hazir im her dem; esîr û bêhîş û sersem

Ku **zulf** û **kakul** û **perçem**, bi lef betin bi baê ra

Bi lef bîn **gîsûyê** taze; bi saz û coş û awaz e

Ruxê ‘‘aşîq, dibit xaz e; ji ber tîrê di cergê ra(r. 37)

Wucûda perde, bû e'dem; digel dîlber, şodem hemdem

**Sîyeh marê** mûyê edhem, xelex bestin ji helqê ra (r. 40)

**Zulf** û **turre**, **bisk** û xalan, awurê ehse-xezalan

Dan bi yexma, kir'ne talan; millet û dîne di min (r.141)

Bi dama **kakul** û **gîsû** û **zulfan**; dest û pabend î

Ji wesla xebxeb û çêşm û zenexdan, dest ne kûtah î (r. 155),

Porê yarê carna dilxapînok, hîlebaz e û ‘aşîq dixapîne girêdayî xwe dike. **Wek mînak:**

Qedd-gul û qamed-gul û xeddê munewwer gulgulî

Cebhetê beyza gul, gul **turreê terrar** e gul (r.93)

Nîn e kes yarek wekî yarê me, yekser gul bitin

Zulfê muşgîn, bûyê gul, hem **kakulê mekkar** e gul

<sup>386</sup> Pala, h.b.r. 384.

Mîslê bulbul, bêhîşê yarê gul, endam im çira?

Çunkî; gîsû, helqedar in, **perçemê ‘eyar e gul**( r. 94)

Porê yarê bi kurîşkên xwe ji bo murxê dilê ‘aşiq mîna dam (xefik) e. Dema murxê dilê ‘aşiq dikeve vê xefikê nikare xwe jê xelas bike an jî naxwaze xwe jê xelas bike.<sup>387</sup> Di dîwanê de jî ‘aşiq ketiye xefika kakul, zulf û gîsûyên yarê û dest û lingên wî girêdayîne. **Wek mînak:**

**Bi dama kakul û gîsû û zulfan;** dest û pabend î

Ji wesla xebxeb û çêşm û zenexdan dest ne kûtah î (r.155)

Por, her tim astengek e ji bo ‘aşiq ku rûyê yarê bibîne û ‘aşiq perîşan dike. Di dîwanê de, rûyê yarê mîna hîvê xweşik û birgok e, dema ku por dikeve li ser rûyê yarê, ‘aşiq nikare rûyê yarê bibîne.

J’îzdîhamê **zulf û perçem, ber ruxê bedrê munîr**

Her nefes, ber dil dikêşin, leşkerê xem, îzdîham (r. 110)

Por, di dîwanê de bi van şibihandin û ravekan derbas dibe: “Sîyeh-mar, mû-edhem, perçemê pur-çîn, zulfê muşkîn, ejderhayê zulfê ‘enberî, gîsûyê helqedar, awize, zulfê muselsel, gîsûyê nazenîn, zencîrê zulf, zulfê şebreng, sîyahê peçe peç, mûyê ‘enber... hwd.” Em ê porê yarê dabeşî sê beşan bikin: “bêhn, şikl û reng”

### **3.21.2.1.1.1 Ji alîyê Bêhnê ve:**

Porê yarê her tim bêhnxweş e û ‘aşiq bêhiş û sermest dike. Bi giştî, bi “Ba”yê re tê bikaranîn. Bayê Seba û Nesîm ji bo bêhna pora yarê wek postavan e. Ji bo ‘aşiq jî, bêhna porê yarê ew qas xweş e ku li hemberî vê bêhnê, Muşka Tatarî û bêhna gulan ne tu tişt e, yanî dema ku bêhna yarê tê, qîmeta bêhnên din namîne.

Nîn e kes yarek wekî yarê me, yekser gul bitin

**Zulfê muşgîn,** bûyê gul, hem kakulê mekhar e gul ( r. 94)

Qîmeta muşka **Tetarî,** rûmeta **werd û buharî**

Kir’ye napeyda bi zarî, zulfê purçîn ê di min (r. 140)

---

<sup>387</sup> Pala, h.b.r. 105.

### 3.21.2.1.1.2 Ji alîyê Şikilî ve:

Ji alîyê şikilî ve, por bi vî awayî di dîwanê de derbas dibe: “pêçe pêç, helqe, helqedar muselsel, zencîr” por bi şikilê xwe yê zincîrî muselsel û helqedar ve, ‘aşiq dixapîne û bi xwe ve girê dide. Ji xêncî vê yekê jî, porê yarê her tim dirêj e. Di dîwanê de, por bi “siyehmar” hatiye şibihandin, yanî pora reş û dirêj mîna maran.

Besteê **zulfê muselsel** bûm di halê sifrê sîn

Min, digel xalê di reş, de’wa ye ta weqtê himam (r. 109)

Besteê **zencîrê zulf im**, bendeê xalê sîyah

Mubtelayê xebxeb im, şefqet ke ya bînt’el-kîram (r. 111)

### 3.21.2.1.1.3 Ji alîyê Rengî ve:

Di dîwanê de, pora yarê her tim wek reş hatiye pênasekirin. Carna wek şevê reş, carna jî mîna ajalên rengreş e.

**Zulfê şeb-reng ê sîyah ê** pêçê pêç ê xem bi xem

Fushetê ‘alem, li min kir tengîna tar û zelum (r. 112)

### 3.21.2.1.2 Rû û Dêm (Rux; Kele; Dîdar; Lîqa; Sifet; Xedd; Ruxsar; Çehre; Cemal; Wech)

Yek ji unsurên herî girîng ên xweşikbûna yarê “Rû” ye. Rû di dîwanê de bi van navan derbas dibe. “Rux; Dem; Kele; Dîdar; Lîqa; Sifet; Xedd; Ruxsar; Çehre; Cemal; Wech.” Hinarokên yarê jî wek “Dêm” derbas dibe. “Rû û dêm” di edebîyata klasîk de gelek caran bi hev re tên bikaranîn. Di dîwanê de rû û dêm bi van şibihandinan derbas dibin: “sifethorî, surxî-rû, xed sorgulî, şêrin sifet, dêmê bixal, dêm mahîweş, reng kewkebê, rûbixal, rûx-afîtab, lale-rû, çehre-gul, xeddê munewwer, xonçedêm, gul-rûx, şêmsê rux, pertewa wech, dîdarê şêrîn, sîma-perî û wechê mubarek.” Li gorî van şibihandinan, em tê derdixin ku ‘aşiq rûyê yara xwe wek rûyê horî û perîyan xweşik dibîne. Rûyê yarê her tim birgok e Çawan ku sitêrk û roj li asîmanan dibiriqin, li gorî ‘aşiq jî rûyê yarê wek sitêrk û rojê birgok e. Her wiha rû û dêmên yarê wek gulan xweşik in. Yek ji taybetîyên rû jî, bi giştî bixal e. **Çend mînak ji dîwanê:**

Yarê, şepal ê, **rû bixal**, ew nazika nûrîn-cemal  
Çi bikim neda carek wîsal, e's-sebrû mîftah'ul ferec (r.57)

Meh-pareê **horî-lîqa**, yarê bi çah û îrtîqa  
Bo min neda şûrbek seqa; e's-sebrû mîftah'ul ferec (r.58)

Ey dîlberê **rux-afîtab**; sotim, di hîcrê bûm kebab  
Îhsan ke yek camek şerab, îhya bibit bendê cîger(r. 73)

Sed hezar Leyla û Şêrîn û Zuleyxa der-xiram  
Çeşme şehla û serwî-bala **xonçe-dem**, elfazê xweş(r. 79)

Leb-gul û gerden-gul û xebxeb-gul û **rûxsar e gul**  
**Dêm-gul û çehre-gul** û ten-gul seraser yar e gul (r.93)

### 3.21.2.1.3 Enî

Enîya yarê di dîwanê de bi peyva “Cebhet”ê cih girtiye. Li gorî helbestvan, ‘enîya yarê sipî ye û wek gulan e’. **Wek mînak:**

Qedd-gul û qamed-gul û xeddê munewwer gulgulî  
**Cebhetê beyza gul e**, gul turreê terrar e gul (r.93)

### 3.21.2.1.4 Çav (Çeşm; Beser; ‘Eyn; Uyûn; Dîde)

Çav, di nav unsurên xweşikbûna yarê de cihekî girîng digire. Di dîwanê de, çav bi van navan derbas dibe: “Çeşm; Beser; ‘Eyn; Uyûn; Dîde.” Di nav van de, herî zêde peyveke bi Farisî yanî “Çeşm” ji bo çav hatiye bikaranîn. Helbestvan, bi hunerên Îstîfare û Şibihandinê taybetîyên çavên yarê anîne ziman. Di dîwanê de, hin îstîfare û şibihandinên ji bo çav hatine bikaranîn ev in: “Çeşmê cellad, çeşmê-reş, çeşmê-belek, çavê-muskîrat, şehla’uyûn, eswed-‘uyûn, , çeşmê-horî, çeşmê-nîr, çeşmê- xezalî, siye-çeşmê û didê-şehla.”

Dema ku em li dîwanê dinihêrin, em dibînin ku çavên yarê bi gelemperî reş, carna jî belek in û wek yê horî û xezalan xweşik û birqok in. Çav, di gel xweşikîya xwe, belaya serê ‘aşîq in, wî xembar dikin û ‘aşîq her tim bi girîn e. Her wiha çavên



yarê wek celad in û ‘aşiq birîndar dîkin û dide kuştin, ‘aşiq jî dixwaze bibe şehîdê çavên yarê yên ku ‘aşiq birîndar dike. **Çend mînak ji dîwanê:**

**Şehîdê çeşmê cellad im**, hewadar im bi bejnê ra  
Di ‘îlmê işqê, neqqad im; rîwayet kim ji amê ra (37)

Bi **çeşmê reş** îşaret kir, li min mujde’w bişaret kir  
Welê teyyê ‘îbaret kir, nîşan dame ji xelwê ra (r.39)

Bo dîlberê **şehla ‘uyûn**; zar û zelil im, ta kunûn  
Gerçî di hîcran im; e’s-sebrû mîftah’ul ferec (r. 55)

Sed sebah’ul-xeyrê min ber xakîpayê dîlberê  
‘Îsewî teb’ê! Kubarê! Nazikê! Dêm-enwerê  
**Çeşmê horî**, werdê curî qedd û qamed ‘er’erê  
Der-lehîbê ateşe, ez ketme pencê beglerê  
El-eman! Sed el-eman! Ey bejn û bala î’tîdal! (r. 87)

Cana! Ji xedengê mujeê **çeşmê xezalî**,  
Dil-derd û hezîn im.  
W’ez hesretê reftarê bi naz û bi delalî,  
Pur-ah û girîn im. (r. 123)

### 3.21.2.1.5 Dev (Dîhen) û Lêv (Le’l; Leb)

Dev bi şibihandina “xoncedîhen”ê di dîwanê de cih girtiye. Li gorî ‘aşiq, devê yarê mîna gula nebişukivî piçûk û xweşik e. Lêvên yarê jî her tim bi kevirê biqîmet “le’l”ê hatiye şibhandin. Ji ber ku rengê vî kevirî sor e, em dikarin bibêjin ku lêvên yarê her tim sor in. Ev kevir carna bi rêya îstîfereyê li şûna lêvên yarê hatiye bikaranîn. Di dîwanê de, lêv bi unsurên wek “diran, çav, gerden, rû perçem, hwd.” re hatiye bikaranîn. **Çend mînak ji dîwanê:**

Birim xelwê, di nêv subbet;me noşî, badeê cennet  
Ji **le’lê** yarê pur hîmnet, ‘edem bûm ez bi cur’ê ra (r. 39)

**Leb-gul** û gerden-gul û xebxeb-gul û ruxsar e gul  
Dêm-gul û çehre-gul û ten-gul, ser a ser yar e gul(r. 93)

‘Eceb şêrînxeber **xoncedîhen**, nazikbeden ya Reb!  
Perîpeyker, sîfethorî, melekterb’ û şekerxaê !

Li **le’lê lêv** û dindanê sedef, bû Rûhîyê “aşiq  
Ze’îf û naçar e, ji ‘işqa wê dil-arayê(r. 167)

### 3.21.2.1.6 Birû (Ebrû ) û Bijang (Mujgan)

Birû, wek unsurên din zêde nehatiye bikaranîn. Di dîwanê de wek “Ebrû û rûheval” derbas dibe û bi van unsurên “çav û bijang, rû” re hatiye bikaranîn. Birûyên yarê jî wek çav û pora yarê reş û ji alîyê şikil ve jî wek hîlalê zirav in. Helbestvan birûyên yarê dişibihîne “mah û hîlal”ê. Her wiha wek qewsê teswîr dike. Bijangên yarê jî wek “birû” zêde nehatiye bikaranîn. Di dîwanê de wek “mujgan” derbas dibe. Bi “tîr û ebrû”yê re hatiye bikaranîn.

Çawan ku birûyên yarê mîna qewsê bin, bijangên wê jî tîr in. Dema ku ‘aşiq li yarê dinihêre, Bijang û birûyên yarê (tîr û qews) ‘aşiq birîndar dikan, anko dikujin.

#### **Wek mînak:**

Ket’me êşa cerh û zexman, **ez ji qewsa rû-heval**  
Mîslê baranê dibarin, **tîr ji wan mujganê al**,  
Kesmekeş tê da me ez, ‘alem li ber çeşmê xîyal  
Dîlberê’ m Tersa ye, natirsit ji zenban û webal  
El-eman! Sed el-eman! Ey muxbeça gerdenxezal!(r. 86)  
Min, ji zatê dîlberê, weslek bi zarî kir meraq  
Zalima Tersa! Bi çi nakit bi min re îttifaq  
Bûme der çerxê firaqê, mislê bedra der mehaq  
Muntezîr mame ji bo rehmk, di nêv narê firaq  
El-eman! Sed el-eman! Ey çeşm û **ebrû** der qîtal! (r. 88)

Şu’ledar im ser te ser ateş dibarit min ji ah!  
Bê, du **ebrûyê hîlal im**; dil me bû kûyê zexal (r.105)

Çeşm û **ebrû** qesdê qelbê min dikin, der-her nefes  
Nakitin perwa li me, şahînşehê zîba xiram (r.112)

Der fîraq im, bêdil im dîdarê dilber na-pedîd  
Perde ye ber **mahê ebrû**, şemsê rux ‘ewr û xemam (r.113)

Ji te’sîratê ‘îşqê, bûme yekser cemre wek ateş  
Qetîlê tîrê mujgan im, ji **qewsê ebrûwanê reş**  
Cunûn û bêhiş im, asarê ‘îşqê, ez dilê serxweş  
Cuda nakin, du sed Şeyxê Geylanî û Teyfûrî(r. 147)

#### 3.21.2.1.7 Çene (Zenexdan; Çahê zenexdan)

Çene di dîwanê de wek “Zenexdan û Çahê Zenexdan (çala çeneyê)” derbas dibe.

Xwendin em bezma wîsalê, dîlbera nîkhet-‘ebîr  
Çûm giham **çahê zenexdanê** nîgara bênezîr  
Bêhiş û sewda û sergerdanê an bedrê munîr  
Min, der axûş kir, bi kamê di, qed û qamê herîr  
Sed hezar îhsan li min kir, şahê îksîr, îltifat (r. 50)

#### 3.21.2.1.8 Diran

Diran di dîwanê de carekê bi “lêv”ê re hatiye bikaranîn. Wek lêçûya hunera şibihandinê cih girtiye, yanî diranên yarê mîna sedefê sipî û xweşik in. **Wek mînak:**

Li le’lê lêv û **dindanê sedef**, bû Rûhiyê ‘aşîq  
Ze’îf û naçar e, ji ‘îşqa wê dil-arayê(r. 167)

#### 3.21.2.1.9 Gerden; Xebxeb û Sing (Sîne û Ber)

Situ, di dîwanê de wek “Gerden û Xebxeb” cih girtiye. Gerdena yarê mîna kevirê ‘acê sipî ye û wek gul û xezalan xweşik e. Sing jî wek “Sîne û Ber” derbas dibe. Sing jî wek situ lêçûya hunera teşbîhê ye, helbestvan “sîne û ber”ên yarê dişibihîne gulan. **Wek mînak:**

Ger muzaffer bim, bi wesla dîlbera **gerdenbeyaz**  
Herdu ‘alem naê ber çeşmê me, qîmet yek peyaz  
Dê li nik emsal û eqranan bikim sed fexr û naz  
Tev tefê ‘uşşaqî bim ez mislê teyrê şahêbaz  
Dê mu’ella kim bi hîmmet sed nufûsê safîlat (r. 53)

Îhsan li min kit, yek wîsal; ew nazika **gerdenxezal**  
‘Işqa me, dê bigrit kemal; yek car ji perdan, bême der (r. 75)

Leb-gul û **gerden-gul** û xebxeb-gul û ruxsar e gul  
Dêm-gul û çehre-gul û ten-gul, ser a ser yar e gul(r. 93)

Hem zenexdan gul; heme gul, **sîne gul, ber gul** tamam  
Gûşîwarê zer, li ser gul û nîkhetê dildar e gul (r. 94)

#### 3.21.2.1.10 Dest û Tilî (Zend û Esbe’)

Ev unsur wek diran kê m hatiye bikaranîn. Dest û tilîyên yarê mîna gulan in.  
Her wiha destên yarê sipî ne. **Wek mînak:**

**Zend** û bazû, gul bizane; kef, gul; û **esbe** ‘ **gul e**  
Xonçe-dem; lew ‘‘aşîqan, subh û mesa, ezkar e gul (r. 94)

Ela ey dîlberê bêmîsl û manend  
Sîye- çeşme, elfê enfê, **sipî zend**  
Bi rehmet, min veke ez-qeyd û ez-bend  
Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban! (r.128)

#### 3.21.2.1.11 Bejn û Bal (Qed û Qamet )

Bejna yarê her tim wek lêçûya hunera Teşbîhê cih girtiye û bi darên wek  
‘‘Serwî, ‘er’er û şîmşad’’ê hatiye şibihandin. Çunkî li gorî ‘aşîq bejna yarê jî mîna van  
daran dirêj û zirav e. Di helbestekê de jî bejn û qameta yarê şibihandiye gulan. Li  
gorî helbestvan, yar seranser bi qumaşê herîr hatiye xemilandin, lewma di helbestekê  
de dibêje: ‘‘qed û qamê herîr yanî bejn û bala bi herîr hatiye xemilandin.’’

Xwendin em bezma wîsalê, dîlbera **nîkhet-‘ebîr**  
Çûm giham çahê zenexdanê nîgara bênezîr  
Bêhiş û sewda û sergerdanê an bedrê munîr  
Min, der axûş kir, bi kamê di, qed û qamê herîr  
Sed hezar îhsan li min kir, şahê îksîr, îltifat (r. 50)

Sed hezar Leyla û Şêrîn û Zuleyxa der xiram  
Çeşmê şehla, **serwî- bala**, xunce-dêm, elfazê xweş (r.79)

Fikrê min, **ew qameta şîmşadî** ye der-roz û şeb  
Roz û şeb; yeksan e, yek reng e ji bom in der-teleb  
Gûşê ber qewlê reqîban, kir hebîbê’ m bêsebeb  
Min ji ber derdê firaqê, pare bû cerg û kezab  
El-eman! Sed el-eman! Ey keckulahê rû bixal! (r. 87)

**Qedd-gul û qamed-gul** û xeddê munewwer gulgulî  
Cebhetê beyza gul e, gul turreê terrar e gul (r.93)

Di malikekê de bejna yarê bi peyva “qîyamet”ê re hatiye bikaranîn, em dikarin bi du tiştan bifikirin: yek, helbestvan yarê di halê qîyametê de teswîr dike, lewra di qîyametê de yê her kes li ser pêya ye; yanî bejna yarê ya ku di halê qîyametê de, li ser pêya, rast û dirêj, a din jî, taybetîyeke din a roja qîyametê heye ku ew jî ev e ku roja qîyametê sembola qelebalixê ye. Dibe ku helbestvan xwestibe ku bejna yarê ya ku hişê mirovan tevlihev dike bi peyva qîyametê re têkildar bike.

Dîlberê **bala qîyamet**, ger nebînim ez der buhuşt  
Yek qedem ger deynim ez, ey dil mehal e, sed mehal! (r. 104)

### 3.21.2.1.12 Şehnik (Xal)

Xal, di tesewifê de ji bo xal gelek wate diyar bûne. Li ser wateya ‘nuqtika wehdeta heqîqî ye ku ev nuqtik destpêk û dawîya kesretan e lihevkirinek heye. Xal ku bi şîkl û dirûvê xwe nuqte ye yekîtiya heqîqetê tîne ziman.<sup>388</sup> Yek ji unsurên herî girîng ên xweşikbûna yarê, xal e. Xal wek unsurên mîna por, çav û birûyan reş e. Li

<sup>388</sup> Ertekin, h.b.r. 200.

gorî ‘aşiq, rûyê yarê her tim bixal e. Bi unsurên wek “rû, por, zenexdan”ê re hatiye bikaranîn. Carna wek lêçûya hunera Teşbîhê cih girtiye û bi “zax û zengî beççegan” hatiye şibihandin.

Di mînaka xwarê de jî helbestvan xala (şehnik) rûyê yarê şibihandiye vî kevirî û xwe wek hecîyekî hîs dike çawa ku hecî Ke’beyê tewaf dikin, ‘aşiq jî şehnika rûyê yarê tewaf dikin:

Dergehê mizgîn û şahî bazî kir yarê şepal  
Çûm tewafa **xalê** eswed, “aşiqê bêdil, bi hal  
Lezzeta halê wîsalê nagihê sed ‘ilmê qal  
Butperest asa, me bir secde li ber dêmê bixal  
Berq û enwarî me pur kir, erd û heftem tebeqat (r. 50)

Yarê, şepal ê, **rû bixal**, ew nazika nûrîn-cemal  
Çi bikim neda carek wîsal, e’s-sebrû mîftah’ul ferec (r.57)^

Besteê zencîrê zulf im, **bendeê xalê sîyah**  
Mubtelayê xebxeb im, şefqet ke ya bînt’el-kîram (r. 111)

Bi qurban perçem û gîsû û **xalan!**  
Di gel wan awur û çeşmê xezalan,  
Te ez kuştim bi van naz û delalan,  
Bi qurban bim, bi qurban bim, bi qurban! (r. 130)

UNSUR	Şibihandin – Mecazên di dîwanê de	Rûyê Lêkçûn
RÛ Û HINAROK	sifethorî, surxî-rû, xed sorgulî, şêrin sifet, dêmê bixal, dêm mahîweş, reng kewkebê, rûbixal, horî-lîqa, rûx-afitab, dêmê sorgulî, xonçe-dem, lale-rû, rûxsar-gul, dêm-gul, çehre-gul, xeddê munewwer, xonçedêm, gul-rûx, şêmsê rux, pertewa wech, dîdarê şêrin, sîma-perî, wechê mubarek	Xweşikbûn- Şikl-Ronahî
ÇAV	Çeşmê -cellad, çeşmê-reş, çeşmê-belek, çavê-muskîrat, şehla'uyûn, eswed-'uyûn, çeşmê-şehla, çeşmê-horî, çeşmê-reşbelek, çeşmê-ter, çeşmê- xezalî, siye-çeşmê, didê-şehla, belek-çeşm, nergisa mexmûr, sad.	Xweşikbûn- Şikl-Reng
LÊV Û DEV Û DIRAN	Le'l, leb-gul, şetê-besîm, leb-nebat, xonçe-dîhen, mîm, dindanê-sedef	Xweşikbûn- Şikl- Reng
POR	Sîyeh-mar, mû-edhem, perçemê pur-çîn, zulfê muşkîn, ejderhayê zulfê 'enberî, turrê terrar, kakulê mekkar, gîsûyê helqedar, awize perçeme hîlebaz, zulfê muselsel, gîsûyê nazenîn, zencîrê zulf, zulfê şebreng, sîyahê peçe peç, mûyê 'enber ..... Zulfê purçîn, bareê gulgûn, zulfê helqê	Reng,- Şikl- Bêhn- Xapînok
GERDEN	Gerden-beyaz, gerden 'ac, gerdenxezal, gerdengul, xebxebgul, gerden-firaz, sîne-gul, ber –gul	Xweşikbûn- Reng
BEJN; QED Û QAMET	Qed û qamê herîr, qed-serwe, serwî-bala, qameta şîmşadî, qedd û qamed er'erê, bejn û bala îtîdal, qed-gul, qamed-gul, gul-endam, bala-qiyamet, qed û bejnê dîlara,elîf	Şikl
BIJANG Û BIRÛ	Mujganê al, qewsa rû-heval, ebrûyê hîlal, mahê ebrû, nûn.	Xapînok- Şikl
XAL	Xalê eswed, xalê reş, xalê sîyeh, xalê zax	Reng
ENÎ Û ÇENE	Cebhetê beyza, zenexdan-gul	Xweşikbûn- Reng
DEST Û TILÎ	Zend-gul, esbe' gul, spî-zend	Xweşikbûn- Reng

**Tablo 8 Unsurên Xweşikbûnê yên yarê û taybetiyên wan**

## ENCAM

Ji ber gelek sedeman, berhemên edebîyata Kurdî ya klasîk wenda bûne, gelek ji wan hîn nehatine peydakirin. Roj bi roj, ev berhem ji wendabûnê xelas dibin û di refan de cih digirin. Ji bo ku ev berhem û nivîskarên wan bîna zanîn û nivîskar û berhemên wan bikevin di nava edebîyata Kurdî de, di van salên dawî de xebatên akademîk tên kirin; yek ji cûreyên van xebatan jî vekolîn û analîza berhemana e.

Ev xebat jî di vê çarçoveyê de li ser dîwana Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepe hat kirin. Piştî vê vekolînê, ev encam derketin holê:

Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepe zana, ‘alim û mutesewifekî edebîyata Kurdî ya klasîk e ku di nîvê sedsala 19an de hatiye dunyayê û bi mexlesa Rûhî helbest nivîsandiye. Di gel mexlesa Rûhî, leqeba Şemsuedîn jî bi kar anîye. Hê di piçûkatîya xwe de li cem bavê xwe dest bi Qurana Pîroz kiriye û piştî wefata bavê xwe di demeke kurt rêveberîya Medreseya bavê xwe kiriye.

Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepe ji ber ku gelek hez ji edebîyatê kiriye, zû dev ji karê rêveberîyê berdaye û wextê xwe ji bo nivîsînê veqetandiye û di gel Kurdî, berhemên ‘Erebî, Farisî û Tirkî nivîsîne.

Ji ber ku Aqtepe di medreseyê de perwerde bûye, zimanê ‘Erebî bi awayekî serkeftî bikaranîye û bi terkîb, mezmûn û hevokên ‘Erebî ev qabilîyeta xwe bi me daye zanîn. Herwiha meharetê xwe ya zimanê Farisî nîşanê me daye, di dîwanê de digel peyv û terkîbên farisî, sê helbest bi zimanê Farisî hatiye nivîsîn.

Aqtepe jî wek gelek helbestvanan li pey şopa Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqîyê Teyran çûye, em di dîwana wî de rastî şopên van helbestvanan hatin.

Her wisa ji ber ku di bin bandora edebîyata ‘Erebî û Farisan de maye, gelek hakimê ‘ilmê belaxetê bûye û di dîwana xwe de cih daye herî zêde girîngî daye hunerên wek “Teşbîh, Tekrîr û Îstî’are”yê. Ev huner jî bihêzbûna vegotina Aqtepe radixînin li ber çavan. Ji xeynî van hersê huneran 40 hunerên din jî hatine bikaranîn. Em dikarin bibêjin ku seranserê dîwanê bi van huneran hatibû xemilandin.

Di dîwana wî de 28 helbest hebûn û herî zêde bi teşeya xezelê hatibûn nivîsîn. %53ê dîwanê ji xezelan pêk hatiye. Di gel Xezelê bi teşeyên wek: Qesîde, murebbe’, muxemmes jî helbest hatibûn nivîsîn. Aqtepe bi cûreyên nezmê yên wek ne’r, medhîyye û recmîyye jî helbest ceribandibû. Lê ji ber ku cih nedabû hemû teşeyên nezmê û bi awayekî sistematîk nehatibûn rêzkirin, ne dîwaneke muretteb bû.



Aqtepi mehareta xwe ya ji aliyê serwayê ve nîşanê me daye, bi gelek cûreyên serwayê helbest hatibûn nivîsandin. (wek: Serwaya Murdef, Serwaya Muqayyed, Serwaya Muesses..h.w.d)

Di dîwanê de qabilîyeta xwe ya weznê jî nîşanî me daye û sê qalibên/ behrên kêşa ‘Erûzê – Remel, Hezec- Recez- bi kar anîne. Herî zêde bi qaliba Remelê, herî kême jî ya Recezê helbest hatibûn nivîsîn.

Aqtepi kesekî Mutesewif e, di karekterên ‘aşiq û me’sûq de timî qala ‘eşqa îlahî kiriye. Lê ev nebûye sedem ku dîwan ji aliyê şikl û estetîkê ve kême bimîne û di heman demê de girîngî daye aliyê şikl û estetîkê jî.

Dîwan ji aliyê naverokê ve jî di asteke bilin de bû. Di dîwanê de gelek têgehên dînî yên wek; “Quran, Xwedê, Qeder, Cennet, Dojeh, Axret, Du’a, Limêj, Qurban, Horî, Şehîd, Heram, Helal, Îman, Kufr, hwd. hatibûn bikaranîn. Di gel van jî, behsa têgehên îtîqadî yên wek, Nefs, Şeytan, Rûh û Cin jî hatibû kirin.

Her wiha gelek kesayetên Dînî – Pêxember, Çar xelîfe, Sehabe- jî di dîwanê de cih girtiye. Aqtepi jî wek ên berî xwe herî zêde pesnê Pêxember (s.x.l) daye û wek sembola şefaet û alîkariyê bi kar anîye. Di helbesteke xwe de ev simbol bi awayekî serkeftî bi kar anîye. Di nav Çar Xelîfeyan de tenê qala Hz. Elî (s.l.) hatiye kirin. Dema ku em li seranserê dîwanê dinihêrin em dibînin ku Hz. Elî jî wek sembola ‘ilmê cih girtiye. Di nav sehabeyan de girîngî daye Hz. Huseyn û ew bûyera ku hatiye serê wî – bûyera Kerbelayê- di helbesteke xwe de anîye ziman. Em pê derdixin ku Hz. Huseyn jî li cem Aqtepi wek sembola Şehadetê ye.

Wek ku me got, Şêx ‘Ebdurrehman mutesewif e û girêdayî terîqeta Neqşebendîyê ye. Ji ber wê yekê em di dîwana wî de rastî şopên Tesewifê jî hatin. Helbestên li ser terîqeta Neqşibendiyê û li ser Şahê Neqşibendiyê hezkirina Aqtepi anîne ziman. Herwiha Têgehên Tesewifê yên wek “ Saqî, Meyxane, Şerab, Terîqet, Dergah, Cam, Kebab, Abê Heywan, Murîd, Zahîd, Sofî, Pîrê Murxan, Pîrê Terîqet, hwd. bi kar anîne.

Di dîwanê de gelek kesayet hatibûn bikaranîn, me ev kesayet dabeşî çar beşan kirin: Kesayetên Dînî- Tesewifî, Kesayetên Xerab, Kesayetên Dîrokî û Mîtolojîk û Kesayetên wek ‘aşiq û Me’sûq ên di edebîyatên cîhanê de navdar in. (Wek mînak: Şêxê Geylanî, Weysul Qeran, Yezîd, Helagû Xan, Îskender, Qubad, Leyla û Mecnûn, Ferhad û Şîrîn, Yusuf û Zuleyxa, hwd.)

Ji bo ku Aqtepî taybetîyên Me'şûqê rave bike, gelek ajal bi kar anîbûn. Hin ji van ajalan ev in: Mar, 'Eqreb, Ahû, Baz. Her wiha hin ajal jî ji bona teswîrkirina rewşa 'aşîq hatibûn bikaranîn. Hin ji wan jî ev in: Teyr, Bilbil, Musîqar, Perwane.

Di dîwanê de gelek navên welat, bajar, çiya û çeman jî hatine bikaranîn. 'aşîq carna feryada xwe gihandiye welat û bajaran. Carna jî bi rêya hunera Mubelexeyê hêstirên xwe şibihandine geşbûna çeman, (wek mînak: Semerqend û Buxara, Yemen, Kerbela, Dicle, Necef, Çiyayê Tûr, Wadî Eymen... hwd.)

Di dîwanê de, ji ber hin taybetîyên xwe yên navdar navên qewman jî cih girtiye (wek mînak: Rom û Hebeş, Deyleman, Tatar, Freng, Tersa, 'Ereb, 'Ecem... hwd.)

Di edebîyata klasîk de 'aşîq û Me'şûq xwedîyê gelek taybetîyan in, carna ji bo xweşîkbûna yarê, carna jî ji bo ku rewşa 'aşîq di nav de bi xwîneran bidin zanîn, bi rêya hunerên edebî yên wek Teşbîh û Îstîfeyan ji gelek unsurên sîd wergirtiye. Hin ji wan unsurên yên ku di dîwanê de cih girtine, ev in: Kulîlk, Dar, Muxeylan, Amûrên Muzîkê, Bêhnên xweş, Kevirên Biqîmet, Alavên Xemlê, Çar unsur, Unsurên Kozmîk, Reng... hwd. Dîwana Aqtepî jî alîyê van unsurên ve gelek dewlemend bû. Em di dîwanê de ji serî heta dawî lrastî van unsurên hatin.

Taybetîyeke edebîyata klasîk jî bikaranîna herfan e; hin helbestvan ji bo rojbûna xwe, dîroka nivîsîna berhema xwe yan jî ji bo ku hestên xwe veşêrin, herf wek sembol bi kar anîne. Di dîwana Rûhî de jî hin herf wek sembol hatibûn bikaranîn. (Wek mînak: Elif, Nûn, Sad, Mîm...)

Di dîwanê de unsurên xweşîkbûnê yên me'şûqê – por, rû, dev, dêm,...- bi awayekî berfireh hatibûn teswîrkirin. Her wiha Aqtepî di helbestên xwe de rewşa 'aşîq jî bi xwîneran daye zanîn.

Wek gotina dawî, dema ku me dîwana Aqtepî analîz kir û ji gelek alîyan ve vekola, hat tesbîtkirin ku Aqtepî hem girîngî daye estetîkê hem jî naverokê. Di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de kêr nimûne hene ku van her du pîvanan bi awayekî serkeftî bi kar anîbin. Şêx 'Ebdurrahmanê Aqtepî, hem xwestiye ku naveroka dîwanê dewlemend be hem jî ji alîyê estetîkê /şîklî ve bala xwîneran bikişîne. Aqtepî bi hejmareke kêr; yanî di 28 helbestan de ev armanc pêk anîye û bi ser ketiye. Ev xebat dikare wek dîwanên bi vî şîklî re bibe wek mînak

## ÇAVKANÎ

Acar, Hayrullah, *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr (metn û lêkolîn)*, Nûbihar, İstanbul 2016.

Açıkgöz, Cenk, “Klasik Türk Şiirinde Dalgıç”, *Uluslararası Türkçe Edebiyat Kültür Eğitim Dergisi*, sayı: 6/2 2017.

-----, “Klasik Türk Şiirinde Balık”, *Uluslararası Türkçe Edebiyat Kültür Eğitim Dergisi*, sayı: 8/1, 2019.

Açıl, Berat, “Klasik Türk Şiirinde Estetik Bir Unsur Olarak Çiçekler”, *FSM Araştırmalar, İnsan ve Toplum Bilimleri Dergisi*, h.5, sal: bahar 2015.

Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, weş. Nûbihar, Stenbol, 2013.

-----, “Rûhî: Helbestvanekî Dahêner ê Serdema Pıştî Mîrekiyan û Bandora Wî”, *Süryani, Arap ve Kürt Klasikleri Uluslararası Klasikler Çalıştayı Bildirileri*, Mardin 2017.

Altuntaş, Selçuk, *Gazâlî" de Tasavvuf Felsefesi*. Konya Selçuk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Felsefe ve Din Bilimleri Anabilim Dalı Din Felsefesi Bilim Dalı, Yüksek Lisans Tezi, 2006.

Aslanoğlu, Osman, *Kendi Kendine Kolay Farsça*, Kent Işıkları, 6. Baskı, İstanbul 2015.

-----, Abdurrahman Aktepe'nin Divanında Hayvan Mazmunları, *Hoca Ahmet Yesevi, Uluslararası Bilimsel Araştırmalar Kongresi*, 26- 27 Ağustos 2019, Gölbaşı- Adıyaman.

-----, Gîya Di Dîwana Şêx Evdirrehman Aqtepe Da, *The Journal of Mesopotamion Studies*, C: 5/1, Winter 2020.

Aqtepe , Şêx ‘Ebdurrehman’ê, *Dîwan*, (amadekar: Mehmed Emîn Hêvîdar), Weşanên Dara, Kanûna Pêşîn, İstanbul 2019.

Axtepe, Şêx ‘Evdirehmanê, *Dîwana Rûhî*, Diyarbekir: Weşanên Belkî, 2013.

-----, *Dîwana Rûhî*, İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002.

Aydın, Haluk, *Cevrî Divanı'nın Tahlili*, Balıkesir Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili Ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Doktora Tezi, Balıkesir 2010.

Batıslam, H. Dilek, “Divan Şiirinde Kadeh ve Kadeh Redifli Gazeller”, *Divan Edebiyatı Araştırmaları Dergisi* 18, İstanbul 2017.

Bolelli , Nusrettin, *Farsça Dil Bilgisi ( Nahiv ve Sarf)*, M. Ü. İlahiyat Fakültesi Yayınları, 4. Baskı, İstanbul, Eylül 2016.

Cizîrî, Mela Ebdusselam, *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, Amadekar: Tehsîn İbrahim Doskî, Werger ji Erebî: Jan Dost, Weşanên Dara, Diyarbakir Avrêl 2018.  
Cizîrî, Melayê, *Dîwan ( Kürtçe Metin - Türkçe Çevirisi)*, Türkçe Çevirisi: Osman Tunç, Arap Alfabesinden Latinize Eden: Selman Dilovan, Weşanên Nûbihar, 6. Baskı, İstanbul, 2018

Çap, Sabri, “Tasavvufta Gül Sembolü ve Gül İle İlgili Telakkinin Oluşmasında Uydurma Hadislerin Rolü”, *Bilimname XXXVI*, 2018/2.

Çelebioğlu, Amil, “Fuzulî’nin Bir Beyti Üzerinde Bazı Düşünceler”, *Osmanlı Araştırmaları VII-VIII*, İstanbul 1988.

Demir, Muhammet Ali, *Divan Şiirinde Sevgilinin Saçının Kokusu*, Boğaziçi Üniversitesi, Yüksek Lisans Tezi, 2015.

Demirel, Şener, “Türk Şiirinde Erguvan Üzerine Bir Deneme”, *Uluslararası Türklük Bilgisi Sempozyumu*, Erzurum Atatürk Üniversitesi, 25-27 Nisan 2007.

Dikmen, Melek – Çetin, Kamile, “Klasik Türk Şiirinde Kadın Takı ve Aksesuarları”, *Bilig*, sayı: 61, Bahar 2012.

Doğan, Ahmet, *Açıklamalı ve Örnekli Aruz Bilgisi*, Akçağ Yayınları, Ankara 2005.

Durkaya, Hayriye, “Fehîm-î Kadîm Divanı’nda Hayvanlar Üzerinde Bir İnceleme”, *Sosyal Araştırmalar Dergisi*, c. 3.

Elbaghdadı, Zeki A., “Eş Anlamlılık Olgusu ve Eş Anlamlı Kelimelerin Arapça Öğretimindeki Yeri”, *KSÜ İlahiyat Dergisi* 19 (2012).

El-‘Eclûnî, ‘İsma’îl b. Mûhemmed, *Keşful-Xefâ* ( weş. Ahmed el-Kalaş), 2/164, Beyrut 1985.

Eskigün, Kübra, *Klasik Türk Şiirinde Efsanevi Kuşlar*, Kahramanmaraş Sütçü İmam Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Ana Bilim Dalı, Yüksek Lisans Tezi, Ağustos-2006.

Ertekin, M. Zahir, “Recmiyye/Le’netname Wek Cureyek Nezmê û Le’netnameya Şêx ‘Ebddurrehmanê Aqtepî ( Lêkolîn-Ferheng)”, *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, Nisan-2019, Cilt: 11, Sayı: 1(23).

-----,- Açar, Zafer, Di Kurmancî De Cotepeyv û Cureyên Wan, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Yıl: 1, Cilt: 1, sayı: 1, Ocak 2015

Ertekin, Nurettin, *Tesewif di Dîwana Şeyda de*, Zanîngeha Bîngolê, Enstituya Zimanên Zindî, Teza Çapnebûyî, Bîngol 2018.

Ez Zerkâvî, Muhtese'ul-mekâsid'il-hasene Fi Beyâni Kesirin Min'el- ehâdis'il-meşhureti Ala Elsine, İslami Yayınevi, 1989.

Göre, Zehra, Adnî Dîvanı'nda Ahenk Unsurları, *Turkish Studies International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Volume* 2/4 Fall 2007.

Güler, Zülfi, "Divan Şiirinde Papağan", *Akademik Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Yıl: 2, Sayı: 1, Mart 2014.

Hoşab, Ayşe Merve, "Sırrî Rahile Hanım Divanı'nda Dinî Kişilikler", *KSÜ İlahiyat Fakültesi Dergisi* 29 (2017).

İpekten, Haluk, *Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz*, Dergah Yayınları, 12. Baskı İstanbul Eylül 2010.

Karadavut, Nilüfer, *Za'ife Divanı (metin-inceleme)*, Adnan Menderes Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Ana Bilim Dalı TDE-YL-2008-0003.

Karaman, Gülay, "Perişan Çiçek Sünbül ve Klasik Türk Şiirinde İşleniş", *İnsan ve Toplum Bilimleri Araştırmaları Dergisi*, c.1, sayı. 2, 2012.

Kartal, Ahmet, *Klasik Türk Şiirinde Lâle*, Akçağ Yayınları, Ankara 1998.

Kaya, Bülent, "Divan Şiirinde At ve Şiirlerde İşleniş", *Türk Bilim Araştırmaları TÜBAV*, Yıl: 2017, Cilt; 10, Sayı: 3.

Kerbelayî, Şêx Mihemed, *Ferhenga Kerbelayî- Mîrsad'ul-Etfal/ Şahranê Kûdekan-* (Amd. Ramazan Pertev, Nûbihar, İstanbul 2012.

Kızıl, Hayreddin, "Di"ya Kirpandinê / Tekîdê di Kurmancî de, *Bingöl Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Yıl: 5, Cilt:5, Sayı: 10, 2019/2.

Kocakaplan ,İsa, *Açıklamalı Edebi Sanatlar*, Türk Edebiyatı Vakfı Yayınları, 7. Baskı, İstanbul, 2011.

Korkusuz, M. Şefik, *Tezkire-i Meşayih-i Amid Diyarbakır Velileri I -II*, Kent Yayınları, İstanbul, Ekim 2004.

-----, *Osmanlı Dönemi Diyarbekir Şairleri*, Nurefşan Yayınları, İstanbul 2016.

Kurnaz, Cemal, *Hayalî Bey Divanının Tahlili*, Kurgan Edebiyat Yayınları, Ankara 2012.

Kuzu, Fettah, “Klasik Şiirde Şarap Kavramı ve Fehîm-i Kadîm’in “Şarâb” Redifli Gazeli Üzerine Bir Tahlil İncelemesi”, *Gaziantep Universty Journal Of Social Sciences*, 2014 13(4)

Külekçi, Numan, *Açıklamalar ve Örneklerle Edebi Sanatlar*, Akçağ, Ankara 1995.

Macit, Muhsin - Soldan, Uğur, *Edebiyat Bilgi ve Teorileri El Kitabı*, Grafiker Yayınları, 9. Baskı, Ankara, 2017.

Mengi, Mine, *Eski Türk Edebiyatı Tarihi*, Akçağ Yayınları, 20. Baskı, Ankara 2014.

Mevlevî, Tahir-ül, *Edebiyat Lügatı*, Enderun Kitabevi, İstanbul, 1994.

Mutlu, Betül, *Divan Şiirinde Deniz İmgesi ve Şiir Öğretiminde Kullanılması*, Dokuz Eylül Üniversitesi Eğitim Bilimleri Enstitüsü, Türkçe Eğitimi Anabilim Dalı, Türkçe Öğretmenliği Programı, Yüksek Lisans Tezi, İzmir-2012.

Nevrûzî, Kerküklü Şair Muhammed, *Yusuf ile Züleyha*, (inceleme-metin: Çoban Hıdır Uluhan), Atatürk, Kültür, Dil ve Tarih Yüksek Kurumu Türk Dil Kurumu Yayınları; 886/1, Ankara 2007.

Okuyucu, Cihan, *Divan Edebiyatı Estetiği*, Kapı Yayınları 4. Baskı İstanbul 2011.

Onay, Ahmet Talat, *Açıklamalı Divan Şiiri Sözlüğü – Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar ve İzahı-*, (hazırlayan: Cemal Kurnaz) Kurgan Edebiyat Yayınları, Ankara 2013.

Öntürk, Ahmet, “Divan Şiirinde Renkler”, *ulakbilge*, cilt. 5 sayı. 12, 2007.

Özaydın, Murat, *Şeyh Abdurahman Aktepe Hayatı Eserleri ve Tasavvufi Görüşleri*, Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Entitüsü Temel İslam Bilimleri (Tasavvuf) Anabilim Dalı, Yayınlanmış Doktora Tezi, Ankara 2008.

Özervarlı, M. Sait, “Su”, *DİA, İA*, c. 37.

Özgeriş, Mutlu Melis, “Değerli Taşlar Yönünden Ahmet Paşa Divanı”, *Türkiyat Mecmuası*, c. 26/2, 2016.

Öztürk, Erdem Can, “Klasik Türk Edebiyatında Akrep ve Anlam Çevresi”, *Türk Kültürü İncelemeleri Dergisi 41*, İstanbul 2019.

İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Kapı Yayınları, 23. Baskı, İstanbul, Ekim 2013.

Sadinî, Xalid, *Feqiyê, Teyran, Jiyan, Berhem û Helbestên wî*, çapa 5., Nûbihar, Stenbol, 2011.

Sağniç, Feqî Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Entituya Kurdî ya Stenbolê, Sermawez 2014

Saraç, M. A. Yekta, *Klasik Edebiyat Bilgisi-Belagat*, çapa 7. weş. Gökkubbe, İstanbul, 2010.

....., *Klasik Edebiyat Bilgisi -Biçim, Ölçü, Kafîye-* Gökkubbe Yayınları 7. Baskı İstanbul 2013.

Sefercioğlu, Nejat, *Nev'î Divanı'nın Tahlîli*, Akçağ Yayınları, 2. Baskı, Ankara 2001.

Selçuk, Bahir, “Klasik Türk Şiirinde Ceres ( Çan /Çingirak)”, *International Periodical For The Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, Volume 7/3, Summer 2012.

Toprak, Yeliz, *Kanûnî Devri İhtişamının Divan Şiirine Yansıması ( Hayalî, Bakî ve Taşlıcalı Yahya Divanlarında Değerli Taşlar*, Yüksek Lisans Tez, Haziran 2017.

Tökel , Dursun Ali, *Divan Şiirinde Şahıslar Mitolojisi*, Fatih Sultan Mehmet Vakıf Üniversitesi Yayınları 2. Baskı İstanbul 2016.

-----, *Divan Şiirinde Harf Simgesiliği*, Fatih Sultan Mehmet Vakıf Üniversitesi Yayınları, 2. Baskı İstanbul, Ağustos, 2016.

Turan, Selami, “Necafî Beğin Şiirlerinde Yer Adları”, *SDÜ Fen Edebiyat Fakültesi Sosyal Bilimler Dergisi*, sayı: 20, Aralık 2009.

Yeniterzi, Emine, “Klasik Türk Şiirinde Ülke ve Şehirlerin Meşhur Özellikleri”, *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, 3/15.

Yeşilbağ, Semih, “Muhibbî Divanı'nda Değerli Taşlar”, *Divan Edebiyatı Araştırmaları Dergisi* 22, İstanbul 2019.

Yeşiloğlu, Ayşegül Mine, “Zati'nin Gazellerinde Kıyafetlerle İlgili Unsurlar”, *Trakya Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, c. 12, s. 1, Haziran 2010.

Yıldırım, Kadri (çeviri ve analiz), *Ehmedê Xanî Külliyyatı IV, Dîwan*, Avesta, Stenbol, 2014.

Yılmaz, H. Kâmil, *Ana Hatlarıyla Tasavvuf ve Tarikatler*, Ensar, 18. Baskı, İstanbul Ekim 2014.

Yılmaz, İbrahim, *Arap Edebiyatında Aruz*, Araştırma Yayınları, Ankara, Ocak 2009.  
Yılmaz Vurgun, Seda, “Buhara Emirliğinin İki Önemli Şehri: Buhara ve Semerkand”, *Türk Tarihi Araştırmaları Dergisi*, yıl 1, sayı 1, Güz 2016.  
Zeynelabidin Zinar, *Şêx Ebdurrehmanê Axtepî Rewdneîm*, Stokholm 1991.





## **JÎNNAME**

Di sala 1995an de li Batmanê hatiye dinê. Dibistana seretayî û navîn li dibistana Kulturê xwend. Di sala 2013an de ji lîseyê mezûn bû û di sala 2014an de di zanîngeha Bîngolê de dest bi beşa Ziman û Wêjeya Kurdî kir. Piştî Lîsansê li heman zanîngeh û beşê dest bi Lîsansa Bilind kir.

